

**Martînê Bextewer**  
**roman**

**Jan Dost**

﴿كُلُّ حِزْبٍ بِمَا لَدَيْهِمْ فَرِحُونَ﴾

**Qurana pîroz**

**Baz bi tena xwe difire, qiralk bi refan.**  
**Spînoza**

**Danê sibehê**

## Se`et neh

**N**eh caran ringînî ji zengilê dêra bajarokê Karlofçayê li Sirbistanê hat û bi wê ringîniyê re yazde kevokên spî ku li ser keviyekê bircê dêrê yê bilind veniştîbûn firiyan û bi ezmên ketin<sup>1</sup>. Demeke dirêj wan yazde kevokên spî li ezmanê sar û sayî hêlan kirin û dawî hatin li ser keviyê xaniyekê ku li ber keviyê çemê Tunayê bû veniştin û dest bi qeqqebê kirin. Hayê wan yazde kevokên spî jê nebû ku di wî xanî de nûnerên çar dewletên ewropî bi nûnerên dewleta osmanî re rûniştine da ku peymana aştiyê ya ku dawî li qonaxeke şer î dirêj dianî, imze bikin.

Destpêka sala 1699an bû. Roja duşemê bîst û çarê meha Recebê ku beramber bîst û şeşê meha çileyê paşîn bû. Seet nehê sibeheke sar, yazde kes, sê ji wan osmanî bûn, di saloneke rût de ku di pencereyên wê re çemê Tunayê û yazde kevokên ku li ezmanekî ewravî difiriyan xuyadikirin, li hev civiyabûn. Ew bûbû heftê rojên wan giregiran gotûbêja peymanê û merc û bendên wê dikirin. Geh li hev dikirin geh na. Geh li hev aş dibûn geh zîz dibûn. Heftê roj bi dawî bûn û ew duşema sar hat. Duşema ku dê berê dîrokê biguhere hat û yazde kesan qedera bi dehan millet mîna cawekî hevrişim bi cawbira berjewendiyên imperator û padşahan dibirrîn. Reîsulkuttab Ramî Mehmet Paşa ku nûnerê sultan Mustefa bû ji tercumanê herî mezin ê osmaniyan Aleksander Mavrokodortos re gotibû ku ew mîna ewropiyan naxwze li ser kursiyekê rûne ku nigên wî bi erda salonê bibin. Kesekî ku nûnerê padşahê osmanî be divê bi hemî bedena xwe ji erdê qut be û di ser hemiyan re be. Loma jî ji wan re bi lez û bez qoltuxek li cem necarê bajêr Branco Moravac dane sazîkirin û anîn li wê salona sar û rût danîn û rûyek ji mexmerekî sor avêtin ser. Nûnerê arşîdokiya Utrîşê kontê nexweş û pîr Kinsky, nûnerê komara Venedîkê Carlo Ruzzi, nûnerê qiralîteya Lehistanê Malachowski û nûnerê imperatoriya Rûsyayê Wosnitzin cihên xwe li ser kursiyên li dora maseyeke girover û bi hevrişimekî şîn nuxumnadî xweş kirin. Kaxez li ber wan bûn, murekkebdank û perîkên nivîsandinê li ber wan bûn û qedera bi dehan welat û hezarê hezaran xelk li ber wan bûn lê nizanîbûn çî ji hev re bibêjin. Kontê saldar Kinsky ê ku bayê sar î di pencereya nîvvekirî re dihat û perîka tawisan ya di ber bonetê wî yê qedîfe de dihejand, murekkebdankekişande nêzikî xwe, perîka nivîsnadinê carekê du caran tê da kir, li ser kaxezekê tiştek nivîsî û got:

- Şer agir e. Agirekî gurr î ku zû bi zû venamire. Şer bi xwe bi xwînê gurr dibe. Ew bi xwîna hezaran mirov, leşker, jin, zarok û kesên bêguneh vêdikeve. Lê dawiya dawiyê ji bo ku ew agir were vemirandin, divê hibr were meydanê. Bi çend dilop murekkeb

---

<sup>1</sup> Jamkutê wê dêrê, Borislavê bîst salî, yekî qut î qalind î rûgirover î simêlboq bû. Wî ji zarotiya xwe de ji dengê zengilê dêran hez dikir. Bi jamkutê dêra Karlowitzê yê kal re hildikişiya bircê jamê û lê temaşe dikir. Yekcaran jî bi wî re weris dikişand û di nav kêfeke bêpayan de ringînî ji jamê dianî. Bavê Borislav pîşeyê xeratiyê ji wî û pêşeroja wî re qenc didît loma jî ew biribû cem necarê bajêr Branco Moravac danî bû. Ew li wir fêrî sazîkirina firaxên textî, listikên zarokan, mase, kursî, dergûş, sindoq, iskemle, çocik û kevçiyên şorbê jî bûbû. Metqeb û çakûç û izmîlê biçûk bi hostayî bi kar dianîn. Darên gûzê û yên berûyan di destê wî de dibûn hevîr û çî bixwesta çê dikir. Ku dengê zengilê dêrê dikir, alavên xeratiyê ji destê xwe datanîn, çavên xwe digirtin û ji xwe re li ringîniyê guhdarî dikir. Dema ku bavê wî mir, ew pazde salî bû. Diya wî, jina dîndar û jixwedêtirsîyayî ew anî dêrê û teslîmê keşîşê wê kir û xewna wî bi cih hat; bû jamkutê dêrê. Lê di nav re xeratiya xwe ya textan û ya bedenên jî dikir.

agirê şerekî giran û dûvdirêj, eger irade hebe, dikare were vemirandin. Em jî îro dixwazin vê yekê bikin. Irade jî heye û hibr jî heye.

Axaftina wî kontê şêst û pênc salî, ê ku carê ji ber jana di pişikên xwe de dikuxuya, cihê pesendkirina kesên rûniştî bû. Reîsulukuttab Ramî Mehmet Paşa di riya wergerandinê re nas kir bê çi hate gotin, rabû cihê xwe li ser qoltuxê xweş kir, şaşika xwe ya mezin ediland, riya xwe ya dirêj bi qevda destê xwe yê rastê mis da, ji xizmetçiyê xwe yê li pişt wî rawestiyabû qutiya nişûqê a zîvîn xwest û hilmek du hilm jê kişandin û qutî tavi lê vergerand û bi ahengeke layiqî nûnerê imperatoriyeke ku bawer nake di şer de şikestibe got:

- Ew qadên mezin ên şer, ew meydanên fereh ku artêş lek bi lek dikişîn û li himber hev şer dikin, bi kêrî pêkanîna armancan nayên bi qasî ku ev salona biçûk û ev maseya kêmnirx bi kêr tê. Maseyeke kevnîk, girover û biçûk ku çar mirovên hişmend li dorê bicivin, dikare bibe qada aştî û serkeftinê bêtir ji qadên ku bi dehan feldmarşal û sadriazam têde li ser hespan in û li pişt topan in.

Peyman berê amade bû, bi almanî, polonî, îtalî, rûsî û bi zimanê osmanî jî hatibû nivîsîn. Nûnerên dewletan imzeyên xwe li binî rêz kirin. Ji aliyê çepê de nûnerê Rûsyayê, Utrîşê, Venedîkê û Lehistanê imze û morên xwe mîna rêşiyên perdeyan avêtin binê peymanê. Mezinê tercumanên osmaniyan, drogmanê navdar Aleksander Mavrokodortosê ji girava Saqizê jî imzeyê xwe bi latînî danî. Dora nûnerê osmaniyan wezîrê navdar hat. Çavên hemûyan lê bû. Wî jî berî ku dest bi imzekirinê bike dîsa qutiya nişûqê ji xizmetçiyê xwe xwest û hilmeke kûr jê kişand, bi tevgerê giran serê perîkê dawerivand binê murekbebdanka li ber xwe û bi zimanê erebî bi xeta nesxê nivîsî:

- Ez'efû `Ibadi-Ellah Muhemmed Ramî. Reîsul Kuttab.

Û seet nehê sibehê mohra xwe li binê peymanê û li rex imzeyê tercumanê xwe danî.

Di wê kêlîkê de siya osmaniyan dest pê kir ji ser Ewropayê dageriya. Li gor xalên wê peymanê, Meceristan û More û Azaq û gelek herêmên din ji dest osmaniyaan derketin û ketin bin baskên Utrîşê, Lehistanê, Venedîkê û Rûsyayê. Rê li ber bazirgan û gerrok û siyasethan û misyonerên ewropî vebû ku bi rihetî herin welatê osmaniyan û di nav de bigerin. Ji wê kêlîkê de êdî welatê osmaniyan bû mîna qetek duhnê ku bikeve nav agirekî hêdî hêdî hiliya.

\* \* \*

Di eynî wê roja duşemê de ji wê zivistana sar, piştî ku di wê salona rût de peymana herî girîng û xeternak di wê sedsalê de imze bû, mêvanekî sar î spî hate serdana gundê Herne li bakurî rûbarê Ruhr û başûrî çemê Emscherê di navbera Dortmund û Essenê de. Berfê şaxên dara şaberûyê ya nêzîkî dêrê serjêr kiribûn. Martîn Setzerê bîst û pênc salî û hevalê wî jamkutê berê ê dêrê Gustav Albusê bi heft salan jê mestir di bin wê darê bi xwe de xatir ji hev xwestin. Hayê herduyan jî ji peymana ku li wî bajarokê dût imze bûbû û ji encamên wê nebû. Wan nizanîbû ku êdî dê rewşeke nû dunyayê birêve bibe. Wan nizanîbû ku Ewropa kevirekî giran ji ser sînga xwe hilanî lê yekî girantir li ser danî. Hîn şerê ji bo taca qiralîteya Ispanyayê dest pê nekiribû lê bilqebîlq bi dîza cengê ketibû.

Wê zivistanê, berî ku Martîn berê xwe bide ser riyên bexteweriyê bi mehekê, diya wî ya ku nû miribû. Wê rojê yekşemê berfa di pêşiya malê de dida alîyekî. Wê dixwest peyarêyeke biçûk ji ber deriyê malê heta rêya ku diçû dêrê û nava gund veke, lê ji nişkêve şemitî bû û serê wê li kevirekî ketibû û can jê kişiyabû. Rahibê ku berê wî li dêrê bû çav lê ketibû û xwe bi lez gihandibûyê lê êdî temam bûbû. Mirineke ku ew ne li bendê bû bû, Martîn digot. Lê rahibê ku yekem kes bû bi diya wî ve hatibû, di veşartina wê de li goristana gund gotibûyê û gotibû tevaya gundiyan jî ku mirov hergav û herdem divê bendewarê yan mirina xwe yan jî mirina kesên derdora xwe be. Gotibû wan jî ku jiyan xalekek mezin e, gelekî mezin e lê mirin xelesa li dorê ye. Jiyan û mirin nuqte û dayireyê ne kes ji nava nuqtayê nikare wê dayireyê derbas bike. Jiyan bi mirinê her û her dorpêçkirî ye. Weha waazên xwe digotin rahibê dêrê.

Wê mirinê gola pirsan di hişê Martîn de ji nûve çelqandibû û di serî d epirsa bexteweriyê. Keşe bextewerî hêsan dikir û digot: bidin pey Mesîh hûnê bextewer bibin. Lê ew bi vê bersivê razî nedibû. Ew ji zarotiya xwe de di nav kitêbên destxet û yên çapkirî yên dêrê de mîna mişkekî çilek ku bîna penêr kiribe, li razên bexteweriyê digeriya. Bîna hibrê ew mest dikir. Misdana kaxezên şayîk ên ku ji Nûrenburgê dihatin gupînî ji dilê wî dianî. Di nav kaxezên spî de li bexteweriyê digeriya. Bextewerî jêre bûbû mereqdarî û derdê herî mezin ku bersiva peydakirina wê nizanibû. Kitêb li dû kitêbê xwendibû û danasîneke ku dilê wî bixe cih ji bexteweriyê re nedîtibû. Bavê wî ji zarotiya wî de dixwest ku berê wî bide mûzîkê. Ew beşdarî dersên mûzîkê yên di dêrê de kiribû heta ku fêrî kemanjeniyê bûbû. Paşê wî bi xwe dersên mûzîkê didan û di koralê dêrê de roleke wî ya mezin hebû. Li dêrê sirûdên olî di cejnan û sibehên yekşeman û êvarên pîroz de, demekê gotibûn. Piştî mirina bavê xwe li mal dest bi nesixkirina kitêban kiribû. Kitêb dikirîn û difrotin. Heta bajarê Köln û Dortmund û Münsterê diçû. Xwe û diya xwe bi wî pîşeyî xwedî dikir. Lê tu pereyekî mezin jê qezenc nedikir û debara wan hema hema bi zor pê dibû. Ji debara malê bêtir, naskirina bexteweriyê jêre pêwist bû. Ew çiye û çawa peyda dibe, li kû heye û kî dide? Çima Mesîh hat û nikaribû bexteweriyê bîne? Çima xwedê evdên xwe wê çendê diazirîne bi soza ku dê wan piştî mirinê bextewer bike? Bexteweriya derûnî çawa peyda dibe? Pirsên wî derbarî vê mijarê de pirr dibûn û di zikê kitêban de li wan digeriya bêyî ku bersivan bibîne. Piştî mirina dayika wî ya ji nişkê ve û naskirina Hans Heilberg xwediyê bar û rêwîxaneyê gund ku navê wê Cafe Heilberg bû, jiyana Martîn Setzer serobinî hev bû.

\* \* \*

**P**iştî ku Hans Heilberg sî û pênc salekî li Den Haagê berçavkîroşî kiribû û di salên dawiyê de li keviyê behra bakur nêzikî dêra mezin Grote Kerk di qehwexaneyekê de kar kiribû, dîsa li Herne vegeriyabû<sup>1</sup>. Wî li Den Haagê naskiribû ku qehwexane cihên herî qenc in ji bo qezenckirina dirav û dostan û civatên sûdwer. Li bajarên mezin, mîna London, Den Haag û Parîsê, qehwexane êdî mîna kîvarkan pir dibûn û nema tenê cihê giregiran bûn, êdî xelkên qata duyemîn û sêyemîn jî dibûn mêvanên qehwexaneyan û di ber vexwarina qehweyê re di fincanên ferfûrî de, behsa her aliyê jiyanê dikirin. Di civatên qehwevexwarinê de, li koşkên imperator û qiral û kont û baronan jî qedera welatan dihate danîn. Ewropa bûbû qehwexaneyekê mezin. Hans jî xwestibû tişteki nûjen î ku layiqî demê be bîne Herne û taze rêwîxaneyê xwe vekiribû. Gundî û serbaz û keşe û hevalên xwe yê kevn jî hemî dawetî şahiya vekirinê kiribûn. Keşeyê dêrê û endamên koralê jî beşdar bûbûn û wan hindirê rêwîxaneyê bi pêtên mûzîkekeke şêrîn germ kiribûn.

Ew herêm bi hacetî rêwîxaneyekê bi wî rengî bû ku qatê binî bar û qehwexane be û jor jî cihê razanê be. Bazirgan û xwendevan ji Münsterê diçûn Kölnê û ji wir diçûne Hollandayê û ji Kölnê jî dihatine Münsterê da ku ji wir jî herin bajarê Emden yê li ser behrê. Hans wisa fikirî bû ku rêwîxaneyek li Herne hebe wê ewqase rêwî berê xwe bidinê û bi kêmanî şevê lê bimînin. Ewê bibe navendek û ewê karibe bi wî awayî jiyanekê tijî mîna jiyana xwe ya li Amsterdamê dîsa bijî.

Di şahiya vekirina rêwîxaneyê de, ku rojê sar ji dawiya sala 1698an bû, Hansê kal ji civatê hemûyî bala xwe dabû Martînê kose ku bi ser xwe de ponijî bû û li koşeyekî dûr meya xwe giran giran û tenê dinoşî. Kalbûna Hans henûniyekê diyar dabû rûyê wî yê girover bi wê riya spî û gij û çavên birqonekî ku êşeke kûr di gel kêfeke xwezayî di wan de xuya dikir. Dengê wî yê ketî ji ber kişandina qelûnê dihişt ku dilê mirov bêtir lê rûne û bi bavîtiya wî bihesê. Piştî ku wî silav li vî û wî kir û bi wan re qedeh bilind kirin, ber bi Martîn ve jî hat. Destê xwe da ser milê wî û hema got:

- Hêy! Xorto! Jiyan çi be ne hêjayî vê kûrramandina te ye.
- Ez ne di jiyanê de difikirim?
- Lê di çi de ?
- Di mirinê de, di bexteweriyê de. Di rastiya rût de.

Hans keniya, kenekî bilind ku hişt her kesek peyalê ji ber lêvên xwe dagerîne û stûyê xwe ba bide û bi alî wan de binere.

Martîn enîşka xwe dabû ser kenarê maseyê girover û bilind li nêzikî şibakeyê rêwîxaneyê, alîkî rûyê xwe sipartibû mista destê xwe û li tengerêya ku bi berfê raxistibû û

---

<sup>1</sup> Hans kurê tekane yê dê û bavê xwe bû. Bajarê wî li kenarê deryayê Baltîq bû. Hîn du salî bû dema ku artêşa Swêdê bi serokatiya qiral Gustav Adolf daketin bejayê û dest bi şer kirin. Qaşo hatibûn bi hewara protestantan ve. Bavê wî yê lûterî hat kuştin. Rabû diya wî ew û sê xwehên wî rakirin û ber bi başûr de reviya. Artêş jî ji bakur de wek xezebekê dihat. Katolîk û lûterî li bin guhê hev ketibûn. Lê êdî şer bûbû şerê dunyayê bêtir ji yê dîn. Û dewletên hawîrdorê her yek ji aliyê xwe de axa welatê Hans gez dikirin û dikeritandin. Hurmeta tişteki nemabû. Bi sala 1643'an re ew û diya xwe û hersê xwehên xwe ên xweşik: Herta, Hermine û Hedwig li gundekî bakurî çemê Rein bi cih bûbûn. Ew deh dwazde salî bû. Havîna wê salê artêşên çar dewletan şerê hev dikirin. Di şer de jî serbaz weke dînan li wan tê. Har dibin û bi dîtina xwîna rijîyayî ya heval û dijminên xwe re ji mirovayetiye dikevin. Çermê wan yê hovan ji qalikê mirovayetiye derdikeve. Wisa jî serbazên frensî û ispanî û yê mîrnuşîniyên wan deveran ketin kirasê dirrindayan. Diya wî li ber çavê wî hate kuştin û serbaz tecawuzî her sê xwişkên wî bûn. Dengê xwişka wî ya sêzde salî ku serbazên ispanî ketibûn ser zikê wê, gelek şevan xew lê diherimand. Di nav wê xwînê de wî hemî wêne didîtin tenê yê Mesîh na! Îqonên ku li ber çavên wî xuyadikirin bi durûvên guran bûn. Xwîn ji her îqonekê diniquît. Ji tirsan re her sê xwehên xwe ên zorganbûyî rakirin û berê xwe da Amsterdamê. Hersê xwehên xwe, Hedwig û Herta û Hermine kirin xizmetkarên dêra Waalse Kerk a li Amsterdamê. Û bi xwe jî berê xwe da Den Haagê û li wir bû berçavkîroş û sîqalkerê camên berçavkan. Çavên wî jî, li ba filosofekî li wir, hatin sîqalkirin û êdî xwe ji baweriyên xwe ên berê dawêşand mîna ku yek xwe ji ava çiraveke gemaî dawêşîne.

heta ber derê dêrê diçû dinerî. Hans hêsrên ku ji ber pêla kenînê di çavên wî de biriqîbûn bi piştî tilîka xwe ya mezin dane alî û bi ahengeke tijî pirs û matmabûn got:

- di mirinê de! Û hîn di çi de jî! Rastî û bextewerî!

Paşê Hans çavên xwe niv girtinê girtin û lêvên xwe qermiçandin û hinekî riya xwe ya gij û spî xurand. Weke yekî ku ji dil û kûr birame bêdeng ma. Tawilê bi hêdî got.

- Ramandina di mirinê de ji mirinê bi xwe jî zortir e. Tu li bexteweriyê bigerî yan têde bifikirî tu yê perîşan û xemgîn bibî.

Raserî wan li jor, di quncikê barê de pîrebokekê konikê xwe di navbera tu textikên stûr ku banê rêwîxaneyê xwe sipartibû rêzek textikên mîna wan, danîbû. Mêşek ketibû nav tayên wî konikî û keftelefa wê bû. Xuyabû ku wê êdî nema dikarîbû ji wir derkeve. Pîrebokê jî ku dîtibû konik diheje, nas kiribû ku nêçîrek ketiyê. Bi lez di ser tayên konikê xwe re meşiyabû û berê xwe dabû mêşê û kefenekî ji tayên spî û xav û zirav li dora mêşê gerandibû. Her ku çûbû tayên ziravik bûbûn xelekin teng û li dora mêşa serîlêgeriyayî geriyabûn. Mêş ji desthilanîn ketibû. Êdî dimir.

Hansê kal berê xwe da jor û got:

- 
- da ku tu ji qalîkê xemgîniyê derkevî divê tu biteriqî. Ev welat ne cihê ku mirovekî xort lê bijî.

Û meya ku di binê qedehê de mabû berda gewriya xwe û vegeriya hinda mêvanên xwe yên din.

Hêdî hêdî reşahî belav dibû û şahî ber bi dawiya xwe ve diçû. Hans dest pê kir mûmên li ser maseyan vexistin û herdu qendîlên li rex deriyê rêwîxaneyê jî geş kirin. Xelkên gund ji rêwîxaneya Cafe Heilberg sermest û bi kêf derdiketin û vedigeriyan malên xwe û rêwîxana vala dibû. Martîn tenê sergiran û dîkul û tevlihev vegeriya mal û kete nav nivînan û ramanên kûr ew dorpêç kirin. Mala wî ya ku piştî mirina diya wî di çavên wî de bûbû kavîlekî wêran, ne dûrî rêwîxaneyê bû. Ji wir carê diakrîbû kenê Hans û heta çingîniya qedehan û firikirina wî ji meyê re jî bibihîze.

Wê şevê xewa wî nehat. Di nav nivînan de xwe çep û rast diqulipand û nediket xew. Gotina Hansê kal *divê tu biteriqî* di guhê wî de mîna zirmêşekê dikire vîngînî. Ku bû nivê şevê ew rabû ji nav nivîna xwe weke ku heft kes bang li wî bikin çeng bû û li rêwîxaneyê vegeriya.

Hans hîn payî bû. Peyalek meya sor li ber bû û di ber xwe de stranek dinehwirand û ji xwe re li agir dinerî.

Martîn hêdîka li rex wî rûnişt. Agirê di tifîka di dîwêr de hîn geş bû. Diyar bû ku Hans çend êzing berî kêlîkeke kurt avêtibûnê. Dema ku çavên wî bi Martîn ketin, nehvirandina xwe nerawestand. Ji cihê xwe jî ranebû lê bi destekî xwe nîşanî kursiyê kêleka xwe kir ku rûne.

\* \* \*

**H**ansê ku hinarkên rûyê wî li ber agirê agirdankê û ji tîna meyê mîna du qet pereng xuya dikirin bi dengê nerm ew vexwende kursiyê li rex xwe û got:

- Were Martîn. Were rûne. Tu îro di şahiyê gelekî xemgîn bûyî. Xort û xemgînî çiyê hev in Martîn? Ez dizanim diya te miriye û tu tek û tenê mayî. Xemgînî jî li pey mirina dayikê ne şerm e. Min bavê te nas dikir. Ew kesekî şad û bextewer bû. Xweh û birayên te ên ku ji diya te re çêdibûn di yekmehiya xwe de dimirin. Ez bawer dikim sê bira û du xwehên te bi wî rengî çûn. Lê bavê te her wek xwe dima. Dema tu bûyî du sê salî jî bavê te nameyek ji min re hinart û têde got ku êdî ew nema li ser te ditirse. Wî digot

ku eger zarokekî wî sala xwe temam bike û nemire êdî ew nema ditirse. Lê ew her bi kêf bû û xemgîniyê riya xwe di wî re nedidît. Derdê mirinê zor e.

Martin hat ku devê xwe veke û tiştekî bibêje lê Hans rê nedayê. Peyalek mey jêre dagirt, danî ber wî û gotê :

- Tu yê bibêjî ew diya te bû. Min jî mirina diya xwe dît. A wê ne mirin bû lê ew hate kuştin. Ew kuştin. Kê ew kuşt? Gotin katolîkan ew kuştiye! Hahew. Lûteranî bana yan katolîk çi ferq bû! Di vê navê de miroveke bêguneh bi destê mirovin din ji ser rûyê erdê kêmbû. Diya min gundî bû. Nizanibû çend cûre dêr û kinişte hene. Nizanibû çend versiyon Incîl hene. Lê mesîhek tenê nas dikir. Mesîhê xelasker! Bes wî jî ew ji pencên kîna kor xelas nekir ha. Tu hîn xort î Martîn. Xortekî nûhatîyî. Salên ku mumkin e tu bibînî ji yên min bêtir in. Hema min jî têra xwe sal dîtî. Min têra xwe bajar û kes û cih û war û dunya dîtiye. Min têra xwe şerên giran jî dîtine. Min dawiya şerê sî salan jî dîtiye Martîn. Çi wêran bû ew?

Martîn meya xwe vexwar û awireke pîrsdar dîsa li jor xist. Bêdeng li wî şerê bêdeng yê pîrebokê û mêşa di ser serê wan re temaşe kir û kêlîkekê ponijî. Ji rewşa pîrebok û mêşê têgihişt ku mirin rê li ber bexteweriyê digire. Berê xwe da Hansê kal û mîna yekî ku gencîneyek dîtibe got:

- Devera ku mirin lê hebe, bextewerî xwe dide paş.

Hans qîtikekî kinik avête ser agirê ku li ber vemirandinê bû û bi kenekî sivik re got:

- Na ne wisa ye. Dibe ku ji bo hinekan mirin bextewerî be. Bextewerî ne wisa hêsane ku bi gotinekê re tu wê bidî nasîn.

Hinekî çavên xwe melûl kirin. Peyala xwe ber bi devê xwe ve bilind kir. Bêyî ku qurtekê vexwe berdewam :

- Ku rast tu li bexteweriyê digerrî berê xwe bide şerqê Martîn. Şerqa rûhanîyetê. Şerqa ronahiyê. Şerqa roj û xweşiyê. Şerqa tesewwufê. Li vir çi heye Martîn? Nakokiyên dêran û keşeyan? Bi sedan mîrnuşîniyên ku êdî ji qijnikan xerabtir xwîna xelkê dimijin û di pehnavan de rebenan kom dikin û bi şûran hev qir dikin? Welatê dînan e ev welat. Çi li vir heye? Zêrperes! Bazirganên mirovan yan jî ev kitêbên katolîk û lûterîyan ku tê de tên hevdû bixwin? Binemala Bourbon yan Habsburg? Prens û lord û graf û kont û baronên mezin. Mîrên ku dijminiya sîya xwe jî dikarin bikin! Here Martîn here. Here. Bide pey rastiye û dawî piştî ku te dilê xwe da ber sûlavên ronahiya rastiye vegere. Tu yê bexteweriyê bi dest bixî. Eger dilê te nebe warê hikmeteke mezin ruhê te xelas nabe. Tu bikaribî heta Hindistanê jî biçê. Her ku tu ji qalikê xwe dûrtir herî tu yê rastiye nêzîktirî xwe bibînî. Ewê mîna horiyeke spehî û tazî were pêşberî te. Tuyê rastiye hembêz bikî Martîn.

Martîn dîsa bi awirên xwe yên tijî pîrs li jor li konikê pîrebokê nerî. Mêşa ku ketibû nav tayên konikê xav û berî kêlîkekê keftelefa wê bû, êdî miribû. Mîna wê mêşe derketina ji wan welatan bûbû demek di serê Martîn de mîna zengilê dêrekê dikire zingînî û mijarên mîna rastî û bexteweriyê serê wî tev li hev dikirin. Bi wan xeyalan re wî peyala xwe bilind kir. Anî ber lêva xwe. Berî ku qurtekê vexwe pîrsî:

- Ma tu qet çûyî wan welatan?
- bi cesedê xwe na, lê bi ruh û xeyalê xwe gelekî li wir mame. Camêrekî ez birim şerqê. Camêrekî ku ne li van welatan bû. Camêrekî ku Rastî mîna bazekî girtibû û ew di rikeha hişê xwe yê vêketî û geş û azad de kedî kiribû.
- Ma ruh û xeyal têra naskirina welatan dikin? Bi xeyal rastî tê naskirin?
- Erê têre dikin. Lê ê min ez di dawîya temenê xwe de bi ser şerqê û sihra wê vebûm. Piştî ku min buhayekî mezin ji temenê xwe da valahiyê, nû çavên min li pakî û rûhaniyeta şerqê vebûn. Min pîrr dereng nas kir ku êdî ev welatên me diherifin û noqî gola genî ya malperestiyê dibin. lê şerq! Hîn rûhaniyeta wê qîz e.



Martîn li vê yekê digeriya: yekî ku wî li derketinê germ û sor bike, yekî ku riya revê raberî wî bike, yekî ku deriyê derve li ber veke. Vaye ew yekê han li ber wî rûniştiye. Vaye ew yek tiliyê datîne ser birînê û destnîşanî kula dilê wî dike û çareyê jî jêre dibêje.

Martîn xwest hîn û hîn jê bibihîze lê wî wisa xeyal kir ku Hans êdî nema dikare biaxive. Ji nişkêve çavên Hans bi ronahiyeke seyr biriqîn, rûyê wî geştir bû û got:

- Hate bîra min! Kitêba bexteweriyê. Ji bo wê mabe berê xwe bide şerqê.

Dilê Martîn bi bihîstina peyva kitêbê re bi lez lêda û pirsî:

- Çi kitêb ?
- Navê wê *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* ye. Wî camêrê ku min behsa wî kir ji min re carekê behsa wê kitêbê kir. Wî got eger yek wê bixwîne dest davêje qepera bexteweriyê û êdî tucarî xeman nas nake. Wî hin beş jê di kitêbên nav destên xwe de xwendibûn û nas kiribûn ku felsefeyeke kûr di wê kitêbê de heye. Ew kitêbeke ku bextewerî daye nasandî û hiştiye çî kesê ku wê bixwîne bextewer bibe. Riya bexteweriyê ye ew. Çawa ku yek fêrî pişeyekî dibe, ew kitêb jî mirov fêrî bexteweriyê dike. Nivîskarê wê ew jî xelîfeyekî misilmanan re nivîsî bû. Dibêjin ku şopa wê cara dawî li bajarekî osmanîyan ku navê wî Heleb e, hatiye dîtin.

Mîna ku westiyabe, Hans henaseke kûr kişand, hinekî perengên di agirdankê de tevdan û berdewam kir:

- Tu dizanî ku ew kitêb yek ji hoyên şerê xaçparêzan î li dijî misilmanan bû. Wî gotibû ku qiralekî ewropîyan leşkerekî giran kişandibû û hemleyeke mezin biribû kenarên Levantê ji bo ku wê kitêbê peyda bike. Lê hemleya wî bê encam bûbû û ew negihîştibû Helebê cihê ku texmîn dibû ku ew kitêb ê lê peyda bibe.

Ku Martîn ev çîrok bihîst got:

- Wa artêşekê nikarîbû wê kitêbê bidest bixîne, de îca çawa ez rebenê bê leşker dê karibim bi dest bixim?

Bayekî aram bi tiliyên xwe yên nedîtî riya Hans ya spî şeh kir. Wî jî serê xwe hejand û got:

- Bidestxistina bexteweriyê ne bi leşkeran e Martîn. Di rêya leşkeran re bextewerî têk diçe. Dengê çekan li ku were bihîstin zanibe bextewerî ji wê deverê dûr e.

\* \* \*

Wê şevê sihreke nepenî di gotinên Hans de hebû. Sihra çîrok û efsaneyên welatekî di nav ronahiyê de. Rastî û wateya hebûnê. Bextewerîya mirov û çawatiya bidestxistina jiyanê bextewer. Û di ser her tiştî re ew kitêb!! Ew bi xwe ev bûn pirsên ku xortaniya Martîn avêtibûn gol û gêjenan û qeyika hişê wî di nav pêlan de çelqandibûn û xewên şevan lê herimandibûn. Wî her û her bi hezaran rûpelên kitêbên dêrê û yên li malê qulibandibûn û li Rastiyê digeriya û lê rast nedihat. Bi qasî wê gera xwe jî bêbersiv û windayî mabû. Ne dêrê, ne kitêbên dêrê, ne jî kes û dost û hevalên wî gundî dikaribûn tîbûna ruhê wî bişikînin. Hevalê wî yê herî nêzîk, Gustav Albus her carê şîret lê dikirin û digot:

- Bêhişîyan neke Martîn! Mirov çawa li tişteki di mista destê xwe de bigere? Riya rast riya Mesîh e û bextewerî di naskirina peyva xwedê de ye. Bextewerî jî hezkirina rebbê me Mesîhê xelasker e. Temenê te çiye tu xwe bi van pirsên hertûqîyan dibilîni û mijûl dikî? Xortaniya xwe di siya kitêba pîroz de derbas bike ji xweber tu yê bextewer bibî.

Dilê Martîn bi van gotinên hevalê wî sar dibû. Bi sedê caran ew gotin di waazên dêrê de bihîstibûn û naramiya wî ya hundurîn sar nebûbû. Ew bi tenê dima, bi tenê derdiket nav daristanên derdorê, di bin darên çinarê û yên berûyan û yên guhîjan de digeriya û serê xwe bilind dikir min ku li ser şaxên daran li bersiva pirsên xwe digere. Di rîyan de dimeşîya û diramiya û di kel û kort û gelî û newalên xeyalê xwe de li rastiya bexteweriyê digeriya lê encama wê gerê valahiyeke di rengê bayê û çêja ariyê de bû. Ew bi xwe jî demekê berî ku Hans were gund û wê rêwîxaneyê xwe veke, fikirîbû ku berê xwe bide welatên dûr û bide pey banga dilê xwe lê derfetên wî nebûn. Niha jî, di wê şevê de û di wê tariya tîr de çîrûskê bi

ber çavên wî ketibû. Kalekî dinyadîtî jêre behsa welatekî dike ku hîn rûhaniyeta wî qîz be! Sihra wî welatî hişt dilê Martîn bike gupînî û di eynî şevê de biryara xwe ya ku nediwêrîbû berî mirina diya xwe bistenda, bistîne û berê xwe bide welatê şerqê û bikeve pey wan kitêban. Bikeve bin pêl û şepolên sûlava Rastî û ronahî û bexteweriyê. Bide pey ronahiya Rastiyê. Rastiya ku xwe nade destê her kesî û bi hezar û yek şêweyî tê nasandin. Rastiya ku bi hêsanî nabe para her yekî lê ku dikeve dest mirovekî jî êdî di navbera dînbûn û baqiliyeke mezin de tê keyandin ew mirov. Berî rastiye jî Bextewerî! Ma gelo rast kitêbek heye ku bextewerî dabe nasandin û dermanê bidestxistina wê peyda kiribe? Ewçend pêxember û fîlosof hatin û çûn, rê û rêçik danîn lê mirovayeti bextewer nebû! Wê kitêbek karibe vê girêkê veke gelo? Nema Martîn diakribû xwe li himber wê sihrê ragire. Mîna ku dengê xwedayî û nuhênî fermanê lê bike û wî ber bi rojhilatê de bidehfîne, wî hema wê şevê biryara pêketina hilma hibra bexteweriyê di dilê xwe de bi cih kir.

\* \* \*

**S**ibeha din, Martîn rabû berê xwe da mala hevalê xwe Gustav. Berfê dabûyê û guliyên wê mîna xewnên ku di xeyalê wî de govend gerandibûn, dihatin xwarê. Kirtekirta berfê bû di bin nigê wî de. Di şopa solên wî de ku hinek geyayê şîn xuya dibû, qijik kom dibûn û dixepirandin. Li kurmik û danikan digeriyan. Wî ew yeka hanê nîşana bêyomiyekê dît û hinekî lezand. Wê sibehê nîşanên jiyanê li gund nebûn ji bilî şopa meşa wî û wan qijikên bêcir û dûyê kişiyayî ji banên xaniyan. Gund mîna goristanekê ker û lal bû lê serê Martîn bi qasî meydana cengeke mezin û navenda bazarekê bi xirecir bû. Gotinên Hans yên duh bi şev di serê wî de ji jamên dêrekê bêtir dikirin ringîn.

Wî biryar da ku berê xwe bide şerqê û dixwest Gustav jî bike hevalê xwe. Gustav kesekî durust bû û herdu ji zarotiya xwe de heval bûn. Gustav kesekî older î ji nimêjên dêrê nedima. Kitêba pîroz hema hema ezber kiribû. Axaftinên wî jî hemû tijî mesel û qisetên Mesîh û peyrewên wî bûn. Nameyên Paulos yên ji şênîyê Romainê û Efsusê re ji ber kiribûn. Ji xwîngermiya xwe û îmana xwe ya qewîn, tev li serbazên feldmarschall Eugen von Savoyen bûbû û çûbû heta welatê Mecrisatnê û şerê tirkî kiribû. Piştî ku malbata wî bi tevayî ji dîne xwe yê katolikî derketin û bûne lûterî, bû jamkutê dêra Herne û di kitêbxaneyê dêrê de heta destê sibê dima û pel diqulibandin. Ew li rastiye digeriya û êdî naskiribû ku hemû dîn û mezheb ji bilî mezhebê lûterî nerast in. Bi naskirina wê rastiye jî bextewer bûbû û êdî, wî digot, gihabû dawiya rê.

Martîn xoyên Gustav nas dikirin. Ew dikare bi salan bikeve pey rastiya ku ew pê bawer be. Rêwîtiyeke wanî dirêj jî dikare bi hevalekî mîna Gustavê dîndar û dilpak re hêsantir bibe. Gustav lûteriyekî îmana wî kûr di dilê wî re çûye loma jî ew dikare ji bo vê îmana xwe berê xwe bide binê behrê jî. Martîn di dilê xwe de wisa difikirî lê gava ku gihişt ber deriyê mala Gustav hinekî dudilî bû: Gelo bibêjim yan na? Çawa wî bînim ser rê û vê rêwîtiya dûr û dirêj pê şêrîn bikim!! Eger bixwaze wek misionerekî lûterî berê xwe bide wê dûra hanê, ma ne divê dêr wî bike nûnerê xwe û bişîne! Eger nepejirîne û di gel min neyê, bi tena serê xwe herim yan na? Ma hêjaye ji vir herim wî welatê dûr û bidim pê xewna kitêbekê yan ji bo rastiyeke ku dibe li wir tunebe jî? Ma çawa dê bidim pey gotineke kalekî ku cihanê û serpehatiyên malbata wî ew nîvdîni û bêhêvî kirine! Ma ku ez ji vî gundê xwe bêzar bûbim, mirina diya min ez xemgîn kiribim çima berê xwe bidim şerqê? Çima neçim bajarekî nêzik û mezin û ji xwe re karekî sezayî xwe nabînim?

Vê dudiliya wî dirêj nekir. Hema nermik nermik li derî da. Pêjna kesî nehat. Dîsa li derî da lê vê carê hinekî xurttir û guhê xwe jî da ser qelşeke ziravik tê de. Deng û his nebû. Ku Gustav

li mal bûya wê hema bi kêmanî kûzekûza segê wî Abulan bihata. Tawilê bala xwe da şopekê di nav berfê de ku bi alî Café Heilberg de diçe. Şopa Gusatv û Abulan bi xwe bû ku ji deriyê aliyê malê yê bi ser baxçe ve diçû. Şopa gavin hûrik û dewsa soleke çermînî ku duh di nigê Gustav de xuya dikir. Û li rex wê şopê şopa lepên segê wî jî li ser berfê xuyabû.

Martîn wê sibeha sar û spî ew şop ajotin. Wan yekser berê wî dane rêwîxaneyê. Li wir çavên wî bi Gustav ketin. Fincaneke qehwêy ferfûrî ku dû jê radibû li ber wî bû. Abulanê wî jî di bin maseyê de xwe di nigê wî dida û teriya xwe dihejand. Ku Hans çav li Martîn ket bi kêf bang kirê:

- Hooooo! Ev tu yî. De were qehweyeke xweş bidim te jî.

Û ji ser agirê vêketî amaneke çingoyî şîn û deqspî rakir û ji wê amanê avek tarî û tîr rûkire fincaneke ferfûrê spî wek ya li ber Gustav û da dest Martîn.

Gustav bi rûyekî hinekî tîrş qurtek li qehweya xwe xist, gustîlka qaşsor ya di tilîka destê xwe yê rastê de gerand û got :

- Qet kêfa min ji vê qehweyê re nehat. Nayê vexwarin. Bêhna tîrkan jê tê. Min bi xwe dema ez bi leşkerên Prens Eugen re li Zentayê bûm, bi dehan tûrên dagirtî ji danên qehweyê dîtin. Di wî şerî de me piştî gawirên osmanî şikand û bi hezaran serbazên wan ji ser pirê ketin û di çemê Tisa de werbûn û mirin. Wan barê deh qantiran tûrên qehweyê li pê xwe hiştibûn.

Û gustîlka xwe nêzîkî serê pozê xwe kir û ew pê xurand û got:

- Ku qehwe tiştêkî heja bûya Osmaniyan ew li pê xwe nedihîşt.

Martîn keniya û got:

- Wan sadriazamê xwe jî li pê xwe hishtibûn ne wisa?

Gustav keysa xwe xweş kir, gustîlka qaşsor di tilîka xwe de zîvirand, enîşka xwe da ser maseyê û bi payebûn çîroka xwe û wî şerî ku bi dehê caran gotibû, dîsa got:

- Di cenga giran a li rex rûbarê Tisa ku ez beşdarî wê bûbûm de, sadriazamê osmanî Elmas Paşa hatibû kuştin û ev gustîlk di tiliyeke wî de bû. Termê wî wisa li meydana cengê avêtibû û her kes bi talanê bilyabû. Min dema dît ku kesek li dora wî termî nîne hema min destê xwe avête gustîla wî û ew bi lez ji tiliyeke wî kişand. Hevalekî min jî gustîleke din ji xwe re bir. Ji wê rojê de ev di tiliya min de ye.

Hans qurtek li qehweya xwe xist, hinekî keniya û got:

- Tu dîn î Gustav! Te ji wî şerî tûrek qehwe anîbaya Herne wê ne çêtir ba ji vê gustîlka qaşsor?

Û bi kêfeke zêde re, qurteke din î dirêj li fincana xwe ya kefgirtî xist û devam kir:

- Ev qehwe ye Gusatv. Ancax yekî mîna Prens Eugen qedrê wê zanibe. Martîn ka hela vexwe lo! Li van Duqiye û Kontgeh û Markîzgehan hemûyan nîn e. Bi Xwedê papayê Romayê jî lezzeta wê nas bike wê vexwe. Ka vê sibê binêre min çi qehwe amade kiriye?

Û dest bi pinepinê kir û stranek di ber xwe de nehvirand. Strana ku di zarotiya wî de diya wî her ji wî re berî xewê digot:

*Bet', Kindchen, bet'*

*Morgen kommt der Schwed<sup>1</sup>.*

Martîn çû fincana xwe hilgirt û vegeriya li ser kursiyê li teniştî Gusatv rûnişt. Qurtek li qehweyê xist, mahdê xwe tîrş kir û lêvên xwe qermiçandin. Serê xwe hinekî ricifand û got:

- Tehl e. Nexweş e.

Hans nehvirandina xwe birrî û bi dengekî hinekî bilind got:

- Ev bê hingiv e. Ku tu çûyî şerqê tu yê li gelek deveran qehwê bi gelek cûreyî bibînî. Bazirganên ku ji wir vedigeriyan Amsterdamê digotin ku li wir qehwexane ji mizgeftan jî bêtir in. Dibêjin jî ku li wir qend heye qehweyê pê şêrîn dîkin.

<sup>1</sup> Razê kurê min razê. Wê swêdî sibehê bîn. Dayikên alman zarokên xwe bi wan gotinan ji leşkerên swêdiyan ditirsandin û dilorandin.

Dema ku behsa çûna şerqê hat kirin devê Gustav ji hev bû û ziq li Martîn nerî. Martîn bişirî û got:

- Ez nû ji mala te tîm. Min dixwest xebere bidim te. Erê. Tiştêkî wisa di serê min de heye. Ez dixwazim te jî bikim hevalê xwe.
- Şerqê?
- Erê
- Şerqa şerq?
- Erê.
- Ez jî?
- Erê tu jî.
- Na û sed carî na!

Hansê kal ji ber agirdankê hat û li ber Gustavê rûtiş û vecinîqî rawestiya û gotê:

- Çima tu ecêb mayî û bû nanaya te? Ma hûn dê yê pêşî bin ku berê xwe didin wî welatî! Beriya we bi sedan çûne û hatine. Erê li van welatan kes neçûye, lê ka hela here Amsterdamê û binêre bê ka xortekî ku berê xwe nedabe wê şerqê maye? Kî çûye û hatiye jî têra xwe mal û milk berev kirine.

Herduyan jî bi yek dengî bersiv dan:

- Em rastî kesekî weha nebûne.

Hans pirsî:

- We qet kitêbeke gerokên ku çûne wir nexwendîye? Herin Amsterdamê û li gemiyên ku diçin û tên temaşe bikin! Bila kesên ku ji wir vedigerin ji we re behsa wan deverên efsaneyî bikin.

Gustav hinekî hêrs bû, destê xwe li serê xwe yê nîvkeçelî xist û awirên xwe di navbera rûyê

Hans û Martîn de kirin hêlanek û tavilê got:

- ku ne di bin siya xaça pîroz de be ez berê xwe nadim tu deveran. Ez diçim şerqê lê tenê bi leşkerekî giran re ku armanca wî rizgarkirina gora Mesîh ji destê gawiran be. Eynî mîna cengên berê.

Hans kenekî qerfokî kir û di ber xwe de got:

- hela pêşî axa xwe ji pencên hev rizgar bikin, paşê berê xwe bidin gora Mesîh!

Di cama pencereyê re berfa spî xuya dikir ku her tişt nuxumandibû; serê birca dêrê, dûkêş û banên xaniyan, çimê daran û şopên ku berî kêlîkekê li derve xuya dikirin û heta xeyalên teyrikên ku li wan deran difiriyan û li danên bin berfê digeriyan jî bi berfê hatibûn nuxumandin. Wê sibehê tu kesî berê xwe nedabû Cafe Heilberg. Tenê ew herdu hevalên ku di cama pencereyê re bi gîsnên xeyalê xwe ew zewiyê spî cot dikirin li qehwexaneyê bûn.

Wê sibehê Martîn û Hans kirin û nekirin ku çûna şerqê bixin serê Gustav nikaribûn. Serê xwe yê nîvkeçel dihejand û riya xwe ya sorikî dixurand û dibû nanaya wî.

- herim nav gawiran! Ê çi bikim? Bidim pey çi!
- bide pey rastiyê.
- Rastî di kitêba me ya pîroz de ye. Rastî wek siya me nêzîkî me ye. We nexwendîye ku Mesîh dibêje: ez im rê, ez im rastî û ez im jîyan<sup>1</sup>!

Hans got:

- Ma kê ne gotîye: ez rê me û bidin pey min! Kî nabêje rastî ez im yan li ba min e! Kî nabêje roja rastiyê ji hemêza min hiltê û di hemêza min de jî diçe ava! Gustav bextewerî û rastî ne milkên taybet in. Nabe ku em wan tenê li ser navê du sê kesan qeyd bikin. Bextewerî hingiv e bi gulekê yan mêşekê tenê peyda nabe.

Gustav bi hêrs got:

- Mesîh kaniya bexteweriyê ye. Ew şana hingiv e û gul û mêş e jî.

\* \* \*

---

<sup>1</sup> Di incîla Jûhenna de ye ev gotin. Mesîh bersiva şagirtêkî xwe, ku navê wî Tûma ye, wisa dabû.

**N**eh rojan temam Gustav dida pey Martîn da ku wî ji rêya çûna şerqê sar û viz bike. Hans jî ji alî xwe de ew li çûnê dihêvot û sor û germ dikir û hey jê re behsa sihra wan welatan dikir. Di navbera herduyan de Martîn sarogermî dibû. Geh vî ew dikişande rexê xwe û geh yê din. Ji ber dudilîbûnê xew lê diherimî. Heta destê sibê payî dima. Sibehê radibû digot ez naçim, êvarê karê xwe û çûnê dikir. Tiştê ku bêtir ew li çûnê sar dikir buhayê rêwîtiya şerqê bû. Kesê ku bixwesta berê xwe bide wir divabû di rêya Amsterdamê re biçe û xwe bide rex bazirganekî mezin û bi karwanê gemiyan re be. Gelekî hizrên çûn û neçûnê di serê wî de çûn û hatin lê dawîya dawî biryara çûnê stend. Êdî şerq bûbû çiyayekî mexnatîsê û yek bi yek mîx ji gemiya dudilîbûna wî dikişandin.

Ew, di gel ku wî biryara xwe dabû jî, her di rê û mesrefa rêwîtiya şerqê de difikrî. Hansê kal bi wî dengê xwe yê ketî û şêrîn, kel û heyecana dilê wî hinekî hênîk kiribû û jê xwestibû ku ew qet netirse û li mesrefa rê jî nepirse û xema wê nexwe. Wî gotibûyê ku bila bes ew xwe bigihîne wir û wê kitêbê werîne û yê mayî li Hans. Û ji sindoqeke qehweyî ku di kulikeke dîwarê başûr yê barê de veşartibû, tûrikekî reş î çermîn ku devê wî bi benekî hevrişim girêdayî bû derxistibû û bêyî ku çavên tu kesî bi wan bikevin dabû destê wî û gotibûyê:

- Ev pêncî Taler in. Ku tu bi dûvê xwe nelîzî têra te û demeke dirêj dîkin. Kirêya rêya te jî jê derdikeve. Tu bi wan dikarî xwe bigihîni Hindistanê jî! Eger tu jêhatî bî, pê ticaretekê jî ji xwe re bike. Lê wê kitêbê ji bîr neke. Bide pey wê. Ew di kîjan qulikê de be bîne. Ka em nas bikin bextewerî çîye! Ku nas bibe bextewerî çî ye, dê ev cîhan tev ol û mezhebên li hemû cihan ji kokê de werin guhertin.

Û navnîşana bazirganekî mezin li Amsterdamê dabûyê ku hersal cuxê inglîzî li gemiyan bar dike û dişîne kenarên rojhilat ên deryaya spî.

Her tişt bi lezûbez çêbû. Êdî Martîn jî nema zanibû çawa çîrokê dest pê kir û çawa daxwaza wî û a wî kalemêrî rastî hev hat! Çima ev kalê ku nebûne çend mehên wî ji xurbetê vegeziyaye û ew bar û rêwîxane ava kiriye, wê çendê wî didehfîne ber bi kitêbekê ku nizane li ku ye! Û ewqase pereyên pirr dixê nav lepên wî! Yek caran mirov xewnekê dibîne û xweziya xwe bi pêkanîna wê xewnê tîne. Hewl dide ku kirasê rastiyê li xewna xwe bike. Ev jî wisa bû qey! Martîn gelek caran ji xwe re digot ku Hans yan xurifiye yan jî serê wî çelqiyaye! Hema wî razeke dilê xwe û xwestekeke jêre got, ma Hans çî zû xwe da ber pêkanîna wê daxwazê? Ew bi xwe çima dê berê xwe bide şerqê! Erê ew berê jî di erênayê de bû û ji gundê xwe û rewşa xwe bêzar bûbû û mirina diya wî ya ji nişkê ve jî bêzariya wî sedqatî kiribû lê wisa zû biryarê bistîne bêyî ku bifikire dê encam çî û çawa be!

Martîn êdî ji dermankirina ruhê xwe re li çareyekê digeriya. Li pencereyê ronahiyê di wê tarîtiya reşbîniya xwe de digeriya. Ji pirsên xwe yên kûr re li bersivan digeriya. Di şevreşa gumanan de destê xwe li baweriyêke rasteqîn dipeland. Û wisa texmîn kir ku dê çare li rojhilatê be.

\*\*\*

**Y**ekşema sêyem piştî serê salê, ku di hîjdehê meha çileyê de bû û çar roj ji Martîn re mabûn ku berê xwe bide şerqê, çavên Hansê kal bi wî ketin ku di ber derê dêrê re dere. Kemana xwe hilgirtiye û berê xwe dide mal. Bi ringîniya nehan a zengilê dêrê re Hans silavek di pêçeka kenekî şêrîn de dayê û ew dawetî meşekê heta seraya Strünkede, ya di nav golek av de, kir. Martîn dê pêre neçûba û di xwe re nedîtiba heta wê koşkê here ku Hans negotibayê ku, divê ew hinekî dûr bikevin çiku wî dixwest hinek razên xwe ji Martîn re berî ku here, bigotana.

Martînê ku nû ji dêrê hatibû û çav bi Hansê kal ketibû, di cih de daweta wî qebûl kir û herdu bi hev re çûn kema li Cafe Heilberg danîn û berê xwe dane koşka Strünkede ya mîna giraveke biçûk.

Hîn berf li erdê bû. Ewrin qeto qeto wek qustikên cawekî qedîfeyê spî ku li ber nigê terziyekî avêtî bin, ezman wergirtibûn û di nav re jî rojê mîna bişkokeke zêrîn, ku ew terzî lê digere, xuya dikir.

Di dirêjiya rê de çavên wan bi zarokên gund ketin ku xwe li ser berfa qeşagirtî bi kêf dişemitînin û kelexa gewr ji devê xwe derdixin û pîfî rûyên hev î sorikî û nazik dikin. Refek ji qijikan jî di nav berfê de li dan û êm digeriyan. Wan qijikan reşayîyeke ciwan li ser wê xavîka spî ya li ser erda Herne raxistî dineqêşandin. Mîna herfên helbesteke xweş di sînga peleke spî de bûn ew qijik. Hibra xêzên kitêban di xeyalê herduyan de rewan herikî. Bayekî sar pirtikên berfê ji şaxên daran diweşandin. Hansê kal û Martîn hinekî lezandin û êdî koşka avî bi dîwarê xwe yê bilind û herdu şêrên di bin taca li ser dergehê mezin de xuyabû.

Refên qijikan û hin çivîkan li derdorê hêlan dikirin. Hans serê xwe bilind kir û awirên xwe bi dû wan tilûran de firandin. Piştî bêhneke kurt serê xwe dîsa daxist û berê xwe da Martîn û bi peyvin nerm û aram gotê:

- qijik bi refan difirin, lê baz! Ew her bi tena xwe ye. Tu jî bibe baz Martîn. Bibe bazek, bibe şahînek û nemîne qijikê ku çavên wî bi dû kûrmikan de ye.

pişt re Hans gelekî axivî. Qala xwe û demên berê kir. Qala kitêban û ol û felsefe û pêximberan kir. Qala welatên dûr û nasnameyên nenas jî kir. Axaftina wî ne a kesekî ku tenê xwediyê rêwîxaneyekê be. Ew mîna filosofekî ji her baweriyê bi guman be diaxivî. Martîn lê ecêb mabû. Pêşî texmîn kir ku salên wî yên pir van axaftinan datînin ser zimanê wî. Lê tavilê tê derxist ku ew encama zanîneke pir e û di bin wî de razin veşartî hene. Li wê derê qurmên du darê qutkirî wek du kursiyan hebûn. Her yek li ser qurmekî rûnişt û bi ramandîneke kûr li koşka di nava avê de nerîn. Hans nîgekî xwe avête ser yê din û tiliyên herdu destên xwe di hev re derbas kirin û da ser kaboka xwe û bi aramî û giran giran got:

Martîn. Ev bêtirî pîncî salî ye ez di vê Ewropayê de diramim. Ew ava dîzekê ye û dikele, difûre, di ser hev re diqulibe û keldûman pê dikeve. Erê desthildariya kînîştîyê qels û lawaz bûye, lê yeke ji ya wê xerabtir serî hildaye. Desthildariya zêr e. Erê Martîn, berê dêr bû lê niha zêr e. Wê zêr bi zora xwe van welatan ji rûhaniyetê vala bike û kiriye jî. Bala xwe bidê bê çawa li şûna şerê mezezbûnê êdî şerê heban û tûrikê zêran û bidestxistina milk û mal e, şerê ferekirina axa imperatoriyan e Martîn. Ez şahidê şêst sal şer im. Min dît çawa artêşa swêdî ji jor de wek lehiyekê herikî û çê û neçê da ber xwe. Min dît çawa bi hezaran xort û ciwan çûne şerê osamniyan û venegeriyan. Bi hezaran jin bî man, bi sedhezaran zarok sêwî man. Qîzên nûhatî zorganî bûn. Dê kezebşewitî man, çira vemirî man û kesî mûma yên ku li eniyên şer mirin û termên wan venegeriyan vênexist. Min dît çawa li Hollandayê frensî dêran dişelînin û zêran didizin û mêran dikujin û bi zorê baz didin ser jinan. Bêguman hollandiyan jî li deverên dûr, ên ku firqat û keştîyên wan gihiştibûnê kuştî li pêşîya xwe raxistine. Dîn bûne dîn. Qeyser e, qiralê Fransayê ye, yê Spanyayê ye, mîr û dotmîr û prens û kontês û lord û graf û baron in. Serleşker û feldmarşal in ku her yekî bi sedan taler û floriyan didin wênesazan û pê wêneyên xwe yên rengîn dikişînin û li dîwarên koşkên xwe bidarve dikin. Li serê girên bilind koşkên mîna birc û kelexa ava dikin û ne di kevçiyên zêr û zîv de bin jî xwarinê naxwin. Bi dehhezaran jî ji ber webayan û ji nêzan dimirin. Ev e encama Reformê! Ma hêjaye heta ku tu fikra xwe bi yê din bidî qebûlkirin, tu çemên xwînê birijîn! Hêjaye ji bo ku tu rastiya bawerîya xwe şanî xelkê bikî, tu riyeke çewt î mişt xwîn û hêsir bajoyî!! Buhayê rastîyê û qebûldana wê çima kirî ewqase hovîtî be! Behane tim hazir in ku mirov werin pêşberî hevdu û bi şûr û tivingan bi nav hev bikevin û hev bigurên. Gur û dirrindeyên çolê jî wisa nakin Martîn. Çend sed hezar bêguneh hatin kuştin ji bo xatirê vê tacê û wê tacê! Vê dêrê û wê dêrê! Vî xaçî û wî xaçî, vî olî û wî olî! Vî xwedayî û wî xwedayî! Ên ku tac li serê wan in ji nermiya hevirmêşê mêzerên xwe û biriqandina gewherên li ser tacan bêhest û kor bûne êdî.

Here. Here û li rûhaniyeta wan welatan bigere. Eger RASTÎ pêtek be jî bixe kefa destê xwe û bîne. Deyne ser zimanê xwe û wê bibêje. Ji xwe divê rastî yekî bişewitîne. Ji xwe tiştek mîna rastiye yekî naşewitîne. Ji xwe rastî çêlîka êgir û neviya ronahiyê ye. Rastî ji gumanê jî peyda dibe. Guman jî makek ji makên rastiye ye Martîn. Min ji te re carekê behsa camêrekî ku ez birim şerqê kir ne? Ew camêr yekî zana bû. Zanayekî ku pêta rastiye hilgirtibû û pif dikirê da ku geş bimîne û ne xema wî bû şewata tiliyên wî. Wî ne tenê camên berçavkan sîqal dikirin. Wî çav û hiş û bîrmendiya mirovan jî sîqal dikir.

Martînê ku serê xwe ji serma re xistibû nav milên xwe û weke leglegekî xuya dikir, bédeng û bi tore guhdarî dikir. Wî nedixwest axaftina Hans bi kuxukekê be jî bibirre, lê bi gotina dawî re di çavên Martîn de vîna naskirina wî kesî biriqî. Hans jî xêzên wê vîna naskirinê di çavên wî yên ku berf di wan de xuyabû xwendin. Axaftina xwe berdewam kir û got:

Ji ber rewşa Grafetî û Duqiyeyan ya nebaş min berê xwe dabû Amsterdamê. Ya rasttir ji ber rewşa min ya nebaş li van deran. Hollanda welatekî mîna pencereyeke ku bi ser cîhanê ve vekirî be geş û ronî û tijî bû. Min jî berê xwe dayê ku di wê pencereyê re li cîhanê temaşe bikim. Berî nêzîka çel salî bû. Min xwehên xwe jî bi xwe re birin. Ew li wir bi xwesteka xwe çûn xizmeta dêrê û nexwestin bizewicin. Ez bi xwe jî ji zewacê mehrûm mam. Ez nemêr bûm. Di çardesaliya xwe de min nas kir ku ez nemêr im. Bi hevalên xwe re ez diketim suhetên nêraniyê û naskirina cîhana têkiliyên cinsî yên nêr û mêyan. Hevalên min ê xortik qala repbûnê û xweşiya hatina aveke germ û gewrikî dikirin. Lê min ji wan fêhm nedikir. Li Amsterdamê, min berê xwe dabû bi dehan etar û bazirganên ku ji çar aliyên dunyayê dihatin û min derman ji wan dikirî û bi kar dianî. Her cûre derman bi kar anî, heta bi Zencebîla ku ji Hindistanê dihat jî, lê hemî hewldan bêhavlî bûn.

Martînê ku hê jî serê wî ji serma re di nav milên wî de bû, dema ku li vê raza wî guhdarî kir, ji şerma re serê xwe bêtir xiste nav milên xwe. Di dilê xwe de got : ev çima behsa vê çîroka xwe dike? U dilê wî pê şewitî. Xwest gotineke berdildanê bibêje, lê peyvan alîkariya wî nekirin. Hema bédeng ma. Hans pê hisiya ku wê axaftina wî hinekî Martîn li hev xist. Xwest berê peyvê bide devereke din. Rabû got :

- Tu dizanî min li Amsterdamê Baruch Spinoza jî nas kir?
- Baruch Spinoza!

Martîn vê carê axaftin birrî û devê wî ji hev ma. Serê xwe yî ku ji serma û şerma xistibû nav milên xwe, kişand û çavên wî yên ku pirs jê dibariyan fereh bûn û matmayînê di rûyê wî de pêl da.

- Erê Baruch Spinoza. Ma tu wî nas dikî.
- Fîlosofêkî cihû ye.
- Na ne cihû ye. Fîlosof e erê, lê ne cihû ye. Wî ne ol û ne netewe û ne jî axa welatekî ji xwe re kiribûn nasname. Loma jî ez dibêjim ew ne cihû ye. Rastî neteweya rasteqîn e Martîn. Hiş nasnameye kurê min. Kîjan fîlosof xwe bi neteweya xwe dide nasîn! Tenê kesên bêhiş xwe bi axeke bi sînor didin nasîn. Tenê mirîşk xwe bi zibilgoyan didin nasîn. Lê baz û sîper! Nasnameya wan ezman e ezman!

Û herdu rabûn berê xwe di nav pirtikên berfa ku bédeng dihat xwarê de dane aliyê dêrê.

\*\*\*

# Seet deh

**P**iştî neh sal û neh meh û neh rojan ji derketina Martîn Setzer a ji gundê xwe yê biçûk ê sedmalî Herne<sup>1</sup>, ew dîsa lê vegeriya. Meha tişrîna pêşî roja duşemê bû. Bi gihiştina wî ya gund re deh caran ringînî ji jama dêrê hat<sup>2</sup>. Yekê mehê, seet bûbû dehê sibehê. Roj derketibû û dara şaberûyê ya li kêleka dêrê ji zû de xwe di ronahiyê de şûştibû û şaxên xwe ji tiliyên bayekî nazik re serbest berdabûn û siya xwe tev li şaberûyên xwe li erdê raxistibû. Çivîkên ku bi şev pê de li ser şaxên wê darê niviyabûn, êdî li wan kenaran di ser şitlên gulan û dehlên tûdirkan re difiriyên. Çend zarokan ji xwe re şaberûyên weşiyayî berev dikirin, bi lingên xwe pê li qalikên strîdar dikirin û şaberûyên mor ji nav dipengizandin. Zarokan hema li ciyê cî ew bi kêrikin ko û kinik diqêşartin û bi xavî, lê bi şahiyê bêsînor, dixwarin. Martîn Setzer li vî dîmenî temaşe kir û di dilê xwe de got:

- ez şaberûyê jiqalikderketî bûm heta niha.

U destê xwe li şaberûya di bêrîkeke xwe de peland, derxist û lê temaşe kir. Êdî ew sivik bûbû, fiş bûbû, nava wê pûç bûbû û ji kifîk û tozê pêve di hundurê wê de nema bû. Ew şaberû bûbû neh sal û neh meh û neh roj, ku li gel wî bû. Kêlîka derketina wî ya ji gund, Hans Heilbergê xwediyê rêwîxaneyê ew ji erdê rakiribû û dabû destê Martîn û gotibûyê:

- şaberû heta ku di qalikê xwe de be, tehma wê ya xweş nayê naskirin. Mirov jî mîna wê ye. Tu ji qalikê xwe derkeve da ku tu xwe û tehma jiyanê nas bikî û tehma te bi xwe jî were naskirin.

Martîn xwest berê xwe yekser bide goristanê û mûmekê ji wan mûmên ku bûbû nêzîkî salekê ji bazareke Helebê kirîbûn geş bike û li ser gora diya xwe û bavê xwe deyne, paşê jî berê xwe bide rêwîxaneyê û kilîta malê ku roja derketina xwe teslîmî hans kiribû, jê bistîne. Lê dengê ew rawestand. Dengê ku ew vegerande berî neh sal û neh meh û neh rojan. Wî dengê ew veegerande wê kêlîka ku wî û hevalê xwe yê korala dêrê Gustav Albus li bin wê dara şaberûyê bi xwe de di dawîya zivistaneke sar de xatir ji hev xwestin û qedera wan her yek ji wan hilavête kenarekî cîhanê.

- Martîn!

Ew Gustav Albus bi xwe bû. Wek ku ew sal di ser wî re derbas nebûbin, xuya dikir. Hîn bi wê riya xwe ya sorikî û girover û birûyên stûr û serê nîvkeçel û çavên hûrik û kortikî bû. Tenê çermê rûyê wî hinekî tarî û eniya wî sor û qemirî bûbû. Hinekî cilê wî jî hatibûn guhertin. Bi ser pantelonekî xetxetî ve, ku xetîkên wî sorê tarî û spî bûn, qutikekî keskê tarî û bişkokzêrîn berdabû. Di bin qutik de jî gumlekekî zer î ku li bersikura wî şaleke reş girêda bû.

Martîn kurtebêhnê ecêb ma û di dilê xwe de got: Gelo çawa vî Gustavî ez nas kirim!

Qiyafetê Martîn ne yê ewropîyan bû: Şerwelekî kurdî, qutikekî esfehanî, kurkekî simûran ku koçerên Qafqasyayê çêkiribûn bi ser wî şerwelê fereh de berdabû û fêseke tîrkan li serî bû. Şaleke hevrişimê spî hema bêfêsal li qirika xwe gerandibû. Hebanek li mil û çend tûrik pê re.

<sup>1</sup> Niha bajarekî li rojavayê Almanya wilayeta bakurê Rheinê (NRW) dikeve. J. Dost

<sup>2</sup> Piştî peymanê Karlofçayê bi mehekê Borislav û malbata xwe dev ji dîne ortodoksiyê berdabûn û bûbûne lûteranî. Wê gavê ji bêgavî berê xwe dabûne rojava. Ji ber ortodoksiyê direviyan. Jê dûrdiketîn. Di ser Merceristan û Utrîşê re heta Herne hatibûn û li wê demekê mabûn. Borislav navê xwe guherîbû û kiribû Karl û bi lez cihê xwe li dêrê dîtûbû û karê jamkutiyê berdewam kiribû. Malbata wî, birayê wî ê mezin û diya wî û yê mayî hewayê Herne debar nekiribûn. Rabûbûn berê xwe dabûn Amsterdamê û ji wir jî bi keştiyê mezin re berê xwe dabûn Emerîkayê. Mehekê dabûn dû Borislav lê wî bi ya wan nekiribû û ew êdî ji hev qut bûbûn.



Tenê kosetiya wî nehatibû guhertin. Ew rûyê bêmû li halê xwe weke beriyeye bêbaranmayî mabû<sup>1</sup>. Eger diya wî jî ew di wê kêlîkê û di wî halî de dîtiba dê ew nas nekiriba, lê ev Gusatv?

- Tu kengî hatî? Te çi aniye serê xwe!

Gustav bi kêf û matmayîn ji Martîn pirsî.

Martînê ku di cihê xwe de sar bûbû, heban û ew çend tûrikên pê re ji dest xwe danîn. Fêsa xwe ji serê xwe kir û firande ezmanan û bêtî ku çu bersivan bide bi rûyekî li ken ber bi Gustav Albus ve lezand. Di navbera wî û hevalê wî de gavek ma. Wî jî bi kêf, lê mîna yekî ku bawer neke bang kir:

- Hêêêêêy!

Û herdu hevalan li bin şaxên dara şaberûyê, ku şahida xatirxwestina wan a berî nêzîkî deh salan bû, hevdu hemêz kirin.

\* \* \*

Gustav Albusê ku li rex hevalê xwe ê nû ji Levantê vegeyriyayî dimeşiya, li yek nefesê diaxivî û tew jî rê nedida hevalê xwe Martîn Setzer ku devê xwe hema bi peyvekê veke. Bi dengê ku bi kêfeke zarokane re têkel got:

- Tu dizanî? Min di xewnê de dît ez û te di rojekê de li Herne vedigerin. Di rojeke wisa xweş bi xwe de. Ev çend sal in ez di vegeyriyê de difikirîm. Bi dest min nediket Martîn. Ez jî mîna te dûr bûm, dûr. Dûûûr. Kî bîra xwe û kenarên rojava yên Efrîqayê dibe! Hema bêje ez çûbûme cîhaneke din. Bi rastî jî ew cîhaneke din e. Axa wê, bayê wê, demsalên wê. Ezmanê wê. Heta bi darên wê Martîn! Mirovên wê. Ez wisa mecazî dibêjim mirov, ew bi xwe dûrî mirovan in. Nêzîktirî ajelan in. Meymûn in meymûn. Binêre li vî destê min. Ka tilîka min?

Û destê xwe yê rastê li ber rûyê Martîn vekir. Tiliya wî ya qilîçanê ji kokê de qut bûbû. Ew tiliya ku Gustav ew bi gustîlka sadriazam Elmas Paşayê osmanî tim dixemiland. Gustîlka ku di şerê mezin yê li nêzîkî bajarê Zentayê qewimîbû de ji tilîka wî sadriazamê kuştî kişandibû û xwe tim pê paye dikir. Gustîlka ku bi qaşa heqîqê sorê yemenî tim wek yadigara serkeftina xaça pîroz di tilîka wî de bû. Ew tilî û ew gustîlk hatin bîra Martîn. Behetî û bi çavên ferehbûyî li Gustavê devbikef û bi kêf nerî û got:

- Eeeeeeeh!

Gustavê ku destê xwe êdî berdabû ber xwe, bi dengê bilind got:

- Erê erê. Ew hov in hov. Mirovxur in. Nizanim wî hovî çi jehr di diranê xwe dabû ku rehên tiliyên min hişk kirin. Yekî zencî bû ewê ku tilîka min xwar. Tev gustîlkê daqurtand! Tiliyên min ên mayî jî pûç bûne. Ezê paşê hemûyî ji te re bibêjim. Ka were niha em herin rêwîxaneya Heilberg. Te bêriya bara Hansê kal nekiriye? Emê herin fincanek qehwe vexwin û paşê binêrin ka emê çi bikin. Te got çi? Nebêje tiştek. Emê herin.

Di nav wê axaftinê re ristikek di gerdana wî de li ba dibû. Ristikek ku tebayekî mor î textîn pêve li ser sînga wî rast û çep diçû û dihat. Martîn bala xwe qenc dayê lê nas nekir bê ka hela ew çi teba ye! Gustav pirsên awirên wî fêm kirin. Rabû xwe hinekî da pêşiya wî û gotê:

- Ev Totem e. Ev Totemê qebîleya ku min li nav wan kar dikir e. Totemê gelê Akan e. Tebayekî ku rastiya wî nîne. Qaşo vî ew diparastin. Hahew. Wan pûtperestên genî wisa bawer dikir. Totemê wan stûyê wan xiste togên hesinî û serê wan xwar. Hellilûya. Ev jî min ji stûyê yekî ji wan derxist. Yekî ku dixwest baz bide û xwe ji nav

---

<sup>1</sup> Û bi lez berê xwe da du kesên li dûr di taldeya dareke çinarê de rawestiyayî. Ew herdu kes xuyabûn ku ne ji wan memlektan in, qiyafeta wan ne mîna ya kesê li dora gora nûkolayî bû. Yekî ji wan kurkekî simûran wergirtibû xwe û bi rûyê xwe yê kose li ezmanê ewravî dinêrî. Ji romana Mîrname. Jan Dost

lepên min bifilitîne. Min ew girtibû û berî ku ez wî dax bikim û bi şîşeke sincirî mora şirketê li qûna wî bixim û bavêjim gemiyê, min ev textikê mor ji stûyê wî yê qilêrî kişand. Hellilûya! Li wir kole gelekî erzan in Martîn. Ku pir buha dibin pênc dibin bi sed albusî<sup>1</sup>. Yanî buhayê pênc koleyan naghê talerekî jî. Ez jî dikim şirketeke taybet bi navê xwe damezrênim. Ne şirketê şirket û bi keştî û sedê karmendan. Na, lê weke şirketeke simsariyê. Ooo Martîn bibûre. Ma tu çi zanî ez qala çi dikim! Bêhna fire ezê çîroka neh salan ji te re li bara Hans bibêjim. Emê îşev li wir binivin. Tu çi dibêjî? Ez berî te gihome vir. Duh bi rojava re li vir bûm. Ji te bêtir zanim çi li gund heye çi tune. Hellilûya.

Martîn behetî bû. Rûyê wî diqermiçî. Lêvên wî dilerizîn û nefesa wî qut dibû, lê xwe radigirt. Nikarîbû biaxeve û ji wê birçîbûna Gusatv î ji axaftinê re û wan agahiyên sosret ecêb mabû. Gustav rê nedidayê heta ku bifikire jî. Ew bêgav mabû ku gavên xwe mîna gavên wî bike û di bin wî barê li milê xwe de gavan ferehtir bike. Gustav germ bûbû û êdî dixwest çîroka xwe hemûyî bi yek carê re ji hevalê xwe re vebêje. Berî ku nêzîkî rêwîxaneyê bibin Gustav çavên xwe yên hûrik û kortikî çend caran kutkutandin û hat li pêşiya Martîn, wek ku rê lê bigre, rawestiya. Riya xwe ya sorikî xurand û got:

- ez dizanim çîrokên te jî ne kêmi yên min pirr û seyr in. Yek du mehan li welatekî dûr bimîne bi dehan serpêhatî rastî wî tên. Îca ev neh sal û neh meh û neh roj in! Te dît çawa min hesibandine! Mirov ku dibe bazirgan yan jî dikeve civaka wan, hemî cîhana wî dibe reqem. Ji xwe rastiya hebûnê jî ev e: hebûn reqem in! Stêrik, mirov, dar û çiya, biçûk û mezinên tiştan reqem in. Kole jî reqem bîn. Hellilûya. Çîrokên şerqê jî wek xeyalan in ne! Tu yê wan vebêjî. Dema me heye. Îşev neqediyan şeveke din. Ma çi li pêşiya me heye Martîn! Em nikarin jiyana neh sal û neh mehan di şevê de bibêjin, lê ma di neh rojan de jî nayê gotin! Ê min bi xwe ez dixwazim îşev her tiştî bibêjim. Tu niha ecêb dimînî ne! Ez berê ne wisa bûm, kesekî di halê xwe de û zêde nedixwazim. Lê piştî ku min ew dunya dît zimanê min vebû. Deh ziman ketin devê min Martîn. Destê min î rastê pûç bûye. Bibûre minê bigota tiliyên destê min î rastê. Geza wî kerî tiliyên min şeht kirin. Diranê wî mîna yên maran jehrdar bûn. Ez nema dikarim binivîsim. Lê zimanê di devê min de dikare ji keşeyekî bêtir biaxeve. Ji roja ku min berê xwe da gemiyê û ez bûme karmendekî Brandenburgisch-afrikanisch-americanische Compagnie û heta vê gava ku min tê de tu dîtî wek efsaneyên cinan ku pîrikên me bi şev ji me re digotin di bîra min de ye û dixwazim bi yek derbê re hemûyî bibêjim. Vaye çend gav man em digihên deriyê rêwîxaneyê. Wî! Tew min ji bîr kir ji te re bibêjim ku Hans miriye. Duh êvarî bi gihiştina gund re min bihîst. Mirovekî ecêb bû ne! Bi salixan mirina wî jî ecêb bû. Hans pirr tevlihev bû. Tim kufrî dikirin. Tê bîra te ne? Ji çu kesî nerazî bû. Gotinên kitêbên hertûqiyên û fîlosofên jidînderketî tim di devê wî de bûn. Yek gotin jî ji kitêba pîroz nedianî ser zimanê xwe. Ewî çûna şerqê bi te şêrîn kiribû ne! Ez ne şaş bim em gihan. Erê. Min dizanibû ku berê me lê ye. Waaa. Vaye li ser derê rêwîxaneyê navekî nû nivîsandine, binêre: Gasthof Zur Kurve<sup>2</sup>! Xuyaye navê berê jî ku Cafe Heilberg bû bi xwediyê xwe re çûye.

\* \* \*

<sup>1</sup> Albus: cûre diravekî kevn bûn li Almanya. Di destpêka sedsala 18an de her Talerek sed Albus bû.

<sup>2</sup> Rêwîxaneya Koşeyê.

Gustavê ku nû ji Efrîqayê vegeyriyabû bala xwe wê sibeha xweş nema dida ne bêdengiya Martîn û ne jî pîrbêjiya xwe. Wek ba û baranê dipeyivî û kef ji kêfa vegeyriyê bi devê wî diket. Rê nedida wî ku ew jî hema gotinekê bibêje. Ma ku rê bidayê jî qey wê Martîn karîba tiştek bigota? Gustav dixwest hemû serpêhatiyên xwe li yek nefesê bibêje. Loma jî berê Martîn dabû rêwîxaneyê û ew dawetî fincanek qehwe kiribû.

Martînê ku mîna gêjan lê hatibû tûrê defterên ku serpêhtiyên xwe tê de nivîsîbûn li ber nigê xwe danî lê ew kitêba ku di germiya paxila wî de mîna mêkewekê lûsiyabû, dernexist. Ditirsiya ku ew kitêb bala Gustav bikişîne û êdî rabe pirsan bi ser wî de bibarîne. Ew jî nikare bersivê bide. Wî berî kêlîkekê bihîstibû ku Hans miriye. Gelekî li ber ket lê nikaribû derbibire. Dixwest wê kitêbê bi eşq û kêf bixe hemêza Hans bi xwe. Dixwest kitêba bexteweriyê bide wî kesê ku berê wî da wê dera dût. Wî dixwest wan sê defterên dirêj ên ku jiyana xwe rijandibû ser pelên wan, bide destê wî û sihra şerqê ya rasteqîn şanî wî bike. Lê ew êdî miribû. Li gor gotina Gustav ku ji şênîyên Herne şeva çûyî bihîstibû, Hans di şevê de tazî derketibû ser rêyan û reqisîbû, bi her awayî reqisî bû ku êdî xelk lê kom bûbûn û xwestibûn hema qerpalekî bavêjin ser wî. Lê wî xwe nedabû dest çu kesî. Ew wisa reqisîbû bêyî ku tiştekî bibêje heta ketibû û miribû. Şeytan ketibûyê! Wisa şênîyan û keşeyê gund jî digotin.

Bara rêwîxaneyê bêdeng bû. Jineke pîr<sup>1</sup> li ber agirdankeke û refîkek tijî şûşeyên vexwarinê rûniştibû û pisîkekî belek û pîrçdirêj di hemêza xwe de mis dida. Jixwe ku herdu heval derbas bûn, pîrê guh jî nedabû wan û dev ji pisîkê di hemêza xwe de bernedabû. Ku Gustav jê re got em dixwazin qehweyekê vexwin, destekî xwe di nav pûrta pisîk de hişt û yê din dirêjî derekê kir. Gustav bi xwe çû amana kelandina qehweyê ya çingoyê şîn û bi xalên spî deqandî amade kir û anî li ber xwe û hevalê xwe danî. Ew aman hîn ewa berî neh salan bû. Pîrê guh neda hatina wan û rabû pisîkê ku xilmaş bûbû bi hêdîka li ser refîkekê li jora agirdankê danî û dîsa rûnişt û gulokek rîs xiste destê xwe. Pîjên xwe rakirin û goreyên ku nivco mabûn ristîn. Li koşeyekî barê jî xortîkekî ku nû ji Mühlhausenê hatibû bi ahengeke hêdî kemanek dijenî. Deftereke notên mûzîkê li ber bû carê diquliband û kevanê xwe li jîh û têlikan dida. Di nav re radiwestiya û kevirê kolofanê di têlikan dida û dîsa kevanê xwe bi çavên girtî di ser wan re dibir û dianî. Yekî rîspî jî li nêzikî şibakeyê rûniştibû û kitêbek dixwend<sup>2</sup>. Li himberî wî, resamekî ku şaleke dirêj û sor di stûyê xwe de kiribû girêkek mezin û guhikên wê bi ser sînga xwe de heta nav ranên xwe berdabûn û li kalê ku kitêb dixwend dinerî. Carê firçeya xwe di rengdankê da dikir û li ser cawê spî dibir û dianî. Kesî bala kesî nedikişand û aramiya barê lihev nedixist. Tenê carekê xortîkekî ku qutîkekî spî lê bû ji jor daket û qedehên vala û tebsî ji ber mêvanan rakirin û bêdeng çû kete xaniyekî li rex bixêrîkê. Ew li hêviya kesên ku di barê de rûniştî bûn ku tiştekî jê bixwazin. Keçîkek bervank kesk û kum spî jî li wan deran diçû û dihat û bêdeng xizmet dikir.

<sup>1</sup> Ew jina pîr xweha Hans a biçûk Hedwig bû, ewa ku serbazên ispanî ew û herdu xwehên wê ên jê mestir zorganî (tecawuz) kiribûn. Piştî mirina Hans, Hedwig derê dêrê li dû xwe dadabû û dabû dû kesê ku xebera mirina birayê wê jêre guhestibû û pêre ji Amsterdamê vegeyriyabû li cihê birayê xwe Hans rûniştibû.

<sup>2</sup> Eger yekî kursiyê xwe nêzikî wî kalî kiriba, wê kitêba di destê wî de naskiriba. Wê karîba bi rihefî li ser bergê wê ev navnîşana ku bi hîbra sor û reş hatibû çapkirin, bixwenda: *Der abenteuerliche Simplicissimus Teutsch*. Romanekê ku berî çend salan li Nürnbergê hatibû çapkirin û behsa şerê sî salan yê li Ewropayê dikir, bû. Nivîskarê wê Hans Jakob Christoph von Grimmelshausen e ku bi navê xwe yê hunerî German Schleifheim tê naskirin û ew roman jî di bin wî navî de belav bûye. Sala çapê bi reqemên romanî ye: MDCLXIX ku beranber sala 1669 an e. Wêneyê afrîdeyekî nenas û efsaneyî li ser bergê wê bû; mirovekî bi bask! Teriya masiyekî, du guh û quloçên mîna ên şeytan, lingekî wî simê gayekî ye û lingek jî yê qazê ye, şûrek bi stûyê xwe ve hilawêstîye, û heft mask temam di binaniya herdu lingên wî de ne! Kitêbek vekirî di destê wî de ye çend wêneyên xerîb li ser in. Kalê xwendevan geh dikeniya û geh rûyê wî tehl dibû. Lê wa xuya bû ku ji romanê razî ye û loma jî hayê wî ji tu kesî nebû. Heta ku dema garsonê xilmaş î qutik spî ji jor daketibû û dest bi civandina tebsîyan û qedeh û fincanên vala kiribû û li ber wî rawestiyabû û jê pirsî bû: ma tê tiştekî din vexwî? Kalo nebihîstibû. Hema ji xwe re hêsirên xwe yên ku ji kenan herikîbûn, paqij kiribû û bi tiliya xwe ya mezin ya ku bi serê zimanê xwe şil kiribû, pelek din qulibandibû.

Awirên Martîn di navbera şînahiya amana qehweyê û şînahiya çavên Gustav de mîna pendola seetekê çûn û hatin. Gustav ji wateya wan awiran fêhm nekir. Fincana xwe ber bi devê xwe de bilind kir, firrek lê xist û bi dû de bi ken got:

- ku yek dûrî welatê xwe dikeve bêriya her tiştê welatê xwe dike. Ne wisa!
- A!

Bi derxistina wê A yê re devê Martîn ji hev ma û wî jî fincana xwe ya dû biserketî bilind kir û gulpek li qehweya nîvşêrîn xist.

Gustavê ku berî bêhnekê gotin ji devê wî mîna wan dane û berên şaberûyan ku li derve li ber bayê wê payîza sar diwerin, diweriyan, weke ku nema di xwe re bibîne bi axive yan jî bêdengiya hevalê wî ew li axaftinê sar kiribe hinekî bêdeng ma. Lê tavilê dîsa germ bû û dest pê kir.

- Tu zanî! Di van neh sal û neh mehan de hindik mabû ez navê xwe jî ji bîr bikim. Wey! Ew çi welat bû Martîn! Roj bi qasî bejna rimekê di ser serê te re ye. Destê xwe bilind bike wê li sêla rojê ya sincirî biqelibe û tilîkên te bişewitin. Hellilûya. Rojeke bi tûn ku tu dibêjî qey floriyekî zêr e bi ezmanê şîn ve zeliqiye. Û ji xwe ew marên mezin! Bawer bike marek dikare fîlekî daqurtîne. Te fîl hîn nedîtine ne? Ecêb in ecêb.

Gustav bi qasî du sê saniyeyan bêdeng ma, çavên xwe hûrik kirin û li valahiyekê nihêrî mîna ku bûyereke jibîrbûyî bîne bîra xwe. Destê xwe dirêjî berîkeke qutikê xwe kir û got :

- Di destpêka çûna min de, piştî ku çend rojekî ez li koloniya Großfriedrichsburgê mabûm, berê min dabûn rojhilat û ez li herêmeke ku fîl lê pirr bûn û bi benderan diranên fîlan li wir davêtin gemiyan û ber bi kenarên Ispanya, Portugal, Firensa, Surînam û Hollandayê ve dibirin, bi cih bûbûm. Li wê herêmê serkarê min yê ku tim şebqeyeke spî li serî û şiveke darîn î dirêj di destan de bû, ez deh mehan di nêçîra fîlan de xebitandibûm. Min û hevalên xwe me bi roj kortikin mezin dikolan û bi şaxên daran û pelgên wan ew kortik sergirtî dikirin û dinixumandin. Ku roj diçû ava û tarî diket erdê garanên fîlên kovî dihatin. Fîlê ku biketa kortê êdî nema dikarîbû jê derketa. Min û hevalên xwe em sibeha din dihatin û bi rihetî me ew fîlê zindanî bi rim û tûran dikuşt û herdu diranên wî hildikişandin û didane serkarê xwe. Yek caran me fîl nedikuşt lê me bi birrekekê herdu diranên wî dibirrîn û fîlê dîl di wê kortika ku dibû gora wî de dihişt û em diçûn. Yan jî me hêdî hêdî ew fîl kedî dikir û ji bo hilgirtina baran bi kar dianî. Min bi kuştina fîlan jiyana xwe ya Efrîqayê dest pê kir, lê paşê jiyanêke din bi min dane destpêkirin.

Û Gustav ji berîka qutikê xwe yê çuxê inglîzî qelûneke spî derxist û dirêjî ber destên Martîn kir û bi kêf gotê :

- ev qelûn ji diranê fîlan e. Binêre çi şayik û spehî ye. Ancax li ba Grafekî peyda bibe.

Martîn bêdilî xwe destê xwe dirêjî qelûnê kir. Ew venerî, wergerand, rakir û danî, nefeseke kûr kişand û dîsa dirêjî Gustavê ku keçela serê xwe dixurand kir.

Gustavê ku tiştek ji wê nefesa kûrkişandî fêhm nekir qelûna xwe rakir û tijî tûtin kir û li ber fincana xwe ya qehwê danî û got:

- Tu zanî Martîn! Ku ez bibêjim min bi destê xwe sed fîl kuştine bawer bike. Sed fîl yanî du sed diranên spî û buha. Komek pere ji dû wan diranan kete berîka min.
- Ohoooooooo!!

Martîn dîsa deng bi xwe xist û nîşana ecêbmayînê da. Nedixwest raza zimanê xwe zû bi zû rabe hevalê xwe bike. Gustavê ku nedixwest axaftina wî were birrîn rabû ji agirdankê bi maşeyê pêtek agir danî ser qelûnê û tûtina xwe pê vexist û got:

- Erê le! Ne min got ew cîhaneke din e. Tew naşibihe van welatan. Ne bi hewayê xwe ne jî bi mexlûqatên xwe. Tu niha di dilê xwe de dipirsî: ma ka çi berê te da wir? Heqê te heye. Ez bi xwe dizanim çi berê te da şerqê. Kitêbek û xewnên Hansê kal û rewrewka bexteweriyê û rastiya sexte. Ê min ez çûm û min rastî bi çavê xwe dît. Rastiya bêrûpoş û mîna keçeke efrîqî şilfî tazî. Rastiya reş. Min rastî bîn kir û tahm jî kir. Min destê xwe da çermê wê yê zivîr jî. Ê min ez çûm min çîrok bi xwe anîn. Ez bi

xwe ketim nav çîrokan. Ji her çîrokeke min kitêbek hezar pelî tê nivîsandin. Lê çi heyv û mixabin tiliyên min pûç bûne. Ezê gelek çîrokan ji te re bibêjim tu jî bide ber wan çîrokên kitêbên ku ez nizanim ka te anîne yan na. Tu jî bi insaf be û ya rast bibêje ka çîrokên min xweş in yan yên wan kitêban. Ma te kitêb anîn? Te anîbin jî bêkêr in. Wa ye te nas kir ku Hansê reben, yê ku ew kitêb xwestibûn û li bendê bû, mir. Te hema mehekê xwe ragirta û bimayî tu yê jî bi min re tev li karmendên Brandenburgisch-afrikanisch-americanische Compagnie bûbayî. Te yê bi sedan Taler û Duqat qezenc bikirana. Tê bîra te? Min ji te re gotibû ne? Ew sala ku ez têde serbaz bûm û di bin siya ala prens Eugen de heta Meceristanê çûbûm, tenê heşt Taler bi dest min ketibûn! Li Efrîqayê her ku koleyekî em digrin bîst albusan distînin. Yanî nêzîka deh koleyan bi talerekî! Karekî hesan!

Gustav nema dixwest raweste. Martîn jî di xwe re nedidît bêtir guhdarî bike. Roj hinekî bitîntir bûbû. Pelên ku payîzê ew sor û mor û zer û binefşî kiribûn, giran giran ji daran diweşîyan erd dinixumandin. Bindeq û berû û şaberûyên ku li erdê diketin zarok şa dikirin. Wan kefên xwe yên biçûk ji wan beran dadigirtin û diqêşartin û hema bi xavî dixwarin. Piştî bêdengiyeke kurt, ku Martîn dixwest heta hetayê dirêj bike, rûyê Gusatv geş bû û got:

- Me çend dêr jî li wir ava kirin û me bi hezaran jî ji wan meymûnên reş anîne ser riya rast.

\* \* \*

**P**îra ku pisîk li ser keviyekî agirdanka germ danîbû û hatibû li ser kursiyekî qehweyî rûniştibû û guloka rîs dubare rakiribû û dest bi ristina goreyên nîvcomayî kiribû, di nav re rîs ji destê xwe datanî û xalxalokên ku li ser wê guloka rîs bûn bi dilovanî derdixistin û li ser kefa destê xwe datanîn. Wan xalxalokan jî, ku bi germiya mista destê pîrê dihisiyan, baskên xwe yên tenik û nazik û zelal ji bin wan qalikên sorikî û deqdeqî û mîna qaşên heqîq ên qubikî yên gulîskan derdixistin û berê xwe didane derve û di ronahiya roja wê sibeha payîzê de difiriyan<sup>1</sup>. Çend rêwiyên ku nû ji xew rabûbûn, hatin li ser maseyan rûniştin. Xuyabû ku wan cihê her tiştî nas dikir û ne cara yekê bû dihatin wir û şevder diman. Her yekî taştêya xwe anî û li ber xwe danî bêyî ku guh bide Martîn û Gustav. Tenê hinekan ji wan ziq li Martîn û qiyafetê wî yê seyr seyrkirin, li wî tûrê wî yê mezin ku li ber nigê xwe sipartibû nigê kursiyê nerîn û dîsa serê xwe bi ser taştêya xwe de xwar kirin.

Gustav sê kirtikên spî berîkeke xwe derxistin, berdane fincana xwe ya qehwê<sup>2</sup>, bi kevçiyekî doxik text tevda û got:

- gelek hevalên min qehweyê tehl vedixun, ez nikarim. Ne şêrîn be venaxum. Ev jî ....!

Tehma devê xwe xweş kir, mirçemirç jê anî û dewam kir:

- ev jî şekir e. Li Surînamê hatiye amade kirin.

Û devê xwe nêzîkî guhê Martîn kir û got:

- şekir ne bi dest her kesî dikeve. Ev cûre şêranî luksus e. Ya mîr û qiralan e Martîn. Ev e zêrê spî. Kê jê tam kiriye tamijiye. Tê jî keriyekî bikeritîn?

Martîn serê xwe hejand. Hejandineke ku hevalê wî jê fêm nekir ka gelo dibêje erê yan na. Paşê Martîn baweskiya heta ku diranên wî yên paşî yên ku reş bûbûn xuya kirin. Bi baweskandina wî re Gustav bala xwe da çavên wî yên ku ji bêxewiyê sor bûbûn. Qehweya li ber wî ku bi nêvî bûbû tijî kir, kirtikek şekir avêt nav û gotê:

- Qehwê vexwe. Va min ew şêrîn jî kir. Bi lez vexwe û binêre çawa ew ê xewê ji çavên te bifirîne. Tu gelekî westiyayî û ne li ser hev xuya dikî!

Martîn devê xwe vekir lê vê carê jî ji bo ku bibawişke. Baweskiya, devê wî qederekî ji hev ma û êdî Gustav di dawiya devê wî de zimanê wî yê biçûk jî dît. Dilê wî hinekî pê şewitî. Rabû gotê:

- Emê îşev li vê rêwîxaneyê şevbuhêrka xwe bikin. Emê sebra hevdû bînin. Paşê emê herin malên xwe. Eger em dereng man jî em dikarin li vir binivin. De ka here kilîta odeyekê bîne hîn ku pîrê şiyar e. Wisa tu ê tu tehmê ji çîrokên min nebînî. Ezê jî bi xwe tu xweşiyê ji vegotina wan nebînim. Tu bêxew mayî û westiyayî. Divê tu hinekî xwe vehesînî.

Xewa Martîn pîr dihat û êdî guhê wî ne li ser pîrbêjiya Gustavê hevalê wî bû. Erê sibe bû lê wî bi şev pê de tu xew nekiribû. Û bi sehera pêr re jî ji rêwîxaneyê ku li Amsterdamê şevêkê

<sup>1</sup> Ew xalxalok bûbûn hevalên Hedwiga pîr yên herî nêzîk. Dêdê xwe ji wan re digot û sebra wê bi wan dihat. Lê ew ji wê re ne wek ku xelk dibêjin sembola bexteweriyê bûn. Ew nîşana rojên tarî û serpêhatiyên tehl bûn û bûyerên diltezîn dianîn bîra wê. Dema ku herdu xwehên wê, Herta û Hermine, di dêrê de yek li pey a din bi janeke nenas ku zikê wan ji ber diwerimî mirin, xalxalok li ser eniyên herduyan bûn ! Wê nexwest xebera mirina wan ji birayê xwe Hans re biguheze, lê rahibê mezin name jêre şandibû û xeber dabûyê. Di dêrê de, rahibek li dora Hedwig digeriya, çavên xwe berdabûn ciwaniya wê û goştê wê yê ter û spî. Êvarekê, hatibû û dîtibû ku ew bi tenê ye, hevalên wê derketibûn nimêja êvarê. Rahib ew kişandibû hemêza xwe, yekser bin guhê wê dabû ber gezin sivik û bi zimanê xwe qirika wê ya mermerîn alastibû. Hedwig sist bûbû, ji ser xwe çûbû û êdî wî rahibî benikên bersînga wê veresandibûn û ketibû ser zikê wê. Dema ku ji ser zikê wê rabûbû, wê benikên bersînga xwe şidandibûn û rabûbû di pencereyê ziravik re li derve nihêrî bû û du xalxalok di ser hev de di ronahiya fanosên qeyikên ku kevîkên pencereyê ronî dikirin, dîtibûn. Her cara ku ew rahib dihat û benikên bersînga wê vedikirin û dikete nav herdu şeqên wê, wê jî ew herdu xalxalok li keviya wê pencereyê didîtin û ecêb dima.

<sup>2</sup> Kandîd li wir çav bi zencîyekî ku dest û ling qutkirî bûn ket, jê pirsî ev çi bi te hatiye, kê wisa kiriye? Wî zencîyê reş bi keser got: *Ev serkarê min birêz Vanderdendur wisa kiriye. Em di şekirxaneyan de dixebitin, ku yek ji me şaş bibe û tilîyeke wî bikeve ber diranê makîneyekê û birîn bibe, serkar destê wî qut dîkin. Dema em dixwazin ji ber wan birevin jî, lingên me qut dîkin. C'est à ce prix que vous mangez du sucre en Europe* (Ev e buhayê wî şekirê ku hûn li Ewropayê dixun). Ji romana Candide, ou l'optimisme. Voltaire.

lê nivistibû derketibû û li erebeyeke servekirî ku du bergîlan ew dikişand siwar hatibû. Rêya ku di keviyên çemê Rheinê re diçû di gelek cihên xwe de nebaş bû û kelûkortî bû, loma jî nivistin û nivîsandin nema ji bi dest Martîn diketin. Di dirêjiya rê de ew dihejiya. Wî yek deqeyê jî nikarîbû çavên xwe bidana ser hev. Ji kêfa veqerê re jî êdî xewa wî nedihat û hewl dida ku di tariya seherê de bala xwe bide gundan û çeman û daran û dêran û heta stêran. Stêrên welatê xwe ji zû de nedîtibûn. Yê li şerqê ne ew stêrik bi xwe bûn. Dixwest şiyar bimîne lê êdî di wê rûniştina bi Gustav re de û li ber wê barana axaftinê xewa wî zêdetir hat. Wî bawer nekir ku Gustav jêre got xewa te tê here miftê bîne. Hema yekser rabû çû cem pîrê û bi liveke destê xwe hawê kilît kirin yan vekirî deriyan kir. Pîrê jê fêhm kir û mifteyek dayê. Wî bi lez berê xwe da qatê jor ku çend ode li rex hev di du rêzan de bû. Bêyî ku serê xwe biêşîne, mifte xiste qufla deriyê yekem û bada. Derî venebû. Çû yê duyem. Ew jî venebû. Deriyê sêyem vebû. Ew odeya wî bû. Dîwarên wê rût û tazî bûn, tenê li jora serê wî kemande daliqandî hebû. Wa diyar bû ku hinekan ew li pey xwe ji bîr kiriye yan jî tew dibe ku Hans dîwar wisa pê xemilandibe. Ji alî hundir de derî kilît kir, solên xwe ji piyên xwe kirin û hema bêyî ku cilên xwe jî deyne xwe avête ser textekî li binê pencereyekê. Kitêba ku bi xwe re ji şerqê anîbû, ji paşla xwe derxist û li bin balîfa bin serê xwe danî û serê xwe danî. Tawilê hate bîra wî ku tûrikên xwe li jêr hiştine lê di xwe re nedît dakeve. Du saniye neçûn kete xeweke giran.

\*\*\*

**S**eбра Gustavê rîsor bi tenê nema hat. Dixwest çîrokên xwe temam bike. Çavê xwe gerandin û bala xwe da rêwiyekî esmer î por reş î ku bi tenê li ser maseyekê rûniştiye û qelûna xwe dikişîne û dû bi ser xwe xistiye. Wî texmîn kir ku ew yekî îtalî ye. Hema fincana xwe rakir û çû cem wî û gotê.

- Posso sedermi<sup>1</sup>?
- Wî! Çima na! Fermo rûne.

Û di cî de xwe bi hev dane naskirin:

- Ez Gustav im. Gustav Albus. Ji vî gundî me.
- Navê min jî Fernando ye, Fernando de la Mara. Ez ispanî me.

Fernando ne kêmi Gustav birçiyê axaftinê bû. Di çavên wî yên reş de ronahiya li derve di gel bijandina axaftinê diçirisan. Rûyê wî yê esmer di nav dûyê qelûnê de winda dibû. Qelûna di devê xwe de wisa hişt û qelûnek ku serê wê serê kalekî rîspî û bi şaşik bû ji berîka xwe derxist, tijî tûtîn kir û pêşkêşî Gustav kir û gotê:

- Biçêje. Binêre çî tûtineke baş e.
- Ooooooooo! Spas .

Bi vexistina tûtînê û kişandina hilma yekem re, Gustav serê xwe hejand û got:

- Ji Kûbayê ye ev tûtîn. Nebêje na!
- Rast e. Xuyaye tu qelûnkêşekî pêzan î! Ma te qelûn jî nas kir bê ji ku hatiye?
- Himm! Na. Min yê wisa ciwan û lihevhatî nedîtine.
- Ji Eskîşehir a welatê osmaniyan e. Min ji neviyê serbazekî kirriye. Serbazekî ku di şerekî behrê de ew ji berîka qebûdanekî osmaniyan derxistibû.
- Helliluya!! Perbonus meus amicus!<sup>2</sup>

Fernando qelûna ji devê xwe derxist û li ber xwe danî û dest pê kir xwe bi Gustav da nasîn: Ez Fernando De La Mara me ji Ispanyayê ji bajarê deryayî Bilbao. Tacirekî tûtînê me ez. Hîn ez li Bilbao bûm min ticareta tûtînê dikir. Tûtina ku ji Kûbayê dihat, hema li benderê dihat belavkirin û firotin. Min jî têra ticareta xwe ew dikirî û li Frensa, Belcîka, Hollanda û heta bi mîrnuşîn û Kontgeh û qiralîteyên ku li derdora çemê Rhein bûn, tûtîn bar dikir, digerland û difirot. Min xwe gihandiye gelek mîran, serleşker û mûzîsyen û ressamên û tîkiliyek baş bi wan re danîye. Ticareta min gelekî berfireh bûbû lê şerê ku lidarket ticareta min hinekî lawaz kir û hişt ku ez dûrî warê xwe, bajarê Bilbao bikevim. Êdî li bendera Amsterdamê min malek kirê kir. Di wê malê de her guhê min li ser gemiyên ku ji Kûbayê dihatin bû. Min li wir tûtîn dikirî û li bajarên nêzîk digerland. Hevalekî min ê ji Westfalyayê ji min re qala xwediyê seraya Strünkede ya li vî gundî Herne kiribû ku ew gelekî ji tûtînê hez dike, qala qelûna wî ya sêbostan dirêj û şevbuhêrkên wî ên qelûnkêşiyê jî kiribû. Ez jî bi armanca ku pereyekî baş qezenc bikim min barek tûtîn bi xwe re aniye.

Guhê gustav ne zêde li ser çîroka Fernando bû, lê da ku jêre bide xuyakirin ku ew guhdarekî baş e hema pirsî bû:

- Ma tu bêriya welatê xwe nakî ?

Bi dû bêdengiyê kurt de Fernando dûyekî dirêj bi dû xwe xist û bi xemgînî got :

- Welat ! Welatê min ew e cihê ku ez karibim bi serbestî tûtina xwe lê bifiroşim.

Ew di wê axaftinê de bûn gava ku çavên Gustav di nav perdedûyekî tîr re bi mirovekî ketin ku hat ew tûrikên li ber masê rakirin û çû jor. Wî qenc bala xwe nedayê bê kiye, lê texmîn kir ku

<sup>1</sup> Bi îtalî ye : ez dikarim rûnim ?

<sup>2</sup> O pir baş e hevalo! Bi zimanê latînî ye.



Martîn daketiye da ku tûrikên xwe yên defteran bibe jor. Guh lê nekir û bi kişandina qelûnê biliya.

Fernando xwesteka xwe yekser ji Gusatv re got. Ew hatibû wî gundî ku here mezinê wê koşka avî Johann Konrad ê ciwan bibîne û tûtînê bifiroşê. Navê wê koşkê li derdorê deng da bû û xwediyê wê jî bi qelûnkêşiyê navdar bû. Digotin ew şevbuhêrkên qelûnkêşiyê li dar dixîne û kesên qata herî jor di civaka wê herêmê de beşdarî şevbuhêrkên wî dibin. Ji Dortmund û Recklinghenê, ji Bochum û Essenê giregir dihatin û li wê koşka avî dibûne mêvan û şevên dûgirtî dibûrandin. Fernandoyê ispanî jî xwestibû ji tûtina xwe re bazarekê li ba mîrê wê koşklê bibîne û bi wê mebestê berî dabû wan deveran. Lê Gustavê ku çîrokên xwe temam nekiribûn guh neda wê xwesteka Fernandoyê ispanî û dest pê kir.

- Gemiya me berî heftiyekê giha lîmana Emdenê. Ez jî duh gihome vir. Nizanim ka çawa dê alîkariya te bikim. Ji zûde ye min gundê xwe terikandibû. Ez li Ganayê bûm. Ez karmendekî Brandenburgisch-afrikanisch-amerikanische Compagnie me. Tu Ganayê nas dikî ? Li rojavayê Efrîqayê ye. Dûr e.

Dema ku Gustav dît Fernando deng nake e û bi baldarî serê xwe dihejîne, keysa xwe li axaftinê xweş kir û çîroka xwe ji serî de vegot:

\*\*\*

**F**ernando! Xortê delal. Ispaniyê qenc. Li çîroka min guhdarî bike. Ezê heta dema navrojê biqedînim. Emê paşê herin seraya Strünkede ya di nav avê de. Xeman nexwe. Mezinê wê dê tûtina te hemûyî bikirre. Lê niha ka guhê xwe bide min û vê çîroka min. Ez îroj ku wê nebêjim dê biteqim. Min ew sed carî bi rê de, li ber bayê sar û peşkên ava şor di gemiyê de, xwestiye ji rêwîyan re bibêjim. Kesî heta dawî guhdarîya min nekiriye. Di nîvê çîrokê de radibûn û diçûn li pêlên deryayê û hûtên mezin dinerîn. Diçûn di enbara gemiyê de dikutane reşikan, yan jî pereyên hev didizîn, mey vedixwarin û bi qumarê dilîstin lê li çîroka min guhdarî nedikirin. Ma ne dîn in lo! Hevalekî min î zarotî û xortaniyê hebû berî kêlîkekê çû kete xew. Wî jî xewa xwe ji bihîstina çîroka min pêwisttir dît. De bila here û xewnan bibîne. Netirse, ez dirêj nakim. Hema bi kurtî be jî dê çîroka xwe ji te re bibêjim. Ku tiliyên min ne pûç bana minê kitêbek li ser jiyana xwe y anehsalan li wan welatan bikira. Wek ku min got, heta dema navrojê diqedînim. Ku neqediya jî êvarî temam dikim. Saet nabe heft, wê çîroka min hemû qediyayî be. Ew neh sal in lê ezê xwe di ser salan re biqevêzim. Ezê gelek tiştên ne giring nebêjim. Ez qala rengê cilan û meyweyan û dar û beran û cûreyên ajelan nakim. Ê ez jimara gemiyên ku min kole lê barkirine jî nabêjim. Hema kurt kurt vedibêjim.

Ezê ji roja pêşî de ku nameya hevalekî ji min re hat dest pê bikim.

Hevalekî min î ku ez û wî li rex hev di yek alayê de bûn û me bi hev re di bin siya ala Prens Eugenê leheng de şerê gawirên osmanî li Zentayê kiribû, ew nameya ku ez ji jiyana pirrikî ya li vî gundî rizgar kirim, şandibû. Binêre vaye hîn di berîka min de ye.

Gustav destê xwe yê çepê hepişande berîkeke xwe û kaxezeke kevinikî derxist û xwend:

Gustavê xoşewîst,

Heftiya berê ez gihome mal. Min dixwest yekser nameyê ji te re rê bikim. Min di gemiyê de hewl da lê hingî mahdê min dixeliya û ez vedireşiyam min nikaribû pê nûs hilgirta. Niha ku hinekî baş bûme, min di cî de ev name ji te re nivîsî. Ev mahdxelandina min ya di gemiyan de heta niha bêçare maye.

Ez di şirketeke bazirganiyê de dixebitim. Bazirganiya sêkuçikî ku di navbera kenarên Efrîqya û Ewropa û Emerîkayê de dibe. Min malekî baş qezenc kir di du salan de. Serbazek di deh sal şer de nikare bi qasî nîvê wî malî qezenc bike. Eger tu bixwazî kar bikî zû bersivê bide min û eger derfeta te hebe meha di pêşiya me de emê berê xwe bidin bendera Emdenê. Gemî ji wir

radibin. Tu jî dikarî ji Herne de berê xwe bidî Emdenê. Emê li nêzîka benderê hev bibînin. Li rêwîxaneyê nêzîkî avahiya şaredariyê. Navê wê Der Segel e. Gelekî naskirî ye.

Bi qedandina xwendina nameyê re Gustav li rûyê Fernando nihêrî. Hinek baldarî têde xwend lê ne ewqasî bi dilê wî bû. Wî xwest bêtir bala wî bikişîne ser xwe û serpêhatiyên xwe, rabû nameya hevalê xwe li berîka xwe vegerand, enîşka destê xwe yê çepê danî ser maseyê, alîkî rûyê xwe xiste kefa destê xwe û berdewam kir:

**N**avê wî hevalî Paul Forgeron bû. Li Berlîna Brandenburgê bi cih bûbû. Malbata wî bi gelek mesîhiyên kalvenî re berî bîst salan ji Parîsê ji ber zordariya katolîkan û qiralê Fransayê Ludvîgê kes nizane ji kengî de qiral e û hêj li ser textê desthilatdariyê ye, reviyabûn û di Herne re derbasî aliyê qiralîteya Brandenburgê bûbûn. Min û Paul me salek ji destpêka xortaniyê li Herne bi hev re buhurand. Paşê wan berê xwe da Berlînê û li wir bi cih bûn. Di şer de jî em rastî hev hatin û her dem di konekî de bûn. Wî jî gustîlkek ji tiliyeke paşayekî osmaniyan î kuştî kişandibû. Gustîlka wî sêqaşî bû, qaşeke zumurrud, yeke yaqût û yeke heqîq bû. Gustîlka wî ji ya min bi gelekî buhatir bû. Ma min ji te re qala vê gustîlka xwe nekiriye? Piştî ku em ji şer vegeriyabûn, Paul tev li karkerên şirketa Brandenburgisch-afrikanisch-amerikanische Compagnie ya ku nû hatibû damezrandin bûbû û berê xwe dabû kenarê Ganayê ku navê wê kenarê zêr e.

Ku ev nameya wî giha min ez li bin guhê hev ketim. Gelo biçim neçim? Hevalê min Martîn beriya min berê xwe dabû şerqê û ketibû pey xewnek ji hibrê ku xwediye vê rêwîxaneyê e berê Hans Heilbergê kal ew xewna derewîn pê şêrîn kiribû. Martîn vê sibê di kirasê dînekî de giha Herne. Bi rastî jî cilûbergên wî ên dînan bûn. Kenê mirovan pê dihat. Ne deng ji serî dihat ne jî ji qûnê. Min kir û nekir min nikaribû çîroka xwe jê re temam bikim. Ne li min guhdarî kir ne jî çîroka xwe ji min re got. Ew niha li jor di xew de ye.

Erê, ez wê demê li bin guhê hev ketim. Min pir dixwest ji gundê xwe derê û li cîhaneke fereh bigerim. Ez jî weke piraniya kesên wan heyaman li jiyaneke xeyalî mîna ya çîrokan digeriyam. Ez çûm û bi Hansê kal jî şewirîm. Hans got: ez wî welatî nas nakim, nikarim şîreta çûnê li te bikim. Her weha nikarim bibêjim neçe jî. Şerq ronahî ye. Tu diçî wir ezê alî te bikim, hema ew welatên han! Tu bi kêfa xwe yî. Tu biryara xwe bi xwe bistîne. Û wisa ez li hewa hiştim. Min jî biryar stend. Ma min dê li vî gundî çî zibil bela bikira!

Ez di sibehek sar de, sibeheke bi pûk û berf de ji Herne derketim. Min berê xwe da bakur, rêya Münsterê girt û çûm. Piştî sê rojan ez gihame Emdenê. Bêhna pêlên şor difûriya. Teyrikên behrê berî ku em bigihên bajêr li ser me rêwiyan hêlan dikirin û mizgîniya nêzîkbûna lengerê didane me. Li ber avahiya şaredariyê rêwîxaneyê der Segel hebû ku Paul navê wê di nameyê de dabû min. Min xwe lê girt û me hev li wir dît.

Min soz daye te Fernandoyê qenc û İspaniyê delal ku çîroka xwe dirêj nekim. Ez li ser soza xwe me. Ez nabêjim çî hate serê me bi rê de. Nabêjim ku ba û bahoz û pêlan dikira em ji mêranî bixistana. Nabêjim ku hût û nehengan dikira gemiya me wergerandana. Na nabêjim. Lê ezê her tiştên din bi kurtayî bibêjim. Di bin ala spî ya ku bi sîperekî sor xemilandî de û bi gemiya mezin, firqata ku navê wê Friedrich Wilhelm zu Pferde bû, firqata ku di pozê wê de kevalekî mezin yê siwarekî li ser hespeke spî hebû, firqata navdar ya bi serokatiya Major Otto Friedrich von der Groeben, du sed kesî û di nav wan ez û Paul, hevalê min e şerê Zentayê me berê xwe dabû kenarên rojava yê Efrîqayê. Li wir nûnerên padşahê Prusiyayê ji xwe re bingeha koloniyekê ava kiribûn û navê wê kiribûn Großfriedrichsburg. Ew weke kelayeke mezin di forma stêrkekê de bû. Dîwarên wê yê li herdu rexên dergehê hesinî, dwazde gazan bilind bûn. Di nava wê de zindaneke mezin ya ku bûbû cihê koleyên nêçîrbûyî hebû.

Em bi dehan kes bûn di wê firqata mezin de ku em li ser pişta wê bûn û berê me li welatekî nenas bû. Tifingçî û topçî li kenarê wê firqatê sekinî bûn. Tifing, hesp, kincên pemboyî, mey bi her cûreyên xwe û malên din jî di enbarên binî yê gemiyê de bûn. Bazirganên Brandenburgê gemî tijî mal kiribûn. Em kesên di zik û hinavê gemiyê de bi kêf bûn û me distira. Ku em hildikişîyan jora banê gemiyê û xwe bi derabzînan digirt û li kefa spî ya ku ji ber gemiyê dipekiya temaşe dikir, peşkên şor yê ava deryayê çelqiyayî dipekiyan rûyên me û

bayê hênik dilê me xweş dikir. Firefira ala spî û di nêvî de sîperê sor bû. Dilê min jî mîna wê alê lêdida. Sîperê hêviyan jî di dilê min de hêlan dikir. Hevalê min Paul xwest ji min re çîrokên wan welatan bibêje. Lê min nehişt. Hin ji wan gotin jî lê bala min ne li wî û çîrokên wî bû. Berê min li çîrokan bi xwe bû û ezê biketama nav wan. Em roj bi roj nêzîkî roja zêrîn û germ dibûn. Ew cara yekem bû ku ez roja wisa bi tûn dibînim. Germ û xweş û nêzîkî mirov! Paulê xwedî tecrube, paçîkek şil kir û da destê min û got: bila ev her li serê te be. Eva han ne roj e lê ew sîwaneke ji êgir e em di bin de ne. Rastî jî wisa bû. Mejiyê min dihat ku bikele. Min digot hindik maye mejiyê min di firnikên bêvila min re biherike. Ku ne şîreta Paul bûya ezê bi şeqamên wê roja har re bimirama. Deyaxa min li ber wê germiya sosret nebû loma jî piraniya demê ez di zîkê gemiyê de dimam. Serê te naêşînim Fernandoyê qenc. Piştî demekê em nêzîkî kenarên Efrîqyaya rojava bûn. Ji dûr ve girava Goreyê ji me ve xuya kir. Ez dikira biketama xew. Min xwe dabû bin siyekê û li ser kulorên werîsan paldabû. Lê Paul hat ez rakirim û got: rabe rabe. Li Girava ku dibêjinê *La porte de non retour* temaşe bike<sup>1</sup>. Dûrbîna ku di destê wî de bû da min, û min jî ji xwe re li wê girava xweşîk nêrî. Me bi rê de hin giravên din jî dîtibûn. Min ji Paul pirsî: ma te çima hişt ez li vê tenê binêrim! Komek girav bi rê de hebûn ! Paul dûrbîna xwe ji dest min girt û got: a ji vê giravê, ji vê girava biçûk, bi sed hezaran kole transferî Emerîkayê dibin. Ev giraveke ku Ewropa û Emerîkayê maldar û ciwan dike û van welatên reş jî vala û xizan dike. Bi qasî ku Frîqiya ji şênîyên xwe vala dibe, wîqasî xezîneyên Ewropayê ji zêran tijî dibe. Tu dibînî çiqasî biçûk e ev girav? Seet bûbû yazdehê berî nîvro. Rojeke bi tûn wek agirê vê agirdanka li ber pîrê vêketî, bi ser serê me de mîna duqiyekê ji zêr xuya dikir. Helliluya.

\*\*\*

---

<sup>1</sup> *La porte de non retour*: Deriyê nevegerê. Wisa nav li wê giravê kiribûn. Koleyên ku ji wir diçûne Emerîkayê êdî nema li welatê xwe vedigeriyan. Ma wê kê ew vegeandina? Lê kê ew nav lê kiriye? Koleyên ku ji zarok û jin û bav û diyên xwe û xak û xwezaya xwe qut dibûn û êdî awira dawî li kenarê Efrîqyayê dixistin û dizanîbûn veger nema, yan jî wan bazirganên ku weke pêkenokekê ji xwe re ew nav lê kirin wek ku çawa nav li erd û ezman û çiyayên xelkê dikirin! Kes nizane.

## Seet yazde

Mirovê ku tûrikên Martîn ji ber maseyê rakiribûn û berê xwe da jor, xwendevanekî katolîk î ilahiyatê bû. Ji Münsterê hatibû û berê wî li Kölnê bû. Metropolîtê Münsterê Franz Arnold, yê ku Papayê Romayê Klemens XI berî salekê ew li ser kursiya metropolîtîyê danîbû, ew li ser hesabê dêrê hinartibû Kölnê ku xwendina xwe berdewam bike. Wî li odeyekê li jora barê di rêwîxaneyê Hans de xwe dirêj kiirbû û xwe vedihesand. Seet yazdehê bernîvro tamam, bi ringîniya dawî ya naqosê re, xwendevanê ilahiyatê yê Münsterî xwest di şibakê re li xwezayê binêre<sup>1</sup>. Li derve mijeke spî hêdî hêdî gund dipêça û sikak tijî spîtiyeke şil dikirin. Êdî deverên ku hinekî dûr bûn nema xuya dibûn. Li dora bircê dêrê jî mij êdî digeriya û mîna marekî hildikişiya jor. Ji ber ku bêhna wî hinekî teng bûbû rabû dakete jêr û bala xwe di nav wê xirecirê de da maseyeke vala ku du sê tûrik li ber bûn. Ew ber bi wan ve çû û bala xwe dayê ku hin defter in. Çend caran li dora xwe nerî kesî guh nedayê. Çû kîbûna xwediyê wan defteran ji pîrê pîrsî. Pîrê serê xwe jî ranekir û di ber xwe de got: ma ez pasvana defteran im! Here hema tu xwediyê wan î. Wî jî di dilê xwe de got ku ka hela ez binerim ev çi defter in? Çi di wan de heye? Ezê vê nivroyê heta êvarkî ji xwe re li wan binêrim û dîsa dakevim jêr û wan li xwediyê wan vegeirînim. Dawiyê tûrikê defteran rakir û hilkişiya jor. Perdeya li rexên pencereyê girêdayî vekir û herdu felqe anîne hev, solên xwe yên çermînî û heta ber kabokan stûdirêj danîn û li ser textê xwe palda û her sê defterên Martîn ji tûrik deranîn û li ser iskemleyek textînî ku li ber serê wî bû, danîn. Bala xwe dayê ku defterin naşibihin yê Ewropayê. Wî di xwendegeha xwe de li bajarê Münsterê hin destnivîsên ku ji şerqê hatibûn dîtibûn ku ev defter jî wisa bûn. Ew bi xwe kitêbên destxet bûn lê xuyabû ku di gelek deveran de bi lez û bezê hatibûn nivîsîn. Pelên wan her sê desxetan hişk û qabên wan jî ji çermekî ku neqşikên islamî li ser bûn, bûn. Stêrik û xêzikin di hev re derbasbûyî û lihevgeriyayî bûn ew neqş. Martînê kose li ser bergê her defterekê tîpek danîbû; A B C bi xêzin ciwan hatibûn rêzkirin. Xwendevanê ilahiyatê deftera “A”, ku stûrtirîn desxet bû di nav wan de û bi tîpên qalind û mezin hatibû nivîsîn û hin wêneyan di rûpelên hundir de ew dixemiland, rahiştê û pêşî dest bi xwendina wê kir. Herdu defterên din jî ne bi wê stûriyê bûn, yanî pelên her yekê kêmtirî sed rûpelî bûn. Xeta ku herdu defterên din pê hatibûn nivîsîn jî xetê hema wisa bû ku mirov tê derdixist ku dem li ber nivîskarê wê teng bûye. Defteara dawî ku C li ser nivîsandî bû, hîn bîna hibrê jê difûriya. Êdî dilbijîna xwendevanê ilahiyatê ji naskirina naveroka wan defteran re bû semasiyekî diranqîç î har û hişê wî zeft kit. Herçendî ji odeya li rex wî xirexira cîranê wî dihat jî wî guh lê nekîr û bi hemû hestên xwe kete nav rêzên wê defterê, deftera A`yê:

\*\*\*

<sup>1</sup> Malbata Borislavê ku navê xwe piştî ku bûbû lûterî kiribû Karl û li Herne bûbû jamkutê dêra wê, mîna hezaran malbat berê xwe dabû Emerîkayê. Wan kiribûn û nekiribûn ku wî jî bi xwe re bikin hevalê wê riya dirêj, ew neçûbû. Xwe ji dêrê bernedida. Jamkutiya xwe bi nav û dengê Emerîkayê tevî nedida. Kesî razê wî û wê girêdana qewîn ya bi dêrê ve nizanîbû. Ministrantê dêrê yê sêzdesalî Georg tenê ew raz dizanîbû. Wî ne bes ew raz dizanîbû, ew hemparê wê razê bû jî. Georgê sêzdesalî hemrazê Karlê karlofçî ê qutî girover bû.

Bûye adet, bi qasî ku min bala xwe dayê, çi danerekî rojavayî heye û kitêb li ser Levantê yan jî bi giştî li ser şerqê nivîsiye, bêtir behsa rê û rêçik, gelî û newal, deşt û çiya, gund û bajar, sûk û bazar, ajal û dar, çem û cobar, cade û dîwar, şeqam û kolan, dêr û mizgeft, dîn û ol, û avahî û hewayê wan deverên ku têre derbas bûbe yan jî lê bi cih bûbe dike. Min hîç kitêbek jî nexwendiyê ku danerekî behsa xwe, jiyana xwe, rabûn û rûniştina xwe, hestên xwe têde kiribe. Wa ez fam dikim ku mirov li deveran xwe di dîmenê giştî de nabîne, bala xwe nade banga xwe ya hundirîn ku bingeîn. Bi derve dibile û hundirê xwe ji bîr dike. Ahengên giyanê xwe, çi şad û çi xemgîn bin nabihîze. Bi qasî ku kevalekî rasteqîn ji deşt û çiya û latên welatan re bi qelema xwe dikêşe, nikare piçekî jî qala kel û kortên jiyana xwe bike. Nikare dîmenê demên xwe yên li wan welatan bikişîne.

Ê min ez dixwazim berevajî wan bikim. Ezê li kûraniya ruhê xwe vegerim û behsa cîhana xwe ya veşartî bikim. Ezê rastiya xwe bibêjim ne kêr ne zêde. Heta ku ez karibim dê aliyekî tarî di jiyana xwe de nehêlim ku behsê nekim. Bi qasî ku ji min bê ezê qirêjiya giyanê xwe, serkeftinên xwe, rindî û nerindiyên xwe, evîn û nevin, xurtî û qelsî, şahî û jarî, serketin û binketinan, bi kurtî ezê rastiya xwe ya rût û şilfî tazî mîna berrik û tejikan raxînim. Ezê jiyana xwe ne mîna ku xeyal dikim lê mîna ku jiyame û dijîm vejînim. Ezê wê jiyane careke din, bi hûr û gir û evraz û nişûv û beroj û nezar û kel û kortên wê li ser van pelan deynim û pêşkêşî xwendevanan bikim. Bi qasî ku bê bîra min ezê bûyeran wek ku qewimîne binivîsim. Ne li gor dilê min bin jî ezê rastiya bûyeran deynim. Rastiya min eger çiqasî bi tazîkirinê kirêt û naşîrîn bibe jî ezê kirasekî lê nekim. Ji xwe rastî rût e, ku cil û berg lê dibin namîne rastî.

Ez ev im. Martin Setzerê ku berî neh salan ji gundê xwe yê biçûk Herne li kontgeha Mark (Graftschaft Mark) ku di navbera du rûbaran de ye derketim û min da ser riyên bexteweriyê. Li ser wan riyên jî bi qasî ku bi dest min ket ez bexteweriyê nas bikim û destê xwe bidimê, hembêz bikim, bîn bikim û dengê wê bibihîsim û wê tehm bikim û bi çavan jî bibînim, bi dest tu kesekî din neketiye. Erê bextewerî! Ewa ku ez lê digeriyam û dawîya dawî min ew dît lê li wergeriya û bû peyalek jehr. Niha jî, niha li vê xana di navbera Ruha û Diyarbekirê de, min dest pêkir û bûyerên jiyana xwe mîna refekî qitikan ajote xefka van pelên spî. Piştî min li Helebê ye. Ez mirovekî reviyayî ji ber qederekê. Tirsiyayî û pêrîşan û tevlihev. Berê min li hevalê min Alberto ye. Ev dawîya çîrokekê ye û ez jî naxwazim ji dawî de destpê bikim. Çîrok ji detpêkê de xweştir in.

\*\*\*

Duşema ku min têde xatir ji gora diya xwe xwest û mûmeke stûr î veketî li ber kêla serê wê danî û ez derketim min li bin dareke şaberrûyê xatir ji hevalê xwe Gustav jî xwest, sibeha rojeke sar bû û ji qijikên reş û şalûlan pêve şopên jiyanê li derve nebûn. Bîst û şeşê çileyê paşîn bû û berfê her der spî kiribû. Wê sibehê, wê sibeha spî û xemgîn û bi qijikên reş xemilandî Hans Heilbergê xwediyê Café Heilberg bi min re heta derveyî gund meşîya û çend kulm libên qehweya biraştî xistin tûrikekî etlesê sor û da destê min û got:

- Bigre! Êvaran ku tu bixwazî xewê birevînî çend daneyan ji vê qehweyê bavêje devê xwe û bikeritîne.

Berî ku em xatir ji hev bixwazin, Hans xwarî erdê bû û şaberûyeke ku pengizîbû wan deran rakir û da destê min û got:

- Ku tu qaşilê wê ji ser ranekî tu nizanî ka genîye yan na. Ev jî tu yî Martîn. Divê tu ji qaşilê xwe derkevî.

Min ew şaberû ji dest wî girt û nola yadigarekê bêdeng xiste berîka xwe. Paşê min ew Hansê dilovanê ku ez bi israr û pereyên xwe dehfandim van welatan, hemêz kir û çûm li erebeyeke ku du hespên qelew û bijîqusandî û dêlhûnayî ew diajotin siwar bûm û min berê xwe di riyeke li kêleka rûbarê Ruhr de da kenarên çemê Rheinê û di keviyên wî çemê bi heybet re wê erebeyê berê me da Amsterdamê. Heta ku ez dûr ketim û êdî Herne bû mîna şanikeke reş li ser sînga bedewekê min awir ji wir qut nekirin. Dilê min dihate guvaştin. Şahî û xem, kêf û elem hatibûn cem hev û di dilê min de kombûbûn wê kêlîlkê. Ku nema Herne xuyabû, bayekî sar ji hêla rûbarê aram de rabû û li rûyê min xist û ez bi du hêsrên ku ji çavên min diherikîn hisandim.

Ji Amsterdama ku ez piştî roj û nîvekê gihiştimê, li gemiyeke holendiyan ku berê wê li kenarên rojavayê Efrîqayê bû siwar bûm. Gemiyeke holendiyan ji binî de ziravik, di nêvî de pehn û ku digihê banê gemiyê dîsa ziravik in. Ne mîna gemiyên firensiyan ku serbanên wê weke meydana mezin in. Heta sala 1699an jî, yanî sala ku ez têde ji Herne derketim, gemî weke karwanan diçûn. Ji tîrsa qorsanên deryayî yên barbaran û xeyrî wan bêgav dibûn neh deh gemî bi hev re bin. Lê dawî peyman di navbera dewletên bakurî Efrîqayê û dewletên ewropî de li dar ketin û êrîşên qorsanan pir kêmtir bûn. Wê gemiyê gelek siwarên xwe li Tancayê danîn û rîya xwe berdewam kir û berê xwe da kenarên rojava yên Efrîqayê da ku ji wir koleyan hilgire û bibe Emerîkayê. Tancaya ku ez û gelek lê peyabûn bajarekî mezin î li ser kenarê deryayê bû. Hîn bîna inglîzên ku ew bajarê ciwan bîst û pênc salan dagîrkiribûn ji sûrên kela asê dihat. Mizgeftên ku demekê bûbûn dêr û xaç li ser minareyan wan bilind bûbûn dîsa li mizgeftbûna xwe vegeriyabûn. Dengê azanê bilind ji minareyan dihat. Min cara yekem li wir mizgeft dît in û azan bihîst. Hundurê mizgeftan bi merş û xaliyên buha raxistî bûn û yên ku diçûn nîmêjê solên xwe li ber deriyan ji piyan dikirin û di hewşa wê de dest û rû û nigên xwe dişuştin û paşê diçûn hêwanê li ser wan merşik û xalîyan nîmêj dikirin.

Her tişt li wî bajarî bi min nû bû. Xweza bi dar û berên xwe, bi ezman û erd û her derên xwe, bi ba û hewa û benderê xwe, bi mirovên xwe, durûv û sukum û axaftina wan, bi bêhnên ku sibehan difûriyan. Heta bi çirîsnadina stêrikan bi şev û hilatina rojê jî bi min nû bûn. Min di dilê xwe de got: sihra şerqê ji vir dest pê dike! Min pîrsa wê kitêbê ji bîr nekiribû. Lê min ji kê pîrsî gotin here Şam û Helebê yan jî here Bexdê li tiştên wisa bigere. Ew li wan deveran peyda dibin. Xelkê di bin çavan re li min dinerî. Xwe zêde nêzîkî min nedikirin. Bersiva pîrsên min didan û dûr diketin. Heta dukançiyên jî zêde nedixwestin bazara tiştan bi min re bikin. Min nizanîbû sebeb çiyê. Lê paşê ku min li welatê şerqê sal buhurandin ez tê gihiştim ku çavên şîn û kosetî nîşana bêyomiyê ne. Ji bo ku ez xwe nêzîkî civakê bibînim min xwe bi her awayî guherî, cil û berg û tevger û ziman jî. Lê çavên şîn û rûyê bê mû! Mîna xwe man.

Li Tancayê ez gelekî nemam û min berê xwe da Iskenderiya Misrê. Vê carê ez li gemiyeke bazirganên firensiyan, ku malê ewropayî ji firaxên qizêz û cuxên buha û sabûna Marsîlyayê û û koleyan reşik û pûl û pereyên zîv û zêr dibirin wan welatan, siwar hatim û me berê xwe di rojeke baxweş de da rojhilat. Bayekî hênîk ji rojava dihat. Di gel ku ala Firensayê li ser gemiyê hildayî bû jî lê dîsa tîrsa bazirganên ji qorsanên barbaran û yên Maltayê gelekî hebû. Gemiya ku bi selameti derbas dibû û digihî bendera xwe, şahî li dar dixist. Bazirganên gemiya me jî ku nêzîkî Iskenderiyê bûn dest bi kêf û şahiyê kirin. Nêzîkî meh û nîvekê di ser rêwîtiya me re derbas bûbû. Li Iskenderiyê ez ji gemiyê daneketim. Eger yek daketiba û hema pê li erda Iskenderiyê kiriba, divabû baca peyabûna xwe bida. Hin bazirgan mal daxistin û hinek rêwî siwar bûn. Min dît karmendên benderê ketin gemiyê û nasnameyên me pîrsîn. Wan tûr û sindoq û bale û çenteyên rêwîyan jî vedinêrîn. Li ser her çenteyekî jî çend qurîş gumrik distandin. Piştî rojekê gemiyê berê xwe da Ekkayê. Li Ekkayê ez nêzîkî mehekê mam û fêrî çend cumleyên erebî bûm. Ez kitêbxane bi kitêbxane jî li kitêba El Ifade fî iksîr el seade geriyam. Xwediyên kitêbxaneyan, ku navê wê ji dibihîstin, bi min dikenyan. Carekê yekî gote min: ev nav hema hinekan ji xwe re li hev aniye. Kitêbek bi vî navî nîne. Xelkên Ekkayê jî ne kêmtir yên Tancayê bûn û wan jî zêde xwe nedidane ser min. Lê ku didît in ez bi

bazirganên din ên ewropî re me çavên xwe ji kosetiya min digirtin. Lê hema min di awirên wan de tirsê û xwevdana ji min eşkere didît.

Ekka bajarekî ne biçûk û ne mezin bû û bazirganên ewropayî yên ku lê diman tenê firensî bûn. Du bazirganên portugalî jî hebûn. Yê cenovayî û venedîkî û florensî û inglîz nebûn. Piraniya wan bazirganên firensî jî li xanên wî bajarokî diman. Çend xan li rex hev bûn û nêzîkî benderê bûn. Bi şev dengê pêlan heta ber şibakeyên xanan dihat û sibehan bîna sasî ya masiyan bi sura bayê şor re difûriya. Buhar hîn ne buhurî bû û dunya xweş bû. Hembalan bi çewalan kuncî û genim û penbo bar dikirin. Neyşeker û xamên caw û bi taybetî hevrîşimê<sup>1</sup> ku ji Çînê di rêya Helebê re dihat jî li gemiyên ku berê wan li Marsîlyayê bû, bar dikirin. Xanên wir jî gelekî mezin bûn, rêwîxaneyên Hans ji ber wan ve odeyek e. Min li wir li Xanul Ifrenc (xana firenciyan) a ku derdora mehekê lê mam, bazirganekî portugalî nas kir navê wî Pedro Del Faro bû, wî şîreteke zêrîn li min kir gava ku got:

- eger tu bixwazî jiyanê rihet li vê şerqê bijî, fêrî zimanên şerqî bibe, bêtir jî erebî. Û van cilên ewropayî ji xwe bike û xwe fêrî lixwekirina cilên van welatan bike. Nebe gayekî spî di nav naxirê de.
- Û ev rû!
- Ew jî derdeke. Ev misilman gelekî ji çavên şîr û rûyên kose di'initin. Ê te jî herdu nîşan li ba te kom bûne. Lê eger tu zû bi zû zimanê erebî û tirkî fêr bibî wê barê te siviktir be.

Pedro bi xwe baş bi tirkî û erebî dizanîbû û di rêya latînîya ku min û wî me herduyan zanîbû re alî min kir û ez fêrî çend gotinên erebî yên ku di jiyana rojane de pêwist in, kirim. Dema ku min raza hatina xwe ya şerqê jê re got kenîya û got: çima na? Ev der şerq e, her tişt lê peyda dibe. Lê ya rihet ticaret e. Erê hîle û xapandin tê de heye û mirov li van şerqiyan ewle û êmin nabe, dewleta osmaniyan jî gelek astengiyan datînin pêsiya bazirganên ewropî û baceke bêhawe pir distînin û tehsîldar û paşa û şahbender dibin hevparê yekî, lê dîsa jî mirov pereyekî baş qezenc dike.

Beriya ku meha min tamam bibe min berê xwe da Bêtlehem cihê jidayikbûna Mesîh bi hêviya ku wan deverên pîroz, wê axa efsaneyî ziyaret bikim. Yekî ji Ekkayê ku zimanê latînî baş zanîbû, bû rênas û hevrêyê min<sup>2</sup>.

Em negihane Qudsê, me Bêtlehem jî nedît! Rêbirrên koçer ên ereb ketin riya me û em şelandin. Tiştê bi me re nehiştin, cilên min ên ku pê ji Herne derketibûm jî birin û ez wisa tazî hiştim. Xwedê kirî me pere zêde bi xwe re neanîbûn. Hevalê min ê ekkayî li ber wan geriya negeriya hîç bû. Ew rêbirrana hemû jî çavkildayî bûn û rûyên wan bi cawekî reş nuxumandî bûn. Ji xwe çawa ku em talan kirin piştê xwe dane me û hespên xwe zixt kirin û berê wan guherîn û di nav tozê de ji ber çavên me winda bûn.

Piştî wê bûyera ecêb ku ruhên me jê bi selameti ve geriya, ez dîsa vegeciyam Ekkayê û li Xanul Ifrenc li dostê xwe yê portugalî Pedroyê tacir rast hatim. Wî ber dilê min da û got ku wisa ye, divê mirov bi karwanên mezin re biçe deveran. Û got ku heta karwanên mezin jî rastî talanên mezin tên. Gera bi tenê xeternak e. Pedro razeke xwe jî ji min re got! Wî got ku osmanî nizanin ew portugalî ye, ji ber ku dijmintiya herdu dewletan li dar e wî xwe wek firensiyekî dabû naskirin. Ji ba qonsulusê firensiyan kaxezek imze kiribû ku ew firensî ye.

Wî ji min re qala ticareta xwe û kaxezan jî kir. Ji Ewropayê kaxez, bi taybetî jî kaxezên Marsîlyayê, dianîn û hema li benderê difirote bazirganên Şam û Heleb û Quds û Bexdê. Wî

<sup>1</sup> Hevrîşimên navdar li Şerqê hene, di serî de yê ku ji bajarê Ceylanê li welatê farisan tê, rengê wî spiyekî ber bi zer ve ye, bazirganên ermen û tatar wî tînin û li Helebê bi cuxê Kerseys re bi tacirên venedîkî re diguherin. Li Kisrewana Lubnanê jî hevrîşimekî gelekî binirx heye bi piranî li Firensayê tê firotin. Navê wî Kisrewanî ye û gelek jinên kurmancan ji serê xwe re dikin tac.

<sup>2</sup> Di defterên min ên windabûyî de min gelekî behsa wê ziyaretê kiribû. Derbarê wan der û doran de çî zanyariyên ku min bi dest xistibûn, min ew nivîsî bûn. Behsa nakokiyên katolîk û ortodoksan, ku di esase xwe de nakokiyên Rûsya û papayê Romayê ne, û şerê wan î jî bo ku dest deynin ser kilîta gora Mesîhm hemû di wan defetran de tomarkirî bûn.. Belkî sî rûpel jî hebû.

got jî ku kaxez malekî nirxdar e û dikare bibe diyariya herî buha ku ji paşa û waliyan re were pêşkêşkirin. Min niyeta xwe û rêwîtiya Helebê jê re got. Dema wî ev yek bihîst yekser got: ez dixwazim qenciyeke bi te bikim. Tu jî hinek kaxez bi xwe re bibe. Tu yê qezenceke baş jê peyda bikî. Barekî kaxezên spî ji Pedro Del Faro re ji Marsîlyayê hatibû. Min barekî biçûk î kaxezên spî kirî û li enbareke xanê danî. Min li bendera Iskenderiye sê Talerên xwe bi pereyên osmanî re guhertibûn, hin pereyên wan ên zîv nû derketibûn jêre digotin Qurûşî Cedîd. Qîmeta aqçeyan daketibû. Loma jî min Qurûşî Cedîd peydakirin û heta ji min hat min aqçe kêr kirin. Min hinek taler jî bi tuxralî û zêrên venedîkî<sup>1</sup> re jî guherîn ku navê wan Esedî bû. Gelekî bi qîmet bûn ew Esedî. Hin serraf hebûn dihatin di gemiyan de pere diguherîn. Ji Mecer Altûnî bigire heta Tuxralîyan bi wan re hebûn. Ku meha min tamam bû nebû ez jî bi karwanê ku berê xwe da Şamê re tebayî barê xwe yê kaxezan bi rê ketim.

\*\*\*

Dema karwanê me giha Şamê, buhar ber bi dawiya xwe ve diçû. Baxçeyên li jêra bajêr ji kulîlkên kerez û zerdelo û xox û hirmî û hincas û alûc û behîvan pembêhî û spî dikirin. Şaberûya ku min Hans li gund dabû min û min bi xwe re anîbû hate bîra min. Min ew ji nav kincên xwe derxist û lê nihêrî. Ew hinekî çilmişî bû lê hîn terr xuya dikir. Min dîsa ew vegerande cihê wê û di dilê xwe de got ka gelo ez yan ev şaberû dê pêşiyê li ber xurbetê qels bibe! Ku em gihane nêzîkî xanan, wekîlên bazirganan ber bi me ve beziyan. Hembalan jî barên me ji ser pişt deveyan bi lez û bez daxistin û hema li wir dest bi kirîn û firotinê bû. Min bi erebiya ku ez fêr bûbûmê û bi şermokî û fihêtiya biyaniyekî bang kir: wereq wereq! Wereq firencî. Wereq wereq, wereeeeeeq. Min peyva wereq wek werek digot û ew Q bi min re dernediket, heta niha jî ew tîp bi min re dernakeve. Dengê min ne ewqasî bilind bû jî lê min dît yekî bi şerwelekî navran fereh û ser bi kum hate ber min û bazara kaxezan kir. Bazarê dirêj nekir û min ew barê sivik yê kaxezan bi buhayekî baş firot. Min pere û qurîşên xwe jî di cih de ji wî mirovê bi şerwel stendin û çûme xanekê ku pişt re min nas kir navê wê Xana Dikkê ye<sup>2</sup>.

Li Şamê, di wan çend rojên ku di xana Dikkê de bûm, çavên min li sedan kesên ku berê wan li hecca misilmanan bû ketin. Ji her deverê hatibûn, ji Qustentûnopelê (dibêjin Istenbol jî, rûs jêre dibêjin Tsarîgrad!), Antakiyayê, Qonyeyê, Diyarbekrê, Bedlîsê û gelek bajarên din jî. Karwanê ku ji wan hêlan hatibûn navê Karwanê Romî li wan dikirin. Û karwanê ku ji Heleb û Hums û Hemayê jî hatibû navê Karwanê Helebî li wan dikirin. Karwanê hecacên ku ji welatê farisan jî hatibûn navê Karwanê Eceman li wan kiribûn. Hema bêje ji welatê osmaniyan û eceman tevî hacî hebûn. Wan jî ji bo ku rêwîtiya xwe ya pîroz fînanse bikin mal bi xwe re anî

<sup>1</sup> Ev cûre pere bi gelek navan dihate nasîn, Dokatê Vendîkê, Altunu Vendîk, Florî, Firincî Altunu, Sikke-î Ifrenciye, Qizil Qurûş yan jî Yildiz Altunu. Ew ji pereyên bi navê Eşrefî hinekî buhatir bû. Bi panzdeh aqçeyî erzantir bû. Dokatê venedîkî li welatê osmaniyan gelekî bi nirx bû, li zerbaxaneyên Qustantûnopolê di bin çavdêriya sultanê bi xwe de sikke lê diket û peyva erebî صح (Seh) yanî durust û ne dixel li ser dihate nivîsîn. Her dukatek, dema ku min ew guherîn, sêsed û panzde aqçe kirin. Aqçe pereyekî zîv bû, lê nirxê wî her û her li himber zêrê venedîkî dadiket. Sala ku ez gihame Ekkayê her dukatekî venedîkî bi 315 Aqçeyî bû. Bi qasî ku nirxê wî diravî erzan dibû wî qasî jî hêza osmaniyan kêr dibû. Qey hêza welatêkî bi pûlên wî welatî ve girêdayî ye!

<sup>2</sup> Li ber wê xanê sekoyekî kevirî û bilind hebû (bi `erebî ji sekoyê ji erdê bilind re dibêjin Dikke) ku li ser wê cêrî û xulam û kole ji firotinê re dihatin pêşkêş kirin. Min carekê dît cariyeyekê lê difiroşîn. Firoşkar bang dikir û pesnê wê dida. Ma çi nedigot! Qala goştê wê û hunerên ku dizane dikir. Behsa şeweyên kutanên ku ew têde hunerbaz e jî dikir. Yê ku dikira ew bikiriya, ew kirî jî, destê xwe li bedena wê hemûyî dipeland. Kulêmekên wê, sînga wê, memikên wê, ran û navran û çaqên wê û her devera wê. Her devera wê heta devê wê jî vekir û bîn kir. Loma jî hinekan navê xanê dikir Xanul Cewarî yanî xana cêriyan.



bûn. Xaliyên esfehanî, zehferan, darçîn, bîber, qerenfil, kafûr, zencefil, nîle û benîştê daran ku digotinê Mistekî yan Mezekî ku ji girava Saqizê dihat, komên mewîj û hejîrê hişkîrî û gwîz û behîv û benî û beharat û qehwe û qumaşên rengareng û mirwarî û gewher û xişrên jinan yên zîv û zêr li her bazarê hildayî bûn. Tu çûbayî koşeyê kîjan bazarê teyê çendek ji wan bidîtana ku girêkên hemyanan vedikin û pereyan jê derdixin û dixinê, mal dikirin û difroşin. Di gel wan misilmanan fille jî hebûn ku piraniyan wan suryan û ermen bûn û çendek gurg û rûs jî hebûn. Wan berî li Qudsê û Bêtlehemê bû. Ew jî li Şamê peya bûbûn ku herin heca xwe bikin. Ji xwe li her xanê sê çar bazirganên ewropayî jî hebûn; ji Cenovayê, Venedîkê, Florensayê, Marsîlyayê, Portugal û Hollanda û Firensayê û welatên din jî hebûn<sup>1</sup>. Li xana Dikkê ez li Alberto de Silva rast hatim<sup>2</sup>. Ku ewê paşê bibe heval û destbirakê min ê herî nêzî. Mandoleke xweşik pêre bû û êvaran awazin mîna pêlên deryayê ji jîh û têlikan derdixist û dengê nerm û hevrîşimîn ji zengeloka wî derdiket gava ku distira. Li ser şarên dûr, yarên dûr û warên dûr stran mîna hingiv ji wê zengeloka wî ya zêrîn diherikîn. Berê Alberto de Silvayê zengelokzêr li Esfehana Ecemistanê bû. Heta vê gavê jî, heta vê gava ku gavên min min davên ser riyên bextewerriyeke nû û ez berê xwe didim Alberto, min qet dost û heval mîna wî wefadar û dilrast nedîtine. Eger ez karibim ezê di dirêjiya van serpêhatiyan de behsa xwe û wî bi ferehî bikim.

Ez li wî bajarê di biniya çiyayekî bilind û rût de ku navê wî Qasyûn e, gelekî nemam. Hew ez nêzîka heftiyekê mam lê min di wê heftiyê de gora Selahedînê mezin ê kurd li nêzîkî mizgeftê ku berê kuniştê bû bi Alberto de Silva re ziyaret kir. Dema em zarok bûn navê vî sultanî di çîrkoan de derbas dibû. Dibêjin ew gelekî tolerant bû û dîl û êsîrên xwe ku bav û kalên me ewropayîyan in, parastin û kes neda kuştin. Min sikakên teng û tarî û girtî jî ziyaret kirin. Çemê Bereda jî. Lê tiştê ku herî bêtir kêfa min jê re hat hemamên bajêr bûn. Ez rojekê çûme hemamê. Roja pêncşemê êvara îne bû û xulexula xelkê bû. Hindik mabû Mikeyyis piştî min bianiya xwarê hingî ez lûfik kirim û firkandim<sup>3</sup>. Di nav kelexê de kesî kes nedidît. Terqeterqa qabqabkên textikî kenê min dianî. Wan qabqabkan him mirov bilind dikirin him jî meşa wan pir seyr dikir. Kesên di hêwana hemamê de diçûn û dihatin, ji bo ku neşemitin mecbûr bûn ku wan qabqabkan bixin pê. Li jor di binê qubên avakirî de ronahiya derve zelal û dilovan derbasî hundirê hemaman dibû. Ew qub bi dehan qulikên camkirî ku jêre digotin Qemari, xemilandî bûn. Her cama qulikekê bi rengê cuda ji rengên din bû. Piştî şûştinê qehweyeke yemenî jî pêşkêşî min kirin. Beşek ji sihra şerqê bû ew hemam. Rûyek ji rûyên bexteweriyê bû ew roj.

Berî ku ez ji Şamê derkevim û berê xwe bidim Helebê bi rojekê, hayûhoyek di nav bazirganan de bilind bû. Yekî ji wan kevokek girtibû ku nameyek bi lingê wê ve bû. Name vekiribû û ji hevalekî xwe re dixwend. Ew bi kêf bûn. Min ji hevrêyekî xwe yê florensî pirsî ku ev çi mesele ye? Wî gote min: ev kevokeke namebir e. Erebi jê re dibêjin El-hemam Ez-zacil. Bazirganên Şamê di rêya kevokên namebir re, nameyên ku dostên wan yan wekîlên wan ji deverên dûr ji wan re dişînin, rewşa buhabûn û erzaniya mal li wan welatên dûr nas dikin. Di wê nameyê de jî wekîlekî ji bazirganekî şamî re nivîsîbû ku qehwe nizanim li Marsîlyayê gelekî buha bûye. Wî hevrêyê min gotina xwe qedand neqedand û bi lez berê xwe da sîka beharatan. Wê rojê tacirê şamî û hevalên xwe daketin bazaran û qira qehweyê anîn. Yek dane

<sup>1</sup> Ticareta di navbera osmaniyan û ewropanyan de gelekî geş e. Şopa bazirganan li her kolan û bajar û benderên Levantê heye. Her tiştên ku ji vî welatî kêr in di rîya bazirganên ewropî re tê; cuxên buha û qeseb, kincên dirûfî, kaxez û risas û beharat û heta bi diravan, firensîyan ticareta diravên zîvîn xistine destê xwe û ku ne ew dirav bin ji xwe osamnî nikarin tu ticaretê bikin, nikarin tu malî bikirrin. Berejewendiyên herdu terefan jî dihêle ku bazar germ be. Heta dema ku welatekî mîna Venedîkê û dewleta Osamnî dijmin bin jî, bazirganên venedîkî ji vir narin.

<sup>2</sup> Alberto de Silva bi eslê xwe ji Lizbona Portugalê bû. Kalkê wî efserekî deryayî bû û li Mesqeta Ummanê serdarekî naskirî bû. Dema ku portugalî li wir têkçûn û pencên imperatoriya wan tevizîn û kolonî û mêtîngeh mîna avê ji nav tîlîkên wan herikîn, ew tev li venedîkiyan bû. Bi jineke venedîkî re zewicî û li wir bi cih bû. Alberto bi xwe li Venedîkê jidayik bûye.

<sup>3</sup> Ji yê ku laşê mirov lûfik dike re dibêjin Mikeyyis. Kîsekî reş î zivir di destê wî de ye, û hema mirovan pê difirkîne. Tê ku xwînê ji bedena mirovan derîne.

qehwe jî li sûkê nehiştin. Êdî bazirganan zarok bi kirê girtibûn û her yekî sê kulm nokên biraştî didane wan ji bo girtina her kevokeke namebir. Hindik mabû qira kevokan jî bianiyana. Xeber di cih de gîhabû waliyê Şamê Ehmed paşa Hacî Kîray. Wî paşayî hema di cih de girtina kevokan qedexe kir. Lê me bihîst ku êdî kevok ji bo wî bi xwe tene girtin<sup>1</sup>!

Roja din min û Alberto de Silva me karê xwe kir ku em bi karwanê berî li Helebê re herin. Ji ber ku li Şamê amadeyîyên çûna hecê dihatin kirin, karwanê me biçûk bû. Nêzîka sed deve û komek leşkerên ji bo parastina karwanê me li kêleka me û barayîkê dimeşîyan. Min jî du top şalê hicazî û sê tûr qehweya yemenî ji bazirganekî misrî kirîbûn û li piştê wî heywanê ecêb î pişt qop kiribû. Ez jî li piştê malê xwe li piştê deveyekî di siwar hatibûm. Alberto de Silva jî barekî ji guldank û çira û qedeh û bazin û gustîlên şûşeyî yên ku li Muranoya Venedîkê hatibûn sazîkirin, di nav pûş de di sindoqan de bi cih kirin û di gel xwe barkirin. Dema em derketin min zarokên sikakan dîtin ku hemîyan berê xwe dabûne ezmanê sayî û çavên xwe li refên kevokan digelandin. Min jî bêhemdî xwe berê xwe da jor û karwan bi rê ket.

\*\*\*

- *Oh mi amor Fernando, el hombre buen<sup>2</sup>*. Spas ji bo vê bêhnferehiya te. Ma ne tu bayî minê ev çîrokên xwe ji kê re bigotana? Xwedê tu ji min re şandî! Va seet bû yazde û em pê jî nehişîyan. Te dît bê dem çi nerm û zû diherike! Dem mar e mar! Bi te vede venede dişemite. Emê herin. Emê herin seraya Strünkede. Sebra te hebe em dikarin îşev jî biçin. Tûtina te hemî wê bê firotin. Kî dikare xwe li ber bigire û nekire! *No pensamientos<sup>3</sup>*.

Fernando mizek li qelûna xwe xist û mija dûyekî mîna telpek ewr bi ser xwe û Gustav xist. Li derve jî êdî mij mîna dûyê qelûna di devê lawirekî efsaneyî de tûrtir dibû. Mijeke payizî bû ku hişt êdî dêra nêzîk bi zor xuya bibe. Mijeke berevajî mijê bû. Mija mij be êvaran belav dibe û sibehan bi germiya rojê re û li ber tavîkê belav dibe. Lê ew mij! Hema ku dem ber bi nîvro ve diçû tûrtir dibû. Dengê nazîk ji weşandina pelên daran dihat. Xiştexîştê hin zarokan bû li derve li ser wan pelên zer û mor û ji her rengî ku hişk bûbûn û ji daran diweşîyan, dimeşîyan. Gustav jî her diaxivî weke ku peyvên wî jî pelin zer bin û ji dara hişê wî bêne weşandin. Bi destê xwe yê ku tilîkek jê qut bûbû, dûyê ku rûyê wî weşartibû dûr xist û ji dara xeyala wî pel wisa weşîyan:

Fernandoyê qenc! Min ji bîr kir ji te re bibêjim ku hevalê min î kalvenî Paulê firensî ji min re negotibû ku karê wî yê bingeîn girtin û nêçîra reşikan e. Wî negotibû min ku li wê koloniyê bazirganiya herî mezin ya koleyan e. Lê di şeveke sayî de ku tede stêrikin mezin li ezmanekî bêdawî diçirîsîn, ez û wî piştî ku me têr mey di enbara gemiyê de noşî bû li sekoya serê gemiyê rawestiyabûn û me li firefira ala sîpersor guhdarî dikir. Wî çîroka ticareta koleyan ji min re got. Ez bi rastî bibêjim! Ez hinekî dilteng bûm û min ev kar kirêt dît. Lê Paul ji vî alî û wî alî de hate min û ez dame fêmkirin ku kiniştêya me bi xwe jî rêya vê bazirganiyê rewa û durust dîtiye. Ev gelên reşîk gawir in û divê rastiya Mesîh nas bikin. Ew ne tenê gawir in lê gelekî gellekî nêzîkî heywanatan in jî. Weha paul dixwest ez karê bi wî girtin û nêçîra reşikan bipejirînim. Di rojên mayî de wî her li ser pereyên pirr ku bi qasî wan stêrikên li ezmên diçirîsîn bi dest mirov dikevin, diaxivî. Dîsa jî destpêkê min dil nebû ku tu carî wê ticaretê

<sup>1</sup> Di karwanan de mirov gelekî rastî rikeh û qefesên ku kevokên namebir di wan de ne tî. Karwan bêtî wan qefes û kevokan nîn in.

<sup>2</sup> Bi ispanîye: O hevalê min Fernando, mirovê qenc.

<sup>3</sup> Xeman nexwe. Bi zimanê ispanî.

bikim. Ez pêşiyê bi civandina diranên filan mijûl bûm. Çi niha serê te diêşînim Fernandoyê qenc! Bibûre ez xwe nagrim û hema tiştên beradayî jî dibêjim. Soza me ne wisa bû ne! Niha ezê kin bibirim û vegerim çîrokê. Hasilî, gemiya me piştî nêzîka du mehan ji rêwîtiya di nav oqyanosa Atlantîk a lajewerdî û ezmanekî şîn û pêlên berfîn de, nêzîkî kenarên bender û kela Großfriedrichsburgê li Ganayê bû.

Roj germ û tûj û hewa bi rewa bû. Ez bi xwe hatim ku bixeniqim. Bêhna min teng dibû û xwêdan heta gûzekên nigên min diherikî. Serê min bû dîza li ser êgir û hindik mabû bilqebilq bi mejiyê min biketa û bikeliya. Ew kenar çiqasî demûşî û mezeloq û şîrêzî bûn! Bendereke xweşik li raserî wê kela ciwan çêkiribûn. Bi dehan gemî li wir lûsiyabûn û li ser hemûyan jî wê ala sîpersor firefir dikir. Berî ku ez nigê xwe deynim ser bejayê çavên min bi çend kesên reş ketin. Rastî bibêjim ez cinoyî bûm û bi şûn de vegeyriyam û dîsa li gemiyê siwar bûm.

Paul keniya û got: Metirse hevalo! Me ev kovîyên daristanan kedî kirine, ew bê penc û diran in û te naxwin. Tu nabînî nigê hemûyan bi qeydan ve girêdayî ne!

Paşê min nas kir ku ew reşik ji bendera Akarayê hatine û alîkariya kompaniya BAAC ê dikin. Wê nîvroya germ reşikên tazî, ne tazî tazî bûn, me tenê navlingên wan nedidît, qetek caw li qûna xwe digerlandin û hew, piştî ku xwe bi dev de li ber lingên me avêtin erdê, rabûn û sîwan bi ser me de bilind kirin û bi bawêşînkên ji pelên daran, ba li me kirin. Diranên wan ên spî qîç dikirin. Çi diranên wan spî ne lo!

Ez sê rojan li wir mam, karê min maliştina xwêdana ku ez li ber xwe biribûm bû. Di jiyana xwe hemûyî de min rojên wisa germ û şilekî nedîtibûn. Di gel ku baran nedisekinî jî, germ û wexm bû. Hewayeke ecêb li wir heye. Ji xwe êvaran dengê zindaniyên reşik û qarewara wan nedihîşt ez binivim. Zarokên ku dê û bavên wan ji wan diqetandin û li gemiyan dikirin û berê wan didane Emerîkayê, bi carwara xwe guhên me qul dikirin. Çi qasî şîqeşîq û qajewaj dikirin lo! Di roja sêyem de Paul gote min: Gistav ku tu naxwazî biçî nêçîra reşikan, emê te bişînin nêçîra filan li rojhilatê koloniyê. Min çûna nêçîra filan hîlbijart û çûme wir û deh mehan xebitîm. Te fîl dîtine. Ooooo çî mezin in mezin. Her guhekî wan bi qasî wê perdeya han e. Xurtûmên wan ji xwe! Bêjim çi! Naşibihin tiştêkî lê hema bi qasî koka wê dara hanê ne. Stûn in stûn. Piştî wan deh mehan ez vegeyriyam. Û îcar karê rast dest pê kir. Hellilûya.

\*\*\*

Dema min destên wî zenciyê çavtirsîyayî, ewê ku ji bendera Takoradî ya li rojhilatê Großfriedrichsburgê bû, ku yekem reşik bû ez wî digrim, xistin kelebçeyan hevalê min bi tirs qêriya: nigê wî jî nigê wî jî. Min nizanîbû ku ew reşik dikare mîna kîvroşkan bireve û bi destên kelebçekirî xwe bifiliûne. Min qeydekî ku gokeke nêzîka deh pfundan giran pê ve bû xiste nîgekî wî jî û ez rabûm ser xwe. Hevalê min bi razîbûn li min nerî û got: ha wisa ha! Ma dest tenê?

Ewê zencî bi wan çavên tirsîyayî li tilîkên min dinerî û devê xwe yê mezin û kawik jihevmayî hiştibû. Ez keniyam û min ji hevalê xwe re got:

- binêre ev reşik çawa li tilîkên min dinere! Ez niha tilîkên xwe di çavên wî rakim û birjînim?

Min bi xwe henek dikirin lê hevalê min got:

- dîn nebe Gustav. Eger ev hov kor bibe em nikarin wî bi Hellerekî jî bifiroşin. Divê nêçîrên me saxlem bin yan na ew tu pereyî nakin. Gelek kole hene seqet in; yan çavekî wan nîne, yan destekî wan çolaq e, yan diranên wan ketî yan kurmî ne, yan jî hema eybek di wan de heye. Dikulin mesela! Ica evên wisa li aliyekî datînin û tev li yên saxlem nakin. Gelekî erzan in ew.

Min ji kerban re kefa destê xwe vekir û da ber rûyê wî reşikî û bi zimanê wî yê akanî gotê:

- tiliyên min pênc in pênc! Tu çi dijmêrî hey meymûn kurê meymûnan?

Ez çi bibînim Fernando! Hema diranên xwe di tilîka min î ku ew gustîla qaşsor tê de bû de çikandin û bi hêrs û hêza pilingekî birçî gez kir. Qirçînî ji movikên tilîkê anî. Tavi lê ew ji qurm de qut kir û tev li gustîlka nîrxbuha daqurtand. Tiliya min xwar lo! Ji êş û janê hindik mabû hiş ji serê min biçûya. Hevalê min bi min ve hat. Lê berê wî bi lez devê zenciyê har gem kir û paşê hat tilîka min bi bizrê dara Baobabê derman kir. Te ew dar ne dîtiye ne? Li Ispanyayê nîne ne wisa? Li vir jî nayê dîtin. Ew dareke mezin e. Me kulîlkên wê dikelandin û didan ser çermê ku ji ber şewqa rojê dişewitî. Bizrê wê jî ji birînan re baş e. Me navê wê darê kiribû Affenbaum. Yanî dara meymûnan. Meymûnên weke wî yê ku tiliya min qutkirî diçûne ser û berg û berên wê dixwarin.

Ez pir keribî bûbûm. Bi girtina zenciyê yekem re wisa were serê min? Bi neh zenciyên din re wê destên min bêtilî bimînin, û eger ez sedî bigrim ezê tev werim xwarin. Ev çi bela bû ez ketimê? Min ji xwe dipirsî! Ê ew gustîla min? Tu zanî! Tacirêkî ji Surînamê, hîn dema me fîl digirtin, deh taler dane min lê min nefiro! Dawî jî belaş kete zikê wî meymûnê han!

Tu zanî me çi kir jê? Divê cezayê wî giran be ne! Ma ne divabû em berê gustîlê ji zikê wî derxin paşê wî ceza bikin! Nojdarê bi me re dermanek bi zorê berda gewriya wî da ku verîşe û gustîlê bavêje. Meymûno nevereşîya. Nojdar rabû dermanekî ku nava wî bibe dayê. Em sê rojan, wek zarokê ku xwe bide bende qûna qazekê ji bo hêka wê, li bende qûna wî bûn û me hişt yekî reşik her carê bi darikan vîjika wî tev bide, bixe amanên qafikî û di bêjingên qulhûr re derbas bike. Lê gustîlk nebedî bûbû. Çare nema. Êdî me biryar da ku em zikê wî biqelêşin û binerin ka gustîl ketiye tiliya kîjan cinawirî di wî zikê genî de.

Sibehekê em rabûn. Jana tiliya min a qutbûyî kêmbûbû, lê destê min tev de tevizî bû. Tiliyên min nema diliviyân. Pûç bûbûn. Rehên ku xwîne diherikînin tiliyan miçiqî bûn. Destê min şeht bûbû. Nojdar digot ku wî hevî bi geza xwe re rehên livandina destê min tevizandine lê wê bi demê re wek berê bibe. Lê hweta niha jî wek berê nebû. Em heyirî mabûn! Em wî reşikî bikujin heqê wî pere ne. Wî nekujin jî gustîl buha ye! Dawî serkarê min î ku şiv ji destê wî nediket got ku gustîl ji wî buhatir e emê wî bikujin. Me ew reşikê laşxur serçok kir û berê lûleya tivingê da serê wî. Meymûno peyvek jî negot. Te digot qey em henekan dîkin yan bi wî re dilîzin. Wisa bêdeng û aram bû wek ku nizanibe mirin çiye? Gulleyek ji min bes bû ku serê wî biteqîne û termê wî li erdê ramedîne. Me ew gurand, zikê wî bi neştêrêkê qelaşt û bi bêvilên girtî em ji gewriya wî heta mîdeyê û roviyên zirav û qalind û heta ber zotika wî jî geriyan. Me şopa gustîlê nedît. Beta bûbû. Bi ku de çûbû kes nizane.

Fernandoyê ku bi baldarî û matmayîn li çîroka Gustav guhdarî dikir û ecêb mabû û nema dizanîbû ka ev rastî ne yan derew in, weke ku dilezîne da ku rabe çend mizên sivik û li pey hev li qelûna xwe xistin. Gustav matmayîna ku di çavên wî de diçirîsî xwend û berdewam kir: Ecêb nemîne, li wan welatan tiştên jê seyrîr jî rastî me û em rastî wan hatin. Êdî berî ku em rabin û yekî girtî kelebçe bikin me devê wî gem dikir. Hîn ji wan direviyan, wek tajî û pilingan bûn û em nedigihan wan. Di nav rêl û daristanan re direviyan û nedisekinîn. Me jî ji tîrsa marên mezin û piling û şêran newêrîbû xwe bida ser wan. Çi ehmeq bûn. Ma wê çi bibûya? Me ew digirtin û li gemiyan bar dikirin û dişandin Surînamê. Li wir di mezre`eyên neyşekeran de kar dikirin û pariyek nanê xwe dixwarin. Ma ne çêtir bû ji wê jiyana wan î weke ya meymûnan. Hê? Ma ne qencîr bû ji xwarina kurmîk û kêzikan. Hê? Ma ne rindîr bû ji lawir û cinawir û av agirî. Hê?

Êdî me togên hesînî ji bo gerdenên wan jî amade kirin. Hesinkarên ku bi me re hatibûn bi hezaran tog û qeyd û zincîr û gokên hesînî saz dikirin û nema di ber re digihan. Ewan togên gerdenan jî, ku çar bistên serçengelî û gazeke dirêj bi wan ve bûn, çêdikirin. Me ew tog dixistin stûyên reşikê ku em ji reva wan ditirsiyan. Êdî ku bireviyana jî li terhik û şaxên daran di`eliqîn û dîsa me ew digirtin. Me hinek digirtin jar û zêf bûn. Eger giraniya wan kêmbû sed û sî û pênc pfundî bûya em mecbûr dibûn ku wan qelewtir bikin. Mehekê tamam di zindanê de me alifê baş dida wan heta bi ruh dibûn û êdî nema parsûyên wan xuya dibûn. Îcar nû bazirganan ew dikirîn. Yan jî, ku dem hindik bûya, hema di gemiyan de, gemiyên ku mişt

kole bûn me ew bi xwarin dikirin. Heta ku digihîştin kenarên Surînamê êdî qelew dibûn û perê xwe heq dikirin. Erê ha! Karekî ne wisa hêsan e jî. Rast e qezenceke baş jê heye lê zorê û dijiwariyên vî karî jî hene Fernando! Hellilûya.

Hovên ku me ew digirtin me bi xêra peyvên pîroz yê Martin Luther yê ku di kitêba *De servo arbitrio*<sup>1</sup> de ne, ew dianîne ser rêya rast jî. Ew hemî putperes bûn. Iradeya xwe û Xwedê, yan jî iradeya wan pûtan û xwedê tev li hev kiribûn. Nizanîbûn ku tenê iradeyek heye ew jî iradeya ezêlî û pîroz ya xwedayê me yê rehmanî ye. Xwezî tenê xwedayekî wan hebûya jî! Hema çi bûya persetiya wî dikirin. Kullî, gumgumok, mar, roj, hîv, stêrik, ewr, teyrok, baran, teyrik, çiya, çem, keskesor, dar û ruhên bav û kalan jî!! Her qebîleyek xwedayekî wê hebû. Na bi Xwedê her malek xwedayek lê hebû. Ma mirov bûn ew! Hellilûya.

Binêre! Bi saya vî karê me yê ku zêr bi ser me de rijandin me razîkirina Xwedayê xwe yê rehmanî jî qezenc kir. Me ew mirovên hov û kovî anîne ser rêya Mesîh û ronahiya Încîla pîroz. Me tovên mizgîniya ruhên heyirî li wan welatên hovan belav kir. Keşeyên me ew û zarok û jinên wan di ava pîroz de dadikirin û navên paqij li wan dikirin. Navên mirovan me li wan dikir. Tu navê wan ên herêmî bibihîze tuyê ji kenan lal bibî. Erê ew dibûn kole, lê jiyanek paqij û ruhekî nû dikete bedenên wan<sup>2</sup>. Ew bextewer dibûn. Lê çi fêde hov bûn û haya wan ji wê bexteweriyê nebû. Jê direviyan ew hovên hov. Me berê wan dida rastiyê lê ew di pirika tewşî û çewtiyên xwe de diman. Ma koletiya wan ne fersendeke baş bû ji wan re? Koleyên gumgumakan bin baş e yan koleyên mirovên mîna me spîçerm û spîruh û spîcil bin! Û tew bi xêra me bibin peyrewên peyva Xwedê û kurê wî Mesîhê xelasker!

Fernandoyê ispanî, tûtinfiroşê katolîk qelûn ji devê xwe danî û bişirî. Li çavên Gustav yê ku dibirgîn nihêrî, desmaleke nedîtî ji qerf û tinaziyan li peyvên xwe pêça û bi hêdîka got:

- me jî berî du sed salî li Emerîka wisa kir. Me jî dîne xwe yê rast li wan welatan belav kir û ronahiya kiniştaya xwe gihande her derteng û kevî û perav û çiya û newalên wan hov û korên çermor li wê devera dûr. Niha jî em rastiya xwe dikin tûtîn û di qelûnên feldmarşalan de dişewtînin. Ha hema vê havînê, tu ne li vir bûyî, nodhezar serbazên firensî û heştê hezarên hêzên yekbûyî yê ingilîzan û hollandîyan û prusîyan bi şûr û tîving û topan bi hev ketin. Prens Eugenê te yê ku pişt li tirkên şikandibû û navê wî li ser her zimanî ye û te jî, tu dibêjî, di bin ala wî de şerê gawiran kiriye, niha dide pêşiya artêşên mezin û mesîhiyan dikuje. Tu qala kîjan rastiyê dikî hevalo? *El tabaco es la única verdad*<sup>3</sup>.

Û Fernando xelekên mijeke şînikî ji dûyê qelûna xwe çêkirin û berdan jor. Çavên Gustav ên ji wê axaftinê ferehbûyî, man li dû wan xelekan û nema deng jê hat.

Mija li derve, her ku dem ber bi nîvro ve diçû, tûrtir dibû. Awirên Gusatv jî weke wê mija tîr tev li xelekên dûyê ku bi ser wan ketibû dibûn û wî dûyî herdu ji ber çavên hevdu û ji ber çavên kesên li barê rûniştî vedişart.

<sup>1</sup> Di beşekî wê kitêbê de Martin Luther dibêje: Xwedê dikuje û Xwedê jiyanê jî dide, yekî dişîne dogehê û rêya vegera ji dogehê jî jêre vekirî dihêle. Wisa dilovaniya xwe ya ezêlî di bin xîşm û xezeba xwe de vedişêre, dadweriya xwe di bin zordariyê de dihêle. Li vir asteke bilind ji bawermendiyê raxistî ye: ji bo ku tu bawermend bî ku Xweda wî qasî rehmanî ye, lê hindik alîkarîyê dike û pir diazîrîne, divê tu vê yekê edalet bihesibînî. Mîna ku Erasmus dibêje: di serpehatiyên herî diltezîn de, bextewerî heye.

<sup>2</sup> Gelî koleyan, guh li xwediyên xwe bikin bi dilekî rast mîna ku hûn guh li Mesîh bi xwe dikin. Paulus, name ji bawermendên Efsusê re. 6. 5

<sup>3</sup> Bi ispanî: tûtîn tenê rastî ye.

- Oh Fernando. *Perdone mi buen español*<sup>1</sup>. Ka em dev ji katolîk û lûteriyan berdîn. Em venegerin şerê niha û yê sîsalan baştir e hevalo! Vê bihêle ji Xwedê û demê re. Ez behsa wê jiyana ecêb dikim. Guhdarî bike hindik maye temam bikim. Bibûre ne! bêhemdî min hefsarê van çîrokên ku ji hespan bezatir in ji destê min difilite û ji te re carnan qala tiştên nepêwîst û beradayî jî dikim.

Pîştî bêhnê Gustav rabû berê xwe da alî şûşeyan û şûşeyek meya sor ji qulikekê daxist. Pîrê<sup>2</sup> di nav ristina goreyên ku nîvco bûbûn re serê xwe rakir û gotê:

- mey buha bûye tu zanî! Heft sal şer dikarî rîxê jî buha bikin.

Gustav di ber kenekî re destê xwe xiste bêrîka qutikê xwe û sî û pênc heller derxistin û xistin destê pîrê û bi payedarîyeke sezayî tacîrekî koleyan got:

- pênc heller jî ji bo te pîra qenc. Hiriyê pê bikire û şaleke sê hirinan dirêj bo xwe birêse. Dîbêjin wê zivistana îsal sar be.

Û çavê xwe hilda jor, awirek li konikê pîrê xist. Pîrebokek tede bû û tayên xav û zirav û spî li mêşekê digerandin. Bêyî ku tiştêkî din bibêje, Gustavê dev li ken şûşe rakir û vegeriya maseya xwe. Qedeha li ber Fernando dagirt, ya xwe jî dagirt û dîsa dageriya nav çîrokan:

*De nada Fernando*<sup>3</sup>. Meyêke katalanî ye ji herêma Aragonê, navê wê: Anima Negra ye. Binêre; *buen Vino: realizados en Aragón*<sup>4</sup>. Ew jî weke te ye! Ne bi Habsborgiyan re ye ne jî bi Borboniyan re. Bi meynoşan û qelûnkêşan re ye û hew, hahahaha. Ji ber şerê van heft salên buhurî mey hinekî buhatir bûye lê xem nake. Tiştên qenc tim buhane. Di demên aştîyê de jî buha ne. Hellilûya. Dilê xwe negre ez henekan dikim ha. De ka were em meyê vexwin û qala xwe û keçîka reşik Liberta Negra bikim. Vê meyê û navê wê ew anî bîra min. Hîn heta navrojê dem heye. Te got çî?

Gustavê ku ne li hêviya bersiva Fernandoyê reben bû, ji berîkeke hundir ya qutikê xwe şûşeyek biçûk derxist û got:

- ev jî Rum e Fernandoyê qenc. Te Rum vexwariye bê guman. Li ba we jêre dibêjin Ron.

Û Gustav şûşe bilind kir û çîngînî ji piyala Fernando ya hîn li ser maseyê bû anî û got:

- Salut.

Û bi yek qurtê re dawî li şûşeyê anî û dîsa da nav daristana çîrokan:

Pîştî salekê kompaniya me bi hezaran zencî girtibûn û di oqyanosa Atlantîkê re şandibûn Emerîkayê. Bi dehhezaran taler qezenc kiribû wê kompaniya me. Helbet para me jî ne hindik bû. Em bi wan der û doran ketibûn û me ew reşik mîna gêzeran ji erdê radikirin. Me carekê gundekî reşikan dorpêç kir û gundî hemî girtin. Para min malbatek biçûk bû, bav û dê û çar zarok: Keçikeye şazdesalî û sê zarokên din di bin wê re bûn. Qîjewîja zarokên biçûk ez gelekî bînteng dikirim. Me di serî de dê û bav bi mora koletiyê dax kirin. Erê erê! Mora kompaniyaya me jî hebû. Me bistekî dirêj ku serê wî hesinekî gulover bû li ser agirekî disincirand û kole pê dax dikirin da ku ên me û ên kompaniyayên xeyrî me tev li hev nebin û eger yek ji ba me bireve jî em wî li ku bibînin nas bikin. Li ber gemiyan jî me ew mor dikirin.

<sup>1</sup> Bi ispanî ye: li min bibûre ispanîyê qenc!

<sup>2</sup> Rahibê ku wê êvarê rabûbû ser zikê Hedwigê, nema bela xwe jê vekiribû. Her dema ku kesên di dêrê de diçûn jor ku nimêja êvarê bikin û li ber qurbangehê kom dibûn û dest bi selewatan dikirin, rahib jî dadiket jêr û benikên bersînga Hedwigê bi lez vedikirin. Dibû uftekufta wî di nav selewatên nimêjkerên li ber qurbangehê û dengê orgelê de. Wê demê jî weke aniha, Hedwig demên xwe ên derveyî nimêjan û karê dêrê bi ristina goreyan dibuhurandin. Dest bi ristina goreyekê ji rahibê hevalê êvarên xwe yên lezzetdar re kiribû. Lê ew rahib mir û gore nîvco ma. Êşa ku rahibên qîz pê diketin di dêrê de bûbû webayek. Ji nişkêve zikê wan mezin dibû û di du sê mehan de dinepîxî heta ku digiha ber devê wan. Ew ji ber mezinbûna zikê xwe nediêşîyan, lê ji nişkêve termên wan dihatin dîtin. Pîştî ku rahibê yarîkê Hedwig mir, ew êş ji nav rahibên jin rabû.

<sup>3</sup> Bi ispanî ye: kerem bike Fernando.

<sup>4</sup> Bi ispanî ye: meya qenc: li Aragonê hatiye sazkirin.

Her gemiyekê moreke xwe ya taybet hebû. Me ew mor li ser goştê wan dixist û çizînî bi wî goştê reş diket. Têr mor dibûn. Hellilûya.

Min qala çî dikir? Malbateke ku bûbû para min ne? Erê erê. Îcar me paşê dê û bav bi hev ve girêdan û qeyd li dest û lingên wan û tog jî li stûyên wan gerand û di cih de li gemiyê kirin û ew transferî Surînamê kirin. Keçika wan a şazdesalî jî, ya ku dikira bireviya, me ew bi her sê birayên wê yên biçûk ve girêda. Birayek bi destê çepê ve, yek bi yê rastê ve û yê biçûk jî ku pênc salî bû me ew bi lingekî wê ve girêda. Ku em li gor qanûnên firenisyên ku ew jî mîna te katolîk in bimeşiyana me ê nikariba ew malbat ji hev veqetanda û teka tek bifirota. Ew dibêjin ji bo nîrxên mirovayetiye divê malbateke koleyan her bi hev re bimîne, ango dê û bav ji zarokan qut nebin! Lê çî me û firensiyên! Qanûnên me ên me ne û yên wan ên wan in. Erê Fernando yê qenc qanûn ji bo koleyan jî heye ma tu nizanî! Te qet navê **Code Noir**<sup>1</sup> nebihîstiye! Ew qanûna ne adil a ku dibêje divê kole û bazirganiya wan tenê di nava katolîkan de be! Bibûre Fernando, lê divê vê rastiye bibêjim: katolîk gelekî egoist in.

Em vegezin çîroka xwe. Ew keçika şazde salî wek pilingeke dirinde bû. Te bidîta tuyê bitirsîyayî. Xweşik û dirinde! Bejna wê rast, lihevhatî, lêvên wê dagirtî û çavên wê ji daristanekê tarîtir û tirsnahtir bûn. Heywaneke hov î xweşik bû. Koviyeke bû ew. Hellilûya.

Ez ji te venaşêrim Fernando! Dilê min bijiya wê keçika têrgoşt û lêvtopikî. Min ji serkarê xwe re got ku, ka ezê wê bikirim. Ew ecêb ma û got:

- tuyê çî bikî ji vê heywanê? Lewitî û gemarî! Tu li kû û ew li kû Gustav!

Dilê min êdî dibijiya goşt Fernando yê qenc. Goşt goşt. Kerekî jî du buharan dûrî mankeran bixe wê dîn bibe. Dirêj nekim, me gelekî da û stend. Dawiyê serkarê ser bi şefqe û dest bi şiv gote min ku, ez dikarim wê meymûnê ji bo salekê kirê bikim! Paşê ku kêfa min jêre hat emê peymanî kirêkirinê dirêj bikin. Min jî hema got bila be. Ê min ew bi şûşeyek mey û heftê hellerî ji bo salekê kirê kir û peymanî kirêkirinê ya bi dizî, ya ku tenê di navbera min û serkarê xwediyê şiva dirêj de bû, imze kir. Bes ew hêja bû deh şûşeyan jî ha! bi Mesîh ew hêjabû deh markên zêrîn yên Kölne jî! Hellilûya.

Şeva pêşî, êdî ew bûbû koleya min, ez çûm maxa ku ew û birayên xwe tede girêdayî û razayî bûn. Min xwe di ber wê de li ser pûş dirêj kir. Erê bêhna xwêdanê jê dihat lê bêhneke mê bû ku ez mest kirim. Her sê birayên wê yên pêve girêdayî ji girî û westabûnan mîna miriyan bûn. Min destê xwe avête memikên wê yên bel. Ew li ber tava rojê bûbûn weke du mangoyên stewiyayî û şêrîn. Li min rabû û min xwe di wê da. Ew jî ji xew rabû û ez har û hêç bûm. Ez bûme weke gabazekî ku li himber desmaleke sor û xwîna herikî hêrs bûye! Wê nedixwest birayên xwe aciz bike loma jî bêdeng ma lê rûyê xwe tîrş kiribû. Min di ronahiya hîvê de çavên wê yên kovî û dirinde wek du çêleşêran didîtin. Destê min daketin jê, li ser navîka wê geriyan û hatin di bin re li ser guroverîka qûna wê şemitîn û vegeziyan nav şeqên wê. Destê min di nav şeqên wê de wek ku li felqeyek Papaya rast bê, wisa nerm û helisî bû. Hat ku deng bi xwe bixîne û kir ku biqîre lê min di cî de desmalka xwe xiste devê wê û rabûm li ser sînga wê ya wek kakawê mîna siwarekî peyabûm. Bi uftekufta min re birayekî wê çavên xwe vekirin û çav li min ket. Lêvên wî ricifîn lê newêrîbû bigiriya. Min awirek tê veda heta çavên xwe girtin û min karê xwe bi lez qedand. Gava ku min sermemikên wê yên bel mijtin, tehma vanilla devê min tijî kir. Te vanilla tu caran tehm kiriye! Xweş bû Fernando xweş bûbû! Bi qedandinê re ahîniyeke wek orîna filekî bi min ket û herdu zarokên din jî rabûn, îca her sê bi hev re mîna ku di koralekê de bin giriyan. Xûşka wan jî, ya ku min navê wê kir Lîberta Negra, bi zimanê akanî û bi wî devê desmal tê de dikire birebire. Nizanim gelo bi wan re dixeyidî yan sixêf û dijûn ji min re digotin? Ma desmal ne di devê wê de bûya minê çî jê fêr bikira?

<sup>1</sup> Ji beşên **Code Noir** ku mîna destûrnameyeke têkiliya bi koleyan re bû:

- Zarokên ku ji koleyan ji dayik dibin, ew jî kole ne.
- Nabe ku koleyek bêyî destûra xwediyê xwe, çekan hilgire.
- Koleyê ku li xwediyê xwe yan li jin û zarokên xwediyê xwe bide, divê were bidarvekirin.
- Eger xwediyê koleyan bimre, ew jî mîna mîrasê wî tene parvekirin.

Ez rabûm û min desmal ji devê Liberta Negrayê kişand û xwe ji xwîna qîzaniya wê û avika xwe xwe paqij kir û weke serleşkerekî di şer de biserketî derketim derve û min bi kêf li hîveronê temaşe kir.

Hîva ku mîna tebiseyeke zîvîn li ser qedîfeyekî reş dixewinî, bi min re dikeniya. Mîna serxweşekî di wî ezmanê bi stêrikan xemilandî de mest bûbû û ber bi rojava de digindirî. Min pişikên xwe tijî bayê seherê yê safî kirin û vegeyriyam cihê xwe.

Siba din me hersê birayên wê vekirin û di nav giriyeke bêhawe nexweş re ew şandin benderê. Gemiyeke din li peravê bû dikira berê xwe bida girava Gorê. Gemiya zarokên kole bû ku şirketek nû ya şekir ew kiribûn. Ji wê nêçîrê sî taler ketin bêrika min û ew şêrereşa ku min ew wê şevê ji qîzanî xist jî bû para min.

Heftiya pêşî min û Liberta Negrayê me gelekî li ber hev dida. Ew razî nedibû. Hela tu bala xwe bidê! Ewa reşika gawir bi minê mesîhî û çermespî razî nabe! Ma ne ji ecêbên cîhanê ye ev yek. Ha?

Lê ku heftiyek derbas bû ew jî êdî teslîmî qedera xwe bû û stûyê xwe rada. Îcar min bi şev qeydên destên wê vedikirin, lê min goka hesinî di nigê wê de dihişt da ku nereve. Nema ew ji min ditirsiya û ez jî, ji te venaşêrim Fernandoyê qenc, bêyî wê nediçûm tu deveran. Piştî du sê mehan hinekî kedî bû û dê û bav û birayên xwe ji bîr kirin. Dikeniya û diranên wê yên spî wek kulîlkên Baobabê dixewinîn. Lê dîsa jî xemgîniyeke kûr û nenas di awirên wê de mabû. Gelek êvaran digiriya. Ez li ber wê radiwestiyam, min hêsirên wê dadimalan. Ji te venaşêrim Fernandoyê qenc, min jê hez kir. Min ew bi xwe re dibire her deverê. Min ew dibire nêçîra koleyan jî. Wê bi xwe keçik digirtin û destên wan dixistin qeydan, bi akanî bi wan re dipeyivî û kêfa wan dianî. Berî ku sala wê tamam bibe bi du mehan ez êdî jê têr bûbûm, nema sebra min lê dihat. Ji te venaşêrim Fernandoyê hêja, min yên ji wê xweşîktir û erzantir dîtin. Hin karkerên nû ji bajarên Emden û Sternberg û Dramburg û Berlînê hatibûn, dûrî jinên xwe ketibûn û divabû agirê hinavên xwe vemirînin. Min Liberta Negra da xebitandin. Şevêk razana pê re bi pênc helleran! Di wan du mehan de min sêsed heller qezenc kirin. Tu bawer dikî? Hellilûya.

Dema ku sala wê qediya, serkarê min ji Emerîkayê vegeyriyabû. Sibehê zû hate ba min û got:

- hayê te jê heye ku peyman îro diqede? Divê tu wê keçikê teslîmî min bikî.

Min Lîberta Negra anî û ew danî ser mêzînê. Di salekê de deh Pfund li xwe zêde kiribûn. Kêfa serkar gelekî hat. Destê xwe li guverîkên qûna wê gerandin, memikên wê guvaştin, devê wê vekir û li diranên wê nihêrî, destên xwe li parsûyên wê pelandin û çend carî tepin biçûk li newqa wê xistin û got:

- her tişt tamam e. Saxlem e.

Seet dwazdehê nîvro tamam min peymana teslîmkirina Lîberta Negra li ber dergehê kela Großfriedrichsburgê imze kir û qeyd xistin dest û nigên wê û piştî xwe da wê lezzeta reş.



## Seet dwazdeh

*Jama dêrê dwazde caran kire ringînî. Seet bûbû dwazdeyê nîvro. Wa diyar bû ku cimxarê dêrê wê kêlîka nîvroyê bextewer bû loma jî bi nermî û aramî li zengil dida. Awazeke diloan bû ew deng<sup>1</sup>. Ji bilî wan dwazde çingelingan jî gelek caran deng bi sê naqosên din jî ket di burcê naqosan de ku doza nimêjê li bawermendan dikirin. Xwendevanê ilahiyatê yê ji Münsterê deftera ku bi baldarî dixwend, bêdilê xwe anî hev û li hêviya bidawîhatina wê ringîniyê ma. Bi ringîniya dwazdeyan re bêhna wî fereh bû û dîsa li xwendina defterê vegeriya. Xirtepirtek ji odeya cîranê wî dihat lê wî guh nedayê. Çîrokên ku wî dest bi xwendina wan kiribû ew di çemê xeyalekî şêrîn û cadûker de werkiribûn. Defter li ser rûpela ku gihiştibûyê dîsa vekir û xwend:*

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Karlê ku navê wî, heta ew ortodoks bû Borislav bû, bi her ringîniyekê re bajarokê wî Karlofça û dêra wê û Branko Moravac necarê ku li ber destê wî fêrî hunera xeratiyê bûbû, dihate bîra wî. Taştêya xwe ku hinek penêrê bizinan î tev li sîrikê û hinek hingiv bû xwaribû û êdî çu derdekî wî yê giran nema bû. Loma jî bêhna xwe li kişandina werîsên naqosan fîreh kiribû û heta jê dihat ahengeke giran, aram û nazik ji her naqosekê derdixist. Di navbera xeratê navdar Branko û jamkutê nûhatî Borislav de têkiliyeke pir bi dizî li darketibû. Li xeratgeha Branko zêrzemînek hebû ku bûbû civangeha herdu yaran û xeratiya bedenên û lêdana zengilên şeweteke narewa û nebihîstî êvaran dest pê dikir. Wê nîvroyê jî Karl jî, ku wî deng bi naqosa hemûyan xistibû, xwe ji kat û demeke hingivîn re amade dikir.

**S**eet dwazdeyê nîvro bû. Karwanê me di bin taverrojeke tûj de dimeşîya. Xwêdan bi me ketibû û destê me ji kûzikên avê yên ku cawekî telîsî û şil li dora wan gerandî bû, dûr nediketin. Rojê mîna dotmîrekê kirasê xwe yê zêrîn bi ezmên re dixuşand. Germ bû. Lê bi nêzîkbûna me ji bajarê Humsê re hinekî hewa hênîk bû. Rojê kirasê xwe hilda û hinek ewrên tarî û rûtiş ezman nuxumandin. Ew germiya ku heyecaneke bêsinor li ruhê min gerandibû çû. Çipikên pêşîn ji baranê mîna ramûsanên evîndarekî şermîn bûn di yekemîn civana bi yarê re. Lê ji nişkê ve em ketin ber xezeba baraneke ecêb. Baraneke xurt ku gundê min Herne anî ber çavên min. Heta wir em kêfxweş bûn. Karwansalarê me got ku xaneke nêzîk di devê rêya me de heye emê kêlîkeke din xwe bigihîninê û tê de bihêwirin heta ev baran vedike. Hevalên me bi tecrube bûn, zanîbûn ku ew dever tim bi baran e loma jî seywan bi ser xwe û malê xwe da vegirtin. Ê min û hevalê min Alberto de Silva em bê seywan bûn. Ji nişkê ve gurmîneke sosret ji tavekê hat û ew kêlîk û karwan serobinê hev kirin. Ji tavan wêdetir ew mîna dengê topeke şer î giran bû. Deveyên me hêç bûn. Ku hemî bi hev ve ne girêdayî bûna, wê her deveyek bi deverekê de biteriqiya. Tevî wê jî ew deve bi yek derbê re çeng bûn û barê gelean hate xwarê. Carekê ez li pişt xwe zîvîrîm min dît wa hevalê min ê jar Alberto ketiye bin zikê deveyekî û wisa li hewa maye. Sendoqên barê wî jî pekiyabû dera hanê. Yek bi wî ve çû û deve aram kir û mexeland. Lê tişteke ji sendoqan bi selameti nefilitibû. Şûşeyên wî mîna xwê hûrhûrî bûbûn. Ez hîn ber dilê wî didim û dibêjim xem nake Xwedê kirî mal e ne can e, dengê ji pişt min hat û bi erebî got: El qehwe El qehwe ya xoce! Min tê derxist ku ew çê li barê min î qehweyê dike. Ez beziyamê lê çi bibînim! Her daneyek bi deverekê de pengizîye. Tu ji xwe re ji qesdî jî wisa bikî nabe! Çi bikim! Ne daneyek û ne du bûn ku bidim hev. Hema min ew wisa di nav pirrik û çirav û avê de hiştin û xwe gihande deveyê xwe. Di riya vegera cem deveyê xwe de ez li şaberûya xwe rast hatim. Ketibû nav pirrikê û şil bûbû. Nizanim çawa pengizî bû û firiya bû nav heriyê! Min ew bi dilovanî û tirs rakir, desmalek ji berîka xwe derxist û ew hinekî pê paqij kir û li berîka xwe vegerand. Wê rêjnebaranê çarîkekê dirêj nekir, lê tişteke di me û malê me de nehişt. Yekî helebî bi me re bû, henekê xwe bi hewayê Humsê kir û got: ev bajar welatekî ehmeqane ye, ew jî û xwezaya xwe jî ehmeq in. Gelek kes kenîyan, ê min heta min di rêya Alberto de Silva re fêhm kir ka bê çi hate gotin, êdî dema ken derbas bûbû.

Bi halekî xerab me xwe gihande wê xana di devê rê de. Baranê vekiribû û roj geştir û xweşiktir ji pişt ewran derketibû. Heçî kesê ku barê wî caw bû, li ser sekoyên di hewşa xanê de topên caw danîne ber tava rojê da ku zuha bibin. Me şevê li wir buhurand û min û Alberto de Silva me ji xwe re her yekî seywanek kirî. Seywanek ku dê nema bi kêrî me bihata di wê dojeha havîna şerqê de.

Li wê xana di rê de, li ber dengê xuşîna baranek xurt, min bi şev pê de ber dilê Alberto de Silva dida. Ew gelekî xemgîn bû. Çend caran destê xwe avête mandola xwe lê tu awaz pê re derneketin. Digot ku tacîrekî helebî çavreyî wî û malê wî ye. Ji hemûyî bêtir li ber guldankeke diket ku bi roj rengê bû û bi şev li ber ronîya mûm û çirayan rengêkî cihê distend. Alberto de Silva digot ku dê wê guldankê cihê xwe di heremlika paşayê Helebê de dîtiba û wî ê qezenceke baş ji firotina wê bi dest bixista.

Roja din bi destê sibê re, em li ser dengê hîrehîra hespan û borebora deveyan ji xew rabûn. Her kesek bi malê xwe daketibû û li ser piştê heywanan dişidand. Ku çavên min bi ezmên ketin, min bala xwe dayê ku yek ewr jî nemaye. Te digot qey ew barana ku ji nişkê ve bariya bû tenê ji bo ku wê rêwîtiya me li bin guhê hev bixe bariya bû. Ezmanekî şîn û çiksayî bû ku di bin de karwanê me bi rê ket û berê me kete Helebê.

\*\*\*

Dema ku ringîniya yekem a seet dwazde dest pê kir Gustav hêrs bû û di rûyê wî de nerazîbûn xuyabû. Xwest çîrokên xwe berdewam bike lê ringîniyê nedihîşt. Bi ringîniya dwazdemîn re got:

- Ohooo! Ev deng dê nehêle em çîrokên xwe temam bikin! Em gihabûn ku Fernandoyê hêja? Ji xwe tu li vê mijê! Seyr e ha! Ev ne mij e heyran. Ev gûyekî wek yê kûçikan spî ye. Hellilûya.

Û bêtî ku ji Fernandoyê bêdeng tu bersivê bibihîze, destê xwe dirêjî qutiya tûtînê kir, hinek tûtîn jê derxist û da ber pozê xwe û bi kûranî bîn kir. Şûşeya xwe ya Rumê a ku berî kêlîkekê bi yek gulpê re vala kiribû bi kerb avête binê maseyê û çerqînî jê anî. Qurtek mezin li meya xwe xist û hinekî riya xwe ya sorikî di bin çena xwe de bi çar tiliyên destê xwe yê çepê xurand. Fernandoyê ku li resamê xort dinêrî, tûtîna qelûna xwe nû kir û bêtî ku vêxîne got:

- tu bêje ez dibihîzim.

Û Gustav dewam kir:

Tûtîna te nîrxdar e ha! Malê Kûbayê ji bîna xwe diyar dibe. Gelekî baş xuyaye. Emê hemûyî bifroşin xeman nexwe. Em ghiştibûn ku lo? Hah. Hate bîra min! Min got ku min peymanî teslîmkirina Lîberta Negrayê imze kir. Erê min imze kir û ez bi hevalê xwe Paul re vegeyriyam karê xwe.

Keçik bêhesab bûn. Dilê te bibijîya kîjanê dibû ya te. Bi cotek sol re, bi şûşeyek mey re, bi guldankekê re, bi mistek qehwe re, bi du sê serî şekir re. Yek caran bi pfundek tûtîn re jî me dikaribû keçikek ji bo çendakî bi dest bixista. Carekê min keçikek ku ji gundekî nêzîkî kenarê rojavayê çemê Tano anîbûn bi qutiyeke zîvîn re guherî. A rast min qutiya xwe wek gerew û rehnî danî ba Paulê hevalê xwe û keçik heta heftiyekê, berî ku gemiya koleyan bigihê benderê, li ba min ma. Ew mîna şeveke sayî bû. goştê wê wisa nerm bû te digot hevrişimekî reş e. Ji lêvên wê yên tijî û qelew tim bêhna Kokosnussê<sup>1</sup> dihat. Ez dihatim ku wan herdu lêvan bixum. Ji xwe min lêva wê ya jêr carekê bi gezekê re qul jî kiribû. Hellilûya.

Bejna wê jî mîna dareke kakawê bû, gevera porê serî jî eynî mîna şaxên Ananasê gijikî û telaş telaşî bû. Lê şêrîn bû Fernando şêrîîn bû. Biçûkiya wê jî ew şêrintir kiribû. Welatê meyweyên xerîb e ew der Fernandoyê qenc! Navên wan jî mîna navên çiya û çem û darên wan xerîb in. Tu dizanî navê wê keçika lêv ji vanilla çi bû? Ganîma bû<sup>2</sup>! Hellilûya.

Û kenekî bi hêl dîsa kir û çavên xwe ên şîn û hûrik çend caran li ser hev kutkutandin, kuxikek nîvsextayî kuxiya, destê xwe di ser keçela serê xwe re bir û çîroka xwe dîsa herikand ber guhên Fernandoyê ku êdî qûna xwe li ser kursiyê dibir û dianî û bêzariya xwe şanî Gustav dîkir. Gustav guh neda wê îşareta wî û dewam kir:

Nizanim çawa sê salên min li wir qediyam. Ez dizanim ku êdî pere pir dibûn û min her tişt jî bîr kiribû. Tenê Krutata yê min jî bîra min nedîçû. Te ew dîtiba te ê bigota heqê te heye tu wî jî bîr nekî. Jîr bû, bîrbir û baqil û aram jî bû.

---

<sup>1</sup> Kokusnuss: gwîza Hindê.

<sup>2</sup> Ganîma û keçikên hevalên wê di rojeke xweş de li qeraxê çemê Tano bûn û daneyên zêr yên ku tev li zixur û şijikên çem bûn, didane hev. Di ber re jî stranên xwe ji Takûra re, xwedayê çem yê ku li gor efsaneyan mala wî li serê kaniya wî çemî bû, bi yek dengî distiran. Ganîmaya dwazde salî, rahiştibû amaneke textî û weke sêlekê vêlikî û carê di bin ava çem de dadikir û bi destê xwe di wê ava pirikî de ku ketibû amanê li daneyên zêr digeriya. Seet dwazdeyê nîvro jî nişkê ve çend siwarên spîçerm û ser bi şebqeyên fereh wek seywanan û derpî teng wek goreyan, bi tivingan girtin ser gund û rêya revê ji kesî re nema. Ganîmayê nû daneyek zêr dîtibû û kêfa wê gelekî xweş bûbû, lê bi wê êrîşa spîçerman ya ji xafil de re, bêhemdê xwe ew dane avêtibû devê xwe û daqurtandibû da ku ji ber çavan veşêre. Ku toga hesinî avêtibûn stûyê wê û keçikên hevalên wê jî, bala wê tenê li ser daneya wê ya zêr bû. Wê nizanîbû mesela wan togên hesinî çi ye. Û çima wan wisa dajon ber bi aliyê behrê ve! Li çend cihên ku lê sekinî bûn fersend nedîtibû ku di nav gûyê xwe de li daneya zêr bigere. Wê jî nema zanîbû bi kîjan gûyî re ew dane derket û çû! Ku bi bisteke serî pehn û sincirî kulêmek û bin milê wê ji alî piştê de dax kirin, hîn jî Ganîmayê nas nekiribû ku bûye koleya spîçerman.

Min ji te re qala segê xwe yê delal Krutata nekir ne? min ew ji Herne bi xwe re anîbû. Li Herne navê wî Abulan bû. Bavikên wî îtalî bûn. Xweşik bû mîna îqoneke katolîkan! Guhên wî pehn û dirêj û daliqiyayî. Pirça wî nerm û nazik, teriya wî jî mîna teriya simûreyekî têr pûrt bû. Jîrbûna wî di çavên wî yên safî de xuyabû. Ji bo ku xwe biyanî nebîne min navê wî guherî û kir Krutata. Navekî efrîqî û li gora wî bû. Di gemiyan de bi min re bû, di rav û nêçîran de bi min re bû û di bazaran de jî hevalê min î sozdar bû Krutata. Carekê bazirganekî xwest wî bikirre û dê sê kole li şûna wî bidana min lê min nefiro. Min deh kole xwestin û me li hev nekir. Sê kole çî bînirx bûn li ber wî segê min! Min ew fêr kiribû ku bêhna koleyên niyetpîs jî zanibe. Koleyê ku mebesta wî rev bûya, Krutata ew nas dikir, bi ser de dikire ewtîni. Ewtîniyeke ku dihişt kole di cihê xwe de were mîxkirin û newêribe gavekê tenê jî pêşde biçê. Lê ax Fernando ax. Xwezî min ew wê roja reş nebiriba nêçîrê. Bila wî zenciye hov ne tilîkek min lê destekî min ji kok de xwaribana.

Sibe zû bû. Mijek wek vê mijê xwe li herdu kenarên çemê Ankobrayê pêçabû. Me ji êvar de karê xwe û hewdana gundê li ser çem kiribû. Bi zelalbûna asoyan re me, em dora pêncî nêçîrvanên bi tiving û rim bûn, êrîş bire ser gund. Zarokên gund hîn di xew de bûn lê jin û mêr li qeraxa çem bûn û xwe amade dikirin ku dakevin çem û daneyên zêr berev bikin. Pêşî me zarok hemî girtin û li maleke ku banê wê ji pûş û şaxikên darên Baobabê bû komî ser hev kirin. Paul got ku, hûn herin mêran bigrin ezê bi tenê li ber zarokan bimînim. Me ew li wir hişt û em daketin nêçîra mezinan. Me nizanîbû ku ew jî çekdar in û dê li ber xwe bidin. Êdî ew hov jî fêrî şerê li dijî nêçîrvanan bûbûn. Ew bê tîr û kevan û rim nedîçûn destavekê jî. Ku di nav wê mijê de pêjna me kirin û qirpeqirpa simên hespên me bihîstin, mêran bi lez xwe gihandin daran û li ser şaxên wan bi cih bûn û tîr barandin me. Me nedixwest em wan bikujin. Loma me berê tivingan dida wî ezmanê mijgirtî û gulle li hewa berdidan. Lê a wan ne wisa bû, ew li kuştina me digeriyan. Di wê hayûhoyê de me çend jinên li kenarê çem mayî girtin û destên wan kelepçe kirin û ajotin devereke xewle û êmin. Mêrên li ser daran ku dîlgirtina jinan dîtîn bêtir hêrs bûn û tîr barandin me. Du sê heb ji me ketin. Krutatayê min jî li rex min bû û teriya xwe bi kêf dihejand. Tîrek wek brûskê nizamim ji kîjan darê hat û di simikê wî yê rastê yê pêşîn de çikiya. Krutata xwe gazeke bi hewa ve bilind kir. Ez bi lez pê ve çûm û min serê tîr jê kişand. Hema li wir min ew derman kir û xiste hemêza xwe. Wî kazekaz xwe nerawestand. Birîna wî xedar bû lê ez zêde jêre ne vala bûm. Dengê lawiran ji nav daran dihat. Li wî xaniyê ku zarok tede kombûyî jî qîjewîjeke kirêt dihate bihîstin. Bi rastî em veciniqî bûn û me kir û nekir ku ew reşik ji ser daran dakevin û teslîm bibin, daneketin û teslîm nebûn. Dawî me biryar da ku xwe li wan meymûnan bigrin û çî dibe bila bibe. Kûzekûza Krutata bû ji ber jana birîne. Ez jî bi wê janê dihisiam. Dilê min dihate hêran. Şerê me û wan zenciyan qederê du seetan dirêj kir. Lê dawî me ew mîna meyweyên stewiyayî çînîn. Û tev de, deh mêr û pazde jin û sî zarok li pê hev bi werîsekî gemiyan yê dirêj ve girêdan. Hinek ji wan reviyabûn û çend heb jî bi derbên tivingan re hatibûn kuştin û bi daran ve daliqiyayî mabûn. Me serên wan wek ananasan qut kirin û bi daran ve daliqandin û me termên wan hevalên xwe jî li piştê hespan kirin û ber bi Großfriedrichsburgê ve çûn.

Min bala xwe dayê ku Krutatayê min, hevalê min î wefadar deqe bi deqe li xwe dişikîne. Ne dixwar û ne vedixwar ne jî dilîzt. Hema kûzekûzeke mîna griyekî pê diket û birîna simikê xwe dialast. Roja çaran êdî hêz û tewana wî nemabû. Li erdê veket û bi çavên xwe yên tijî niyaz li min nihêrî. Nojdarê me ku birîna wî venêrî bi rûyekî tirş û hêvînemayî gote min: ew tîra ku lêketiye jehrdar bûye. Jehra marên daristana ye ev. Filitandina wî nîne. Ez dîn bûm Fernando dîn bûm. Ma min negote te ew hov in hov! Krutatayê min roja pêncan seet dwazde nîvro mir. Di hemêza min de û li ber îskeîska min mir. Min bi hêsrên xwe pûrta wî hemû şil kir. Bes xwezî min nas kiribûya kî bû ew reşikê ku ew tîra xedar lê xistibû! Min ê laşê wî ji gwîzeka nig heta paş stûyê wî bi şîşeke sorkirî dax kiribûya. Minê ew biselixanda û çermê wî yê qetranî tijî rîxa filan. Hov in hov.

Û Fernando bala xwe da du rondikên zelal ku ji çavên Gustav yên hûrik û ji dûyê qelûnê sorbûyî gindirîn û bi ser riya wî ya sorikî de hatin xwarê.

Gustav, desmaleke spîçolkî ji berîka derpiyê xwe yê xetxetî derxist û hêsirên xwe pê malîştin. Pişt re di keçela serê xwe yê xwêdangirtî da û dîsa desmal vegerande berîka xwe. Dengê kemanê êdî pir nizim bûbû. Kemanjenê xort xwest hinekî raweste, kevan ji ser têlan hilanî, çena xwe ji ser çendanka reş rakir û çavên xwe ên hûrik çep û rast gerandin wek ku li hêviya aferînan be. Gava ku dît kes guh nadê, bi destê xwe yê kevan têde pelikeke dî quliband û dest bi parçeya “Ey Îsayê Mesîh li me binêre” ji mûzîka hevalê xwe yê li bajarê Weimarê Johann Sebastian Bach, kir. Berê wî kemanjenî li Amsterdamê bû. Hevalê wî, Johann Sebastian Bach yê ku stêrka wî êdî li Weimarê bilind dibû, di nameyekê de jê xwestibû ku kemanekê ji kemanên Hendrik Jacobs jê re bikire. Hendrikê holendî miribû jî lê kemanên wî deng dabûn û mûzîkvanan ji Parîsê, Medrîdê û Berlînê û bajarên din berê xwe didane Amsterdamê da ku kemanên wî bikirrin. Kemanên Nicola Amti yê îtalî û şagirtê wî Antonio Stradivari jî gelekî bi nav û deng bûn lê ew li bakurê Îtalya bûn, dûr bûn û riya wan çep bû. Li Nürnbergê û deverin nêzik ên din jî kemanên baş hebûn lê ne bi başî û hêjabûna yê Hendrik Jacobs bûn. Ji kemanên wî melodîyeke efsaneyî dihat.

Ku wî kemanjenî ew parçe lîst, Fernando rabû ser xwe û berê xwe da derî bêtî ku tiştêkî bibêje. Li wê mija ku êdî bûbû keldûmana dîzeke mezin ku agirekî gurr di bin de vêketî be, bêdeng temaşe kir. Destê xwe yê çepê di ber bişkokên qutikê xwe re kir û hilmeke mezin li qelûnê xist û tavlê dûyekî mîna wê mijê tev li mijê kir û vejeriya kursiyê xwe. Gustav hinekî beşîşî, pê hisiya ku wî çîroka xwe gelekî dirêj kiriye û Fernando êdî bêzar bûye, rabû got:

Fernandoyê qenc! Delalê min. Bîna te fereh be baş e, vaye nêzik emê navrojê bixwin. Emê biçin. Emê tûtina te hemûyî bifroşin. Netirse hevalê delal! Me bi deh hezaran reşik firotin, em nikarin deh panzde pfund tûtina Kûbayê bifroşin!

Êdî çavên Gustav zuwa bûbûn lê hîn çîrokên wî neqediyabûn. Bêdengiya Fernando yê ku him fersend bi dest nediket biaxeve him jî nema dixwest tiştêkî bibêje, wêrîneke mezin dabûyê ku berdewam bike:

*Perdone usted por favor Fernando!*<sup>1</sup> Ez dizanim min dirêj kir û serê te gêj kir. Hindik maye. Hindik maye çîrokên min biqedin. Sebr baş e hevalê qenc. Ezê çûna xwe ya Surînamê ji te re vebêjim. Sefereke efsaneyî bû ew. Ma ne dibêjin ew dever dunyayeke nû ye? Cîhaneke din e? Bi Xwedê rast e. Cîhaneke nayê xeyalan. Xweziya nêzik bûya û her meh ez li wir bama.

Payîza sala ku tê de Friedrich bûbû qiral li Prusiyayê, berî heft salan bû. Nêzîka sê salên min li Efrîqayê qediya bûn. Segê min î delalî nû miribû. Ez xemgîn bûm. Dilê min û tiştêkî nema bû. Min sed reşik jî bikuştana heyfa Krutata nedihate hilanîn. Lê çi bikim, wisa bû.

Rewşa kompaniyê jî nema wek berê baş bû. Bi dehan kompaniyayê bazirganiyê çêbûbûn û em di ber re nedigihan. Gemiyên me ne bi qasî yê ingilîz û holendîyan bûn. Wan dest danîbû ser wê ticaretê û zora me biribûn. Dema ku nû ez çûbûm wir digotin ku kompaniya me duqatî li ya Royal African Company (RAC) kole li Emerîkayê difirotin, lê paşê! Firotina me kêmbû, me nema wek berê bi rihetî nêçîra wan reşikan dikir. Em diçûn kîjan gundî me didît berî me gund şewitandine û kole birine. Kal û pîr tenê li gundan mabûn. Ew meymûnên kal û pîrên perixî jî ne hêjayî kreuzerekî bûn. Ne ji kar re dibûn ne jî ji tiştêkî din re. Tenê hêjayî mirinê bûn. Ji xwe me hinek ji wan, ji kerban re, kuştin jî. Kompaniya me roj bi roj diherifî. Reqîbên wê xurt û gelek bûn. Ingilîz, portugalî û merivên te yê ispanî û firensî jî hatin wan welatan û bi hezaran kole ji ber me digirtin. Nakokiya li ser wan koleyên êdî hindik mabû cengên giran di navbera me de li dar bixîne. Ên herî qels dîsa em bûn. Çiqas rewşeke xirab bû Fernando! Lê ma em teslîm bûn? Na, em nebûn û me berê xwe da deverin dî ku hîn kesî wir nas nedikir. Lê dîsa jî rewş nebaş bûbû. Êdî kompanî ji hev diket, diherifî û têk diçû. Lê hîn bi yekcarî neherifî ye. Tu dizanî niha çima ez li vir im? Ez dixwazim li ser hesabê xwe şirketeke biçûk ava bikim. Ezê sed kesî bi xwe re bibim û wan li wir bidim xebitandin. Kesê ku bibe şîrikê min jî dikare bi pêncî talerî bibe şîrik. Her yek û bi qasî talerên xwe dibe şîrikê kar. Kompaniyaya me yekî bi du sed talerî dike şîrikê xwe, gelek e ne wisa? Tu bixwazî tu jî dikarî

<sup>1</sup> Ji kerema xwe bibûre Fernando. Bi ispanî ye.

hinek taler deynî. Hema bîst û pênc taleran deyne û bibe şîrkê vî karê sûdwer. Bawer bike reşîkek li Emerîkayê bi dehan taler tê firotin. Malê te qenc be peran dike Fernando! Emê reşîkên ciwan û xurt û dirêj tenê bigrin û hema li cihê cih bifroşin. Ne hewce ye em wan bigihînin kenarên Emerîkayê. Kî kirîdar be ne derdê me ye, bila inglîz bin, holendî bin, swêdî û portugalî bin, firensî bin. Polonî bin. Dixwazî bila osamnîyên gawir bi xwe jî bin, kî pera bêtir bide wê kole para wî bin. Pişt re emê gemiyekê duduyan jî bikirin yan kirê bikin. Emê ticareta xwe vejînin. Emê wan daristanan û kenarên çeman û gundên malpûşî jî reşikan vala bikin û berê wan bidin Surînamê. Dostên min li Surînamê hene. Hema li benderê ezê reşîkên xwe bifiroşim û li şûna wan pembo û meywe û şeker û şeraba Rumê bistînim û werim Ewropayê bifiroşim. Tu dizanî! Di du salan de emê vê herêmê bikin qiralîteyeke mezin. Emê bibin qiralîteyeke mezin, meziiiin. Ka bihêle ez ji te re behsa çûna xwe ya Surînamê bikim. Em bi gemiyeke şirketa me çûn. Gemîyê pir dilezand. Hûtên mezin û semasiyên diranqîç jî gemî dorpêç kiribûn. Wek ku gemîyê dilezand wan jî dilezand. Serên xwe ji nav ava kûr û şor derdixistin û devên xwe yên mîna şikeftên tijî şûr vedikirin. Me ew reşîkên ku jar û zêf bûn û êdî bi kêrî firotinê nedihatîn ji jor davêtin nav pêlên oqyanosê. Yê ku rasterast neketiba wan devên vekirî hinekî bin-av dibû, lê bi lez semasiyan êrîştî wî dikirin û qerteke mezin li newqa wî dixistin. Me qirçîniya parsûyên wan ji wê jêrê de dibihîst. Ez geh li ba qebûdanê gemiyê bûm min li bakurnasê dinêrî, geh jî ez li enbara binê bûm. Êdî nema sebra min dihat ku gemiya me bigihê bendera Paramaribo û em wî barê reş bifroşin.

Rê dirêj bû. Me sebra xwe bi lîstika skembîlan, zaran, nêçîra masiyan bi şewk û çengelan. Gelek caran ez û Paul di paşîya gemiyê de rûdiniştin û me ji xwe re di ber kişnadina tûtina di serê emzîkên dirêj de li asoyên dûr dinêrî. Komên reşikan yên ku nigên wan di qeydên hesinî de bûn jî, bi awazîn xemgîn sekkanên darînî li avê dixistin û leza gemiyê bêtir dikirin. Enbara jêr, ya ku reşîk têde girêdayî bûn tijî bû. Bîna xwêdanê wan hewayê enbarê genî kiribû. Sêsed û sî û sê reşîkên nêçîrbûyî di rêya nevegerê de bûn. Yekî reşîk î por spî û kinik dîzeke mezin ku bi benekî bi stûyê wî ve hilawestî bû li ser wan reşikan digeriya. Çemçikeke textîn her carê di binê dîzê dadikir û ku dihat ber yekî, ew çemçika tijî lebîxe radida devê wî. Ji ba wî jî bi lez berê xwe dida yekî din û hemî bi xwarin dikirin. Ji lez û bezê nedigihî li ber wan reşikan raweste û çemçika tijî lebîxe rade devên wan, hema çemçik li devê wan dixist û her yek û şensê xwe. Kesî ji reşikan newêrîbû dora devê xwe paqij bike. Yê jêhatîbûya bi lez zimanê xwe dirêjî lebîxeya li dora lêvan dikir û dikişande devê xwe û dadiqurtand. Xwas, tazî û tirsîyayî berê wan reşikan li rojavayekî nenas û dûr bû.

Kêfa min ji wî reşîkê ku dîz di stûyê wî de bû re nedihat. Carekê di dema xwarinbelavkirinê de min baang kirê. Ez li jor li keviyê devê enbarê rawestiyabûm. Ew bi lez hat rastî devê enbarê û li wê jêrê serê xwe ji min re berhêr kir û xwe tewand û bi çavîn ku oqyanosek tirs tê de pêl dida li solên min yên di ser serê wî re dibiriqîn nihêrî. Paul û hevalekî min î din li rex min rawestîya bûn. Paul ji xwe re bi pirça kûçîkê xwe dilîst û carê qetek goşt dixiste devê wî. Min ji wî reşîkê ku navê wî Kofî bû re bi zimanê akanî got: ka devê xwe veke. Kofî devê xwe yê koxikî vekir û kenekî tehl resim kir. Min serê sola xwe heta ber lêvên wî yên stûr anî û gotê: de ka îcar bialêse. Kofî zimanê xwe yê dirêj di ser sola min re bir û anî, min ya din jî nêzîkî devê wî kir. Ew jî wisa heta ku cotsolên min di bin şewqa rojê de çirisîn. Min qetek papaya ji berîkeke xwe derxist û hepişand devê Kofî yê koxikî û bi razîbûn gotê: de here. Mala te ava be. Te sol biriqandin.

Hevalê min î bi Paul reku nebûbû du sê mehên wî ji Berlînê hatibû li wê kiryarê mat ma lê dengê xwe nekir. Min jê fêm kir ku dîza pirsan di serê wî de tijî bûye, dikele û difûre. Ez kenîyam û min destê xwe avête ser milê wî û gotê: hemwelatîyê min î qenc. Ev kalê han ji gundê Kumasîyê bû. Min bi destê xwe ew nêçîr kir û kedî kir. Ew pispor e ha! Reşîkên nexweş û li ber mirinê nas dike. Eger ku yekî wisa dibîne tê di cî de xeberê dide min, ez jî ferman dikim ku wan rihet bike. Gotina rihet di navbera min û wî de bûye şîfre. Ew jî vê şîfreyê baş fêm dike. Kofî diçe wî kesê nexweş ji nav reşîkên girêdayî derdixe û bi derbekê re davêje devê semasiyekî. Nîşandar e jî ha! Hîn yek jî navêtiye derveyî devê semasîyan.

Wî reşikê kal ew kole hemû bi xwarin dikirin. Di deqakê de bîst bi xwarin dikirin. Kesî birçî di gemiya me de nedima. Me ew qelew û têt gihandin benderê û li wir, hema di gemiyê de me hemû firotin. Dostekî min î ingilîz hebû navê wî Georg bû, xwediyê fabrîkeyek şeker bû. Te hezar reşik jî jê re biribana wê kirîbana. Pere pirr e û kar pirr e, ma çima wê nekire! Erê fernandoyê qenc. Di wê rêwîtiyê de min bi tena xwe du sed taler qezenc kirin. De îca tu bi xwe bihesibîne. Te jî tûtîn ji xwe re kiriye mal û pê ticaretê dikî. Ne xebera te ye ha. Bawer bike ticareta koleyan a herî baş û rihet e. Hellilûya.

Di nav vê axaftina dirêj re, ku êdî kef bi devê wî xistibû, Gusav çend qurtên mezin li meya xwe xistibûn. Ku qedeha xwe gihande binî, ya li ber hevalê xwe jî rahiştê û bi yekcarî bera gewriya xwe da. Kefa ku bi devê wî diket dipekiya nav çavên Fernando jî. Dengê wî êdî bilind bûbû. Lê wî serê xwe danî ser zendên xwe yên li ser maseyê û kete xeweke giran. Kemanjenê ji Mühlhausenê keman ji destê xwe danî û di cihê xwe de sar bû. Kalê ku kitêb dixwend, perîkeke tawisan xiste ber rûpelê ku gihabûyê û kitêb ji destê xwe bi hêdîka li ser maseyê danî. Ressamê ku firçeya xwe li cawê spî dixist, stûyê xwe bi alî maseya Gustav de bada û bi rûyekî tîrş û westiyayî firçeya xwe di nav boyaxê de hişt<sup>1</sup> xwe hinekî veparimand. Hin kes bi dengê Gustav î bilind re ji jor daketin û di rûyê wan de pîrs mîna pêlên mijê di ser hev re diqulibîn. Lê hemî jî bêdeng rûniştin û her yek ji wan li hêviya navrojê ma. Tenê pîra li ber agirdankê wek xwe ma. Wê pîjên xwe ji dest xwe dananîn û guh li tiştêkî nekir. Serê wê her di ber wê de bû wek ku tu dengî nabihîze. Li jor jî, raserî maseya Fernando û Gustavê ku serê xwe danîbû ser zendê xwe, pîrebokê kefenekî nermik û spî li bedena mêşekê dipêça.

\*\*\*

Di ser xewa Gustav re çarîkek derbas bû nebû qerînek pê ket. Du sê caran li ser hev got: Kofî Kofî. Lê her serê wî li ser zendên wî bû.

Bi wê qêrîna ku wî di xew de bi dengêkî bilind kir re hemî kesên ku li rêwîxaneyê bûn û navroj dixwarin kevçiyên xwe danîn û li Fernandoyê ispanî yê matmayî nihêrîn. Fernando jî, mîna yekî ku bibêje ma çî min û qêrîna yekî di xew de? Çima hûn li min dinêrin? Û bi qelûna di destê xwe de îşaretî Gustav kir, pê re jî destê xwe yê din da milekî Gustav û ew hejand. Tawilê Gustav serê xwe ji ser zendên xwe rakir û bi kerb li rûyê Fernando temaşe kir. Devê wî ji hev ma, çavên wî bel bûn û got:

- Kofî! Tu li vir li çi digêrî?

Fernando keniya, mizek li qelûnê xist û di ber berdana dû re got:

- yan tu serxweş î, yan jî hîn tu di xewneke xwe de mayî. Kofî kiye? Ez Fernando me. Fernandoyê ispanî. Bi gotina te Fernandoyê qenc!

Gustav hinekî çavên xwe firkandin. Riya xwe ya sorikî carekê du caran xurand. Destê xwe da serê xwe yê nîvkeçel û li dora xwe, bêtî ku awirên xwe bavêje tu aliyan, nerî û rabû berê xwe da tuwaletê. Li wir Lîberta Negra hate bîra wî. Ew piştî çûna Efriqayê û kîrîna wê keçikê, her cara ku nîvê xwe yê jêr li serşokekê yan li tuwaletêkê tazî bidîta Lîberta Negra dihate ber çavên wî. Ranên wê yên qelew û stûr, qûna wê ya topikî û bel, navşeqên wê yên germ û şil û tepikî û ew herdu lêvên mor û gupikî dibûne şîrikê rûniştina wî ya bi tenê û xeyalê wî yê tî.

<sup>1</sup> Ewî ressamî ji sibê de bircê dêrê yê ku her seetekê naqosa wî lêdida resim dikir. Naqos ji sifirê zerî zêrîn bû lê qatekî tenik ji zingara kesk li kenaran bû ew ressam heyirandibû. Wî dikir û nedikir ew reng pêre dernediket. Wî rengê zer û şîn tev li hev dikir ku rengê kesk î nêzikî rengê zengê peyda bike lê nedibû. Bircê dêrê û kevokên ku li keviyan danîbû zêde ciwan pêre derketibûn, lê derdê wî mabû ew naqosa xwedîya wî rengê bêcîr.

Mey û Ruma ku di hinavê wî de tev li hev bûbûn wê nîvroya han, wêneyê Lîberta Negrayê zindî û xweşîktir dikirin. Gustav her ku ew dîmen vedigerand ber çavên xwe li xwe xweş dianî.

Dema firavînê bû. Masiyê biraştî, hinek şînkayî, çend kirtik penêr, şorba kumikan û meya sor li ser maseya her yekî ji wan bû. Kesên ku li hêwana rêwîxaneyê rûniştibûn dest avêtin kevçiyên xwe û dest bi firavîna xwe kirine. Tenê kalê ku kitêbek dixwend serê xwe ji ser rûpelên ku wî ew nermik nermik diqulibandin ranekir. Fernando de la Mara jî, qelûna xwe li ser maseyê danî û dest bi xwarina şorbeyê kir. Çoçikek darînî û biçûk û hebekî kûr di binê zerika xwe da dikir û di ber re jî li mija ku li derve pêl dida û her der dipêça û derbasî rêwîxaneyê jî dibû, dinerî.

Di wê navê re du sê axînen kurt û dawî jî axîneke dirêj mîna ku yek sekeratan dike hatin bihîstin. Kevçî û çemçik û çetelên hemiyan li ber devên wan sekinîn û tevan guhên xwe miç kirin. Li hev nerîn weke ku ji hevdu bipirsin: ma ev çi axîn in gelo!

Dilopên tirseke mezeloqî dawerivîn dilê Fernando. Ji bo ku ew peşkên tîrsa ku bi dilê wî ve zeliqî bûn zuha bike, ji xwe re got: ev Gustav e, hingî ku vexwariye û tevlihev kiriye dest bi verîşandinê kiriye. Da ku dilê xwe bixe cih jî rabû berê xwe da tuwaletê û li ber derî rawestiya û bi dengê şîrêzî û nizim bang kir:

- Gustav çi bi te hat? Seet bû yekê nîvro, hemû firavînê dixun tu hîn li vir î!

Bêyî ku Gustav deng ji xwe bîne hema derî vekir û bi rûyekî beşîşî gustîlek bilind kir, da ber rûyê Fernando û got:

- min gustîla xwe dît?
- Gustîl?

Fernando bi çavî ku kîvark û kumikên pirsan têde hilpekiyan li rûyê Gustav î beşîşî temaşê kir û pozê xwe girt.

- erê gustîl. Ma min negote te ku yekî zencî tiliya min tev li gustîlkê daqurtandibû û destê min pûç kir!
- Haaa! Hate bîra min. Te li ku dît?

Gustav gustîl di pantelonê xwe da, paqij kir û xiste berîkeke xwe. Destê xwe ji avîka şîravî du sê caran dawêşand û bi qutikê xwe zuha kir. Keniya û got:

- Ezê ji te re bibêjim. Bêhna xwe fereh bike Fernandoyê qenc.

\*\*\*



**Danê nîvro**

## Seet yek

*Ringîniyeke sêwî lê xurt ji zengilê dêrê hat. Seet bûbû yekê nîvro<sup>1</sup>.*

*Xirecira dema navrojê ya li jêr, nedigiha guhên xwendevanê ilahiyatê yê li jor. Ew ringîniya sêwî û tekane û xurt î ku kevokên li serê bircê dêrê venîştîbûn firandin jî negihayê. Êdî defterên Martîn û çîrokên di wan de mîna pîrepindan ew dabûne ber teşîya xwe û tayên xav û zirav li xeyalê wî yê mîna mêşeke jidesthilanînketî, dipêçan. Wî bala xwe dayê ku balîfa bin serê wî ji perîkan e, perîkekê xwe dadabû nav qelşên kêlên kenarekî wê balîfa bi tayên sor dirûtî û bi hîzarekî sor î qurmizî rûkirî bû û rêşiyên spî bi hostayî li çar kenaran zîvirîbûn. Wê perîkê mîna zindaniyekî ku dixwaze bireve dixwest ji nav refê wan perîkên ku bûbûn dîlê hinavê balîfê derkeve qadên azadiyê. Lê ew di qelşê de asê mabû û tenê zîxik bi qasî nîv tiliyekê derketibû derve û serê perîka spî di hinavê balîfê de mabû. Balîfa ku bûbû zindana perîkan, çivîkên xeyalê wî xwendevanî azad kirin û firandin asoyên rojhilat. Wî destê xwe dirêjî wê perîkê kir, bi zîxika tûj û zelal girt û ew hêdî kişand û rizgar kir. Wî dît ku ew perîka qazekê ye. Perîka qazan xuyaye. Wî ji xwe re got û ew perîka azadbûyî sirgûnî nav rûpelên defterê kir. Hinekî bêhna xwe berda û dîsa xwendina xwe berdewam kir:*

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Karlê ku navê wî berî bibe lûterî Borislav bû, ew ringîniya xurt ji zengilê dêrê anî û dakete zêrzmîna ku deh cêrên meya kevnare têde rêzkirîbûn û bîna kifîkê ji dîwarên wê dihat. Zêrzmîn sar bû û da ku ew xwe germ bike bêgav mabû ku du sê tas meya sor bifirîne berî ku ministrantê sêzdesalî Georg xwe bigihîne wî. Georg lawikekî sêwî bû û ji dehsaliya xwe de bûbû ministrantê dêrê. Roja ku nû hatibû dêrê Karlê ji Sirbistanê çavên xwe berdabûnê û dilê xwe bijandibûyê û gelekî li dorê çûbû û hatibû heta ew gêrî xefka xwe kiribû. Ji bo kêlîkên xwe yên lezzeta bi wî re jî rojê deh heller didanê. Yanî meha wî digihande sê taleran. Vê dawiyê gelekî kêr didayê, yek caran heftiyek diçû bêtî ku yek hellerî jî bide. Her ku zengilê dêrê bi wê xurtiyê seet yek lêdiket, Georg fêr dikir ku bûye dema wî û jamkutê qut î gurover û hemahengiya herdu bedenên. Georg ji alî nimêjgehê dihat û dadiket zêrzmînê û seetek bi meya sor û ganbaziye bi Karl re dibuhurand. Georg tenik î terlan bû. Bi heyecan û destin lerizî Karl berê wî dida cêrekî meyê û girêka navbenda wî vediresand û kirasê wî yê sor hildida. Derpî jê dişemitand û zengilê ganbaziya herdu bedenên dest pê dikir û ew zêrzmîn tijî ringînî dikir. Her wê seeta nîvro yê ew ringîniya şewetê bû.

**B**er êvarî, berî ku roj here ava, ji dûr ve avahiyek bilind li ser girekî xuya kir. Alberto bi kêf got: ev Heleb e. Ha waye kela wê xuya dike.

Alberto bûyera firax û sênîyên xwe ên bellorî ji bîr kiribûn loma jî wê kêfê perîkên xwe di rûyê wî dan û aramiyeke sezayî rêwiyekî ku digihîje armanca xwe di çavên wî de resim kir. Destê xwe avête mandolê û tingeting ji têlan anî û tavilê ji zengeloka wî straneke nazik û nerm herikî. Min ew kêfa wî bêwate dît lê dîsa jî min xwe ji wî alî nekir, min jî kêfxweşiya xwe diyar kir di gel ku min nizanîbû li wî bajarî qederê çi ji min re amade kiriye!! Berê min li cîhaneke nenas û jiyanekê nenas bû û dilê min ji pela darekê di rojê bahoşdar de bêtir diricifî. Tîrsa min mezin bû lê hêviya min î ku ezê kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* bibînim yan jî rastî kesekî ku ew ji ber kiribe werim û wê ji devê wî bigrim, dihişt ku tîrsa min nemîne<sup>1</sup>.

Bayê hênîk ku ji aliyê deştên rojava dihat, xewa min anî. Em ji hal de ketibûn. Cara yekem bû di jiyana min de ku wî qasî di bin tava rojê de dimeşiyam. Rojên welatên me mîna dizan in. Ji pişt ewran derdikevin, te hîn negotiye wa roj derket, te dît careke din kete pişt ewran. Lê li vî welatî roj desthilatdar e. Sultan e. Roj bêtirî şeş mehan şaha xwezayê ye.

Xewa min dihat û min ne zar nas dikir ne jî şar nas dikir. Hevalê min Alberto de Silvayê ku berî kêlîyekê kêf dikir û distira, hinekî xemgîniya wî lê vegeriya. Tingetînga xwe rawestand û berê xwe da min û got ku, divê ez jî odeyekê li rex wî ji xwe re li xanê ji bo demeke dirêj kirê bikim. Wisa hem erzantir e hem jî navnîşaneke min a naskirî çêdibe û qunsulxaneyên Ewropayê kengî bixwazin dikarin xwe bigihînin min û alîkariya min bikin û emê sebra hev bînin. Gotina qunsulxane kêfa min anî, hinekî tîrsa min a ji biyanistanê kêf kir, rabû min pirsî:

- qunsulxane li vî bajarî hene?
- Ev Heleb e Martîn! Bajarekî ku cîhanê bi hev ve girê dide, derziyeke ku şerqê bi xerbê ve didirû. Ma te çiyê vî bajarî dîtiye!
- Xanên wê jî mîna yên Şam û Ekkayê mezin in?
- Gotinek li van welatan heye dibêje ku, xan xanên Helebê, mizgeft yên Stenbolê û hemam jî hemamên Şamê ne. De ka em berê xwe bidin Xana Hokiyîdûnê berî ku şev bikeve erdê û Odebaşiyê xanê deriyan bigire.

Min ji axaftina Alberto tiştêk fêhm nekir. Hokiyîdûn çi xan e<sup>2</sup>! Odebaşî kî ye, û çima deriyan digire. Ma emê herin li kelehekê razin yan em dikevin zindanan!

Em çûne wê xanê. Xaneke xweşik bû, hinekî biçûk bû lê paqij xuya dikir. Bi rastî jî dema em gihanê me dît waye zirmirovekî qerase karê xwe û girtina deriyê qerase dike. Deriyê hesin yê hezar çîn û neqş li ser û bilind bi qasî bejna du rimên dwazde movikî zîqzîqek ecêb jê dihat. Li ber derî Alberto de Silva û wî mirovê qersae hinekî xeber dan û ji rûyê Alberto de Silvayê geş xuyabû ku wan li hev kir û her tişt baş meşiya.

<sup>1</sup> Hîn berî em bigihin Heleb yekî di karwanê me de got ku hin kor û hafiz li Helebê hene, li ber deriyên mizgeftan rûdin. Ew kor dikarin ji yekî re kitêbekê, hema çi be, ji serî heta dawîyê bixwînin.

Min bi gelek koran re dostanî danî. Bi rastî jî ew korin zîrek û zana bûn û haya wan ji gelek tiştan hebû, hemûyan Quran ji ber kiribû loma jî navê wan hafiz bû. Yekî ji wan gelekî bala min kişandibû navê wî Nûredîn bû. Yekî jî navê gelek kitêb ji ber kiribûn. Zanayekî kor bû ew.

<sup>2</sup> Hokiyîdûn: bi eremenî yanî mala rûhanî. Ew xaneke duqatî, biçûk ku hecacên ermenan di rêya çûna xwe ya Qudsê re lê dinivyan. Navê wê kirin Xana Ermenan, xana Qudsê jî lê Hokiyîdûn sezatirîn nav bû. Warekî bi rastî rûhanî bû. Pencereyên odeyên jor li ser hewşê fereh vekirî bûn, û yasemînan û avrêjekê ew der xemilandibûn. Êvaran ku xirecir kêf dibû, ew xan dibû mîna dêreke di koka çiyakî de, bêdeng û cihê ramandinê. Eger ku yek ji wir bi meşê berê xwe bide keleha Helebê, di deh deqeyan de dê li ber dergehê kelê be. Min di wê xanê de "rûhaniyeta" şerqê baş nas kir.

Wî kilîta odeya me hilgirt û bi rê de, li ser derenceyên ku diçûne jor gote min:

- Em gelekî bi şens in Martîn. Rebbê me alîkariya me kir. Binêre ku niha ne çaxê hecê bûya, me cihekî vala jî nedidît.
- Şensê çi Alberto!!
- Ev xan xana ku ermen tere derbas dibin û diçin Qudsê. Berî du sê rojan, Odebaşî dibêje, bi sedan hecacî li vir bûn û rê ji meşa kêzik û mûriyan re di xanê de nemabû. Ne tenê li vir lê li hemî taxên bajêr jî. Lê aniha xan valaye, çend bazirgan û gerrok û pîr û kalekî ermenan mane. Ew pîr û kal jî ji karwanê xwe mane û nexweş in wê li vir bin heta hevalên wan ji Qudsê vedigerin.

Odeyek li rex ya ku berê Alberto ji xwe re kirê kiribû bi dest min ket. Di wê xana tarî û bédeng de. Xaneke ker û lal bû wê êvarê û tenê her kêlîkekê kuxika kalekî û pitepita pîrekê dihat. Ji wê pêve me wê şevê tu deng nebihîstin. Ma xewê, xewa giran hişt em dengan bibihîzin!

Lê dengêkî şêrîn berbangê ez ji xew rakirim. Dengêkî zengilî ku min hîn yên wek wî nebihîstibû mîna pêlên nermik herikî guhê min û ez ji xew rabûm. Ew azan bû! Ji mizgefteke nêzîk bilind dibû. Cara yekem min azan li bajarê Tancayê bihîstibû, lê dengê kesê ku wê çaxê azan dida ne wê çendê xweş bû. Nizanim dibe ku nû bû û ez fêrî wî dengî nebûbûm. Ez ji nav nivînan derketim û rabû min berê xwe da derve. Li ber pencereya Alberto rawestiyam. Ne xema gunê wî bû jî. Te digot mirîye ne razayîye. Ji xwe ziyana xwe ji bîr kiribû. Wek ku çawa êvarê serê xwe li ser palgehê danîbû û li ser kêleka xwe ya rastê niviyabû, wisa jî heta destê sibê mabû.

\*\*\*

Heftiya pêşî li Helebê li wê xanê, ez her roj bi berbangê re li ser dengê azanê ji xew radibûm û di nivîna xwe de li qatê jor dirêj kirî dimam û min li azanê guhdarî dikir heta ku bi dawî dibû<sup>1</sup>. Xew li min diherimî û bêhna min teng dibû. Ne xema hevalê min bû, serê xwe datanî û dibû pixîniya wî. Piştî ku heftiyek derbas bû ez jî weke wî fêrî xirecirê, azanê, teqereqa li ber deriyê xanê û dengê şîrfiroşan jî bûm û êdî nema ji xew radibûm.

Ber nîvro, ez û Alberto derdiketin û li bajêr digeriyan. Xaniyên wê ên kevirî û sikakên teng û zaboqan bala min dikişand. Gulên cûrî, yasemîn û qerenfilan derûdor di bîrê de dihiştin. Ji bîna qerenfilan bêtir, qerebalixa xelkê bû. Ji her millet û her dîn û her welatî li wî bajarî hebûn. Kunemoz yan pêtageke hingiv bû û xulxula xelkê bû tede. Kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* jî mîna mêşeke hingiv di serê min de dikire vingînî. Min navê wê kitêbê li ser kaxezekê nivîsîbû û hema kîjanê ku bîna kitêban jê dihat rastî me bihata me ew kaxez dida ber pozê wî. Em di kolan û zaboqên teng û tarî re digindirîn û heta nêzîkî kelê diçûn û di qeyseriyan re dimeşîyan. Bîna sabûn û darçîn û zaferan û kemûn û gijnjî û hinneyê û dermanên ku di tûrikan de rêz kirî bûn, mirov mest dikir. Dengên bazirganên ku mal dikirîn û difirotin, qirpeqirpa simên qantir, hesp û keran li ser kevirên kolan mûzîkeke xweşik diherikandin guhan. Kebaba helebî jî bala me kişandibû. Heftiyê du caran ku dunya berêvarî hinekî hênîk dibû me diçû kebab dixwar. Ez ji gera li ser piyan di ber mizgeft û dêr û xanan re û li sûk û kolanên sergirtî û teng têr nedibûm. Ku ne ji tirsê derîgirtina xanê bûya ezê nivê şevê vegeyiyama xanê. Pîrê wê gerê ji bo bidestxistina wê kitêba hanê bû. Odebaşî, ku tarî diket erdê û çend stêrik xuyadibûn, derî digirtin û êdî nema ji bavê xwe re jî vedikir. Navê stêrikekê kiribû Quflil Xan, yanî kilîta xanê, hema ku çavên wî pê diketin, derî kilît dikir û nema êdî ba jî derbas dikir.

Alberto jî, ku ew ger bi min re dikir, digot:

---

<sup>1</sup> Pişt re ezê zanibim ku muezzinê mizgefta nêzîkî me, azana sibehê bi meqamê Nehawend digot. Azana nîvro bi meqamê Beyat, ya `esrê bi meqamê Seba, ya mexribê bi meqamê Rast yan Ecem, û ku dibû dema azana `eşayê, muezzinê me dengê xwe bi meqamê Hicaz re dikewkiband. Te digot stêrik û gerdûn tev de pêre azan didin.

- Martîn, kitêba tu lê digêrî nîne. Vaye ti bi guhê xwe dibihîzî ku ew xeyaleke. Ne hewceye tu vê çendê min û xwe biwestînî.

Lê min digotê ku bihesibîne em li gencîneyekê di bin erdê de digerin! Eger me dît, ji xwe em bextewer dibin, me nedît jî gera me ji me re dimîne.

Camêr bi min re, xan bi xan, kitêbxane bi kitêbxane, mizgeft bi mizgeft, dêr bi dêr, hucre bi hucre, medrese bi medrese û nasix bi nasix geriya. Me seh haf û werraqek, çi naskirî û çi nenas, nehişt ku em neçûne balê. Feqî û melayek nema ku me li deriyê wî neda. Lê wek ku tu li dilopek ava ku herikîbe deryayê bigerî! Me pêjna wê kitêbê nekir û şopa wê jî nedît. Belkî bîst rojan bêtir karê me ew bû lê bêhavlî bû. Gelek nasixan nusxeyên kitêba Teqwîm El Buldan ya Ebû- Elfida rê min didan û digotin ku ew hêjayî giraniya xwe zêr e! Lê minê çi bikira ji kitêbekê ku riyên welatan, kenarê behran û çiya û çeman bi te didin nasîn? Ez li kitêbekê digeriyam ku dê bextewerî bida nasîn û rîya bidestxistina bextewerîyeke ebedî bidaya ber min<sup>1</sup>.

Ez li kitêbên di refikan de ecêb dimam. Ewçend ciwan û lihevhatî, ewqase bi tertîb û guhdan datanîne berhev! Di çi ilmî de bûya kitêb hebûn, di kîjan mijarê de bûya kitêb hebûn. Ji xwe bêhnî hibra ku ji wan difûriya mirov serxweş dikirin. Te digot bi meyê nivîsandîne ew kitêb ne bi hibrê. Hemû jî bi xeta destan. Yek jî ne bi makîneya çapê bû. Ehlê şerqê makîneya çapê nas nedikirin.

Carekê, êvara îne bû, Alberto got ka were ez te bibim ba zanayekî helebî ku di mala xwe de, bi alîkariya çend nesixkeran, kitêban nesix dike. Dibe ku em xeberekê ji kitêba te ya tu lê digêrî bistîn. Me destûra odebaşiyê xwe stand. Ez bawer im ku Alberto hinek dirav xistin destê wî û ew bertîl kir. Dirav kevîran nerm dîkin û di nava osmaniyan de dikarin deroyê jina walî jî jê deynin.

Me berê xwe da taxeke nêzîkî kela Helebê. Dema em gihane mala wî zanayî li wê taxa teng û bi qendîlan ronîkirî, me dît çend nesixkar li dora hewdikê avê di nivê hewşê de kom bûne, li ser qeraxên hewdik tijî mûm kirine û li ber şewqa wan mûman kitêbeke desxet serrast dîkin. Min ji xwe re bi baldarî li wî dîmenê şerqî nerî. Sertliyên wan nasixan ku bi hibir bûn bala min kişand. Min texmîn kir ku ew ji nivîsînê vala nabin tiliyên xwe yên bi hibir bişn. Yekî bi dengê bilind kitêba ku dê nusxeyên wê rast bikirana dixwend, yê di guhdarî dikirin û li nusxeyên di nav destên xwe de dinêrîn, ku şasiyeke biçûk derbas dibû, di cih de û yekser rast dikirin û paşê ê ku dixwend, xwendina xwe berdewam dikir. Di ber xwendin û rastkirinê re jî hemûyan ava tuyan vedixwarin.

Piştî ku rastkirin qediya, xwediyê malê, ku dostekî Alberto bû ez bi mêvanên xwe ên nesixker dame naskirin. Min Nûredînê kor jî wê êvarê nas kir. Alberto tercumanê min bû di wê şevbuhêrka mişt bîna hibr û kaxezan û dengê sîrkesîrka qeleman. Dema ku wan nas kir ez li kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* digirim, devên hemûyan ji hev bûn û cênîkên xwe firkandin û çavên xwe hûrik kirin. Ê ku got ev kitêb tune, ê ku got min bihîstiyê li filan bajarî heye, ê ku got ezê di lîsteya kitêbxaneyê mizgefta mezin de bigerim. Ê ku got ev li cem rahibên suryanî tê dîtin û ê ku got na li ba marûniyan heye. Hindik mabû ji bo cihê peydabûna kitêbê bi hev biketana. Nûredînê kor hinekî di cihê xwe de qelqilî mîna ku tiştek li ba wî hebe yan cihê kitêbê bizanibe. Peyv li ser lêvên wî bûn lê dengê xwe nekir. Min jî tiştek ji wê xirecîrê bi dest nexist û em derengî şevê li xana xwe vegehiyan.

\*\*\*

<sup>1</sup> Min carekê nusxeyek ji wê kitêbê li ba tacîrekî esfehanî dît. Wî pêncî tûgraliyên zêr buhayê wê xwestin. Min hinekî li naveroka wê nihêrî; riyên dunyayê hemû tede hebûn. Ji Semerqendê heta Tancayê û tuxûbên Fîrensayê rê bi rê dabû nasîn. Ji min re hîç bûn ew agahî. Lê gelek gerokên ewropî hebûn ku bi rastî jî ew kitêb ji wan re pêwîst bû û rêberekî mezin bû.

Li xana Hokiýîdûnê, cihê ku bûbû mala min û Alberto, kalekî ermenî<sup>1</sup> navê wî Wanês û jina wî ya pîr Zara ji karwanê xwe mabûn û neçûbûn hecê. Herdû jî nexweş ketibûn û bela ku nikarîbûn herin Qudsê digiriyan. Kalê ermenî digot ev cara pêncan e ku ew û jina xwe tên. Çar caran xwe gihandibûn Qudsê û gundê ku Îsayê Mesîh lê jidayik bûbû, Bêtlehem ziyaret kiribûn. Lê vê carê ji ber nexweşiyê bêgav mabûn ku li xanê bimînin. Xizmên wan hemû çûbûn û ew li pey xwe hiştibûn. Wan jî digot emê vê havînê li vir bin heta hecacên Qudsê vedigerin da ku em bi wan re berê xwe bidin welatê xwe.

Hercar, piştî ku pêlek kuxika zuha Wanês zeft dikir wî bêhna xwe berdida. Hinekî bêdeng dima tavilê xemgîniyekê koça xwe li ser rûyê wî yê tijî qermîçek datanî û bi dengekî tehl û nizim digot:

- Min dixwest vê carê jî gora xwedayê me Îsayê Mesîh ziyaret bikim û êdî mirin li ser seran û çavan. Mirina min nêzîk e, ez vê dizanim. Di navbera min û gora min de çend gav mane. Xwedê ev bextewerî jî dabûya min êdî dikaribû ruhê min kengî bixwesta bistenda. Bextewerî nebû para min di dawiya vî temenî de<sup>2</sup>.

Bextewerî! Her kesek bi çavê xwe lê dinêre û rave dike. Kesî hîn ew nenasandiyê. Ma kê gotîye bextewerî çawaye, yan mirovê bextewer kiye? Min dilê xwe xweş dikir û digot ku ezê wê pirtûka ku bexteweriyê yan wek ku ereb dibêjin Seadetê dinasîne, peyda bikim û bi xwe re vegeirînim welatê xwe, wergerînim, şirove bikim û li ba qiral û kont û graf û mezinên ewropayê cihekî berz bidest bixînim ku tu kes berî min negihabê. Min ê bextewerî bi xwe re vegeiranda û wergeranda. Ji şerqê danasîna bexteweriyê, û li xerbê jî pêkanîna bexteweriyê! Û di navbera danasînê û pêkanînê de, qonaxa bi salan sefereke bi tehluke û kambax.

Ez hêdî hêdî fêrî zimanê erebî dibûm, lêvandina hin tûpan di gewriya min de dilikumî û zor bû. Wek ku dasiyek di zengeloka min de biçike min ew tûpên ecêb ku ji koka gewriyê derdikevin, dilêvandin. Helebî bi min dikeniyar û tinazên xwe bi min dikirin gava ku ez diaxivîm. Lê ne xema min bû. Min dixwest zû fêrî wî zimanî bibim û rastî wê kitêba efsaneyî bêm û çî dibe bila bibe.

Hin mirov hene ku zû fêrî cihê xwe dibin, heta ku zindan be jî hogirî quncikê ku têde zindanî ne dibin. Ez bi xwe ji wan mirovan bûm. Ne xema min bû dûriya welatê min. Ma welat çiye ku ne dê û bav û malbat be! Ê min jî ne dê ne bav ne jî malbat, kesekî min li Herne nemabû. Bav û diya min miribûn û ap û metik û xaltîkên mein jî her yek li şarekî bû. Dema ez li Herne bûm jî salê carekê me hev nedidît. Îca minê bêriya kê bikira! Ji xwe ku kesên derdora min, ên ku bûbûn şeş heft sal dût ketibûn behsa êşa mana li biyaniyê dikirin ez dikeniyam û min digot ku ev hestên wisa ne di rê de nikarin bi mirovekî aqilmend re peyda bibin. Ez jî bi qasî ku dereng fêrî zimanê erebî bûm, zû hogirî xanê bûm û ku ez û Alberto yan jî ez bi tena serê xwe derdiketim min bawer nedikir kengî li odeya xwe ya li qatê jorîn li wê xana helebî vegeirim. Maseyeke sedef, biçûçik û têrneqş li ber pencereyekê bû. Kaxezên min li ser bûn û bi şev min li ber şewqa mûmin stûr û spî bîranînên xwe, yan jî bibêjim rojbuhêrên xwe yê li Helebê dinivîsîn. Çî bûyer bûya, çî serpêhatî û çî fikre bûya min her şev dinivîsî. Alberto xwe ji

---

<sup>1</sup> Min li wê xanê nas kir ku neteweyek heye bi dinê xwe fille ye jêre dibêjin Ermen. Di wê mozayîka şerqê ya ecêb de, her tu gavekê biavêjî neteweyek raserî te dibe. Deverên ku netewe lê dibin cîranên hev dijminatî jî serî hildide. Jîneke hevbeş û aram di navbera du neteweyan de, yan jî di navbera du olên ne wek hev de, mucizeyeke xwedayî ye.

<sup>2</sup> Hin caran hizrên mirovan rast derdikevin. Hinek dibêjin mirina me nêzîk bûye û bi rastî jî dimrin. Yên li pê wan dimînin, mat dimînin û ji hev dipirsin: çawa wî yan wê dizanîbû ku dê nêzîk bimire, kê jê re got!! Bi hêzin nediyar ve girêdidin. Wanêsê ermenî, ku wî jî digot jina wî jî digot mirina me nêzîk bûye, ew û Zarayê bi hecacên ermen re vegeirîya welatê xwe. Nizanim ka çî bi wan hat!

rêwîtiya Esfehanê re amade dikir. Bêriya yara xwe Rûnaz kiribû<sup>1</sup>. Bi ya wî bûya ez jî dê di gel wî biçûma, lê min ê çavên Kewêya<sup>2</sup> Kurdaxî ji kê re bihiştana!!

\*\*\*

Xanên van welatan ne tenê cihê ku rêwiyek yan bazirganek lê dilûse ne, ew bazar in jî. Kê çi mal anî be, dikare li wir bifiroşe û çi bixwaze bikirre. Tacir bi xwe tînan xanan û malên xwe pêşkêş dikin ji bo firotinê û bazarên germ di hundirê xanan de li dar dikevin û ew bazirgan li mal û pirtalê ku bikin jî digerin. Havînan, xanên Helebê dibin kunemoz û kewarên hingiv. Xirecira çûn û hatina bazirganan e. Ji deverên cîhanê hemûyî mal tê wan xanan. Ji Çînê, Hindistanê, welatê `eceman, Smîrna û Diyarbekir û Qustentînopolê, Yemenê, Hicazê, welatê Rûsan, Marsîlyayê, Venedîkê, Cenovayê û hemû welatên Ewropayê mal tê Helebê û jê derdikeve. Bi qasî ku mal li bin guhê hev dikevin, wisa jî ziman û mezheb û ol û milletên cihêreng di wê sûka rojhilatê de mîna neqşên xaliyeke ecemî di rex hev de ne.

Xana Hokiyîdûn jî, di gel biçûkiya xwe û navê xwe ê dûrî bazirganiyê û nirxên bazirganan, cihek ji cihên bazirganiya şerq û xerbê bû. Li wir ez poşman bûm ku min perê xwe hemû bi barên kaxezan nêdan û nehat li wê xanê ticareta kaxezan nekir.

Sibehekê, min û Alberto me nû taştêya xwe xwaribû û ji xwe re li kuxtekuxta Wanês û pitepita Zarayê guhdarî dikir. Mêrekî navosere bi şerwelekî navran fereh û qutikekî xetxetî û simêlên wî ji nêvî bêtir spî bûbûn û serikên wan ên ziravik ber bi jor de hildabûn, derbasî xanê bû. Keçek ku kirasekî reng simaqî û dirêj bi destê wî girtibû. Çend tûr di destên wan de bûn. Hema li nivê hewşa xanê ew tûr ji destên xwe danîn û keçik li kevîkê hewdikê hewşê rûnişt. Min di pencereyê re li wî dîmenî dinêrî gava ku çavên min li du çavên reş û kovî ketin. Du çavên ku hezar birûskî tede bédeng vedidan. Nizanim çi hêzê ez anîme jêr! Min hew dît ez li himber keçikê rawestiyame û ziq li birûskên ku di çavên wê de vedidan dinêrim. Wê jî çavên xwe xistin çavên min û bi dilbijîn, yan jî min wisa hest kir, li min nihêrî. Wî mirovê ku şerwelê navran fereh lê bû çawa ku pêjna min kir bi rûyekî beşîşî û du çavên kor berê xwe da min û bi dengê ketî mîna yê kalekî nexweş got:

- Sabûn sabûn. Sabûn xar.

Keçik hîn li cihê xwe rûniştî bû. Desmaleke gulgulî nivê porê wê nuxumandibû û çavên xwe ji min nedibirrîn. Mêrikê kor, qalibek sabûn ji tûrekî li erdê derxist û bi hemû hêza pişikên xwe bîn kir û da destê min ku ez jî bîn bikim.

Min jî ew sabûn, sabûna ku ezê paşê nas bikim ku navê wê *sabûn el xar* e û heta li Helebê bim xwe pê bişom, bîn kir. Bîneke ku ji min re nenas lê gelekî xweş bû jê dihat. Min du qalib sabûn jê kirîn, perê wî danê û bi `erebiya xwe ya mîna a wî şikestî, gotê:

- Şukren hecî<sup>3</sup>.

<sup>1</sup> Alberto dibêje ku wî Rûnaz di rêwîtiyeke xwe ya Esfehanê de nas kiriye. Xaliyên ku wî ticareta wan dikir, çêkirina destê Rûnazê bûn. Ewî soz daye min ku ewê çîroka wê bibêje.

<sup>2</sup> Ne ku ez navê wê şaş dinivîsim yan min ji bîr kiriye. Ji min pêve tu kesî jêre nedigot Kewê. Navê wê Kewser bû. Di quranê de sûretek bi navê El-Kewser heye. Kewser jî wek ku tê gotin, aveke ku roja qiyametê tenê ummeta Muhemmed jê vedixun. Bi saloxên kitêbên misilmanan dirêjiya hewdikê wê avê, qonaxa mehekê ye, pehniya wê jî mehek e. Kenarên wî hewdikî ji zêr in, kevirên wî yaqût û mirwarî ne. Bêhna ava Kewserê ji bêhna miskê xweştir e, rengê wê ji berfê spîtir e û tehma wê avê ji hingiv şêrîntir e. Yê ku qurtekê jê vexwe êdî heta hetayê nema tû dibe. Ê min ez piştî Kewesra kurdaxî bêtir tî bûm. Ez her tiyê wan lêvên wê û şîrîniya maçên wê me.

<sup>3</sup> Hecî: ew kesê ku çûye ziyareta ke`beyê li welatê Hicazê û heca xwe ku yek ji stûnên dînê islamê ye, kiriye. Li şerqê, hema kî hinekî saldar be û pirça cênîkên wî spî bûbin, çûbe hecê neçûbe dibêjinê hecî. Ev ji peyvên rêzgirtinê yên ku ez di serî de fêrî wan bûbûm bû. Hecî li ba min ji efendî watedartir bû.

Keçik bêdeng bû lê rûyê wê wisa aram û nazik bû te digot hevrişimê Hindistanê yan penboyê jenandî yê Misrê bi xwe ye. Lê bi qasî ku rû nerm û nazik û aram bû awirên çavên wê tûj mîna xenceran bûn, mîna xencerên kurdan bûn<sup>1</sup>. Dema ku mêrik tûrikên xwe rakirin, herdu çavên xwe ên ku li tu alîyî nedinêrîn kutkutandin û bê diloanî gote keçikê:

- Kewser! Rabe qîzê<sup>2</sup>.

Keçik jî rabû ser xwe û tûrikê li ber xwe rakir. Desmala xwe ya ku êdî nizamî kengî ji ser porê wê yê reş şemitî bû, rast kir, anî nîvê serê xwe û bêyî ku careke din li min binêre bi destê mêrik girt û herdu meşîyan.

Ku ew hinekî dûr ketin, bû fersend ku ji pişt ve bejna wê keçikê bibînim. Kirasê wê yê heta gwîzekên lingan dirêj, kevî û deşt û tixûb û newalên laşê wê resim dikir. Ay Xwedê ew çî bejn û bal bû! Wisa xwedê ew ji kêfa xwe re durust kiribû!

Ji wê bejnê jî ew kulêmekên gurover û ew qûna efsaneyî bû agirê ku perîk di hêlîna hişê min de kizirandin. Wê qûnê xwe ji xeyalê min nema berda. Min çavên xwe digirtin, ew bû. Vedikim, ew bû. Hişê min biribû êdî.

Piştî ku ew derketin, ez vegeyame jor. Wanês û Zara li hewşa xanê xwe da bûn bin siya dareke purteqalê û li ava hewdikê di nîvê hewşê de dinêrîn. Aveke spî û ziravik bi sê kenaran de bi qasî gazekê bilind dibû û mîna kevanekî ditewiya û vedigeriya hewdik û xuşexuşeke xweş pê diket. Ava di hewdik de diçelqiya û pelên gulên cûrî ên ku weşiyabûn diketin govendê. Min silav da wan û bêyî ku bersiva wan bibihîzim, hilkişiyame jor. Min xwe avête bin hîzarê ku wek konekî li ser text vedayî bû. Rojeke germ bû, xwêdan bi hesinan diket ji wê germa şerqî! Min kincên xwe parçe bi parçe ji xwe kirin û ez şilfî tazî mam û min herdu zendên xwe dane bin serê xwe û di xeyalê xwe de laşê Kewserê mîna ewrekî tijî baran û pemboyî da himberî xwe. Laşekî esmer î ku rojê ew mîna hejîrekê herijandibû. Laşekî ciwan û stewiyayî û mê. Xeyalê min, berî ku ez bi çavan wî laşî bibînim, ew anî li ber min danî û şanî min kir. Xeyalê min ew xezala kurmancan ajote tor û xefkên vedayî di kûraniya hişê min de. Dema ku desmala mîna demsaleke ji kulîlkan ji serî kir, bû gujîniya wî porê reş û mîna sûlaveke ji miskê bi yek derbê re bi ser herdu memikên ter û bel û bi ser navmilan de hate xwarê. Xeyalê min î nêr kiras ji bedenê şeqitand, girêkên doxînê vekirin û derpî jê şemitand û mîna Hewwaya di bihiştê de ew şilf û tazî anî ber çavên min. Pêtagêk ji hingivê şikeftan bû min jî mîna hirçekî birçî lepên xeyalê xwe avêtinê. Min bi herdu destan ew qûna girover û şayik û bel mis da. Çavên min hatin ser hev û destê min î çepê bêyî vîna min çû ser terrikê min î ku hêdî hêdî rep dibû û mista destê min germ û tijî dikir. Xweşî zêde dibû û min dixwest bilezînim. Ez ji cîhanê qut bûm. Ji xirecira sûkên sergirtî, ji qirpeqirpa simên ker û qantir û hespan di kolanên teng de, ji bangkirina firoşkarên serê kolanan û sikakên teng û ji kuxika Wanês û pitepita Zarayê jî qut bûm. Nema deng hatin guhên min. Tenê dengê henasên min û axînen şewetê yên xeniqî li odeya min digeriyan. Min lêvên xwe ji xweşiyê alastin, miştin û gez kirin. Min dixwest li xwe binerim lê çavên min hatibûn girtin û venedibûn. Ez fikrîm: eger ev xezala kurmancan î ciwanik di xeyalan de wisa xweş be, di rastiyê de wê çawa be gelo?

\*\*\*

<sup>1</sup> Min heftiya buhurî xencereke serxwar û qevdik ji darê gwîzê û zîvkirî û bi morîkan neqîşandî û kalan ji çermê pilingan, ji xwe re ji kurdekî kirî.

<sup>2</sup> Rabe qîzê: yanî keçê rabe ser xwe. Ew mêrik ji qewmê Selaheddînê Eyyûbî bû. Kurd bû. Rûyê wî zerhimî û zer bû û min tê derxist ku ew bi jana zirav e. Kuxikeke ecêb dikir. Keçik jî qîza wî bû. Kewsera kurdaxî bû. Kewsera ku dê min bi xwe re tî bibe bihiştê heta ber kevîkên hewdikê Kewsera şêrîn û tî jî ji wir vegeyîne û ji bihiştê jî min bavêje nava dojhê heta ku dilê min biherije û hestiyên min bibin komir.



Berî ku Alberto berê xwe bide beriya welatê eceman, bajarê Esfehanê, rojekê gote min:

- Martîn ka ez te bi zêrkerekî ku eslê wî ji Hemayê ye bidim naskirin. Tê bîra te gava mal û pirtalên me di wê barana li nêzîkî Humsê de ji ser pişta deveyan ketin? Wê çaxê ez gelekî li ber guldanka buha diketim! Min ê bi riya vî zêrkerî bifirota paşayê Helebê. Ew bi xwe, tevî zêrkeriya xwe neqqaş e jî û hayê wî ji gelek kitêbên destxet heye. Wî demekê ticareta wan jî kiribû. Ka em herin ba wî, kî çi dizane! Dibe ku em li wir kitêba te jî bibînin, yan xeberekê jê hilînin. Ma ne dibêjin ku ji devera tu ne li bendê, rovî derdikevin!

Hîn sibeh bû. Lê germê ji şeveqê de dest pê kiribû. Me xwe da ber siya dîwaran û em di caddeyên teng re meşîyan. Heta binaniya kelê li ber dergehê Qinnisrîn, ku yek ji şazde dergehên bajarê Helebêye û di navbera dergehê Antakiya û dergehê Elmeqam de ye, em meşîyan. Paşê em zîvirîn sûkeke sergirtî ku li herdu aliyên wê dikanên zêrkeran bûn. Di wan dikanan de tiştê ku bala min bêtir kişand ew bû ku xişrên zêr; gustîl û bazin û pelik û guhar û gerdenî û milwank û berbisk û serbend û kemer û xilxal û her cûre xişrên din di qefesan de li ser refikên nazik bûn. Zêrê zer di qefesên hesin de bûn ku destê dizan negihê wan. Xirecira wê sûkê nedîşibihî xirecira sûkên din. Her ku mertebeya pîşeyekê bilind dibe, têkiliya di navbera firoşkar û kirîdar de jî bajarîtir dibe, loma jî dengê muşterîyan hêdî bû. Kêfa min ji wê sûka hênîk re hat. Lê dîtina wan jinên ku tu deverên wan nexuyabûn hinekî bîna min teng dikir. Ji serî heta binê lingan reş bûn. Hin jin û keçên ku ji gundan hatibûn ne wisa bûn, hema bi kêmanî cilên wan, desmalên wan rengîn bûn û rûyê wan jî xuya bû. Em gelekî di wê sûkê re nemeşîyan. Dikana Zekeriyayê zêrker di serê wê de bû. Em herdu derbas bûn. Piştî silavê yekser Alberto ez bi Zekeriya dame nasîn û got:

- Ev Martîn e.

Û yekser derbasî mijara kitêban bû.

Kurîkekî derdora panzde salî li dawîya dikanê bû, bi bazînekî pelixî daketibû û ew rast dikir. Gava behsa kitêban bû, bazîne zêr ji dest xwe danî, rûyê xwe ê spî û nazik xist nav herdu kefên xwe û zîq li me nihêrî. Zekeriyayê zêrker bi kerb awirek tê veda û gotê:

- Ebdullah tu çi weke gêjan di cihê xwe de sar bûyî! Ka aveke hênîk ji van efendiyan re werîne.

Dîsa li me zîvirî û tavlê kerba ku li ser rûyê wî perdeyeke tarî berdabû rabû û dev li ken got:

- Ev kurê min Ebdullah e. Ez berê wî didim zêrkeriyê, ew jî hewesa wî kitêb in.

Em hersê kenîyan. Bi kenê me re ava sar hate ber destê me; sê kaseyên bellor, ji camên ku li Helebê saz dikirin, bi bejnên xwe ên zirav li ser tebsiyeke zîvîn û di binê her kaseyekê de desmaleke kitanê spî hatin ber me. Di nav vexwarina avê re Zekeriya hinekî gilî û gazine sûkê kir. Got ku firotina zêr ne wek her karî ye, erê qezenceke baş tê de heye, lê xesara wê jî mezin e. Û çîrokên xwe û hevalên xwe ên zêrker û dizan gotin. Paşê em dagerîyan behsa kitêban û suhbeta me li ser wan germ bû. Behsa kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* gelek caran hate kirin. Lê xuyabû ku ew kitêb peyda nabe. Ê min jî ew xwesteka dîtina wê kitêbê di dilê min de sar bûbû. Loma jî min bêtir ji xwe re guhdarî dikir û li xirecira hêdî a li derve temaşe dikir.

Di wê navê re keçek derbasî dikanê bû. Hîn derbas nebûbû min bala xwe dabû wê û ew ji dûr de dîtibû. Dilê min kire gupînî, gelo ev ne Kewsera kurdaxî be!

\*\*\*

Ew bû, ew bi xwe bû. Bi wê qûna efsaneyî û devê mîna gupikek gul û bi wê desmala xwe ya gulgulî. Xuşîniya ji ber kirasê wê yê leylakîyê vekirî û bi gulin reş î hûrik deqandî hat, bîna bihuştêkê fûrand. Awirên min û wê mîna gemiyên qorsanan li hevdu likumîn. Ew jî mat ma ku ez dîtîm. Lê tavilê kenîya û kaniya bişîrîneke şêrîn li ser lêvên wê teqîya. Zekerîya ew nas dikir. Dîsa bangî kurê xwe kir û gotê:

- Ebdullah! Ka binêre Kewserê çi dixwaze<sup>1</sup>.

Zekerîya û Alberto behsa kitêban qedandibûn û êdî ketibûn gola axaftineke bêdawî li ser xalîyên esfehanî, firaxên cam ên Muranoya Venedîkê, wê guldanka buha ku hûrhûrî bûbû, qehweya yemenî, sabûna Xar a Helebê, kaxezên semerqendî û hevrişimê Hindistanê. Li ser xaçhebînan û dubendiya ku ketibû nav wan li welatên rojavayê, û ew dubendiya ku gihiştibû nav xaçhebînen şerqê jî diaxivîn. Min jî ji xwe re li guregura agirê şehwetê yê ku wê qûnê di hinavê min de geşkiribû, temaşe û guhdarî dikir. Wê qûna ku dubendiyek mezin û kûr xiste navbera dil û mejiyê min, navbera hest û hişê min û ez di navbera evîn û dilbijînê de xistim hêlaneke ji êgir û birim û anîm. Terrikê min dişidiya û ez bi sincirandina wî ya li ser ranên xwe dihisîyam. Ji min we bû ku her kes li nav şeqên min dinêre. Fedî û poşmanî û tirseke têkel bi hestî nediya re li bin guhê hev diketin. Lê dîsa jî min xwe negirt û rabûm û ber bi Ebdullah û mişterîya wî de çûm û ber wan rawestîyam<sup>2</sup>. Min pirsek bi zimanê îtalî û bi dengêkî ku bi qedîfeyekî ji lav û xwezîyan pêçayî avête ber guhên Ebdullah:

- Ji vê keçîkê re bibêje, ka hîn sabûna xar li ba wan tê dîtî?

Tercumanê min jîr bû. Lê nizamî mebesta min fêhm kir yan na, bes min ji axaftina wî û wê nas kir ku Kewserê kêfxweş e. Serê xwe hejand lê mîna aveke sar dengê Zekerîya pijiqî nav rûyê min û bi ser min de rijîya:

- Tu bixwazî Ebdullah ê te biba cem dostekî min ku sabûna herî baş li ba wî heye!

Paşê mîna ku zanibe min dilê xwe bijandîye Kewserê, got:

- Sabûna ku Kewserê û bavê xwe difiroşin jî ne xerab e.

Ez bi şûn de vekîşîyam û bédeng rûniştîm. Paşê, Kewserê wek ku derbas bû wisa jî derket û ew bîna bayê bihuştê dîsa bi xuşîna kirasê wê yê leylakî re fûriya.

Siba din Alberto bi kerwanê Ecemistanê re berê xwe da Esfehanê. Amîra xwe ya mûzîkê li odeyê hişt, û got:

- Nezano Martîn ev der şerq e. Keçek nikare bi pismamê xwe re jî bi tenê bimîne. Te nebihîstîye qey! Ew dibêjin ku, ger keçek û xortek bicivin, kesê sêyemîn şeytan bi xwe ye. Rûnaza min ermen e jî, filleye jî lê dîsa ez wê bi dizî dibînim. Her çendî urf û adetên sefewîyan ne mîna yên osmanîyan hişk in jî lê dîsa di pîrsa jinê de henek nabin. Li xwe miqate be.

- Tu bi rêya xwe de here Alberto, ew karê min e.

Ez piştî çûna Alberto di rêyekê de fikirîm ku hema wê keçîkê bibînim. Wê awirpilingê dilê min mîna diranên tûj yên xefkekê zeft kiribû. Ez dil ketibûmê û serê min bê mey digeriya.

---

<sup>1</sup> Heta îroj jî ku min piştî xwe daye Helebê, ez dibêjim ku Kewserê ketibû pey min! Di hevdîtinên me de, wê tew xwe li vê yekê nedikir xwedî. Dikenîya û digot: ma minê çawa zanîbûya ku tu li wir î! Ez hatibûm ristikeke zêr bikirim. Min tu bi rasthatî dîtî. Wê rojê wê tu ristîk nekirî. Ebdullah li ber wê gelek ristîkên xweşik rêz kiribûn. Wê jî her carê diçû li ber mirêkekê radiwestîya, ristîk li qirika xwe ya esmer digerand û di bin çavan re, di mirêka li paşîya dikanê re li min dinêrî. Awirên min jî ji wê qûnê qut nedibûn. Ji nav heft ristîkan yek eciband. Ebdullah ristîk avête kefa terazûyeke biçûk, jêre pîva û buhayê wê got. Wê jî bi nazîkî ji ber sînga xwe pere derxistin û jimartin. Pere kêmbûn. Fedî kir. Çavên xwe berdane erdê û rûyê wê hinekî sor bû. Zekerîya bala xwe dayê. Bi bavîti gotê: xem nake, emê ristîka te li devereke cihê hilînin. Kengî pereyên te temam bûn were bibe.

<sup>2</sup> Alberto, her ku ew roj dianî bîra min û xwe, dikenîya û digot: Min bala xwe da te Martîn. Eynî mîna îblîsekî te xwe ji civata min û Zekerîya vedizî û çûyî li rex Kewserê rawestîyayî. Ji min nevesêre tu ji wê deqê de dilketibûyê ne! Destpêka evîna min û Rûnaza esfehanî jî wisa bû.

Mest bûbûm êdî ji evînê. Min ew hestên xwe mîna imtihanêke ji ba xwedê de dihesibandin. Min dizanîbû eger ku ez bidim pey dilê xwe, ewê min li teht û keleman bilikumîne. Dil rêberekî kor e. Evîn jî xefk e nayê dîtîn. Ez jî kesekî bê tecrube bûm. Min nikaribû xwe li ber bayê evînê bigirta. Dilê min ez dajotim wê xefka nexuya. Hevalê min ê ku ez bi civaka Helebê didame nasîn û Heleb û civaka şerqê jî bi min dida nasîn berê xwe dabû Rûnaza xwe û kar û barên xwe û êdî ez tek û tenha û tenê mîna dareke li devê geliyekî mabûm. Pêlên lehiya evînê dikirin ku min ji qurm de hilibikin. Ez bêgav bûm ku wê evîna yekalî ya xedar di riya mijûliya bi fêrbûna zimanê erebî re sist bikim û heta radeyekê bi ser ketim.

Fêrbûna erebî, li ser destê Ebdullahê kurê Zekerîya dema min bi rastî jî baş dagirt. Di serî de ez çûme nik wî ji bo fêrbûna gramêr û rênivîsê. Lê wî hucreyeke biçûk li rex dêra ermenan ya mezin<sup>1</sup> wek cihê dersê hilibijart û got ku rojên şemîyan û yekşeman ew vala ye, dikare dersên ziman û gramêra erebî bide min.

Rahibekî helebî navê wî Cermanus Ferhat, ku niha li dêreke çiyayê Lubnanê ye, kitêbeke delal li ser zimanê erebî nivîsî bû. Mamosteyê min î nûhatî ew kitêb ji ber kiribû. Bi rastî jî wî, di gel temenê xwe yê hindik, bi şeweyekî zanistî ez li ber dersê dixistim û pirr zû û ne mîna ku min xeyal dikir ez fêrî nivîsandina wan tûpên weke resman bûm. Lê min nêr û mê li bin guhê hev dixistin. Mamosteyê minê ciwan dikeniya, ji şaşiyên min hinekî fedî jî dikir. Min jî ber dilê wî dida û digotê: Ya ustazî<sup>2</sup>! Yê şaş dibe ez im ne tuyî, divê ez şerm bikim ne tu.

\*\*\*

Niha di vê rêya han de hemû bîranînên Helebê nayên bîra min. Hinek bûne xewn û mijê xwe li wan pêçaye û ez jî bi zor dikim wan bidim ber çira xeyalê xwe û bibînim. Hinek jî wek mirêkê ne, zelal û her alî jê tê bîra min. Ji bo nivîsandinê ez bi hacetî rihetiyê me. Lê di vê riya revê de rihetî ji ber min reviyaye. Karwan e, xan û tîrsa dizan e loma jî bûyerên berê yên ku li beriya bîranînan bariyabûn nema têne bîra min. Ez ji neçarî vî xeyalê zuwa diguvêşim ku hema çipikin ji wan bûyeran berhev bikim. Gelk macera û serpêhatî hene ku ez dikim û nakim nikarim wan ji bîra xeyalê xwe bikişînim. Hin jî hene weke kaniyan diteqin û diherikin bêyî ku ez wan dawetî van rûpelan bikim.

Çend salan berê bû. Metropolitê rûnêrm, şivanê berxikên dêra Ortodoksên rûmên melekî li Helebê Athanasios III Debbas, berê xwe dabû girava Qibrisê. Ew metropolit, da ku bi kar û barên mesîhiyên kiniştêya ortodoksî rabe, hema bêje ji gemiyê peya nedibû. Di navbera Qibris û Helebê de diçû û dihat. Di sefereke xwe ya Qibrisê de, berê xwe dabû welatê Eflakan û ji cem mîrê wê mekîneyeke çapê anîbû. Ebdullahê ku navê wî ji zîrekiya zêde bûbû Zaxir, yanî deryayê pêldar, û birayê wî Nîmetullah û herdu rahibên helebî Curcis û Mîxaîlê Bezzî bûbûn

<sup>1</sup> Navê wê dêrê Dêra Çilşehîdan bû. Çîroka wan çilşehîdan hinekî bi şewat e. Dibêjin hakimekî zalim ê bîzansiyan hebû, di dema wî de çil leşker hatin ser dîne mîsîhiyetê. Rabû wî hakimî ew îşkence kirin. Di şeveke sar de ji şevên Erzerûmê li bakurî welatê osmaniyan û nêzîkî rûsan, hemî şîlfî tazî kirin û avêtin ser qeşayê. Bi hev re, wan çil leşkeran du`a dikirin û bi peyva: Ea Mesîh me ji rêya xwe danegerîne, xwe germ dikirin. Bi destê sibê re, yek ji wan sist bû û nema karîbû xwe li ber wê zemherîrê bigirta. Rabû gotinên kirêt derheqê Mesîh de kirin ku wî berdîn. Ew mane sî û neh. Dîsa wan du`a kirin û gotin: Ey Mesîhê bilindpaye, ey xwedayê me yê di rengê mirovan de daketiye jêr, bihêle em çil kes werin hizûra ezmanê bilind. Rabû pasvanê wan jî, ê ku çavdêriya wan dikir da ku ji ser qeşayê nerevin, cilên xwe ji xwe kirin û tev li wan bû. Bi wî halî heta sibehê ew man li ser qeşayê û bûne qeşa.

<sup>2</sup> Ya ustazî: peyveke erebî ye yanî ey mamosteyê min. Lê Ebdullah digot eslê peyvê Ustad e, ji farisî hatiye.

karmendên wê çapxaneya nû. Berî wê, ji bo ticareta xwe min gelek caran ji metropolît re gotibû ku li welatên Ewropayê mekîneyên çapê hene, bi herfên hesin in. Min gotibûyê ku ew mekîne dikarin bi sedan kitêbekê çap bikin ku ji kitêbên nasixan xweşîktir in û bêçewtî derdikevin. Ez difikirîm ku mekîne were Helebê, êdî kaxezên min dê bibin kaniyeke spî û biherikin sûka Helebê.. Hema dêra ortodoksan bibe muşteriyê min bes e.

Roja ku mekîne hat rojeke bi şan bû. Mekîne li nîvê hêwana dêrê danîn û metropolît rabû gurzek ji geyayê Zûfayê di ava pîroz da kir û lê reşand û sê caran bi destê xwe ê rastê, li hewayê rastî mekîneyê xaçek resim kir û got:

- Di kitêba pîroz de tê gotin ku di destpêkê de peyv bû. Erê peyv bû. Niha jî emê wê peyvê bi vê mekîneya li ber me belav bikin. Xwedê bereketê bide me . Amîn

Misilmanan bi çavên gumanê li wê mekîneyê dinêrîn. Min kir û nekir ku şêx û zanayên Helebê nesixkirina kitêbên xwe bi wê mekîneyê bipejirînin, min nikarîbû. Wan digot: ev aleteke şeytanî ye û ji kufra reş e ku kelamê Xwedê, yan jî herfên erebî ên Quranê pê werin çapkirin. Eger wan jî qebûl bikira wê ticareta min deh qatê din ferehtir bûbaya.

Di wan deman de, di wan demên ku min têde şair û daner û xwendekar û keşe û mela û feqî bi pel dikirin, defterên ku min têde jiyana xwe ya ji roja derketina ji Herne, rojbuhêrên xwe ên li bajarê Helebê, dinivîsandin, ji min hatin dizîn.

Gelek pel min tijî jiyan kiribûn. Hema bêje hezar pel bûn, hezar pelên semerqendî bûn. Min bi xwe pelên firincî bikar nedianîn. Yên semerqendî xurttir bûn û xwe li ber demê û rewayê digirtin. Sîqalkirîbûn û hibr venedixwarin, wek van pelên ku niha ez li ser wan dinivîsînim. Pelin spî bûn lê min bi jiyaneke tevlihev ew reş û zindî kiribûn. Di her pelekê de bûyerek, xweşî, hêvî, têkçûn û wêneyên vê şerqa sihirbaz hebûn. Ez gelekî li wan geriyam, min pêjna wan li tu deveran nekir. Xwezî min zanibûya kê ew defterên min dizîbûn û wê çi bikira ji wan? Bi qasî ku ez li wan defteran geriyam ez li tu tiştên di negeriyabûm. Êdî ez li Helebê heta demekê bi navê firenciyê ku defterên xwe wînda kirine, hatibûm naskirin. Kê ez li sûkê yan li meydana xanekê yan li ber derê xanekê yan dêr û qunsulgehekê bidîtama bi pistepist ji hevalê xwe re digot: ha defterên vî koseyê firincî hatine dizîn.

Min di wan defteran de behsa derketina xwe ya ji gundê xwe yê biçûk Herne kiribû. Min bi ferehî behsa her bajar û lenger û der û dorên ku tê re derbas bûbûm kiribû. Min kî dîtibû kî nedîtibû û çi hatibû serê min hemû di wan defteran de qeyd kiribû. Ez gelekî li ber defterên xwe ketibûm. Ez gîhabûm kê û min gotibûyê ku defterên min hatine dizîn. Min hemû qunsulxaneyên ewropîyan agahdar kiribûn. Hayê çi misyonerên ku hatibûn mezhebên xwe belav dikirin jî ji diziya defterên min çêbûbû. Li cem feqeyên mizgeftan jî lê geriyabûm. Bi gelek hêvî min berê xwe dabû dêrê hinda metropolîtê (pîskoposê) rûmên melekânî li Helebê û derûdorên wê, Athanasios III Debbas û min ew jî agahdar kiribû. Wê demê dostê min Ebdullah kurê Zekeriyayê zêrger ku berpîrê çapxaneya nû bû, û rahibekî helebî jî di gel wî çûbûn nik metropolîtê rûnêrm. Metropolîtê Ortodoks ê rîspî û sîng bi xaç û xeftanreş, metropolîtê şêst salî yê ku nû ji girava Qibrisê vegeriya bû, ber dilê min dabû, destê xwe di ser serê min re biribû û gotibû:

- xema çend defterên xwe nexwe kurê min. Bi hezaran defter û kitêbên pîroz li ber lingan çûne. Bi hezaran gencîneyên kiniştayan di şeran de hatine şewitandin.

Lê min defterên xwe ji bîr nekiribûn. Bîranînên min, jiyana min ya piştî derketina min a ji Herne, hêviyên min, zor û zehmetiyên ku pêrgî wan hatibûm, rojreşî û kêfxweşiyên ku min ew dîtibûn û hema her tişt di wan defteran de bû.

Hayê paşayê Helebê jî ji çîroka diziya defterên min çêbûbû. Ferman li muhtesibên bajêr kiribû ku hemû dizên xanan û qelaş û sakûlên sikakên Helebê bînin û pîrsa defteran ji wan bikin. Dizan gotibûn: efendiyê me yê qedirbilind! Em her tiştî didizin. Em solên ber derê mizgeftan û mûmên dêran jî didizin. Heta em kefenên miriyan jî didizin, lê defteran! Bi serê sultan û walî be ku hayê me jê nîne. Êdî şopa wan defteran ji şopa derziya di nav bînderekê de nebedîtir bûbû. Min jî ji neçarî dev ji pêketin û şopajotina wan hersê defteran berda.

Zimanê min ê erebî û zaravayê helebî gelekî baş bûbûn. Mamostayê minê xortik Ebdullahê ku wextê xwe êvaran di dêra rûmên meleanî de bi metropolîtê zana re dibûrand gote min:

- Xoce Martîn, bi vê zûbûnê kes nikare fêrî elifbêya erebî jî bibe. Waye tu êdî kitêban jî dixwînî bêtî ku ji me bipirsî ka ev gotin yan ew cumle çi dibêje!

Resamê îkonan Ni`metullahê kurê Yûsif El-Musewwir û bavê Henanya, resamê ku ji destpêka hatina min a Helebê de dostê min î herî nêzîk bû û du salan mijûlê kişandîna îkona xwe ya navdar *Eddeynûne* bû, carekê ji min re got:

- Fêrbûna zimanê erebî ne li ser destê şêxan be, kême e. Razên vî zimanî hemî di bin şaşikên wan de ne! Metranên me bi xwe jî dersên zimanê erebî li ba wan distînin. Tu here xwe li kenarê deryayê wan bigre û bihêle pêlên zanîna wan li te biqelibin.

Sala ku têde sultan Mustefayê duyem ji ser textê selteneta osmanî hatibû avêtin, Yavuzê xettat<sup>1</sup>, ku wan rojan hatibû Helebê, bi min re çûbû mizgeftê ku sê sed gavan dûrî xana Hokiya dîdî bû û minareya wê, ku min ji pencereya odeya xwe li alî bakur dînerî, tala bircê dêra Meryem a li rex dêra çilşehîdan, xuya dikir. Em li hucreya imamê wê mizgeftê ku navê wî şêx Mustafa Eltermanî bû, rûniştin. Me û imamê şaşikmezin li hev kir û diravên wî yên şeş mehan di cih de danê<sup>2</sup>. Wî ez qenc fêrî zimanê erebî kirim.

Ew imam dîndarekî hişk bû. Lê hinin jê hişktir jî hebûn ku digotinê çima ev koseyê firincî derbasî mizgeftê dibe? Li ba misilmanan kosetî û çavên şîn nîşana xirabiyê û bêyomiyê ne. Lê wî bersiva wan dida û çîrokin ji sîreta pêximber Muhemmed dianîn û digot: cenabê pêximber jî xiristyan derbasî mizgefta xwe kirine, ne ez ji pêximber çêtir im, ne mizgefta min ji a wî pîroztir e û ne jî ev kose Martîn ji wan xiristyanên Yemenê gawirtir e.

Min ji ba nasîyekî kitêba çîrok û efsaneyan ku navê wê bi erebî Elf leyle we leyle ye<sup>3</sup> bi du ritil kaxez kirî bû<sup>4</sup>. Min ew kitêb carê bi xwe re dibire hucreya şêx Mustefayê ku ez fêrî zimanê erebî dikirim. Wî pir bala xwe nedidayê. Cara dawî, se`et êdî bûbû sisîyê nîvro, ji rojeke payîzê ku bi se`eta erebî bûbû heşt. Dîsa Yavuzê çortanxur ku êdî bûbû dostê min û muşteriyê min jî hatibû û em bi tevayî çûne mizgeftê. Dema ku şêx ew kitêb di destê min de dît, rûyê xwe qermiçand û got:

- Xoce Martîn ev kitêb û xwendina wê ne layiqî mirovekî aqilmend in û nabe ku derbasî malên Xwedê jî bibe.
- Çima şêx efendî?

Yavuz bi dengêkî bilind pirsî. Şêxê ku qet nedixwest li dostê min ê xettat ê rûkirêt binêre, berê xwe da min û got:

- Tîjî fisq û ficûr e, rûyê mirov ji nepakiyên tê de digihê erdê.

Vê carê min pirsî:

- Ma te ew xwendîye şêx efendî!

---

<sup>1</sup> Piştî ku min û vî kesê ecêb û rûkirêt û devxwar me hev nas kir, ezê paşê behsa wî bikim, min navê wî kir Yavuzê çortanxur! Wî bi kulman çortan, ku mastekî şorî hişkkirî ye, davête devê xwe î xwar û dixwar. Min jî ew çend caran tehm kir lê tew jî kêfa min jêre nehat.

<sup>2</sup> Pêşî ku em derbas bûn û Yavuzê çortanxur gote imamê bi mezhebê xwe henefî û piştgirê xelîfê misilmanan, sultanê Osmanî Ehmedê ku niha li ser erşa Qustentinopelê ye: ev xoce Martîn e, firincîye û dixwaze fêrî zimanê erebî bibe. Imamê şaşik mezin û sist, şaşika xwe hinekî ber bi jor de bir û pêşiya serê xwe xurand. Çavên xwe hûrik kirin û rûyê wî hinekî tîrş bû. Ku çingînî ji diravên birqonekî hat, Çavên wî biriqîn û rûyê wî bû wek axa ku xunaviya baraneke hûrik lêkiribe.

<sup>3</sup> Pênc cildên gelekî ciwan ji wê kitêba delal ku wateya navê wê hezar û yek şev e, li ba min hebûn. Ew ji min hatin dizîn. Min hîn xwendina efsane û çîrok û serpêhatiyên wê bidawî nekiribûn. Ez gihîştibûm şeva sêsedî ku têde çîroka Harûn Er-Reşîd û Eladîn bû ku ew bi temamî di hişê min de maye.

<sup>4</sup> Her ritilek rizmeyer kaxez e û her rizmeyer jî bîst desteye, yanî pêncsed pelên sîqalkirî têde hene.

Ku min wisa ji şêx Mustefa pirsî, bi rastî min bi dilpakî pirsî, ew kete hev û riya xwe ya girover û belek bi destê xwe yê çepê mis da û di ber misdana riyê re jî sîwaka<sup>1</sup> xwe ji berîka qutikê xwe derxist û di diranên xwe da. Rûyê wî ji pelên çinarên wê payîzê zertir bûbû. Paşê ji kel de rabû û got:

- bû dema nimêja `esrê. Ez rabim.

Û bêyî ku tu bersivê bi erê ya na bide, ji hucreyê derket. Şêx Mustefa şêxekî bêcîr bû. Kêfa min qet jêre nedihat. Lê bi rastî ew di zimanê erebî de dahiye bû. Qesîde û xezeliyatên bi dehan şairên ereb ji ber kiribûn. Ji xwe Quran wek avê dizanîbû. Lê hema cira wî ya nexweş zanîna wî li ba min gelekî bînîrx kiribû. Her carê digote min ka were misilman bibe. Wî ez bi keça xwe jî timadar dikirim. Digot: ku tu misilman bibî ez ê keça xwe li te mehr bikim. Roj bi roj ez jê bêzar dibûm. Min nikaribû wek ku me peyman danîbû şeş mehan li ba wî temam bikim. Di meha sisiyan min dev ji wî û mizgefta wî berda. Û ez çûm min li ba imamê mizgefta Behramiyeyê dersên xwe temam kirin.

Min Hans, dêra Herne, xwezaya wê, zivistanên spî û payîzên rengîn ji bîr kiribûn. Lê ev giyanê min, ev ruhê aware her û her biyanî mabû. Qet û qet ruhê min û ev axa şerqê li hev nebaniyan. Min bi dehan kitêb nesix kirin û ji kaxezên ku min ticareta wan dikir bi hezaran kitêb nesix bûn. Deverek nema û têde li wê kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* negeriyam. Nûredînê kor, yê ku her roja îne min ew li ber deriyê mizgefta mezin ku dibêjinê camiya Zekeriya didît, carê navê yekî digot: here ba filankesî ewê li ba wî peyda bibe. Here ba bêvankeso ew kitêbên entûke dihewîne. Lê hemî hewldan vala bûn û kitêb nedihate dîtin. Min têra xwe mal û dirav qezenc kirin. Min têra xwe jin nas kirin û dilê min jî têra xwe birijî. Evîn û dostanî, xayintî, gunehkariyên mezin, min jiyan bi hemû rûyên wê li Helebê dît. Ba û bahozên jana xurbetê û bêrîkirina warê min jî yek caran li deşta dilê min radibûn lê tavilê çirisandina zêran ew ba radiwestand. Min carekê du caran name ji dostên xwe yên gund re, di serî de ji Gustav û Hans re, hinartin. Lê min nema zanibû ka gelo digihên yan na. Bersiva min nedihat û ez jî zû bêhêvî bûm. Şaberûya ku Hans di roja derketina min de dabû min her û her bi min re bû. Min jêre tûrikekî biçûk ji çermê keroşkan li ba koşkarekî ermenî dabû çekirin û ew têde parastibû. Heta niha jî, di vê rêya revê de ku pişta min li Helebê ye ew şaberû hîn bi min re ye. Ew tenê ji welatê min bi min re maye.

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Sîwak: darikekî bi bêhn e. Misilman ji beriya Hicazê di dema hecê de tûnin. Li dikanên Helebê jî tene firotin. Sîwak bi qasî şeş heft pêçiyar dirêj e û serê wê mîna firçeyan e pê diranên xwe pak dikan. Tu misilmanekî bê sîwak nabînî.

Bextewerî armanca her kesî ye. Lê bi qasî mirovên ku hatine rûyê dinyayê, şeweyên lêgerîna bexteweriyê ji yekî heta yekî din cudane. Bi qasî kesên ku hatine jiyane û dê hîn bîn ji wateyên bexteweriyê hebûn û hene û danasîna her yekî ji bexteweriyê re ji danasîna ê din cudatir e. Di her qonaxek ji qonaxên jiyana mirovekî bi xwe de jî, wateya bexteweriyê xwe diguhere. Dibe ku di zarotiyê de seriyek şekir yan kulmek nokên şorkirî be yan hinek behîvterkên xwêkirî yan jî seriyek garisê kelandî be. Di xortaniya pêşîn de dibe ku maçek ji keçekê yan xortekî be. Li Herne dibe ku dîtina Helebê be û li Helebê jî bextewerîya mezin vegera li Herne be!

Ez bextewer bûm dema ez pê hisiyam ku ji Kewserê hez dikim. Çima derewan rêz bikim! Di destpêkê de ji hezkirinê bêtir dilê min dibijiyayê. Dilbijîn jî koka evînê ye. Lê hingî xedar û dijwar bû min digot ew evîn e. Bextewerîya min bûbû hemêzkirina wê, bêhnkirina binçengên wê û misdana memikên wê ên girover û bel. Bi qasî ku evîna wê bi jan bû wisa bextewerî jî dida min. Bextewerîyeke janbar bû, yan jî jane xweş bû ew. Ez pê dihisiyam ku êdî wateyek ji jiyana min re çêbûye. Wateyeke derketina min î ji welêt û vê xurbeta min heye ji bilî pêketina kitêbekê ku min ew peyda nedikir û nema li peydakirina wê digeriya. Ez difikrîm ku ne ew evîna nûhatî bûya wê çi wate ji jiyana min re hebûya! Kitêba bexteweriyê! Na, ji ber ku evîn bi xwe bûbû bextewerî û êdî pêdiviya min bi wê kitêbê nemabû. Rojekê min Kewserê li ber derê xanê zeft kir. Ez nizanim li çiyê xwe digeriya! Lê min nema ber xwe dît. Nizanim gelo serê min zîvirî yan dunya li dora serê min zîvirî? Gêj bûm ez û hatim ku bikevim. Min bawer nekir ku ez careke din li wê rast bêm. Hema min xwe gihandê û bi erebiya ku dizanim gotê:

- Ena uhibbukî cidden<sup>1</sup>!

Ez heta niha li dilêriya xwe ya wê rojê ecêb dimînim! Li Herne wî qasî min nediwêrbû xwe di keçikan bidim. Ji xwe her gav mîna rahibekî li dêrê dimam û di nav kitêban de bûm. Dilêriya min a mezin di jiyana min de ew bû ku, rojeke yeksemê piştî daweta gundiyeke me û mehrbîrrîna wî û bûka wî em ji dêrê derketin û min keçikek maç kir. Ew jî hatibû dawetê û me berê jî hevdû carekê du caran dîtibû. Ez pêre heta nêzîkî mala wê meşiyam. Herdu kenarên cadeya em têre derbas dibûn bi gulan xemilandî bûn. Dema min dît cade vala ye ez xwarî gulekê bûm û min ew bi nazdarî çinî û da destê keçikê û pêre jî min bi lez maçek ji gepa wê ya ku sor bûbû revand. Ê hew. Tixûbê nêraniya min î li welatê min ew bûyera tekane bû û hew, ez jê derbas nebûm.

Piştî wê gotina *uhibbukî cidden* min bala xwe da rûyê Kewserê lê min tu guhertinên mezin tê de nedîtin. Rûyê wê ji fedîyan sor nebû! Ew esmereke tarî bû, ma wê rûyê wê çawa sor bûba! Wek ku wê dizanîbû ezê bibêjimê ez ji te hez dikim û li bendî wê peyvê be, hinekî beşîşî û diranên wê yên spî di wî rûyê girover de çirisîn. Çaxa ku min dît ew dengê xwe nake, rabû min hevoka xwe ya din jî got:

- Sibe sibehê ezê li dikana Zekeriya bim. Were wir<sup>2</sup>.

Sibehe din Kewserê berî min li wir bû. Kirasekî nû ji sorê meyrengî li xwe kiribû, navbendeke kitanên spî li newqa xwe gerandibû û desmaleke zer dabû serê xwe û bîna hemamên bajêr jê dihat. Zekeriya hîn nehatibû lê kurê wî Ebdullahê ku mamostetiya min dikir dikan vekiribû. Dema ku ew çav li min ket kêfa wî hat. Piştî silavan û xêrhatinê ji nişkêve pirsî:

<sup>1</sup> Yanî ez gelekî ji te hez dikim.

<sup>2</sup> Serbestiya û serberdayîbûna Kewsera Kurdaxî ez heyirandibûm, berî hîn ku ez li ba wê dest bi fêrbûna axaftina helebî bikin, min ji Zekereiyayê zêrker pirsîbû: ev keçika kurd ne wek keçikên Helebê ye, zêde serbest e! Wî gotibû ku ew gundiyeke ji çiyayê Kurmancan e, çend caran muhtesiban rê li ber wê û yên mîna wê girtibûn û xwestibûn ku bi zorê ew xwe binuxumînin. Hemîyan xwe sitirandibû lê wê xwe li dînbûnê danîbû. Islam jî dibêje guneh ji dînan re nayê nivîsandin. Min pirseke din avêtibû ber zîrekîya zêrkerê helebî. Bavê wê jî rebenekî nexweş e, îro dimre sibe dimre. Bi jana zirav e û mîna jina xwe kor e jî. Xwe û jina xwe û vê keçikê bi firotina sabûnan û zeytê û yek caran jî gulên cûrî û baqên yasemînan diqedîne. Sê kurê wî hebûn her sê jî di seferên artêşên osmanîyan de nebedî bûbûn.

- Xoce Martîn ma tu bi îtalî dizanî?

Min bi zimanê latînî ku nêzîkî îtalî ye dizanîbû loma jî min got:

- Ez baş tê digihîjim, dikarim fêr bikim.
- Kewserê jî bi îtalî dizane.

Dema wî wisa got ez pê hisiyam ku çiyayekî ji qeşayê di navbera min û wê keçika serbest de dihişê û tê ku dilê min weke qeyikeke şikestî bide ber pêlên bexteweriyê. Kêfa min gelekî hat û min berê xwe da wê û pirsî:

- Ê vero?<sup>1</sup>

Çavên wê mîna du stêrikan biriqîn û bi kêf got:

- Sî è vero.<sup>2</sup>
- Baş e. Tuyê min fêrî axaftina helebî bikî!

Wê bersiva min neda. Serê xwe daqûl kir mîna ku li tiştêkî xwe yê windayî digere û bêdeng ma heta ku derket. Min dîsa li pey wê bang kir bêtî ku li hêviya tu bersivan bim:

- Tu yê min fêrî axaftina helebî bikî ne?<sup>3</sup>

Îtalîzanîna Kewserê gelekî bala min kişand û agirê mereqdariya min gurr kir lê ji ber ku dema min zêde nebû û ew jî bêtî ku bersiva min bide çû, min nas nekir ew çawa fêrî wî zimanê rojavayî bûye. Ew bi xwe zimanê îtalî li Helebê bûbû zimanê ticaretê û hema bibêje çî bazirganê hebû bi wî zimanî dizanîbû. Tercumanên ku ji wan re dibêjin Drogman jî hemûyan bi îtalî dizanîbûn. Lê Kewserê!! Ev yeka hanê gelekî xerîb bû.

Piştî dîtina Kewserê ez hinekî li bajêr geriyam û paşê vegeriyam xanê. Di kolanên teng re bêdeng dimeşiyam. Hawîrdorê kolanê jî ser dîwaran şaxên yasemînan berjêr bûbûn û bineke xweş belav dikirin. Gulên cûrî, yê Muhemedî, binefş, qerenfîl, yasmîn, lalê û her cûre gulên ku havînan dibişkivin giyan vedijandin. Di dirêjiya riya vegerê de rûyê Kewserê û ew bejna û qelafet û sîng û berê ku xwîn di rehên min de dikeland ji ber çavên min nedîçûn. Hayê min nema ji derûdorê hebû. Dîtina min dît vaye ez gihame ber derê xana Hokiya dîdûn ya ku ez lê dimam. Yekser min berê xwe da odeya xwe. Ez li kal û pîra ermenî jî nesekinîm. Min deriyê odeya xwe li pey xwe girt. Perde berdan û di tariya odeyê de noqî gola lezzetê û deryayek ji xeyalên ronî yê di rengê çavên Kewserê de bûm.

<sup>1</sup> Bi îtalî ye yanî: ma rast e?

<sup>2</sup> Bi îtalî ye yanî: erê rast e.

<sup>3</sup> Heta niha jî ku ew roj tê bîra min, ez li ehmeqiya xwe û dilêriya Kewserê ecêb dimînim! Hela min bi zagonên şerqê nizanîbû û ez biyaniyekî ku nû hatibûm wî welatî bûm, ma wê çima negote min ku têkiliya di navbera me de wê xeter be! Ew bi xwe ku pê bihişiyana yekî ewropî li ba jineke osmanî ye, yê ewropî bi saxî dişewitandin. Eger neşewitandana jî pereyekî pirr jê distendin û ew ji wî bajarî sirgûn dikirin. Havînekê meha gulanê ku jinan koxik li nav darên tûyên spî ava dikirin û pelên tûyan li ser erdê rêz dikirin û kurmên hervirmêş berdidan nav, bazirganekî venedîkî di wir re buhurî bû, qey xwestibû li wan û hunerê kurmperwerdekirina wan temaşe bike, bûbû wîrewîra jinan û çend serbazên osmanî hatibû û ew bazirgan girtibûn. Ku ne mehderiya qonsulê Firensayê bûya dibû ku serê bazirganê reben bi şûr bifirandana jî. Berî demekê wî bazirganê venedîkî xwe kuşt. Di bazirganiyê de têk çûbû. Ne tenê ew têk çûbû, lê Venedîk a ku kilîten bazirganiya Levantê di destê wê de bûn jî têk diçû. Êdî cilik ji bin lingên wê komara deryayî hatibû kişandin û nema dikarîbû rewşa xwe vegerîne mîna berê. Ingilîzan, holendiyan û vê dawiyê firensiyan jî erd li venedîkiyan teng kiribûn. Ji xwe şerê wan û osmaniyan jî dawî li serdema wan a zêrîn anîbû. Êdî Portugalê jî bazirganiya beharatan ji destê wan deranîbû, qumaşê çuxê Londrîn ê ingilîzî zora çuxê venedîkî biribû û nema yek muşteriyî jî berê xwe dida venedîkiyan. Çuxê venedîkiyan ku bi navê Eskarletto tê nasîn û rengê wî sor e, diyariya herî bi nîrx bû ji bo sultanên. Lê niha! Wî rebenî jî, jiyana xwe kire goriya têkçûna welatê xwe û çuxê welatê xwe.



## Se`et 2

**D**u caran zingezing bi zengilê zenggirtî yê dêrê ket<sup>1</sup>. Xwendevanê ilahiyatê ku nola nêçîrvanekî zîxika perîka qazê li ser rûpelê datanî û dida pey peyvên ku di defterê de nivîsandî bûn û ew dipan û dixwendin, hinekî rawestiya. Serê zîxikê li serê peyva Kewserê ku di hevoka dawî ji rûpela buhurî de bû, rawestiyabû. Êdî wî bi heyecan çîrokên di wê defterê de dixwendin. Tî bûbû ew, lê di xwe re nedidît ku dakeve jêr û avê vexwe, xirtepirta ji odeya cîranê wî dihat, ranewestiya bû. Himehimeke nizim mîna ku yek di ber xwe de bistirê jî dihat. Herçendî wî guhên xwe miç kirin ku hema tiştêkî fêhm bike, bê havil û encam bû. Deng ji bara li jêr nedihat. Wî wisa texmîn kir ku piştî navrojê her kesek çûye odeya xwe û pêlekê paldaye. Tenê pêlên awazeke nerm û xwedayî, mîna perîkên deveteyrekî ku di ser rûyê mirov re bi nazikî bixuşe, dihat. Awaza kewanê bû<sup>2</sup> ew. Xwendevanê ilahiyatê çavên xwe dane ser hev û hat ku di xew re here lê awazên nihênî yên di wê deftera di nav destê wî de mîna zengilekî xurt bangî wî dikirin. Careke din wî çavên xwe vekirin û di pencereyê re nihêrî. Mij pir tîr bûbû. Nema dever xuya dibûn. Serbanên ji qermîten sor, ên ku sibehan di ronahiya rojê de dibiriqîn, weke sendoqên kemaçeyên li ber ronahiya mûm û çirayên di katedralekê de ronî didan, êdî bi mijê hatibûn nuxumandin. Wî zîxika perîka di destê xwe de piçekî bada, balîfa li pişt serê xwe hinekî rast kir û xwendina defterê bi wê rîتما berê domand:

---

<sup>1</sup> Berî ku Georgê sêwî hilkişe jor û werîsê zengilê sifir du caran bikşîne, doza sed hellerên deh rojên berê kiribû. Karl gotibûyê ku ewê êvarî bidîyê û jêre bi xaça pîroz sond xwaribû ku vê carê rast e. Georg zêde bawer nekiribû lê di dilê xwe de gotibû ku, gavên derewan kinik in û vaye êvar hat. Û derpiyê xwe bi lez kişandibû xwe û mêzerê xwe yê qehweyî berdabû ser û li ser tiliyên nigan bi derenceyê ve hilkişiyabû. Karl jî pêşî di pencereya zêrzemînê ya ziravik re ku meydana ber dêrê têre xuyabû nihêrî û guhên xwe miç kirin. Dema dît ku pêjna tu kesî nayê, ew jî derkete jor û mûmek di hêwana dêrê ya tarî de pêxist.

<sup>2</sup> Kemanjenê ji Mülhausenê, hevalê Johan Sebastiyen Bach piştî ku dît kesên li ser maseyan xwarina xwe qedandine, xwest hinekî giyanên wan av bide. Rabû parçeyek ji awazê kantata hevalê xwe Bach (Gott ist mein König = xweda şahê min e) bi jihen kemana xwe jenand. Di ber jenandinê re çavên xwe girtibûn û ew roja sar ji Sibata par dianî bîra xwe. Wê rojê berf gihabû kabokan û bi şev pêde banên malan ên serberjêr û qermîdî bi spîbûneke birqonekî dipêça û şaxên daran giran û berjêr dikirin. Giregirên bajêr, li dêra Divus Balsius a pencere dirêj û di nivê bajêr de, li ser kursiyên xwe ên bi qedîfeyên sor ên nixrdar nuxumandî bédeng rûniştîbûn. Bach, bi paltoyê xwe ê dirêj, ku ji çuxekî reş î li bajarê Marsilyayê hatî durustkirin, çuxekî giranbûha û bi mexmerekî kesk î tarî betankirî û bi rêzek bişkoken zêrîn di pêşî û qevdikên paltoyê reş de xemilandî bû. Bi solên bi bizmikên zîvîn û qutikê ji hevirişimê spî û perûkek li serî, li ser kursiyêke bê palpişt rûniştî bû. Kemanjenê ji Mülhausenê jî çena xwe dabû ser kemana xwe û di bin çavan re, geh li hevalê xwe Bach û geh jî li giregirên rûniştî dinêrî. Mîna firefira baskên firîşteyekî deng bi lûleyên Orgela mezin ket. Henasên Xwedê bi xwe têre dibuhurîn û li dîwarên dêrê yên bilind dialiyan û deng vedidan. Xwedê bi xwe wê sibeha sar bi henasên xwe ên germ î ku li ser tiliyên Bach diherikîn, daketibû wê dêra ku pencereyên wê nola nalîna Mesîhê li ber xaçkirinê, bi ezmên ve hilperikî bûn.

Êdî bexteweriya evînê jan dida dilê min û ez diguvaştim. Xwe ji xeyal û xewnên min bernedida wê delala kurd. Kewser meyweyekî şekirbar lê dûredest bû. Ez li çareyekê geriyam ku ez û Kewserê hema mehê du caran be jî hevdû bibînin. Hespê işqeke bi tîn di dilê min de dida cirîdan. Cara yekê bû ku hestên wisa pîroz, xweş û bi tirs û xweziyan û janeke nenas re têkel dibînim. Evîn bû ew, evîneke nola newaleke mişt stirî û dilê min jî evdalekî xwas û kor bû. Ez dil ketibûm wê keçika kurd î serbest î îtalîzan î misilman! Demeke min a dirêj li wan welatan nebuhurîbû jî lê min êdî naskiribû ku civaka şerqî bi tu rûyî hevdîtina mêr û jinekê, yan xort û keçekê ku ne tiştekî hev bin, napejirîne. Behane çî be jî nabe, dixwazî bila fêrkirina Quranê bi xwe be jî nabe ku xortek li rex keçeke biyanî bi tenê rûne. Ew dibêjin ku nêr û mêyek li ku hevdû bi tenê bibînim, dê şeytan kesê sêyemîn be di wê civînê de!

Çend roj derbas bûn bêyî ku çavên min bi Kewserê bikevin. Min ji xwe re di xeyalê xwe de hevdîtîna pêk dianîn. Geh min di nav nivînên xwe de ew tazî didît, geh di quncikekî tarî de min ew zeft dikir û geh jî dihate xewnên min.

Hefteyek derbas bû ew dîsa hate xanê! Vê carê bi tenê bû û tûrikek hinne û çend guldestên yasemînan pê re bûn. Min ji çavên xwe bawer nekir û ez bi lez daketim jêr. Pîr û kalên ermenî, Wanês û Zarayê xwe dabûn bin siya dara purteqalê û tirî dixwarin. Xirecira bazirganan bû, hin derdiketin û hin jî ji bajêr dihatin. Ji vir de silavek ji wir de bişirînek heta ez gihame nêzîkî Kewserê. Min xeyal dikir ku kesên li hewşa xanê hemî dengê gupegupa dilê min dibihîzin û bi raza dilê min dizanin loma jî heta ji min hat min hewl da ku hestên min ên derûnî di rûyê min de derneyên. Bi wê tevliheviya rûhî re ez hatim li rex Kewserê rawestiyam. Kirasekî şalê hindî yê şînê ezmanî û gulhûr lê bû. Kirasekî fereh bû ku deşt û newal û evraz û nişûvên laşê wê veşartibû. Desmaleke etlesê zer î sadereng jî porê wê nuxumandibû. Lê tu tiştî nikarîbû awirê wan çavên dirrinde veşêre û dilbijîna wan binixumîne. Bi fediya aşîqekî rewal û nûhatî ez ber bi wê ve çûm. Heta wê gavê jî ji min re baş ne zelal bû ka gelo hestên min bijandina wê keçikê ne yan jî evîneke rast in! Ji xwe destpêka her evînekê jî dilbijîn e berî ku bibe dilbirijîn. Him dilê min dibijiyayê him jî dibirijî. Ez di navbera hestîna dîn û evînê de dişewitîm. Lê cegermendiya min a ku evîndarî dikare wê bide kesê herî tirsonek jî alîkariya min kir û hema min yekser jêre got:

- Te amo<sup>1</sup>.

Wek wê roja ku min bi erebî gotibûyê ez gelekî ji te hez dikim vê carê jî Kewserê ne mîna keçeke nûhatî ku cara yekem wê gotina cantezîn dibihîze. Min pêşî texmîn kir ku wê ji min fêr nekir yan jî nebihîst. Ez hinekî bêdeng mam. Mîna nêçîrvanekî di kozika xwe de ku çav li nêçîrê ketiye bê çawa ber bi xefka vedayî de diçe wisa ez jî henasqut mam. Lê wê, wê nêçîra ku nêçîrvanê xwe da ber tîr û kevanan ez veciniqandim û mîna xuşîna pêla çemekî got:

- Ti amo anche io<sup>2</sup>.

Bi vê gotina xwe re jî bişirîneke watenas kişande ser lêvên xwe ên mîna du dane tiriyan di dawîya meha tebaxê de û awirên xwe ji çavên min nema birrîn. Wê bişirîna şêrîn gelek rezên razên razayî di xeyalê min de şiyar kirin. Wan awirên wê jî ez aware kirim. Lê ez ji bişirîna wê têgihîştim ku ewê karibe bexteweriya ku ez li pey wê heta van welatan hatime, bike para min. Tirs û şadiyê xwe li hev alandin û bûne hestekî têkel û dilê min dane ber xwe û ew tevizandin. Ji nişkêve, dengê wê yê nazik dawî li tevizîna dilê min û pûçbûna giyanê min anî û mîna ku xwesteka dilê min xwendibe got:

- Tu bixwazî ezê te fêrî axaftina helebî bikim!<sup>3</sup>

\*\*\*

<sup>1</sup> Bi latînî ye yanî: ez ji te hez dikim.

<sup>2</sup> Bi îtalî ye yanî: ez jî ji te hez dikim.

<sup>3</sup> Min yekser jêre got ku, erê ez dixwazim. Min jêre got jî ku hevdîtina xortekî filleyî biyanî û keçeke misilman ne mumkin e. Wê jî got ku ew yek karê wê ye, ewê çareyê bibîne. Û bi rastî jî çareyek, piştî heftiyekê, dît. Ma çare bû! Ancax mirov mînaheke wê di kitêba Elf leyale we leyale de bibîne.

Finasên jinên şerqî seyr in! Gava dilê yekê wan bixwaze dikare maran bireqisîne û daran bimeşîne. Civaka wan ku mêr têde zêde desthilatdar e hiştiye ku jin dek û dolaban mîna çeka herî giran li dijî dijaminên xwe bikarbîne. Bi rastî jî di vê hunerê de ew hosta û pispor in. Ku min bi xwe kitêba *Elf leyle we leyle* nexwendiba minê nizanîba ku ewqasî jinên van welatan bi xap û rîp in. Hema ji şeva nehan de di destpêka kitêbê de hikayeya hembal û sê keçikan hîlebaziya jinên şerqê diyar dibe. Ew dikarin petrek û şêxan ji rê derînin û qîddîs û weliyan bikişînin ser zikên xwe. Jin li ku bin dikarin mêran bixapînin lê jinên şerqî di vê hunerê de şareza ne. Kewser jî ne bes weha bû, lê ew di vê yekê de hostayeke yekta bû. Dema ku wê carekê ji min re qala Pietroyê venedîkî kir ku çawa ew fêrî zimên kiriye, devê min çû piştguhê min. Bi wê hîleyê bi xwe ez jî ajotibûm xefkên xwe ên di kirasê dersan de.

Wê gotibû ku bav û diya wê kal û pîrek in û kor in. Û ji min re gotibû ku ez dikarim xwe bi ebayeke jinan rapêçim û bêtirs dema ku dibe qîçeçîça roja nîvro berê xwe bidim mala wan a ku ne dûrî xanê bû. Wisa, wê digot, kes dê bi me nehese. Min jî, minê ku meya awirên wê û bişirîna lêvên wê ya watenas ez serxweş kiribûm, bi ya wê kir. Min hîç nepirsî ku ev tevgerêke ziyandar e û dikare serê min têde here. Min nepirsî ku encama karekî wisa dikare bibe dawî ji jiyana min re, ji xewna bexteweriyê re, dikare bibe kêra ku berxê bexteweriyê pê serjê bibe. Lê ez bi rastî aşîq bûbûm û min wek her aşîqî nema ber xwe didît. Ne min got! Evîn rêberekî kor e.

Di roj û dema ku wê ji min re bi nav kiribûn de, min li koşeyekî xalî ebaya reş avêt ser xwe. Ji serî heta binê nigan ez hatime veşartin û min berê xwe da mala wê. Dilê min bi gavên min ên lezok û tirsok re fikir gupîni heta ez gihamê ber deriyê mala wê û min du caran lê da<sup>1</sup>.

Ez gelekî li ber derî nemam. Kewserê zû derî vekir û ez derbasî odeyekê di dawiya hewşê de kirim.

Dema em derbasî wê odeyê bûn û min ew ebaya reş ji ser xwe şeqitand. Ez di xwîdanê de mabûm. Wê jî desmala xwe danî û porê wê bi ser navmilên wê de mîna şeveke zivistanê herikî û got:

- Dopo ci si siede<sup>2</sup>.

Me dest pê kir em bi îtalî axivîn. Îtaliya min li Helebê dest pêkiribû û ji ber ku min bi latînî zanîbû ez zû fêr bûbûm. Tacirekî ku îtalî nizanibe nîne li Helebê. Lê wê, dema dît em bi îtalî diaxivin got:

- wisa tu fêrî zimên nabî, tenê wek ez dibêjim bibêje.

Û dest pê kir. Hevoka yekem ku ez fêrî wê bûm jî: *bihibbek mot* bû<sup>3</sup>.

Roja pêşî, paş ku ders qediya, Kewserê hat û destên xwe li nava min gerandin. Gewdeyê xwe ê dagirtî nêzîkî gewdeyê min kir, xwe bi min ve zeliqand. Ez wê kêlîkê pê hisiyam ku ew qetek ji êgir e. Dilê min mîna çûkekî derblêketî dikire pirtepirt û kabokên min dilerizîn.

<sup>1</sup> Deriyê ne gelekî mezin, du çemberên wî hebûn, çembereke sifir î nizm ku serê xezalekê bû û çembereke jê bilindtir ku lepê pilingekî bû. Çemberên nizm ji bo zarok û jinan in û yên bilind jî ji bo mêran in. Ev hema hema di her deriyê de heye. Min ev yek berê dizanîbû loma jî min li ya xezalê da. Bi rastî jî gava mirov li wan çemberan dide dengê nazik ku layiqî jinan e jê derdikeve. Di hin deriyan de ya jinan destekî nazik î bi bazin e, hin gul in, hin jî stêrik in. Yên mêran jî sembolên hêza giran in mîna serê şêr, lepê pilingan û yan jî destekî ku gogek têde ye. Ji xwe hin jî hema xelekek sifir yan hesin in.

<sup>2</sup> Bi îtalî ye yanî: kerem bike rûne. Kewserê bi zimanê îtalî baş dizanîbû! Tacirê venedîkî yê bi navê Pietro, ew fêrî zimanê xwe kiribû. Wê bi xwe ji min re got ku ew tacirê ku di xana venedikiyan de bi cih bûbû salekê temam pêre raza bû. Him ticareta xwe dikir, him fêrî erebî dibû, him jî kêfa xwe di wê hemêza efsaneyî de didît. Kewserê nizanibû tişt veşartana.

<sup>3</sup> Heta mirinê ji te hez dikim. Ev e wateya vê hevoka ku ez pêşî û berî her tiştî ji devê Kewserê fêr bûmê. Wê digot: weke min bibêje. Lê ew tîpa ku ji koka zengelokê derdikeve bi min re dernediket. Tîpên erebî yên ku ji koka zengelokê derdikevin, ji bo biyaniyan zor in. Tîpa pêşî `eyn e ʿ ku bi min re mîna E yan Û yan jî Î yan jî A derdiket. Pişt re ح tê, bi min re H derdiket. Heta ez fêrî lêvandina wan herdu tîpên qirikê bûm, min sed maç xwarin. Her şaşıyek min bi maçekê bû. Min vê dawiyê ji qesdî ve û bi hemdê xwe şaşî dikirin. Timaya min di maçên wê de bû.

Henasên min kurt û kûr bûbûn. Ez mest bûbûm. Wê devê xwe bi awayekî mişt bijandin nêzî devê min kir û ez maç kirim. Te digot buharekê li ser lêvên min venişt. Min xwe winda kir. Min nema ber xwe dît. Ezê tî, ezê ku min jin di jiyana xwe de tehm nekiribûn ketim ser sînga wê ya esmer û me hevdû li wî xaniyê biçûk gevizand. Axînen xweşiyê ji min bilind bûn. Wê destê xwe da ser devê min û got:

- Huşşş. Erê dê û bavê min kor in, lê ne kerr in xoce Martîn.

Şerm û xweşî, kêf û tirs û hestî nediyar wê rojê li ba min tev li hev bûn. Ez bi rastî çûbûme cîhaneke din. Çûbûme ber keviyê wî hewzê misilmanan û ji wê avê têr nedibûm.

\*\*\*

Dersên fêrbûna devoka helebî bi wî rengî bi mehan dom kirin. Her ku azana nîvro bilind dibû û xelk li kolanan nediman min ebayeke reş ji serî heta gwîzeka lingan li xwe dipêça, rûyê xwe vedişart û berê xwe dida mala Kewserê. Di nav re bavê wê bi jana zirav mir. Lê min tu xemgînî li ba Kewserê nedît. Ew hîç li ber bavê xwe neket. Piştî binçalkirina bavê wê bi du seetan xwe gihandibû min û gotibû ka em herin dersê. Êdî gotina em herin dersê bûbû kilîta deriyê şehwetê ji me herduyan re. Di roja mirina bavê wê de em heta destê sibê di hemêza hevdû de bûn<sup>1</sup>. Êdî me rû ji hev standibû. Wê jî di ganê de hezar û yek huner dizanîbûn. Radibû ser min, bi min dilîst, ez dimêtim û dibirim keviyên buhuştê. Wê gelek caran qala Pietroyê venedîkî dikir. Wî bazirganî memikên wê salekê tamam mis dabûn û firkandibûn heta ku ew kiribûn du girên gir î ji êgir. Lê niha bûbû ya min. Ew gulokên êgir di destên min de ronî didan û ez dihilandim.

Min êdî bexteweriya xwe di hemêza Kewserê de didît. Di wê kêliya bi tirs de di bin wê ebaya reş de di wê navbera xana Hokiyîdûn û mala wê de bextewerî mîna wê xaliya esfehanî ku Alberto ji Esfehanê bi xwe re anîbû, li ber lingê min hatibû ramedandin. Kitêb ji bîra min çûbû. Şaberûya ku min bi xwe re ji welatê xwe anîbû êdî hişk dibû û teqteq jê dihat. Bûbû mîna qetek çermê ku li ber tava rojê mayî. Bêrîkirina min a ji welatê min re jî roj bi roj wek gulokek berf di agirê evîna Kewserê de dihliya. Ku çavên min bi wê şaberûyê diketin, hinekî xemgîn dibûm. Gundê min, malbata min û hevalên min ên zarotiyê dihatin bîra min. Lê tavilê perdeya bexteweriya nû dikete navbera min û wan bîranînan. Ez yek caran dihatim ku wê şaberûyê biavêjim lê tavilê min digot ku bila hebe. Ew nikare tofana xweşiyê ku ez dame ber xwe rawestîne. Ew nikare rê li ber bexteweriyê bigre. Bextewerî jî bûbû ew dersên fêrbûna erebî û ew kêlîkên ji hingiv. Min nas kir ku bextewerî nikare di kitêban de hilê. Bextewerî jiyan e, jiyan bi xwe ye. Bextewerî jin e ne tiştêkî din e.

Piştî şeş heft mehan êdî ez fêrî hevokên herî pêwîst û rojane di zimanê erebî de bûbûm û fêrî devoka helebiyan jî bûbûm. Lê aksenta biyaniyan her di axaftina min de xuya bû. Li ser destê Ebdullahê kurê Zekeriyayê zêrker ez fêrî nivîsandin û xwendinê jî bûbûm. Xeta Ebdullah gelekî ciwan bû. Min jî hewl dida ku mîna wî binivîsim. Lê nivîsandina erebî zor e, ji rastê de tê nivîsandin û herfên vî zimanê jî divê bi hev ve bin. Ne bes weha lê hin herf hene serê wan bi herfa berî xwe ve tê zeliqandin û dawî serbest dimîne. Hin jî hene serî û dawî xwe bi herfên berî û dû xwe ve girê didin. Herf jî li gor cihê xwe di peyvekê de tê guhertin. Di nêvî de be şikleke, di serî de be şiklebe û di dawî de de be şiklekî din e ku naşibihe herduyan din.

Ji bo min rênivîsa vî zimanê zor û zor ciwan gelekî giran bû loma jî ez hinekî dereng fêrî nivîsandina xweşik bûm.

---

<sup>1</sup> Tiştê ku hate serê min ji bo wê şeva lezzetbar! Her biyaniyek divê êvarê bi rojavayê re li xanê vegere, lê ez venegeriyabûm. Li min geriyabûn û pirsî bûn. Odebaşî qunsulên ewropayî hemû agahdar kiribûn, li cem her kesê ku min ew nas dikirin pirsî min kiribûn, heta gumana mirina min jî kiribûn. Min jî nizanîbû dê ewqase lêpirsîn hebe. Sibehê dema ez vegehiyam xanê û min nas kir ku min zagoneke xanan şikandiye, min got ku min xwestibû berê xwe bidim Iskenderûnê û pêşwaziya hinek mal bikim lê min bi rê de bihîst ku gemî dereng digihin benderê, ez şevê li gundekî razam û paşê zivîrîm hatim. Piştî wê yekê ez nema şevder dimam.

\*\*\*

Hîn ji sala ku ez têde ji welatê xwe derketibûm û min berê xwe dabû van welatan peymanek di navbera osmaniyan û ewropiyan de li Karlofçayê imze bûbû. Encama wê peymanê ji bo me firenciyên li şerqê baş bû. Êdî ewropiyan li welatê osmanîyan bêtir rihetiya xwe dîtin. Hin qeyd û bendên bazirganî ji ser wan rabûn û tevgera misyoneriyê jî siviktir bû. Rêjeya keştiyên ku ji benderên Marsîlyayê, Venedîkê, Cenovayê, Amsterdamê û xeyrî wan digihane lîmanên levantê duqatîbû. Û reqabet di naberaz bazirganan de jî duqatî bû. Hinek têkçûn û hin jî bi ser ketin û bilind bûn. Min bi xwe karekî sivik dikir. Ez hîn nebûbûm ew bazirganê mezin ku roleke xuya di sûkê de bilîzim. Masiyekî hûrik bûm ez di gola hûtan de. Fêda min î herî mezin xweparastina min bû. Lê di gel ku kelemên li pêşiya me bûn bi xêra wê peymaanê rabûbûn jî hê jî me nikaribû em derbasî civakê osmanî ên misilman bibin û dîr herin. Têkiliyên me û wan di ser re bûn. Li Helebê komikên ewropiyan çalakiyên xwe bi tena xwe li dar dixistin. Çûna nêçîrê, şevbuhêrk, zemawend û şahiyên me cihê bûn û yên wan jî cihê bûn. Heta yek caean ez pê dihisîyam ku ew xanên em têde, ew qunsulusên ewropiyan zindan in û em jî girtî û dîl in. Em ne mîna hev bûn. Him bi olên xwe him bi reng û rûyên xwe û bi dab û nerîtî û tradîsyon û rîtuêlên xwe em dîrî hev û ji hev cudabûn. Min bi xwe di gel ku dostên min ji bazirganên firencî digotin xwe zêde nede ser civaka wan, guh li wan nedikir û xwe dida nav û hewl dida nav. Loma jî ez di nîqaşên kûr yên civaka xiristîyanên helebê de beşdar dibûm. Li dêran, li nav malên ku ez dibûme mêvanê wan û li her civakeke xiristîyanan guftûgoyên mezin li ser katolîkan û lûterîyan û mezhebên din jî li dar diketin. Li ser têkiliya ku divê di navbera fille û misilmanan de li dar bikeve û li ser rastiya her yekî ji herdu terefan me nîqaşên bêdawî dikirin. Lê tiştê ku zêde bala min dikişand ew cudatîyên kûr yên di nav mesîhiyên şerqê bi xwe de bûn. Min nizanîbû ku ew nakokî li her devera ku xiristîyan lê dijîn hene. Min digot ev nakokîyên bi vî rengî tenê ji para me rebenên li rojavayê ne. Ew nakokîyên kûr yên ku gelên rojava dane ber kêrên kîna reş ku bi sedhazran kuştî, sêwî, bî, penaber, kitêbên şewitî, gundên talankirî û her cûre qirêjiya şerên mezin û bêwate li pey xwe hêlan. Di wan nîqaşan de min durûtiya dewletên me yên ewropayê jî nas kir. Her yekê xwe dikire xwediyê xaça pîroz û dixwest kîlîten gora Mesîh bi dest bixîne. Rûsan, firensîyan, papayê Romyê û ingilîzan li ser gora Mesîh şer dikirin. Osmaniyan jî kîlît didan kesên ku kîsên xwe vedikirin û zêde zêr dirijandin.

Min wisa xeyal dikir ku şerq cihê ronahiya erd û ezman û giyan û bîr û bawerîyan e. Min digot ku Mesîh li wir ji dayik bûye loma jî ewê axeke pîroz û paqij û layîqî jidayikbûna Mesîhê xelasker be. Lê min bi çavên serê xwe dît çawa xiristîyanên me li şerqê jî hevdû gawir dihesibînin, kitêban derheqê pûçkirina bîr û boçûnên hevdû de dinivîsin û yekcaran jî li kolanan dikevin qirika hevdû. Min dît bê li himber katolîkan, hela tu kalvenî û lûterîyan deyne aliyekî, agirê çî şerekî dijwar gurr û geş dikin! Ortodoksên Helebê, ku girêdayî kursiya Antakyayê bûn û ji wir jî girêdayî Qustantînopolê ne, bi hemû hêza xwe li ber xwe didan. Heta dereceya ku wan dewleta osmanî bi tevgera dijberên xwe ên olî agahdar dikirin. Dijberan jî, ku piraniya wan ji mezhebên fransîskan û latîn û kalvenî û lûterîyan bûn û ji rojavayê hatibûn û misyonerî dikirin, di xanan de, li qunsulgehên rojavayî, li sûkên mezin û li her deverê rastiyan xwe weke kulav û xalîçeyên rengîn rast dikirin û li ber her lingî radixistin. Tebîeta Mesîh, ka gelo xwedaye yan mirov e, lahût e yan tenê nasût e! Jidayikbûna wî û gelo dayika wî jî xwedaye yan diya xweda ye!! Ma Mesîh di şeva yekşema pîroz de şîv xwar yan na? Şîva wî kîjan nîfşê xwarinê bû? Û gelek pîrsên weha bûbûn mijarên nakokî û nîqaşên mezin di civaka xiristîyanî de. Kîniştêya Helebê, yan jî a rast kîniştêya Antakyayê, ketibû ber diranên heyretê. Bûbû hêlanek û di navbera Romyê û Qustantînopolê de diçû û dihat. Çavek li vir û yek li wir bû. Gelek caran metropolîtê ortodoks ez li ba xwe dihiştim û digote min ka rastiya protîstant û kalveniyan bêje min. Carekê dema ku min li gor ku dizanîbû hin agahî jêre

gotin, serê xwe dihejand û bi çavên xwe ên mişt ronahî li îkonên ku Îkonstans (dîwarê ku dikeve navbera kursiya îsquf û nimêjkeran) xemilandibûn nihêrî û bi dengê hêdî mîna firîna perwaneyekê got:

- Xwedê berxên xwe ji bîr nake kurê min.

Mamostayê min ê biçûk Ebdullahê kurê Zekeriyayê zêrker jî, di gel temenê xwe ê panzde şanzde salî beşdarî wan nîqaşan dibû û piştgiriya dîne ortodoksî dikir. Wî dixwest berê min ji rêya xwar, wek ku wî nav li mezhebê min î lûterî dikir, vegerîne. Delîlên xwe ji Incîlan dianîn. Çîrokên rahiban û mesîhiyên pêşîn jiber kiribûn û amade bû xwe di ber fikrên xwe de bimre jî. Vê dawiyê kînîsteya Helebê êdî duqet bûbû, birrek ji civakê ji mezhebê ortodoksî qetiyên û bûne katolîk. Ebdullahê mamosteyê min jî bû katolîk û hin risale û namîlke derheqê rastiya katolîkan de nivîsîn.

Ji xwe di civaka misilmanan de jî cidalên mezin hebûn. Wan jî, her yekî ji alî xwe de bi quloçê rastiye girtibû û ew diajote selexanê û kêrên xwe yên tûj datanîn ser zengeloka wê.

Carekê di sala min a yekem de, rojeke îne bû û berfê kolan spî kiribûn<sup>1</sup>. Ez ji dîrsa erebî, yanî ji hemêza Kewserê ya germ, derketim û min bi wê ebaya reş ku min her carê xwe di nav de vedişart, xwe berda kolanê. Li qunceki xewle ku benîademek jî lê nebû, min ebaya xwe ku ji barîna berfê şil bûbû ji xwe şeqitand û xiste tûrikekî û meşiyam. Min dît du komên mêran ên mezin, her yek li serê kolanekê ye û di destê wan mêrên hêrsbûyî de xencer û cinih in. Hayûhoy bi wan ketibû û kelexa spî mîna dûyê bixêrîk û tifikan ji firnik û devên wan dikişiya. Çend deqe neçûn bi nav hev ketin û bû şer. Min nizanîbû çi doz e! Min qedere niv saetê li wê şemateyê temaşe kir. Bi cinih û daran bi nav mil û serê hev ketibûn ew herdu kom. Heta ku birrek leşkerên yenîçeriyên ji kelê daketin û ew bi qamçiyên ji hev belawela kirin. Wan hevdû baş eşandibûn. Kesî ku birîndar nebûbû nebû. Lekehên xwînê li ser wê berfa li kolanên mîna kulîlk û laleyan ku li ser cawekî spî neqîşandî bin, xuya dikirin.

Min dixwest nas bikim çi diqewime. Kalek li wir bû rabû min jê pirsî ev çi meseleye? Keniya, devê wî ji hev vebû heta zimanokê biçûk li serê gewriya wî di kûraniya devê wî yê kox de xuya kir û bêyî ku zanibe ez kî me, got:

- Ev henefî û şafî`ne. Te şerê wan nediye birazê!! Hertim wisa ne.

Piştî çend rojan ji wê bûyerê min rastiya wê nas kir. Gundiyekî ji derdora Helebê, li mizgefta mezin ji melayekî pirsî bû: mela efendî! Destê min bêhemdî min, haşayî cenabê te, li terrikê min ket ma desmêja min dişkê yan na? Melayê ku şafî`î bû di cih de gotibû: erê wey, çawa naşkê! Hedîsa pêximber dibêje ku destê kê ji we bi ewkê wî bû, divê ji nû ve desmêj bigre. Li rex wan ne dîr, feqeyekî henefî jî hebû. Xortik bû û şaşikek spî li serî gerandî bû. Hema xwe zer kiribû ewê gundî û gotibûyê: na na pismam desmêja te inşallah naşkê. Li ser mezhebê henefî naşkê. Pêximber ji sehabiyekî xwe re gotiye: ma ne terrikê te jî qetek ji laşê te ye îca desmêj ji bo çi ye! Ê berê xwe dabû melê û gotibûyê. Dîn hêsaniye mela efendî. Lê hûn şafî`î pir dişidînin û delîlên wan ze`îf in. Melayê safî`î hêrs bûbû. Li bîedebîya wî feqeyê henefî ecêb mabû. Tizîbiya xwe ya seddaneyî avêtibû nav rûyê feqî û gotibûyê: hey bîedeb, tu hîn zîxan û ferxik î tu fitûyê jî didî! Ev hûn herçî henefî ne hemî wisa bîedeb in. Sûc sûcê imamê we ê mezin Ebû Henîfe ye. Ji vî feqeyê henefî yek û ji wî melayê şafî`î yek, bi hev ketibûn û şaşikên herduyan jî li hewşa mizgeftê gindirîbûn. Îcarê peyrewên herdu mezheban jî kom bûbûn û hatibûn hewara mezhebên xwe. Gundiyê reben nema tişte fêm kiribû û nema zanîbû ka gelo desmêja wî şikestiye yan na! Di wî şerê ji bo Rastiye de, negihabû tu rastiyan.

Di nav wê xirecirê de, di nav wan nakokiyên de, ez Martîn filleyê firincî û Kewsera kurd î misilman ketibûn cenga yekkirina bawerî û ramanan, ran û ranan, xeyal û rastiyan û xewn û hêviyan. Dîn û îman bûbûn ew kêlîkên germ ku giyanên me di odeya biçûk a Kewserê de pê

<sup>1</sup> Rojên înan di dema nimêjê de, deriyên xanan li ewropiyên di hate girtin û qedexa bû ku ew li kolanên bigerin. Hinan digotin ku osmanî wisa dikin da ku biyaniyan ji tundrewên misilman biparêzin, hinan jî digot na, ew wisa dikin da ku xwe biparêzin. Ji zû de li welatê misilmanan gotinekê belav bûbû ku firencî, yanî xelkên Ewropayê dê di rojeke îne de êrîşî welatê islamê bikin û zefî bikin.

dihatin sotin. Kewsera ku têtikiya min a cinsî bi wê re di ser re bû bûbû rastî û bexteweriya min. Ez ji hunerên wê yên di nav nivînan de raberî min dikirin dimame ecêbmayî! Ewê digot ew ji kitêban fêrî wan huneran bûye. Gelo ewçend huner di kitêbên misilmanan de derbarî gan û kutanan de hene! Tenê destûra min û derbasbûna wê ji pêş ve nebû wekî din hemî rê li ber min vekirî bûn. Wê ez difirandim, bîn dikirim, dîn dikirim, disincirandim, dimêtim, diguvaştim û dawî di nav nivînan de mîna termekî sar dihiştim.

\*\*\*

*Xwendevanê ilahiyatê, carekê bala xwe dayê ku destê wî çûye ser terrikê wî. Bê vîna xwe li çep û rastê xwe nerî û hema bi lez destê xwe kişand û ji pê rawestiya. Çend caran bi destê xwe yê ku ji ser terrikê xwe kişandibû, li hewayê xaçek resim kir. Perîk xiste nav rûpelên ku gihabûyê û qaba defterê dada û da aliyekî. Hinekî di odeya xwe de çû û hat. Zimezim ji odeya li rex wî qut nedibû. Lê wî nas nedikir bê kî di odeya di rex wî de dihêwire. Xwest hinekî çavên xwe bide ser hev û binive. Lê mîna ku giyanê wî bûbe qetek hesin û ew defter bûbe mexnatîsekî hêzdar, dîsa destê xwe avête deftera ku çend rûpel tê de mabûn, perîka qazê ji nava rûpelan deranî. Carekê bala xwe dayê ku êdî vaye terrikê wî mîna bijiya elokekî daliqiyaye. Pala xwe da palgeha perîkî û dest pê kir bi balkêşî ew çend pelên mayî xwendin:*

\*\*\*

Min êdî xezala bextewerîyê ajotibû kozika xwe. Yan jî wê ez ajotibûm xefk û fetrakan! Çi ferq e? Ez bextewer bûm û hew.

Ew bi xwe sed û yek rû ji bextewerîyê re hene lê mirov rastî rûyekî tenê dibe. Bextewerîya rast ew e ku mirov her rûyê bextewerîyê bibîne. Min wê demê, wê dema ku êdî kitêba **El Ifade fî Iksîr El Se`ade** ji bîra min çûbû û Kewsera kurd naskiribû, nas kir ku mirov bi destê xwe hevîrê bextewerîyê distirê, bi destê xwe tenûra wê germ dike û nanê wê dipêje û xwe jê têr dike. Mirov nikare fêrî bextewerîyê bibe, mirov bextewerîya xwe diafirîne.

Dostê min Alberto ji rêwîtiya Esfehanê vegeyabû. Malê xwe di rêya bendera Iskenderûnê re hinartibû Lizbon û Venedîkê. Kêfa wî li cih bû. Têra xwe bi yarika xwe Rûnza ermenî re mabû. Gelek xaliyên buha û ciwan anîbûn. Doza şîrîkatiyê li min kir, lê min ew qûna efsaneyî bi Esfehanê hemûyî û bi xaliyên şah Ebbas jî nedida. Êdî ez fêrî gunchkariyê bûbûm û siwarê şehwetê hefsarê hiş ji destê min revandibû. Ez bi hinek ticareta sivik razî bûm. Min idareya xwe qenc dikir. Bazirganên ku li Heleb nediman, hinek ji malê xwe li ba min datanîn û min ji wan re serf dikir. Min kirîdar didîtin û xwe diqedand. Gundê min qet nema dihate bala min. Herne û ew cih û war dawerivîbûn binê bîra bîrmendiyê. Di wê sala pêşî de min ne tenê welatê xwe, xizm û xak û dost û nas ji bîr kiribûn, min her tişt ji bîr kiribû û di serî de kitêba ku ez lê digeriyam. Sînga Kewserê bûbû kitêba min a pîroz. Sînga wê bûbû rêya ku ez diajotim kana bextewerîyê.

Ez û Kewserê ji ganbaziyan di odeya wê ya biçûk de bêzar bûbûn. Me dixwest em cih biguherin. Carekê taqeta min û ganê nema û min kir û nekir tiştek nema. Ji min hat Kewserê got:

- di kitêban de tê gotin: guhertina cihê ganê agirê şehwetê gurrtir dike.

Min jî û wê jî me dixwest em cih biguherin û kurtir di gola gunchkariyên lezzetbar de noq bibin lê me yê cih ji ku peyda bikirana di wî bajarî de?

Rojekê ez hîn li xanê bûm, min temaşeya binbanê odeya xwe dikir û dîregên wî binbanî ji bêzarî û bêhntegîyê dijmartin. Terqeterqek hate guhê min. Ku ez derketim min dît waye erebekî bedewî kirasekî xetxetî lêye, ebayek ji hiriya deveyan li ser milan e û kofîyeke reş li serî girêdayî li hewşa xanê ye. Ez vegeyiyam cihê xwe. Min bazirganên wisa gelek caran didîtin, dihatin xanê xencer difirotin, ebayên ji hiriya deveyan difirotin lê kêfa min ji wan û malê wan re nedihat.

Lê ew terqeterqa nigê wî bazirganî her ku çû nêzîktir bû. Êdî li ber deriyê odeya min bû. Du caran li derî ket, min ji cihê xwe de bang kir: ez tiştekî nakirim, bihêle ez ê razim. Lê carekê min dît dengê Kewserê bi xwe ye ku bi hêdî dibêje: ez hatime dersekê bidim te xoce Martîn! Min ji guhê xwe bawer nekir. Tişekî wisa di xewnan de jî nabe. Min rabû derî vekir û Kewserê, lê di kincên bazirganekî ereban de, li ber derî dît. Min ji çavên xwe bawer nekir. Wê jî derfet neda min ku bi axivim û hema derbas bû û derî li pey xwe girt. Qûna wê ya topikî di bin şalika mor de çep û rast diçû û dihat, radibû û dadiket û bêhna mêtîyê ji nav ranên wê



difûriya. Ez gêj bûm. Ez mest bûm û min xwe negirt. Hîn li ber deriyê odeyê min bi hişkî cilên bazirganan jê şeçitandin, kirasê fereh bi derbekê re jê danî û ew avête ser doşeka xwe û di dema azana nîvroyê de bû uftekufta me.

\*\*\*

Bi wî awayî min meh disipartin mehan. Bi hevdîtînên bi dizî û efsaneyî yên min û Kewserê, bi hevalbendiya endamê komel û civakên ewropî û bi taybetî inglîzîyan ku destê sibê diçûne nêçîra keroşk û qitik û beytikan, bi cirîdên hespan<sup>1</sup> û lîstika qeremaçan, bi şevbuhêrkên li civatên filleyên helebî û bi dersên erebî û bi buhurandina êvarên şemî û yekşman li barekê di qunsulgeha firensiyan de ku me bêhesab têde meya rojavayê Firensayê heta destê sibê dinoşî. Jiyanêke tijî bû û êdî min gera li pey kitêbêdi ser guhê xwe re avêtibû. Şopa peymanê Karlofçayê di welatê osmanyian de qenc xuyabû êdî. Li Helebê û iskeleyên din bi dehan bazirganên venedîkî xuyadibûn. Lê holendî kêr dibûn. Holendiyan ji xwe re riyên bazirganiyêke dûredirêj dîtibûn û Heleb û Smirna û iskeleyên din bi cî dihiştin. Qeyd û bendên ku berê li ser bazirganên Venedîkê hebûn, hemû bi yek derbê re rabûn û bazar li her derê germ bû. Sûkên Helebê di nav mal û pirtalên rengareng de man. Rê û rêwanî nema li sûkan hebû. Tu li kîjan bazarê bayî, te yê çendên biyanî bidîtana ku bi xulamên xwe re dimeşin û mal dikirin û difiroşin û baran radikî û datînin.

Êdî wê şaberûya ku yadigara tenha bû ji cih û warên min nema hestên min tev didan. Ew bûbû qetekî jibîrbûyî di nav hûremûrên min de lê nizanî çima min ew nediavêt! Razek têde hebû. Her carê min lê dinêrî û dileqand. Xişexîş pê diket. Hişk û pîr bûbû û hestên bêrîkirina welêt jî li ba min pê re pîr dibûn. Ez bi xwe bûbûm şaberûyêke ji qêlik derketî. Ez bûbûm ew zarokê ku nû ji zikê diya xwe derketibe û êdî malzarok û gola avê ya malzarokê ji bîr kiribe û hema ji xwe re bi pêşîrên diya xwe ve mijûl bûbe. Gelek ji ewropiyên li Helebê ku dicivîyan behsa zarotiya xwe, xortaniya xwe ya pêşî û evînên xwe û behsa malbatên xwe jî dikirin. Hin ji wan di agirê dûriyê de dişewitîn û nema bawer dikirin ku vegerin. Çendekan ji wan piştî xwe dane her tiştî û vegerîyan jî. Sabûnfiroşekî ji Marsîlyayê tew xwe ji kerban re xeniqandibû. Yê min ne wisa bû. Te digot min kevîrek li şûna dilê xwe di sînga xwe de daniye û ez ne ji welatekî dûr im.

Bexteweriya ku ez têde bûm, evîna Kewserê û tevgera bêhedar û rewşa min a baş nedihiştin hestên bêrîkirinê serî li dil û mejiyê min bidin. Êdî min nema di xewnan de jî welatê xwe didît. Ez bûbûm dareke ji kokê hîlbûyî û ji rehan qutbûyî, dareke li hewa mayî û di navbera erd û ezmên de daliqiyayî.

Demek dirêj ji wê têkiliya me buhurî êdî Kewserê doza ku ez wê ji keçî nî bixim û ew zarokêkî ji min çêbike kir. Ez behetîm û min pê da fêmkirin ku ew doz dozeke ji baqiliyê dûr e. Ezê fille û ewropî û ewa misilman û kurd a osmanî! Bi tu rûyî ne mumkin bû. Lê wê israr dikir. Dema min gotê ku ez fille me û ew misilman e, got ma jê hêsanîr heye? Eger tu rast ji min hez dikî misilman bibe! De îca were vê hetûketiyê! Zagonên ku osmaniyan û qunsulgehên ewropîyan danîbûn jî gelek astengî danîbûn ber xwestekên wisa. Divê mirov zanibe ku jiyana bazirganên ewropî li iskele û bajarên Levantê gelekî zor e. Ew nikarin jinên xwe bi xwe re bînin û her wisa nabe ku ji osmaniyan bizewicin jî. Heta zewaca ji filleyên dewleta osmanî jî qedexe ye! Yekî xort û ciwan dê çi bikira! Rêvebirên milletên ewropayî, yanî milletbaşîyan qanûn wisa danîbûn da ku kes li şerqê bi cih nebe û malbatê çêneke. Bi wî awayî û piştî ku deh salên yekî biqediyana ew bêgav dikirin ku vegerin. Wekî din jî gelek teşqeले ji hebûna

<sup>1</sup> Hespêkî min î çê navê wî Raad yanî tava baranê hebû, gelekî beza û xurt bû. Seglawiyekî nijadpak î ji welatê Necdê hatibû. Her rojên yekşeman xizmetçiyê min î çerkez ew zîn dikir û em diçûn cirîdê bi qunsulên ewropî re. Ew bi xwe li Helebê, Smîrnayê û her bajarekî osmaniyan î mezin, siwarbûna li hespan ne ji bo her kesî durust bû. Hin ewropîyan gelek ruşwet didan ku li hespan siwar bin.

jinên ewropayî derdiketin. Berî çend salekî terziyekî firensî li Helebê hebû, jina wî gelekî ciwan bû. Xortekî helebî dil ketibûyê û li ser bextê xelkê be, ew bi dizî jî didît. Terziyê firensî rabû dîne xwe guherî û bû misilman ku heyfa xwe ji xortê helebî hilîne. Civaka firensî li Helebê li bin guhê hev ket. Nema ne dikarîbûn terziyê misilmanbûyî vegehrînin dîne wî ê berê, û ne jî dikarîbûn li himberî wî xortê helebî tiştekî bikin. Qunsulê firensî wê demê D'Arvieux bû, bi zor û heft belayan ew jin û mêr xelas kirin û ew hinartin bendera Iskenderûnê û ji wir berê wan da Marsîlyayê. Lê hinek ji ewropiyan bi filleyên Helebê re dizewicîn û neslek ji wan peyda dibû, nîv osmanî û nîv ewropî ku navekî seyr lê kiribûn, ji wan re digotin: Mezza Razza ku him osmaniyan û him jî ewropiyan bi çavekî kêr li wan dinêrîn. Ji bo vê pîrsê jî Sadriazemê navdar Qere Mustefa berî sî salî menşûrek deranîbû tê de beyan kiribû ku herçî ewropiyê ji reiyeyên sultên bizewice ew jî dibe ji reiyeyan û tu imtiyazên wî wek ewropiyekî ku li welatê osmaniyan dijî namînin û divê ew û zarokên ku ji wî peyda dibin bacê û xûkiyan bidin. Îcar qunsulusan her kes mecbûr dikirin ku sondên giran bixwin û sozên nivîskî imze bikin ku ewê tucarî bi osamniyan re nezewicin. Her kesê ku ev yek nekira ew vedigerandin welatê wî. Min jî sondeke wisa li ber qunsulusê ingilîzî xwaribû û mîna peymanekê derbarî wê mijarê de mohr kiribû.

Kewserê ev zagon nasnedikrin, nas bikirana jî guh li wan nedikir û dixwest hemûyî bide bin lingên xwe û bi gotina wê: zagon zagonên dilan in ne yên li ser pelan in.

Hestên min û nerîna min î li Kewserê hatibûn guhertin. Evîndarî bûbû şehwetbazî û lezzetxwestin, gupîna dilan û şahiya dîtina Kewserê wergeriyabû xwestina bidestxistina wî laşê germ û sînga buhuştî. Rastiya evîne qulipîbû û tenê vîna têtikiliyeke berdewam a bêsînor bi meyweyên sîng û ber û paq û çaq û ran û navranên wê keçika kurd mabû. Berovajî çîrokên evîne ku têde hestên dilbijîna laşan werdigerin hestên evîndariyeke zelal, li ba min hestên evîndariyê serobinî bûbûn û êdî li meydanê ganbazî û dilbijîna tenê mabûn.

Lê di gel wisa jî ez ditirsiyam. Ez ditirsiyam ku rojekê ji rojan perde ji ser têtikiliya me ya veşartî rabe û ez malwêran bibim. Yan serê min bibirrin, yan min bi saxî bisojin û yan min vegehrînin û yan jî min bi pereyekî pirr ceza bikin û rût û rewal bihêlin ku mecbûrî deynan û parsê bibim.

Ez nizanîm êdî wê bi kîjan çavî li min dinêrî, lê qet sarbûna ji min li dora wê xuya nedikir. Her ku diçû germtir dibû û ji ya xwe danediket: Zewaca me û misilmanbûna min! Ez li fersendekê digeriya ku xwe ji Kewserê xelas bikim êdî.

Min serrafekî cihû naskiribû. Yaqûbê Serraf ku li tevaya Helebê kesekî naskirî bû. Malê wî pir û destê wî dirêj. Dostê walî û qunsulusan, dostê bazirganan û qadî û tehsîldaran bû. Dostê subaşî û defterdar û milletbaşî û paşa û şêx û serleşker û keşe û metran û petrek û melayan bû. Dostê şeytên û Xwedê jî bû. Ew bûbû dostê min jî. Gelek caran min eslaniyên venedîkî li ba wî serf dikirin û bi aqçeyên osamnî re diguherîn. Em wisa bûbûn dost ku êdî min nema tiştekî xwe jê vedişart.

Maleke wî li taxa cihûyan li Helebê hebû. Bûbû civangeha min û Kewserê<sup>1</sup>. Heftiyê carekê min kilît ji Yaqûbê Serraf distend û min û Kewserê me li wir hevdû didît û ber ji buhuştê diçîn. Di wan civanên me de her wê doza zewacê li min dikir, digiriya, xwe dixeyidand, delaliyên xwe dikirin, xwe vediçîn û nedida dest min.

Rojekê ji wan rojan ku Yaqûb mal ji me re vala kiribû û ez û Kewserê bi tenê bûn. Me li ber ahenga azana nîvrojê hev vedigevizand. Wek ku Kewserê ji hiş çûbe tevdiqeriya. Piştî gevizandineke çêjdar, Kewserê destê xwe li nav lingên min pelandin. Agir bi pîrêzeya nav wan xist û dîsa mûma şehwetê geş kir û bi çavên girtî û lêvên geztî gote min: ez zarokêkî ji te dixwazim. Zarokêkî mîna te çavşîn. Ez behetîm. Sist bûm û mîna ku marek bi min vede ji ser sînga wê daketim û min bi lez cilên xwe kişandin xwe. Ew hîn paldayî bû. Porê wê li ser palgehê mîna baskên sîmirekî efsaneyî û reş belav bûbû. Min di dilê xwe d egot divê êdî sînor

<sup>1</sup> Çend cihû hebûn malên wan ji bo civana bazirganên ewropî û jinên xwefiroş bûn. Haya osamniyan ji vê yekê hebû, lê bi hukmê zêran çavê xwe jê digirtin.

ji vê təkiliya bi tehluke re were danîn. Divê êdî ev çîrok bi dawî bibe. Divê ez ya dilê xwe bibêjim û çî dibe bila bibe. Rabû min dilêriya xwe hemû civand û bi toneke sar gotê:

- Kewê bes e. Em ji hev re nabin. Dîwarên di navbera min û te de, ne me avakirine û ne jî em karin hilweşînin. Emê her yek bi riya xwe de herin.

Deng jê derneket. Lê di çavên wê de barîna makeşêreke birîndar hebû. Ji nişkêve rabû ser xwe. Li himber min rawestiya, devê xwe tijî tû kir û avête rûyê min<sup>1</sup>. Min nedît ew çawa derket û kengî çû! Lê dîtina min dît ku ez, li dêra ku çend gavan nêzîkî xanê bû, li ber qurbangehê, li îkona Meryema diya Mesîh ku li aliyê çepê yê ikonostasê bû, dinerim û digrîm<sup>2</sup>.

\*\*\*

Piştî wê roja ku ez û Kewserê têde li mala Yaqûbê serra civiyabûn demeke dirêj derbas bû min nema pêjna wê kir. Ewê bi tûkirina rûyê min təkiliya me ya şêrîn birrî û nema çavê min pê ket. Ji xwe min nedixwest êdî wê bibînim jî. Ez bi rastî jî jê ditirsyam, ne ji wê lê ji kiryareke wê ya bêhişane ku dikare stûyê min bide ber devê şûran û agirekî gurr. Ez pirr ditirsyam ku ji nişkêve vegere. A wê nema êdî evîn û îşqbazî bû. Wê tiştekî din dabû pêşiya xwe ku nizanim çî navî lê bikim. Eger ku dewlet bi təkiliya min û wê hesiyabana wê yekser ez kiribama êzingê agirekî bi şerîetê dadayî. Çare, di rewşên weha de, ji şewatê pêve nîne. Yan jî misilmanbûn<sup>3</sup>! Û eger ku ez xwedî hêz bim divê ez pereyekî pir bidim walîyê Helebê û miflis li welatê xwe vegerim. Ji bo yekî firensî yan ingilîz jî wê ne derdekî mezinba ji ber ku bazirganên wan alîkariya kesekî ketî ji qewmê xwe dikin. Ê min ne qunsulê welatê min li wan deran hebû ne jî milletê alman!

Kewserê ji bîra min nediçû. Di wê dema dirêj î ku derbas bû de her min bendewariya wê dikir û digot: aha niha wê xuya bibe. Xeyidiye û delaliyên xwe dike. Çûye gundê xwe yê li Kurdaxê û wê vegere. Him ditirsyam û him jî min hêvî dikir ku vegere û ez wê bibînim. Hestekî wisa têkil ji tirs û hêviyê ku navekî minasib jêre di zimanan de nîne. Lê ew nema xuyabû. Min jî hêdî hêdî ew ji bîr kir û bi kar û barên bazirganiya xwe daketim.

---

<sup>1</sup> Di defterên xwe ên windabûyî de, min tayên təkiliya xwe û Kewserê bi derzîyê ve kiribû. Û li jihevqutbûna me min gelek rûpel nivîsî bûn. Niha her tişt nayê bîra min. Ku were bîra min jî ez di xwe re nabînim hemûyî dubare binivîsim. Lê ez dizanim ku piştî wê kêlikê me nema hevdû dît. Heta ew roja nebxêr hat. Ku ez ê derbarî wê de bi ferehî binivîsim. Min fêr kir çima wê wisa tû kire rûyê min lê ew çî daxwaza ecêb bû min fêr nekir! Zarokek ji min dixwest! Wey gîdî! Dixwest min bidehfîne mirinê yan misilmanbûnê.

<sup>2</sup> Ew îkona ciwan bi firçeya ressamê îkonan ê helebî Henanyayê ji malbata Musewwir, hatibû kişandin. Henanya kurê Nî metullahê Musewwir e. Îkonsazî di xwîna wê malbatê de bû. Dostaniya min û wan jî gelekî xurt bû. Vê dawîyê min dibihîst ku keşeyên dêran ji karên Henanya ne razî ne, wan digot ku wî qaideyên îkonên bîzansî şikandine û ne li ser şopa bav û kalikê xwe ye, ne wefadarê qaide û bingeşên berê ye, lê tevî wê yekê jî îkonên wî dîwar û ikonostasên dêrên ortodoksan dixemilandin. Wî carekê ji min re qala îkonan kiribû û gotibû: berî her karî divê kesê îkonsaz rojî bigre, zebûrê bixwîne û kincên xwe ên binî hemûyan biguhere ku ji hundur û derve de paqij bibe. Di pey re divê textekî bê tûk û kelem ji darên gûzê, selwê, kajê, yan jî berûyê bîne û bixeritîne. Cawekî kitanê spî lê bigerîne û bi şîrêzeke sor ku ji hestiyê keroşkan e bi wî darî ve bê zeliqandin. Carek dî divê bê xeritandin heta cawê kitanî baş bi text ve bizeliqe. Piştî ku resm qediya divê elbikek zeyta kitanê û şîrêza kajedarê û enberê bi ser de birijînin û wisa bihêlin heta ku resm wê zeytê vexwe.

<sup>3</sup> Ew jî zor bû. Hinekên ku dixwestin misilman bibin, qunsulusan ew di cih de li gemiyan dikirin û dişandina welatên wan. Destê min jî ji wî welatî nedibû. Misilmanbûn jî divê ne bi dizî baya. Her kes wê pê bihişiya û ezê bihetikiyama her wekî ezê derbarî vê mijarê de jî binivîsim.

Ez bûbûm wekîlê Alberto de Silva. Min pêşwaziya malê wî, ê ku ji benderan û bi karwanan re dihat, dikir û li tacirên Helebê belav dikir. Rewşa min hinekî baş bûbû û mijûliya min zêde bûbû. Mijûliyeke ku hişt ez Kewserê bi carekê re ji bîr bikim. Bîranîna Kewserê piştî çend mehan, mîna ku birînek be, mîna ku tayeke germ be êvaran min ji ber jan dida û ez diêşiyam û yek caran xew li min diherimand. Lê bi roj sivik dibû. Lê taviê bû kaviê di beyabanekê de û bi bahozên qûmîn ên jiyane re winda bû.

Heta rojekê nameyek ji min re ji Ekkayê hat. Dunya çiqasî mezin e wî qasî biçûk e jî. Di kêrî mehekê de, nameyek dikare ji bajarekî mîna Ekkayê bigihê adresa xwe li bajarekî mîna Helebê. Xizmeta postê li welatê osmaniyan ne mîna li ba me ye lê ne xerab e jî.

Ez li ser textê xwe li qatê jor bûm û min guhdariya azana bi meqamê Beyat, ku bavê meqaman e, dikir. Ji zêzemîna xanê min kûpîkek meya sor li ber xwe danî bû û hûrik hûrik difirand. Carekê min dît dengê ji jêr tê û bang dike: Martîn Martîn. Ez rabûm û min di pencereya li ser hewşa xanê re nihêrî. Yekî kinik li jêr bû û stûyê xwe yê stûr û rûyê xwe ber bi pencereya min de hildabû û bangî min dikir. Ez bi lez daketim. Derenceya ku derabzîna wê bi qutîkên laleyan xemilî bû di bin nigê min de dihejiya. Min jî dilezand mîna ku ez zanibim tiştekî giring li hêviya min e.

Ermenî kinik î derdora çil salî, nû ji heca Qudsê dihat bi rûyekî geş silav bi portugalî da min û got:

- Bom dia<sup>1</sup>.

Min jî ev silava portugalî dizanîbû lê ji tîrsa ku ew ermenîyê kinik, bêtir bi portugalî biaxive û ez tiştekî fêr nekim min bersiva wî bi silaveke erebî vegerand, ku gelek neteweyên şerqê jî wê silavê bikartînin.

- Merheba.

Wî ermenî kinik bi erebî nizanîbû, lê kesek bixwaze kesekî din bide fêmkirin ewqase peyv jê re navên, hema ji paşla xwe nameyek deranî, da destê min û got:

- Pedro. Pedro Del Faro.

Min nas kir ku nameya wî bazirganê portugalî ye, yê ku me hev li Ekkayê dîtibû û min barekî biçûk î kaxezan jê kirîbû.

De îca çawa bazirganê portugalî Pedro Del Faro zanîbû ku ez li xana Hokiîdûnê dimînim, hêj ez nizanîm!

\*\*\*

Pedro Del Faro yê portugalî, di nameya xwe de nivîsî bû ku wekîlê wî yê ticarî nema bi kêrî karê wekîltiyê tê û ew bi hacetî wekîlekî din e. Ewî gotibû ewê barê kaxezan ji Ewropayê bîne û bigihîne navendên mezin ên bazirganiya navwelatan. Ewî her weha nivîsîbû ku li gor daxwazan dikare barên kaxezan bigihîne bendera Iskenderûnê, Beyrûtê, Ekkayê û her devera ku ava deryayê têde pêl dide û şerq û xerbê digihîne hev di Levantê de. Ez zêde nefikirîm. Hema min bersiva wî: erê, ez bi kêfxweşî dibim wekîlê te, nivîsî û mor kir û bi karwanê postê, ê ku berê xwe dê bida Şamê re şand.

Bi vî awayî ez bûme wekîlê Pedro û monopolîstê ticareta kaxezan li Helebê. Kaxezên firencî û bi taybetî yên Marsîlyayê hemî di rêya min re diahtin firotin<sup>2</sup>. Muşterî û kirîdarên min jî, werraq, nasix, mucellid û sehhafe Helebê û derdorê bûn. Şêx û muderris û xorî û mela û keşe û petrek û rabîyên cihûyan jî bûn. Suxteyên medreseyan, feqîyên hucreyan, mirîdên tekyeyan,

<sup>1</sup> Siba te bi xêr.

<sup>2</sup> Bexteweriyê li vir rûyekî din şanî min kir. Ji sînga Kewserê û qûna wê ya esmer û germ, bextewerî bi kaxezên spî re hate guhertin. Piraniya wan kaxezan ji Maesîlyayê dihat.

ministrantên dêran, tacirên biçûk û rahibên serê çîyan jî bûn. Wan deman bazara kaxezan li Helebê germ bûbû. Nasixan ew bazar germ kiribûn. Her cûre kitêb dihatin nesixkirin. Kitêbên tîbbê, ên şîrê û dîwanên xezeliyatan, kitêbên felsefeya yûnanî yên tercumekirî, yên stêrnasîyê, mentiqê, nehew û serfa erebî, cebr û hesabê, tefsîrên Quranê û kitêbên dînî ên mesîhiyên Helebê û kiniştaya ortodoksî li şerqê jî. Di her mizgeft û dêrekê de jî kitêbxaneyek hebû, li rex her maleke Xwedê medreseyek hebû û li mala her kesekî naskirî û payebilind kitêbxaneyek hebû. Sûka werraqan jî hebû ku bi xêra gera min î li kitêba El ifade fî iksîr el seade min firoşkar û werraqên tede hemî naskiribûn. Yek caran ez pê dihesiyam ku erd û ezmanê Helebê ji kaxezan in.

Min dît bê çawa kitêban nesix dikin: Xwediyê xetên ciwan rûdiniştin û li kitêba esil dinêrîn, xêz bi xêz, peyv bi peyv, fethê û demme û kesre û sikûn jî weke ku didîtin, di pelên xwe de dinivîsîn. Weke ku li ba me mekînêyên çapê hene li ba wan nebûn. Ez fikirîm ku mekîna li Helebê û van welatan pir bibin, çîyayên kaxezan jî nema têrê dikin. Rabû min carekê ji Ebdullahê mamosteyê xwe yê zimanê erebî re got ku ew çima mekîneya çapê naynin dêrên Helebê! Metropolît berê mekîneyek li welatê Eflaqan li ba mîrê eflaqî dîtibû. Ku min ew behs bi Ebdullah re vekir, wî jî li dêrê qal kiribû û ketibû serê wan. Metropolîtê ortodoks rabûbû di ziyareteke xwe de çûbû wir mekîneyek bi xwe re anîbû. Ebdullahê jîr û zîrek, ku di zêrkeriyê de pir bi ser ketibû, herfên erebî rewêştibûn û ji risasa hilandî qalibên wan çêkiribûn. Her cara metropolîtê dêrê ez didîtim, dikeniya, diranên wî ên spî di nav simêlên wî ên bi ser devê wî de hatibûn xwarê, xuya dikirin û digot:

- Kurê min, xêra te di hebûna vê mekînê de gelek e. Tu mesîhiyekî rastrew î.

\*\*\*

Bi wekîltiya Pedro del Faro re min dev ji wekîltiya hevalê xwe Alberto berda. Alberto jî nema zêde mal dianî û piraniya dema xwe li welatê eceman derbas dikir. Ewî bexteweriya xwe di hemêza Rûnaza ermenî de dîtibû û ew hemêz bi Helebê hemûyî nedida. Rewşa min gelekî baş bû, pere bi ser min de bariyan, wek şîrrik û mezirîban rijîyan. Bi qasî ku pere rijîyan jin jî bi ser min de qûriyan. Pere li ku bin, jin xwe lê digrin. Bêhna şeytanan ji pereyan difûre û jin qenc wê bêhnê nas dikin.

Gelek kesan xwestin ku di sûkê de piştî min bidin erdê, xwestin baskên min ên kaxezî bitewînin û bişewitînin û min bişkînin lê nikaribûn. Di serî de tacirekî bexdadî hebû wî jî kaxez ji Bexdê dianîn. Ew berî min di sûkê de bû. Dostaniyeke me ya di ser re hebû. Lê gava ku dît xelk berê xwe ji wî û malê wî diguherin û xwe li min û kaxezên firencî digrin, kîlê dilê wî werimand. Destê xwe xiste destê tacirekî antakî ku wî jî kaxezên şamî, misrî û semerqendî dianîn. Lê herduyan jî nikaribûn min bidin erdê. Min nanê herduyan jî ji Helebê qut kir. Min hin xortikên sêwlek kirê dikirin û bi şev ew dişandin deverên ku wan herdu taciran tede barên kaxezan bi cih dikirin. Wan sêwlekan agir berdida wan komên spî û direviyan. Ku fersenda agirberdanê neba bi satilan av bi ser wan kaxezên di enbaran de dikirin û ew kaxez dibûn hevîr. Êdî dilovanîyê ji dilê min barkiribû. Qaideya sûkê weha bû: cihê ku bazirganî lê serdest be dilovanî dîr direve.

Ez nizanim çî hatibû serê min lê ez bi wî şêwe jiyana xwe ya nû şad û bextewer bûm. Ji min bihata minê reqîbên xwe bixesandana jî. Minê di wan hilda û ew weke kesên jidînderketî jî bidana nasîn. Jin û mal, û di ber re jî danûstandina bi giregirên civakê re, bi Paşayan re, bi Miftiyê mezin re, bi waliyê Helebê re, bi Petrekê Ortodoksan ê mezin û hemî tacirên Helebê re, meşka dilbijîna jiyana li ba min dijenand. Êdî gunehkarî bûbû bextewerî ji bo min.

\*\*\*

Erê Kewserê da rê û çû, lê Xedîce<sup>1</sup> hat. Ez qet jî bi pey Kewserê neketim û hîç ji bo min jî nebû meraq ku binasim bê ka ew li ser erdê ye yan li bin e! Ew jî bû wek salixa welatê min î ku jê dûrketibûm kêman caran dihate bîra min. Ji welatê min yadigarek hebû ku ew dianî bîra min: şaberûya ku roj bi roj hişkolekî dibû. Lê ji Kewserê ew yadigar jî nebû. Tenê yek caran di nava mijê de dibû mêvana xewnên min.

Mala Yaqûbê Serraf jî bûbû buhuştê min. Bûbû civangeha ku min têde sifrê bexteweriya xwe sîqal û qilê dikir bû. Ew mala xweşik î ku lavlavan dîwarên wî kesk kiribûn civangeha min û Xedîce bû. Di wê mala cihê de min û wê me şevên ji agir û şahî û stranan heta serê sibê li dar dixistin.

Ez bi sala sêyemîn re bûme navekî naskirî di civaka Helebê de. Misyoneran, qunsulan, bazirganan, keşe û şêxan, rabî û rahîb û feqiyan xwe li min û kaxezên min digirtin. Heta min gelek caran dibihîst ku suxteyên medreseyan dema bixwazin pesnê defterên xwe û pelên wan defteran bidin dibêjin: pelên me ên xoce Martîne koseyê firencî ne. Bazirganên pelan xwe dane aliyekî. Hinên venedîkî jî hatin û kirin û nekirin nikaribûn têkevin bazarê. Wan xwest qayîşê bi min re bikişînin û min bidin erdê. Lê çu ji dest wan nehat û pîlî poşman bûn û çûn. Min devê waliyê Helebê jî bi diyariyan tijî kiribû û ew lal kiribû û bûbû destbirakê min. Kî bi hêz bûya û bixwesta min bide erdê û ticareta min têk bibe, min ew yan ji riya xwe bi zorê dida aliyekî, yan jî bi çingîniya zêran û çirûskên diravan devê wî gem dikir. Serrafên cihê ên li Helebê hemû bûbûne dostên min. Ji hemûyan bêtir Yaqûbê serraf ku ji bilî mala wî a Helebê, maleke wî li Tadîfê jî hebû. Tadîf gundekî ne gelekî dûrî Helebê ye û ziyareta Ezrayê nivîskarê tewratê li wir e. Ew serraf bûbû dostê min. Em şîrîkê hev ê fayîzê jî bûn. Min dirav didanê, wî jî bi fayîz dida tacîrên misilman û erebên li wir. Mal pir bû. Mîna guloka berfê her ku çû pirtir bû. Bexteweriyê mîna cewrikekî xwe di nigê min dida. Bextewerî êdî bûbû çirûskên zêr, bûbû katên ji bihevşabûna laşan. Bexteweriya min bûbû sînga Xedîceya helebî.

Xedîceya helebî jî keçeke çermespî bû ku rehên şîr mîna cobarên kevî bi berf di qirik û zend û ranên wê de xuya dikirin. Çavên wê du morîkên şînekî zelal bûn. Mîna îkoneke bîzansiyan gelekî ciwan bû ew. Qendîlek şeva mîracê bû û di tariya jiyana min de îsiya<sup>2</sup>.

Naskirina min û wê bi serê xwe çîrokeke. Her gava ku ez ji xana Hokiya dîdî derdiketim û diçûme karekî xwe bêgav dibûm ku di taxeke teng re nêzîkî pêncsed gavî bimeşim. Taxeke ku herdu aliyên wê bilind bûn û rê nedidan çavan ku ezmên bibînin. Ez taxeke teng î tarî bû ew. Tu çima nabêjî keçikekê bala xwe dabû min û ez di çav xwe re kiribûm! Ji meşrebiyeke<sup>3</sup> ku şaxên yasemînan di qulik û qelşên wê re derketibûn, her gava ku pêjna min dikir li min dinêrî. Çavên xwe berdabûn min lê hayê min jê nebû. Ji xwe min newêrîbû çavên xwe bilind bikirana û li wan meşrebiyan binêriya. Carekê ez dîsa di wê taxê re dimeşiyam. Te digot goristan e. Ji zarokan jî vala bû. Tenê qirpeqirpa kaba sola min têde dihat û gavên min ên sivik kûpê bêdengiya wê kolanê dişikandin. Ji nişkê ve min dît vaye kaxezek li ber lingê min ket. Kaxezeke şahîk ji kaxezên min ên firincî bû ku mîna berbejneke misilmanan bi sêkoşekî hatibû pêçandin. Bînek mê jê difûriya. Ez xwar bûmê û min rakir, vekir û xwend. Di nav xwendina kaxezê re pistîniyek hate guhên min. Ku min serê xwe bi alî jêdera pistîniyê de hilda, çavên min li rûyekî spehî di nav kulîlkên yasemîne yên spî û bîndar de ketin. Bişîrîneke

<sup>1</sup> Min çîroka wê hemû nenivîsî. Lê her ku ez fersendê bibînim û deverêke vala li ser van rûpelan bibînin, ezê hin agahiyên ku min di şevên şehwetbaziye de ji wê bi xwe bihiştine, binivîsim.

<sup>2</sup> Di şevên Mi`racê de ronahiyan bajarê Helebê dişûşt. Qendîl û xetîre, mûm û çira û fanûs li her deverê û bi taybetî li serê minareyan geş dibûn. Ew şev bîranîna seyranê ezmanan ya pêximberê îslamê Muhemmed e. di şeveke Mi`racê de ez û Xedîce bûbûn gulokek ji êgir û berê me jî li ezmanan bû.

<sup>3</sup> Meşrebiye: weke balkonan in, lê girtî ne. Ji darê tuyê yan gwîzê yan jî kinêrê tene sazkin. Bi neqşên gelekî xweşik tene xemilnadin û qulikên tene ji aliyê hundur ve bi camên rengîn tene girtin. Bi wî awayî kesên li hundur, piranî jî jin in, dikarin li wir rûnin û ji xwe re li xelkên kolanê temase bikin bêyî ku xelk wan bibînin, yanî sitare ne. Hem jî ew meşrebî dibin talde û germiya rojê ji hêwanên malan bi dûr dixin û erda binê xwe jî li kolanê sî dikin ku xelk xwe bavêjinê dema dibe qîçîna rojê yan jî şîrşîra baranê. Guldankan jî pêve dadiliqînin. Ku kolan xalî be, evîndarek dikare li binê meşrebiya yara xwe rûne û ew û wê bi hev re hinekî suhbetê bikin.

şêrîn li ser lêvan neqîşkirî bû. Ew rû jî bûbû yasemînek di nav wî taqa yasemînan de. Terpeterpek li pişt min ji kolana kevirî hat. Qantirekî ku nû hatibû nalkirin û siwarê xwe bûn. Pencereya biçûk a ku di nivê meşrebiyê de bû hate dadan û ew rûyê firîşteyî û çavên şîn wînda bûn. Min serê xwe bera ber xwe da û destê xwe li kaxezê pêça û dîsa meşiyam<sup>1</sup>. Ew nameyeke ku doza civanekê tê de hebû. Navê taxekê û deriyekê naskirî tê de hebû. Min nepirsî ev jin kîye û gelo ji min bi xwe re ew kaxez nivîsiye yan hema kî bûya wê ew jêre biavêta! Lê êvara îne, ku dengê muezzin ji minareya mizgefta mezin hat û azana mexribê ji hemî mizgeftên Helebê bilind bû, min odebaşiyê ku êdî bûbû dostê min ruşwet kir û berê xwe da başûrê kela bilind. Naskirina taxa Sabûngeran ne pir zor bû. Bi bêhnê be jî mirovekî biyanî dikare xwe li wê taxê bigre. Bîna sabûnê di ser dîwarên malên wê re digiha her deverê. Qendîlên vêketî ji kulikên minareya mizgefta Altunbuga ku li wê taxê bû ji dûr ve xuya dikirin. Min xwe li wê ronahiyê girt. Lê dîtina Bismillaha bi xeta sor, ku wê gotibû ew li ser deriye, di tariyê de dijwar bû. Min bala xwe dayê ku hemî derî bi bismillah xemilandî bûn. Di gel ku min xwe di cil û bergên helebiyekî de veşartibû jî ez ditirsiyam û min hema carê li pişt û paş û çep û rastê xwe dinihêrî. Carekê deriyek vebû û dengekî jinan î nazik di wê tarî û tirsê de mîna stêrkekê ronî da:

- Fût, fût<sup>2</sup>.

Ez derbas bûm, derbasî bihuşteke li erdê bûm. Ji bîna misk û kafûr û yasemînan, ji bîna gulav û maweran, ez mest û teles bûm. Ez....

---

<sup>1</sup> Eger tu bixwazî bihuştê bi çavê xwe bibînî êvara îne ya di pêşiya me de, bi rojava re berê xwe bide taxa sabûngeran li Meydana Reş. Li wir mizgefta Altunbuga heye, li rojhilatî mizgeftê, deriyê yekem ji aliyê çepê de bi xetê sor bismillahirrehmanirrehîm li ser kevanê wî nivîsandîye. خ.

Ev bû nivîsa di wê kaxezê de. Tîpa X ya bi erebî bi wê nuqtaya li ser, di dawîya nameyê de, ku ew tîp serê navê wê ciwanê bû, weke dasekê ku dabe pey perwaneyekê bû. Bi hibreke sorî qirmizî hatibû nivîsîn ew tîp. Bêhneke gelekî xweş jî ji pelikê difûriya. Vexwendina derbasbûna bihuştê ye kî jê dimîne! Eger wê ez dawetî dogehê jî kiribama ezê çûbama.

<sup>2</sup> Yanî derbas be.

*Bi qasî sê çar pelan, piştî hevoka: ez mest û teles bûm, ku dawîya rûpelekê bû, bi hev ve hatibîn çespandin. Xwendevanê ilahiyatê, nedixwest yek hevok lê biçe. Bi taybetî wan hevokên ku tevizandineke xweş diherikandin rehên wî û heta navşeqên wî jî. Bi haydarî, bi baldarî xwendevanê ilahiyatê yê ku ji hawîrdora xwe qut bûbû xwest wan pelên bi hev ve qemitî ji hev veke. Wî kir û nekir nikarîbû pelan dûrî hev bixe. Weke ku di nava wan de şîrêz herikî be yan jî bi hibreke demûşî ew çend rûpel hatibîn nivîsîn, bi hev ve zeliqî bûn. Rabû kêrikeke tûjikî ji berîkeke tûrikekî xwe derxist û devê kêrê avête koşeyê jor ê du pelên bi hev ve zeliqî û w mîna du şeqan ji hev vekirin lê dît ku nivîsa di nav de hemî riniyaye, mihiyaye û nema tê xwendin. Rûpel êdî mîna rûyê zeriyeke çav bi kil ku giriya û hemû kila çavên wê bi ser wî rûyê nazik de herikîbe, xuya dikir. Hewl da ku pelên dinveke ew jî mîna ên berê bûn û nava wan nehate xwendin. Ji wî re bû kuleke giran ku nas bike çi di wan pelên bi hev ve zeliqî de hatibû nivîsandin lê çare nebûn. Ji bêgavî defter li ser peleke nûn vekir û xwend:*

\*\*\*

Bi sala çaran re ez êdî ketibûm xaniyê Alberto de Silva ku ji wan malên erebî ên ku di nêvî de hewşeke fereh bi gul û yasemînan xemilandî bû. Di nêvê wê hewşê de jî hewzekî avê hebû, di nêvê hewz de jî avrêjek ku jêre dibêjin Fisqiye yan Nafûre hebû. Êvarên havînan li kenarê wê fisqiye yê min mûm datanîn û li ser kursiyekî rûdiniştin û min şerab bi horîyan re vedixwar. Êdî min ji xana Hokiya dîdûnê bar kiribû û ew tenê mabû cihê hev dîtina min û bazirganî û kirîn û firotina malê ku ji benderan dihat.

Ez bûbûm endamekî ji civaka Helebê ya mesîhî. Ez bi roj bi ticareta xwe dadiketim û bi şev bi heval û dostan re diçûm û dihatim û diciviyam. Henanyayê neqqaş ku li Helebê bi navê Henanya El Musewwir naskirîbû, dostekî min î herî nêzîk bû. Xaçadorê ermenî, rahibê dêra çilşehîdan<sup>1</sup>, ku çend gavan dûrî xanê Hokiya dîdûnê bû, ew jî ji dostên min ên nêzîk bû. Ji xwe Ebdullah û birayê xwe Ni`emtullah û bavê wan Zekeriyayê zêrker û apê wan Nîqola bûbûn malbata min. Êvarên yekşem û înan jî, min xwe ji cîhanê qut dikir. Min xwe ji dostan dîr dixist û beta dibûm. Diçûme civanê gulan û min hingiv dimêt. Ez diçûm di nav bîna memik û gerdenan de serxweş dibûm. Min giyanê xwe di ariya gunehkariyên şêrî de digevizand û jiyanê bi dizî ku berevajî jiyanê min a rojane bû, dibûrand. Wan dostên min ên navborî, ku ji giregirên civaka nesranî a Helebê bûn, nizanîbûn ez çi dikim û diçime kû. Min li ba wan maska pakiyê dida ber rûyê xwe, maska bazirganekî ewropî yê jixwerazî û li nav û dengê xwe û bazirganiya xwe miqate! Di bin maskek ciwan de min rastiya rûyê xwe veşartibû. Jiyanê bi mask jî bextewerî û lezzetê bêsînor ji min re peyda dikir.

<sup>1</sup> Ew dêra ermenan a navdar, nêzîkî xana Hokiya dîdûnê bû, ew xana ku sê sal û nîvan - berî bikevim xaniyê Alberto li nêzîkî Xan Elbenadiqa li biniya kela mezin, mala ku berê mala konsulosê Firansayê ê berê Laurent d'Arvieux bû - odeyeke biçûk tede mala min bû. Şemasê dêrê, Xaçador, neviyê xoce Bidîk bû. Xoce Bidîkê ku bi navê Bidrosê Ecemî jî dihat nasîn berî sed salî dêra çilşehîdan nûkiribû. Kalkê Henanya jî, Yûsif El-Musewwir, îkonên herî delal diyarî dêra çilşehîdan kiribûn. Ku di hin şevbuhêrkên me de li mala bavê Zekeriyayê zêrker, behsa resm û îkonên pîroz dibû, Henanya bi keser digot: ka îkonên berê, kanî ew resmên ku dema te lê dinêrî, êşa di wan de, mîna goşiyekî ji êgir di bedena te de jî dihat guvaştin. Xweşiya di îkonê de jî li giyanê te mîna peyalek ji meyê dirijîya! Niha her kesek dibêje ez jî resamê îkonan im. Kî çar rengan li nav hev dixê, xwe dike îkonsaz! Min bala xwe dayê ku Henanya gazina tiştê dike, lê ew bi xwe nizane çiye. Di îkonên berê de kesî herfên erebî nedinivîsandin. Hema niha, hin nivîsên erebî derbasî îkonê dibin, mîna navê firîşteyan, navê şagirtên Îsayê Mesîh û navê qidîs û kesên pîroz jî. Min bi xwe ji devê rahibekî dêrê suryanan bihîstîye dibêje: îkona ku herfên ne suryanî û yûnanî tede bin, îkoneke şeytanî ye. îkonsazî ku berê hunerek xwerû bîzansî bû, êdî tesîrên herêman jî lê dibin.



Xedîceya helebî weke pisîkeke kedî di nîvê înan de di nav nivînan de heta destê sibê tenûra ganbaziye dadida. Kêfa min jî ji wî goştê spî re dihat. Û ji xwe wan çavên şînikî ez dîn dikirim û li ser baskên nedîtî ez vedigerandim welatê min. Keçika yekem ku min nas kir û ew bi tirs ramûsa, dianîn bîra min wan herdu çavan. Her ku ez diçûme ba wê li wê mala li taxa sabûngeran, nû ji hemamê derketibû. Bîna kelexê û kulîlkên nêrgîza bejî û sosinên ter û sabûna xar ji laşê wê ê hervrîşimî dihat. Li ser bedena wê baxekî nedîtî ji lalayan şînatibû. Hevala wê, Hewwaya çerkez, xwedîya malê, tev li şahiyên me dibû. Ku azana `eşayê û selewatên mizgeftan şevên înan bidawî dibûn, Hewwayê pif mûman dikir û dest bi şahiya mezin dibû.

Hewwa, jinebîya çerkez ku girîz bi devê mêrên Helebî diket dema navê wê dihate ser zimanan, ku civat digeriya radibû cilên reqşê li xwe dikirin û dibû zîzokek ji êgir, dibû bahoz ji goştê spî, û dibû lehiyek ji şehwetê. Mîna ku dixwaze heyfeke xwe ji erd û ezmanan, ji mirovan, ji xwezayê ji xwedayê xwe hilîne tev digeriya. Carekê gote min ku serdarekî yenîçeriyên osmaniyan berî panzede salan mêrê wê gêrî cengeke giran li Meceristanê kiribû û ew li wir hatibû kuştin. Hewwa hîn hîvdesalî bû bûbû jinebî. Îcar serdarê osmanî ew kiribû yariya xwe û hevala nivînên seraya xwe a mezin. Heta ku di dema Sultan Silêmanê duyem de li Asitanê yenîçerî rabûn û Sadriazem Siyawêş paşa kuştin, ew serdar jî li ser darê tuyan bi destê hevalên xwe hate xazokirin û ew rizgar bûbû û bi laşê xwe heyfa xwe ji qederê dihilanî. Şeva ku min ew nas kir, bi saya nameya Xedîce, min nas kir ku ew jine makeşereke mêran ji xwe re dike nêçîr. Ew tenê şevên înan dihat û mûmên şehwetê geş dikirin û xaçîrêkên tarî di xeyal de ronî dikirin. Kesî nizanîbû ew wan rojên din diçe kû! Mûman li kû vêdixê û kîjan koşeyên tarî bi ronahiya memikên xwe dişo! Kesî nizanîbû bê ka ew bahoz mala kê wêran dike û ew lehiya tund kîjan zeviyê dide ber pêlên xwe!

Hewwa û Xedîceyê her carê serpêhatî û çîrokin nû ji jiyana xwe ji min re digotin. Hewwayê digot ku bi sedan mêr di nav seqê wê re derbas bûne. Lê ew min guhê ne li wan çîrokan bû. Min tenê li li ser rûpelên wan herdu bedenên têrgoşt û bîndar û cadûker çîrokên bexteweriyê dixwendin. Di tariya şevên înan de ku bayê serxweşiyê li me hersêyan radibû, min nema zanîbû destê min li ser memikên kêye yan ez di nav ranên kê de me! Di nav nivînan de, bîst tilî wek bîst çêlikên keroşkan li ser sîng û ranên min diçêriyan.

Di nav wê gola hingiv de hin caran kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* jî dihate bîra min. Gelek caran mamosteyê min ê xort Ebdullahê ku êdî diçû ba Henanya û xwe fêrî neqaşî û resmkêşana îkonan dikir, digote min:

- eger tu bixwazî emê li kitêbxaneyên dêrên Helebê û derdorê li kitêba te bigerin. Li ba rahibên marûniyan gelek kitêb hene, li mizgeftan jî em dikarin bigerin.

Ebdullah gelekî ji bidestxistina wê kitêbê re germ bûbû û hêviyên wî weke temenê wî, ter û nazik bûn. Ew ji ba xwe de lê digeriya. Ji taciran, rêwiyan, ji rahib û melayan li wê kitêbê dipirsî û nedidît. Min bi xwe nema di xwe re didît xwe ji dil bidim pêketina wê. Min hema bibêje ew ji bîr kiribû. Ew di nav agirê bi tîn yê şehwetbaziyan min î bêdawî de bûbû arî. Bextewerî bûbû ew dêwê ku di efsaneyên Elf Leyle we Leyle de bi firkandina fanosê re yan jî bi firkandina gustîlka Suleymanê pêximber re amade dibe û dibêje: şubbêk lubbêk, `ebdek bîn îdêk<sup>1</sup>. Min çî bixwesta pêk dihat.

\*\*\*

Bi sala pêncan re, ticareta min gelekî fereh û geş bû. Wek kumik û kîvarkên ku di biharan de, di koka daran û kenarên riyan de ji nişkêve şîn tîn û di roj û şevê de bilind û belav dibin, ticareta min jî wisa mezin û geş bû. Ez û Pedro Del Faro ji hev qetiyabûn û min êdî bi tena

<sup>1</sup> Yanî: Ha û libê! Koleyê te di fermana te de ye.

xwe ticaret dikir. Dostê min Albertoyê ku ji xwe re maleke xweşik ji du qatan, li biniya kelehê kirîbû salê hew carekê ducaran dihate Helebê. Çend rojan dima û diçû ticareta xwe. Nîvê salê li Esfehanê li ba yara xwe Rûnazê dima, nîvê mayî jî li Venedîkê bû û di gendolan de nêçîra keçîk û masiyan dikir. Ewî kilîta wî xaniyê xwe dabû min. Di wî xaniyê mezin ê duqatî de, yê ku li pişt Xan Elbenadiqa diket û berê konsulusê firensî têde bû, min şevbuhêrkên gelekî xweş bi dost û hevalên xwe yê helebî û civakên ewropî re buhurandin. Gelek caran stranvan û ûdjen dibûn mêvan û heta destê sibê gerdûn em ji deng û awaz û meyê serxweş dibûn. Şevên min ên taybet jî hebûn ku divabû yek benîadem jî pê nehise.

Min Xedîce û Hewwayê dianîn mala xwe, yanî mala Alberto û me şevên înan bi şehwetbaziyan heta destê sibê dibûrandin. Di wan deman de min Rahêla jina Yaqûbê serraf jî naskiribû û ew ajotibû xefkê. Eger ku dilê min bibijya wê min xwe li mala wan digirt. Ew li bajarokê Tadiîfê bû lê kar û barên Yaqûb li Helebê bûn loma jî maleke wî li wir jî hebû û gelek caran deriyê xwe ji min re vedikir ku ez û yarikan têde şevên şehwetbaziye bibûrînin. Serrafiyeya wî jî li nîvê bajarê Helebê bû. Min Rahêl di dikana wî a serrafiyê de nas kiribû. Jineke zirav û dirêj, çavreş û lêvtenik bû. Dema cara pêşîn me hev dît, me ji awirên çavên hev nas kir ku em herdu jî li hev digerin. Min wê rojê hinek dînarên zêr ên venedîkî ku dibêjinê eslanî û esedî<sup>1</sup> biribûn cem Yaqûb da ku wan wergerînim. Min hinek ji wan eslaniyan bi zêr re guherî. Ji nav zêran jî min gustîlek derxist û da Rahêl û gote Yaqûb: heqê vê serrafiya te ya paqij bila ev gustîl diyariya vê jina te ya bedew be. Ê min çavek ji Rahêlê re qurçand. Ew ji wê kêlîkê de bû yarika min. Gelek caran ku ew dihate Helebê min ew dibire civanên şehwetbaziye bi Xedîce û Hewwayê re. Hersêyan li ber min, hev tazî dikirin û hev dialastin. Di ser hev re diqulibîn û ez di nav sihra laşên xwe ên germ û nerm de winda dikirim. Axînen wan awazeke har bû giyanê min hebûna min li ber dibû mîna dewrêşekî bi cizbê ketî.

Di wan deman de, di nava wê serxweşiya min a bi meya bexteweriyê de Nûredînê kor rojekê hat li deriyê min da. Êvareke îne bû û Hewwaya çerkez bi tenê li ba min bû. Me xwe ji avjeniya di gola hingivê şehwetê de re amade kiribû. Lê wê lédana bi israr a li derî hişt ku ez cilên xwe li xwe kim û derkevim binêrim ka ew kiye. Heta ez gihiştim ber derî jî deng dihat. Diyar bû ku lédana korekî ye. Ne li destikê derî dida Nûredîn kor lê bi gopalê xwe li keviya deriyê min dida. Gava ku min derî vekir min kêfa di wî rûyê bêçav de dît. Mîna her korekî berê wî li jor bû û stûyê xwe bi rexekekî kiribû û çawa ku pêjna min kir got:

- xoce Martîn mizgîna min li te. Kitêb hate dîtin.
- Kitêba çi?

Nûredînê kor ji kêfa xwe daneket û bi hêrs got:

- El Ifade El Ifade. Te ji bîr kiriye? Ew kitêba ku tu lê digeriyayî. Li mala şêx.....

Lê min ew bi sarbûneke ku wî nedipa qut kir û got:

- Kitêba bexteweriyê li ba min e. Loma jî ez nema lê digirim.

Ku min wisa got, Nûredîn gelekî li ber xwe ket. Stûyê xwe xwar kir û serê xwe du sê caran çep û rast hejand û di ber xwe de kire birebir û bi lez ji ber derî çû û ez jî vegeyîyam wê kitêba bexteweriyê ku berg û pelên wê goştêkî spî bû û hibra ku pê hatî nivîsîn jî şerbeta du lêvên ji meyê xweştir bû.

Ez bûbûm du mirov. Du kesên bi her awayî ji hev cuda. Derve û hundirê min ne wek hev bûn. Ji derve de, ez kesekî maqûl, xiristiyanekî Xwedêperes, dilnermekî ku xêran li her xizanî dike û napirse dîne wî çiyê. Ne dilbijokê jinan û hema nîv melayiketek. Lê di hundirê xwe de, ew hundirê ku min bi sed û yek gaz çuxê ingilîzî ê reş ji xap û rîp û fen û finasan pêçabû, mirovekî din bûm. Derewker, ganbaz, kutanvan, çavlider û dilbijokê her karekî kirêt. Heramxur û fayizçî, zinêkar û bêdîn. Rû, qedîfeyekî nerm ku ji pirça keroşkê nermtir bû lê astar ji cawekî ji mûyê bizinan zivrtir bû! Ya ecêb ew bû ku harmoniyeke tekûz di navbera herdu aliyên min de, di navbera derve û hundirê min de hebû. Çawa li hev kiribûn derve û

<sup>1</sup> Hin ereb ji wan dînanan re dibêjin Bûkêl. Ew ji gotina Ebû Kelb hatiye, yanî dînarê ku wêneyê seg li ser! Nizanim çima li şûna navê şêr, navê seg bikardianîn! Qey ji ber nefreta wan a ji venedîkiyan fiile re ye!

hundirê min! Min bi xwe ji xwe bawer nedikir. Çima ez ewçend hatibûm guhertin! Biriqandina zêr bû ku ez wê çendê wergerandibûm yan jî dûriya ji welêt bû!

Nûredînê kor carekê, berî ku dilê wî ji min sar bibe û ez nema wî bibînim, li ber deriyê hemama Yelbuxa ku li başûrê kelehê û rojavayî mizgefta Altunbuxa dikeve, gote min:

- Xoce Martîn ku mirov dûrî welatê xwe bikeve, mîna ku dûrî xwedayê xwe bikeve, genî dibe.

Ê min ez ne bes dûrî welatê xwe ketibûm, lê êdî min nema zanibû welat çiye û çima kirî yek bêriya wan deverên ku jê derketiye bike. Ewqase mal bi ser min de rijiyayî, ewqas jin di bin siya gunê min de û ewqase bextewerî! Welat çi rêx bû!

Ez bextewer bûm. Ji xwe wan hestên bexteweriyê dihiştin ku ez di riya xwe de bimînim û li ber çu kiryarên xwe nekevim û ji ber têkiliyên xwe fedî nekim û poşman nebim. Wijdanê min gelekî aram û razî bû. Bextewerîya ku di kitêban de ez lê digeriyam, êdî di jiyana rojane de mîna kîvroşkekê ketibû tora min û min ew di hemêza xwe de kedî kiribû. Çima dê îcar rabim toran li vir û wir vedim! Mesîh dibêje ku kesê gunehkar dibe koleyê gunehkariyê. Ê min jî gunehkariyên min ji min re bûbûn bextewerî û min jî bi rastî hevсарê xwe dabû destê şeytanan û bûbûm koleyê wan gunehên şêrîn.

\*\*\*

Bi vî awayî sal derbas dibûn. Bi fêrbûna zimanê erebî, ticareta kaxezan û çûn û hatina der û doran. Bi seyran û çûna nêçîrê bi dostên xwe ên inglîz re. Bi lîstina skembîl û kaxezan û qumarê di şevbuhêrkên ewropîyan de. Bi beşdariya di ciridên hespan de. Bi bidestxistina gelek jin û cariyeyan û bi danûstendina bi waliyan û qunsulusên ewropî û giregiran re. Û bi herifîna hundurê min ê ku hayê min jê nebû, salên min buhurîn mîna ku seet bin ne sal. Şaberûya min her bi min re bû. Carê ez li tûrikê ku min ew têde hilanî bû rast dihatim. Ez dihatim ku biavêjim, lê nizamim ew çi hêz bû destê min li ber avêtina wê girêdida! Min dizanibû çi bi hundirê şaberûya min hatiye lê min hay ji hundurê xwe û kifîkgirtina wî nebû. Ez diherifim. Mîna berfemêrekî li ber tavê dihatim xwarê û dibişifim. Herifîna hundiran jî kes pê nahise. Ew ne mîna nexweşiyên ku li bedena mirov peyda dibin e. Ne mîna nexweşiya zaferanpaşa ye ku çermê mirov û çavên mirov ji ber zer dibin û her kes dibîne. Ne jî mîna tayeke germ e ku rûyê mirov têde ji ber germiya hinavan sor dibe û ne jî sersamiye ku di gotinên mirovan de xuya bibe. Ew herifîneke ku pelên darên pakiya hinavan zer dike û diweşîne. Herifîneke bêdeng e, xedar e û hêdî hêdî ye ku derûnê mirov û pakiya mirov dide ber xwe. Ez diherifim û giyanê min dibû kavilekî wêran.

Ev nivîsa ku li ser jiyana min a li bajarê Helebê ye û serpêhatiyên min î wî bajarî ne, min di riya di navbera Heleb û Diyarbekirê û Diyarbekir û Bedlîsê de bi dawî anî. Geh li xan û karwanserayan û geh jî li hucreyên mizgeftan, geh jî li kenarê riyekê û keviyê kaniyekê yan jî li bin siya darekê min ev serpêhatiyên xwe nivîsî ne. Gelek ji van bîranînan li ber ronahiya mûmên ku min ji Helebê berî derketina xwe bi rojekê kirîbûn hatine nivîsandin. Hin jî li ber tava êş û hesretan di quncikên hênîk ên karwanserayan yan hêwanên mizgeftan de û hin jî li ber ronahiya agirê poşmaniya min hatine nivîsandin. Niha jî ez van xêzên dawî di rojeke payîzêyî sar de dinivîsînim. Ez, hindik maye bigihêim hevalê xwe Alberto de Silva ku wî ez dawetî vî welatî kirime. Ev welatê kurmancan e ku bûye çend meh min daye ser rê û rêçikên wî û berê min li xewnekê ye. Welatekî ku çiya têde mîna beranan poşan li zikê ezmên didin. Welatê hezar çiyayî ev welat.

\*\*\*

## Se`et 3

*Sê caran, deng ji naqosa dêrê hat<sup>1</sup>.*

*Lê rewaya ku li dora dêrê derî li ber dengê naqosê kilît dîkin, ew sê çingelingên bi lez û xut î ku nîşana se`et sisê bûn, hinekî nizm kiribûn. Ne mîna ku hewa sayî be û rewa nebe û zuwayî be. Wê hingê dengê jamên dêran li her deran vedide û safî digihê guhan. Dibêjî qey rewa, ewr û mij dengan dimijîn!*

*Bi çingelinga sêyem re ku ji herduyên berî xwe bihêztir bû, xwendevanê ilahiyatê deftera yekem qedand. Ew bûbûn pênc seetên wî ku ketibû ser zikê wê defterê. Destê wî jê nedibû. Dema bi dawî hat ew defter, wî serê xwe ji ser rûpela dawî, ku bi hevoka (û hin jî li ber ronahiya agirê poşmaniya min hatine nivîsandin) diqediya, rakir.*

*Bêhna xwe hinekî berda û zîxika perîka qazê li ser deftera din danî. Deftera A, xiste bin palgeha pişt xwe ( wî jî fêhm nekir çima wisa dike! Gelo xwedîtîyê li defterê dike! Yan jî wê ji ber hinekan diparêze!) û xwest dest bi ya din bike lê tîbûnê zora wî bir û nema xwe girt. Bêgav bû ku dakeve jêr û qedehek av vexwe. Gava ku çavên wî li kesên rûniştî ket, behetî. Her yek di cihê xwe de bû. Kesek nelivîya bû. Lê hemî jî bêdeng bûn. Ne di xew de bûn lê bêdeng bûn. Heta ew refên tilûran û şalûlên nikil sor û perîk reş jî li ser şaxên daran hîn nivîyayî mabûn û bêdeng bûn. Ji xwe Gustavê ku ji axaftinê têr nedibû, di xew re çûbû, serê xwe li ser milên xwe danîbû û xwe sipartibû şala xwe ya reş ya ku li ser maseyê kom kiribû. Dengê henasên wî tev li dûyê ku ji serqelûna Fernando dikişîya banê jor dibû. Ressamê şalsor, hey li naqosa dêrê dinêr<sup>2</sup>. Kursiya kalo vala mabû lê wî dîsa jî her kêlîkeke kurt li wê semtê dinerî û firçeya xwe li ser cawê li pêşîya xwe bi bêzarî dibir û dianî. Kemanjenê ji Mülhausenê jî, bi wê tempoya tilîkên ressam li ser cawê spî re, tilîkên xwe li jihenê kemanê dixistin û mîna ku li hêviya aferînên wê be, li pîra ku bêdeng li ber ocaxê rûniştibû û gore dirêsa, dinêrî. Xwendevanê ilahiyatê gelekî mat ma! Gelo çima ewqase dem derbas dibe û dîmen nayê guhertin? Dem dîmenan dimeyîne û diguherîne, dengê wan di newal û geliyên xeyalê mirov de bilind dike, rengin nû li wan bar dike. Lê ev dîmenê li jêr! Her wisa maye bêtî ku guhertineke bingehîn lê xuyabibe. Bi seetan ew pîr goreyekê tenê dirêse yan gelo gelek gore ristine? Kemanjen hin awazin nû amade dike û lê dide yan her û her dubare dike? Xwendevanê romanê yeke din dest pêkirîye yan her wê romana xwe ya berê dixwîne? Ressam tabloya ku dikişand qedandiye yan her bi ya berê mijûl e û biliyaye? Wî guh neda bersiva van pirsên ku bi derûnê wî ve mîna gêrik û mîroyan hildiperikîn û ew dixurandin. Bêdeng qedeha avê rakire ber devê xwe, av vexwar û mîna dizekî li ser tiliyên nigê xwe bi derenceyên ji darên gwîzê ve hilkişîya jor û çû odeya xwe bêtî ku kesek ji wanên li jêr bala xwe bidê. Kete ser zikê wê deftera ku mîna çend nameyan bû û bi nivîseke xerîb dest pê dikir û xwend:*

\*\*\*

<sup>1</sup> Seetekê temam Georg di hêwana tarî ya dêrê de bêdeng û ponijî mabû. Karl hatibû ber wî û destê xwe bi hogirî di ser serê wî re biribû û xwestibû ber dilê wî bide û gotibûyê ku ewê deh hellerên zêde jî bidîyê, lê wî bi destê Karl girtibû û dûrxistibû. Karl kiribû nekiribû ku ew lê binêre, gotineke wî vegeirîne, Georg qet guh nedabûyê. Gelekî li ber geriyabû lê hey Georg xwe bêtir delalî kiribû. Heta ku seet bûbû sisîyê pê nîvro jî û jê xwestibû ku hilkişê jor û li zengil bide wî nepejirandibû û bi kerb rabûbû û ji dêrê derketibû. Karl jî bi kerbeke weke ya wî çûbû û werisê jama dêrê sê caran bi lez û kerb li ser hev kişandibû û ringînê jê anîbû. Kevokên bêhiş ên ku dîsa li ser kevîkê birca dêrê veniştibûn her yek ji xwe re bi aliyekî de firiyabû.

<sup>2</sup> Ew rengê bêcîrr, rengê zengê ku ressamên dunyayê diheyirandin hîn bi wî re derneketibû. Di dilê xwe d egot: ma wê çi biqewimiya ku ev naqos jî nû ba û ev zenga jehrîn negirtiba! Û di ber xwe de çend nifir li keşeyên dêran kirin.



﴿بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ﴾

Ji Martîn Setzer, ji bo rêzdar Hans Heilberg,  
Silav

Ev bûye bêtirî neh salan ku ez ji welatê xwe derketime û dûrketime. Tu dehê caran dihatî bîra min lê nizanim çima rojekê jî nehatibû bala min ku ez nameyan ji cenabê te re rêbikim! Piraniya nameyan di ava deryayê wer dibin yan jî bi gemiyên qorsanna re diçin. Gelek name jî winda dibin, kesê ku divê wan bigihîne cihê wan zêde xwedî li wan dernakevin. Vaye niha piştî ku ez bi selametî, lê bi giyanekî guvaştî, zimanekî şikestî û viyanekî peritî ji wê xana seyr reha bûm, ez dest bi nivîsandina nameyan dikim. Nameyên ku dê bi xwe dest bi dest bidim te wê ne pirsîna halê te yan rewşa gundê me bin, ewê bersiv bin. Bersiva wan pirsên ku ji roja roj de mejiyê min, hiş û giyanê min bi peydakirina xwe mijûl kiribûn. Min berê jiyana xwe heta qonaxekê wek kitêbekê nivîsîye û ew daye aliyekî û parastiye. Min gelekî hay jê dikir. Di wê xanê de jî hayê min ji wê defterê hebû. Ez ditirsyam ku dîsa tiştek bi wan pelên ku min jiyana xwe rijandiye nav wan bê. Ez ditirsyam ku winda bibin yan jî kesek wan bide ber devê êgir yan bidize. Heta ji min hat min ew parastin. Ji roniya çavê xwe bêtir min ew parastin.

Ez ê bi çu kesî re van nameyan neşînim Hans. Ez ê bi xwe, bi destê xwe wan bigihînim te. Ez ditirsim ku dema ez te bibînim nikaribim bûyerên ku ez li şerqê tûşî wan bûbûm û ew rastî min hatibûn ji te re vebêjim. Zimanê min giran dibe, pûç dibe û êşeke nenas di koka wî de peyda bûye. Xurek ketiye binê zimanê min ku bi rastî ecêb e. Ez ji vî zimanî bi guman im! Bawer nakim ku ewê karibe bûyeran vebêje. Bawer nakim ezê karibim vî parçe goştê ku di devê min de yek caran pûç dibe, bi silametî bigihînim Herne<sup>1</sup>.

Min serpêhatiyên xwe, ji roja derketina ji Herne û heta dawiya sala min a pêncan li Helebê di defterekê de wek kitêbekê bi wê qelema ku min ji mamosteyê xwe ê biçûk Ebdullahyê kurê Zekeriyayê zêrker mîna diyariyekê wergirtibû, nivîsibûn. Dema ez û kesên din di wê xanê de asê bûn û rêya derketinê li ber me hate girtin, min bi dizî di şevên sar û bêdeng û bi saw de nivîsîna wan serpêhatîyan rast dikir. Wek ku mirina min li ber derî be min her tiştê ku li min çûbû û dîsa dihate bîra min dinivîsî. Xwedê kir ku li wê xana mişt raz û serê mirovan dixwar, ew pelên min filitîn.

Hansê hêja,

Niha êdî ez pê dihesim ku divê bi te re biaxivim, bîr û bawerî û bûyeran bi te re parvebikim. Min bêriya te kiriye. Min bêriya dengê te ê dilovan û awirên te ên bavane kiriye. Min bêriya rûniştina bi te re heta derengî şevê kiriye. Min bêriya Herne, dêra wê, dengê naqosa wê, kevokên ku li ezmanê wê û di ser banên sor re difiriyan û dehlên tûdirkan û darên berû û sêvan û bindeqan kiriye. Min bêriya darên guhîjan kiriye. Min bêriya berfê û axê û bayê sar û ewr û erd û keroşk û sivore û hertiştê Herne kiriye. Lê berê ewqase bêrîkirin di kîjan quncikê dilê min de bû? Di kîjan hêla hestên min de asê mabû? Çima serî hilnedida? Gelo ku ne ew rojên xanê ên reş bûna wê welatê min her û her di binê bîra bêrîkirinê de heta kengî maba? Minê biryara vegeerê daba yan na? Ev pirs li bersivan digerin. Ez li xwe digirim. Ez, şaberûya ji tela xwe ketî û ji qêlik derketî, dixwazim careke din li qalikê xwe vegeirim. Gelo ew qalik ê min bihewîne yan na? Gelo ezê di wî qalikê hilêm an na? Nizanim, nizanim. Heta di wan rojên

<sup>1</sup> Ez li Bazîdê me. Bajarekî kurdan e. Berî demekê ez û Alberto di rojê ku baraneke reş têde bariya em gihabûnê. Niha li mala camêrekî kurd î xetat im navê wî Şêrbarê Mamzêdî ye. Wî û birayê xwe Dawudê Mamzêdî ez gihandime vir. Çîroka min û wan jî dirêj e ezê vebêjim. Bi xêra Dawudê zana min ev bajar tev dahev û kitêbfiroş Selaheddîn ji nas kir û hin alavên nivîsandinê ji ba wî korrîn.

tarî û giran de jî şaberûya ku te roja derketinê dabû min bi min re bû. Min her carê ji tûrikê çermîn derdixist û lê dinêrî, destê xwe didayê, dida ber guhê xwe û dihejand. Hîn jî di berîkek min de ye ew şaberûya sêwî. Ew xerîba welatan û dûrketiya ji qalik û şax û terhikan.

Do, roja şemiyê heftê meha çîleya paşîn ji sala hezar û heftsed û heştan bû ku li gor salnameya dêra ortodoksî û xiristiyânên şerqê cejna rojbûna Îsayê Mesîh e, ez se`et sisiyê piştî nîvro bi halekî perîşan bi xêra kurdekî qenc û merivekî xwedê ku navê wî Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî ye gihome bajarê kurdan Bayezîda ku di dawîya memlekta osmaniyan de ye û li ser sînorê qizilbaş û rûs û ermenan e û çiyayekî bilind ku serê wî tim di nav ewran de ye, ji dûr bi berfa xwe ya ezelî lê dinêre. Tu li wê deştê li kîjan gund yan bajarî bî ew çiyayê mezin xuya dike. Bi ku de diçî ew çiyayê sawdar mîna dêwekî efsaneyan her bi dû te de ye.

Ji bo min bi xwe jî do roja jidayikbûneke taze bû. Ez ji nûve do hatime ser rûyê erdê piştî demeke efsaneyî di xaneke seyr de ku dê bûyerên wê ji te re di nameyên xwe de, piştî ku vegotina serpêhatiyên xwe yên li Helebê biqedînim, rêz bikim.

Martîn

Bayezîd, seet sisiyê piştî nîvro. Yekşema pîroz. 8ê meha çîleya paşîn. 1708<sup>1</sup>

\*\*\*

Hansê hêja,

di nameya xwe ya berê de min soz dabû te ku dê serpêhatiyên xwe yê li bajarê helebê temam bikim û paşe werim ser wê xana ecêb a ku hîn tîrsa wê diniquite dilê min. Ezê niha bûyereke diltezin, bûyereke ku ez bi rastiya min re rû bi rû kirim ji te re binivîsim.

Li Helebê, berî bêtirî salekê bû. Zivistaneke sar konên xwe ên berfê li bajêr û derodra wê vegirtibûn. Şevê ji şevên çîleya pêşîn bû, ez bi tenê li mal bûm û min dirhem û dînarên xwe ên ku min ji firotina çend bar kaxezên di wê rojê de bi dest xistibûn dijimartin û dixistin kûpîkekî. Dengê derî hat. Min bi lez kûpîk xiste cihê wî û rabûm min derî vekir. Pêşûzek di destê minê çepê de bû û bi destê rastê min bi felqeyekî derî girtibû gav ku min di ronahiya çirayê de rûyê Kewserê dît. Kewsera ku min di deftera berê de çîroka xwe û wê vegotiye bi xwe bû. Çavên min bûne tas! Ev li ber deriyê min û di vê şevê de li çi digere? Ji ku derket! Çawa mala min nas kir? Van pîrsan di kêlîkeke gelekî kurt de xwe dane rex hev, mîna xêzeke di vê pelê de rêz bûn, lê Kewserê bi gotina: merheba Martîn re nuqte li dawîya wê rêzê danî.

- Kewê tuyî!
- Ne ez tenê me, ez û zaroka te ne.
- Zaroka min?

Min negotê derbas be, wê jî negote min: ma ez dikarim derbas bibim? Û kete hundir.

Weke vê gavê, wê gavê jî devê min zuwa bû û zimanê min giran bû. Min digot qey pûç bûye. Deng ji min nema derket. Em bi hev re bêdeng heta hêwana ku sê mûmên mezin roniyên xwe rijandibûn ser xaliyeke ji mûyê deveyên bajarê Belxê ku Alberto carekê ji Esfehanê anîbû. Hinek ji ronahiya wan sê mûman bi dîwarên hêwanê ve jî hilperikîbû. Min bala xwe dayê ku Kewserê bi giranî rûnişt û pala xwe da palgeha ku pala xwe dabû dîwêr. Pêşûza ku hîn di destê min de bû siyeke mezin ji zikê wê re li ser dîwêr resim kir. Min li zikê wê nihêrî, zikê wê bi rastî jî mezin bû û gihabû ber devê wê. Kewserê ducanî bû. Ava bû. Kewsera ku bûbû çend sal min pêjna wê jî nema fikir avis bi ser min de hat Hans!

Aaax Hans! Te berê min da kîjan wêranê? Min berê xwe da kîjan wêranê? Di gera li bexteweriyê de, ez ketim pirika perîşanî û gunehkariyê. Di gera li bexteweriyê de ez ketim

---

<sup>1</sup> Ev li gor teqwîma Grîgoriye a ku gelek welatên ewropa tarîxa xwe pê dinasin. Ez bawer im ku hîn protestantên me ên lûterî û dewleta Prûsyayê bi teqwîma Julyanî dikin! Li gor wê hîn sal nû nebûye û tarîx weha ye: 28 çîleya pêşîn 1707!

gerîneka gemarî ya ruhekî lewitî ku şeytanan pêde mîstibû. Ez ne tenê dûrî welatê xwe ketibûm, ez dûrî xwe jî ketibûm û êdî nema min bi xwe xwe nas dikir. Sûcê min bû yan yê te? Yan jî wek ku misilman dibêjin ev qedera min bû û li ser eniya min hatibû nivîsandin? Ne xwedayek hat ku bi destê min bigire û min ji wê koncalê bikişîne û ne jî min dixwest ku ez ji wê koncala ku min digot qey tijî hingiv e derkevim.

Wê êvarê, dema ku min dît vaye Kewserê li mala min e û reva ji ber wê êdî nabe, min cegermendiya xwe hemî komî ser hev kir û bi dengê jixwebawer gotê:

- Kewê tu dizanî ji zû de me hev nedîtiye. Sal ketine wê navberê, çawa tu dibêji: ev zaroka te ye?

Di ronahiya pêşûza hîn di destê min de, min çavên wê yên ku berê mêrg û çîmenmên giyanê min bûn dîtin. Min di wan de hêsirên ku li ser wî rûyê esmer î ku ji avisbûnê belek bûbû dîtin.

- Min bisitirîne Martîn!

Kewserê got û bû îkseîska wê û serpêhatiya xwe wisa vegot:

Ez di meha xwe ya heştan de me. Ev zaroka di zikê min de berhem û berê şeveke bêyom û têtikiliyeke bêqidoş e. Şeveke ku qederek reş bû. Pietroyê venedîkî ê tacir, berî diya min bimre bi sê mehan, dîsa hatibû Helebê. Min ew berî te nas dikir. Tu ji dest min çûbûyî û êdî min dixwest ruhê xwe yê birîndar melhem bikim. Ez pêre razam. Min qîzaniya xwe ya ku ji te diparast diyarî wî kir. Min ji wî hez dikir Martîn. Berî te, ez yariya wî ya bi mehan bûm. Wî soz dabû min ku min jî bi xwe re bibe Venedîkê. Ew kesekî qenc bû û min tucarî derew jê nedipar. Ji min re behsa bajarê xwe û qina û av û pir û koşkên wê dikir. Ji min re behsa gendolan dikir ku di kolanên venedîkê de digerin û şahîyê belav dikin. Min karê xwe kir ku ez pêre birevim. Wî got ku ewê here seferekê û zû li min vegere. Û çû. Ez pê hisiyam ku di zikê min de insanek xulîqiye. Ez nema ketim cilan. Xwîna bînimêjiyê qut bûbû. Mahdê min li hev diket û dilê min dixeliya. Min nema zanîbû çi bikim. Min xwest ji diya xwe re bibêjim lê dê wê dêya kor a reben û nexweşa li erdê çi ji min re bikira! Demek derbas bû diya min mir. Tu xeber ji Pietro nema hatin. Min destpêkê mesele veşart. Lê wek ku kurmanc dibêjin: çêlek bi dizî tê ga û eşkere dizê. Roj bi roj zikê min mezintir dibû. Hêviya min hîn hebû ku Pietro rojekê bê û bi destê min bigre û min bibe. Wî derew li min nekiribûn. Lê xebera reş hat û got: Pietro di ava deryayê de xerq bûye. Gemiya ku li nêzîkî qeraxên Qibrisê rastî bagereke deryayî hatibû, di gel sêsed kesî binav bûbû. Hêviya min jî binav bû. Min pêşî bawer nekir. Mirov naxwaze xeberên ne li gor dilê wî bin bawer bike. Lê rast bû. Wek devê kêrekê rast û tûj bû ew xeber. Her kesî behsa gemiya ku ji Venedîkê dihat û xerq bûbû dikir lê kesî bi derdê min nizanîbû. Ma te ew xeber nebihîstibû<sup>1</sup>?

Bêguman te bihîstiye. Wê demê min xwe meheke din jî ragirt, min digot hema xeberek were, mûcizeyek serê xwe hilde. Ma hindikin ên ku xebera mirina wan hatibe, paşê ji nişkê ve xuya dibin! Dem diçû û hêviya min biçûk dibû. Bi qasî ku hêviya min biçûk dibû, zikê min jî mezin dibû. Êdî veşartina wî zikê mezin nema dibû. Min nedixwest ji mal derkevim. Min zarokên taxê dişandin kirîna xwarinê. Gelek caran min xwest berê xwe bidim te, lê cegera min nebû. Mêrekî aqilmend li cîhanê nîne ku ji bo zaroka kesekî mirî bibe bav. Kesek nîne ku bibe bavê pîçekî. Jineke aqildar jî nîne ku zaroka xwe bikuje, bila ew zarok berhema têtikiliyeke haram be jî, ewê zaroka xwe biparêze. Hin caran ez bi şev diçûme ber keviyên çemê Quwêq û min dikir ku xwe bavêjim avê û xwe û vê zaroka bêguneh bisipêrim bextê pêlan. Yan jî werîsekî li telê dareke spîndarê ku li rexê Quwêq şîn tîr girêbidim û stûyê xwe bixim xelesa wî û xwe daliqînim. Lê nizanim çi hêz bû ez radiwestandim. Min dixwest vê zaroka di zikê xwe de

---

<sup>1</sup> Helbet min bihîstibû. Bûyereke wisan Cenova û Venedîk û Marsîlya û London û Amsterdam û Bexdad û Smîrna û dunya hemû jî pê dihesê. Ew wek agirê ku bi pûş bikeve li xanên Helebê jî geryabû. Alberto de Silva gotibû min ku bi sedan kes xerq bûne. Wî navê Pietro jî ji min re gotibû. Wan hevdû nasdikir. Ji xwe metropolîtê ortodoks jî wê demê nû ji Qibrisê hatibû û navên gelek kesên naskirî ên ku bi gemiyê re binav bûbûn, bi xwe re di listeyekê de anîbûn û li derê û qonsulgehan û xanan belav dikirin. Lê min guh nedabû wê bûyerê. Ez bi derdê xwe û ticaret û kêfa xwe daketibûm. Bi derdê Rahêla cihû, û Xedîce û Hewwayê daketibûm.



biparêzim. Ez pê dihisiyam ku ev zarok divê bimîne û ne ji mafê min e ez wî ji ber xwe bikim. Ew kurê kesekî ye ku min jê hez dikir. Lê dîsa weke dînan min hewl da ku zarokê ji ber xwe bikim. Hewldanên min têkçûn. Ne min derman nas dikirin, ne jî zarokê xwe ji malzaroka min berdida. Min barên giran di mal de rakirin. Bi kulman bi zikê xwe diketim. Piştî min dihat ku were xwarê lê ev zarok danediket.

Niha jî dema di vê şevê de min berê xwe da te, min berê xwe daye dilê te yê mezin. Dest û nigên te maç dikim Martîn. Min bike cêriya xwe, min bike evda xwe. Çawa dikî bike lê hema vê zaroka min biparêze. Tu bi qedrê diya Îsayê Mesîh bikî Martîn. Ez di bextê te û pakiya giyanê wê de me.

Min bi rastî jî nizanîbû kîjan bersiv hêjayî wê rewşê ye? Çi jêre bibêjim? Bêdengî nabe, xwe ji wî alî nekim nabe. Ew hatiye û xwe li min girtiye. Rabû min gotê:

- Kewê ez nizanim çi bibêjim! Wisa tu ji nişkêve derketî û dozeke mezin li min dikî. Bihêle ez hinekî biramim. Çend rojan fersendê bide min, helbet çareyek heye.

Û em herdu di gola bêdengiyê de werbûn.

Gelo çawa ezê xwe ji vê gerîneka han derxînim? Min ev pirs ji xwe kir û li bersivan geriyam. Kewserê demekê di mala min de bû. Min nema zanîbû çi bikim. Ku ew di mala min de biwelide ezê ji xelkê re nebêjim çi? Ku hinek fesadiyê bikin û kesek wê li mala min bibîne, ew ê zor be û dibe ku min û wê me herduyan jî bi saxî bisojin. Ji min dixwest ku ez biçim ba dayeyên pîr û li dermanê jiberxwekirinê bipirsim. Lê êdî dem buhurî bû û jiberavêtin nema mumkin bû. Di meha heştan de jiberxwekirin kuştin bi xwe ye. Mumkin e kuştina dê û zarokê herduyan be jî. Ez ditirsiyam ku raza min kifş bibe. Ji bo min û navê min ê ku bûye çend sal ez ava dikim nebaş bû. Eger xeber bigiha paşayê Helebê yan jî ku dewletê bixwesta min mehkeme bike, wê tehlûke bûya. Milletên ewropî û dostên min pê bihisin hetîketî ye. Ji xwe ku xelkên bajêr yan merivên wê pê bihisin wê min bi keviran biricimînin. Cezayê min dê pir giran bûya ku bizanibana têkiliya min bi vê keçê re hebû. Hela dê ji qet wê nepirsiyana ka rast e an derew e! Dê ew yekser bidana ber xenceran. Dîsa fikreya jiberkirinê serê xwe hilda. Min texmîn kir ku riyeke ne xirab e. Dibe ku bibe çareya xelasîyê. Ihtimaleke mezin heye ku kewserê bifilite. Êdî min digot ezê zarokê bi zora dermanan ji ber bikim.

Min hin kitêbên tîbbê bi dest xistin û di wan de xwend ku kuncî û kafûr û beybûn ji bo beravêtinê qenc in. Lê dîsa jî min newêrî bû. Ez ditirsiyam ku Kewserê di nav destê min de bimre, îcar kuştina jinekê ji min kêr bû! Gunehkarî hemî li ba min asan bûbûn lê qetla benîademan? Destê min li Kewsera bêguneh û yara min î demeke xweş nedigeriya. Di wê heyra han de, di wê gerîneka kûr û bêbinî de, Kewserê gote min ku ka em bizewicin. Bi rastî wek dînan bûbû. Min gotê ma ne ez fille me tu jî misilman î û zewaca me nabe. Got ka ez bibim fille! Min gotê wisa tu dibî murted yanî ji dînê xwe derdikevî û cezaya murtedan jî serbirîna bi şûr e û ez jî dikevim belayê. Wê got ka min birevîne û em herin welatekî din. Yanî gotinek ji şerq û yek ji xerb dianî. Bi rastî jî malxolî bûbû û ez êdî jê ditirsiyam.

\*\*\*

Di wê demê de xettatê kurmanc Yavuzê çortanxur hatibû Helebê. Ewî heyreta min dîtibû û bi rik bû ku nas bike çi bela min e. Min nedixwest ez ji wî re meselê bibêjim. Çend carî me hevdû geh li ber derê kelê, geh jî li ber derê xana Wezîr ku ew lê dima, didît û wî hey pirsî rewşa min û mahdê min î zer dikir. Min jî dixwest derdê xwe ji kesekî ne ji bajêr re bibêjim, min dixwest wî barî ji ser piştî xwe deynim û rûhê xwe hinekî rihet bikim. Berî ku Yavuz berê xwe bide welatê xwe bi rojekê, min sibehekê dît ku waye ew ji aliyê sûka hevrişimê tê. Ez jî nû ji mal derketibûm û berê min li Yaqûbê serraf bû. Min soz dabû Kewsera ku hîn di binê xênî de bû û li hêviya çareyekê bû, ku zû lê vegerim û di nava heftiyekê de vê pirsgirêkê çareser bikim. Çawa ku wî ez dîtîm, negiha silavê li min bike got:

- Yan tu bi jana zirav î yan jî derdekî te yê derûnî û mezin heye! Tu nikarî ji min veşêrî. Bawer bike xelkê sûkê tev de di bi te diaxivin. Gelek dibêjin ku Martînê kose nema li

ser karê xwe ye û bi tişteki giran mijûl bûye. Ya dilê xwe bibêje dibe ku ez karibim alîkariya te bikim.

Rabû min ji bêgavî çîroka xwe û Kewserê ji serî heta dawî jê re got. Çavên wî biriqîn. Biriqandinek ku min jê fêhm nekir lê di ber kenekî sivik re ku devê wî ê mîna dasekê xwar xwartir kir, bi şahî got:

- Çîroka te ev be hêsan e xoce Martîn.
- Çare çiye?
- Tu li min bihêle.
- Ka bibêje tu yê çi bikî!
- Ezê pêre bizewicim.
- Çawa?
- Yanî ezê wê li xwe mehr bikim. Ezê wê bibim welatê xwe.
- Rast?
- Tu bawer nakî yan tu naxwazî?

Ne min dixwest û ne jî min bawer dikir! Lê di nav wan pêlên bilind û sergêjiya min de, di nav wê pirrika ku min xwe ji nişkan ve têde dît destek dirêjî min bûye, destê alîkarî û rizgarkirinê. Ma gelo min dê çawa xwe teslîmî bextê wî destî nekirib? Min dê çima xwe nesipartiba siya wî dîwarê bilind? Lê dîsa jî min dixwest zanibim ka ewê çawa bike. Min jê pirsî:

- Erê baş e lê bi çi awayî?
- Ew karê min e. Min gelek derd derman kirine. Xema wê yekê nexwe. Hew ev bû çîroka ku te ji min vedîşart?

Yavuzê çortanxur bi ken ew pîrsa xwe got û keriyek çortan avête devê xwe û em herdu bêdeng meşyan. Bi rê de dîs pîrsek ji min kir û got:

- Tu nabêjî min ew keçikek niha li ku ye?
- Li ba min li mal e.
- ezê wê li ba te bibînim û hinekî pê re bixivim. Ma dibe?
- Erê dibe, dibe.

Min got û serê xwe du sê caran ber bi jêr de hejand û hew me dît va em li ber deriyê Yaqûbê serraf in.

Em zêde li sûkê neman. Di nigê nig de em vegeeriyane mal û yekser min hişt ku ew kurmanc, yanî Kewserê û Yavuz, li hev rûnin.

Herdu jî kurd bûn û ji zimanê hev fêhm dikirin. Ew kêlîkekê bi tenê man. Eu nizanîm çi ji hev re gotin û nizanîm çima bi dengekê gelekî nizim li gel hev axivîn lê min dît ku rûyê Kewserê tavi lê geş bû. Êdî wê nema bawer dikir ji mala derkeve û min jî nema ji çavên xwe bawer dikir. Heta ku derketin û Kewserê ji bîr kir xatir ji min bixwaze jî ez behetî bûm û deng ji min nedihat. Gelo vî Yavuzî çi sihirbazî kir û jêre çi got heta ku ew wisa şad û geş bû? Ji bo min ne zêde pêwîst bû ka wan çi ji hev re gotin. Ya pêwîst ew encama wê axaftina wan bû. Min ji guh û çavên xwe bawer nekir. Xwedê ev Yavuzê dilbirehm ji min re ji kû şand! Xewn e gelo yan rastîye! Mîna ku keviyekî giran ji ser sînga min bigindire, min nefeseke kûr kişand. Ê wê şevê heta sibehê bêyî ku xew li min biherime raketim.

Martîn

Bayezîd, seet sisîyê piştî nîvro. Duşem. 10ê meha çileyê paşîn. 1708

\*\*\*

Hansê hêja,

Ew sernivîsa ku di destpêka nameya berê di nîvê pelê de min li jor daniye û bêguman wê bala te bikişîne û xura pirsê li ba te gurr bike û tê nikaribî bixwînî, bi herfên erebî ye. Bismillah e ew. Bismillahirrehmanirrehîm e. Ango bi navê xwedayê mihrevan û diloan<sup>1</sup>.

Tuyê bibêjî çiyê te û vê bismillahê? Tu nizanî ku ez jî demekê misilman bûbûm! Erê ez misilman bûbûm Hans.

Berî çend mehekî bû. Ez ji mesela Kewserê xelas bûbûm û êdî bi meya bexteweriyê serxweş bûbûm. Maldariya zêde ez ji rê deranîbûm û nema hayê min ji bayê felekê hebû ji ku hiltê û bi kû de diçe. Dunya buhar bû. Kulîkên kerezan û zerdelo û hirmî û behîv û xoxên ku bistan û darên wan li dora çemê Quwêq bilind bûbûn, êdî bişkivîbûn, teqiyabûn û bîna xwezayê xweş bûbû. Spîndarên ku mîna dêwan li keviyên çem ji pê rawestiyabûn, qebayên kesk î ciwan li bejnên xwe ya zîvîn kiribûn û serê xwe ber bi ewrên spî de dikişandin. Bîna kulîkên hûr ên mîna goşiyên stêrikan ku li şaxên darên sicê ketibûn erd û ezman mest dikir. Li kolanên Helebê ji ser dîwarên her hewşekê û di her meşrebiyekê de gulên cûrî, yasemîn, qerenfil û laleyan govendeke ji bîn û rengan li darxistibûn. Bîna bihuştê difûriya lê bîna min genî bûbû! Erê bîna genî ji min difûriya. Te digot berateyek avêtine hundirê min. Bîna wan kiryarên min ên pîs bû Hans. Bîna dizî û derew û xap û rîp û heramxurî û zinakariyên min bû. Giyanê min kifikî bûbû û ez ji rehên xwe de diriziyam. Ez ji kok de kurmî bûbûm. Bîna min tehmûl nedibû loma jî ez bi lez çûme ba etaran, sabûnfiroş û hekîm û eczexaneciyan û li dermanan geryiam. Piraniya wan digotin ku divê ez xwe bi xwêya zivir bişom. Hinekan jî xwêya geliyê Netrûna li Misirê qenc didîtin. Min rojê sê caran xwe bi wê xwêya buha û kêr peyda dişûşt. Heftiyê du caran diçûme hemama Yelbuxayê. Hemamcî laşê min diherifand û dikir ku min biselîxîne. Ji serê Kelehê heta dergehê Entakiyayê û Qinesrîn û Babulmeqam diçûm û li ilacan digeriyam. Li ba bazirganên ku ji welatê Hind û Çînê û welatê eceman jî dihatin li ilacan digeriyam. Çi ilaca ku min peyda dikir, geya ba, xwê ba, kevîr yan jî macûnek ba min di xwe dida. Lê çarîkek nediçû bîna wî berateyê di hinavê min de dîsa difûriya. Hekîmekî cihû hebû, digotin ew her derdî derman dike, li gundê Tadîfê rojhilatî Helebê bû. Ez çûme ba wî jî. Wî gote min ku, geyayê Meyremiyê ku mîna pûngê ye, bikelîne, ava wê vexwe û rojê du sê caran geyayê ji ber kelandinê mayî di bedena xwe bide. Min bi ya wî jî kir lê ew jî hîç bû. Yekî jî gote min ku, xellê di xwe bide. Min ew jî ceriband û bêhavlî derket. Hînan gotin ku nişa baş e û çendekan jî ava xiyaran û şebê wek derman bi nav kirin. Hinek dostên min sabûna Marsîlyayê ji min re anîn. Kê çî bigota min bi ya wî dikir. Hemûyan berê xwe dabûn paqîjiya laş, paqîjiya çermê genî, paqîjiya vî qalikê min ê derve, lê kesekî negote min: giyanê xwe pak bike! Kesekî negote min: li hundurê xwe vegere. Kesî negote min: dilê xwe ji zenga gunehkariyan bi agirê tobeyeke rastîn sîqal bike. Ji ber wê belaya mezin min nedixwest bi kesekî re rûnim. Min didît ku çawa ez di ber yekî re dimeşim bêvila xwe digre. Loma jî di binê mala Alberto de Silva de rûniştim, ku ne ji bo tiştêkî pêwîst bûya ez dernediketim derve. Ew nexweşiya xedar ne bes bû, herdu tacirên kaxezan jî, ên ku min digot êdî divê destê xwe ji ticareta kaxezan berdî û nekevin rîka min, ji nişkêve bi barên kaxezên bexdadî û semerqendî û misrî sûka Helebê xeriqandin. Ji cem miftiyê bajêr fitûya heramkirina kaxezên firencî anîbûn û li her kolan û tax û caddeyan belav kiribûn û dabûne xwendin. Fitûyê digot:

<sup>1</sup> Di Quranê de ku kitêba pîroz a misilmanan e, her sûretek bi bismillah dest pê dike. Tenê sûretek heye bê bismillah e. Sûretên Quranê sed û çarde ne, di sed û sêzde sûretan de bismillah heye, di yekê de nîne, lê dîsa jî jimara bismillahan sed û çarde ye. Ji ber ku di sûretekî de du caran bismillah heye. Misilman çî dikin bismillahirrehmanirrehîm dibêjin. Ew kilîta her derîye li ba wan. Ji kutanê bigre heta çûna destavê, vekirina deriyê dikanekê heta bi rakirina zarokekî biçûk, nivîsandina kitêbeke nû, yan nameyekê, destpêkirina cengeke giran yan jî sunnetkirina zarokekî! Her tişt divê bi navê Xwedê dest pê bike.

*Eger kesekî misilman, li ser kaxezên ku ji welatên Firingistanê tî, bi herfên erebî binivîsîne, gunehkar e. Ku bi israr be jî gawir dibe.*

Ev fitûya kurt û kinik bes bû ku ticareta min a geş a ku bi dirêjiya salan şax û reh vedabûn tîk bibe. Êdî nema kesekî mal ji min kirî. Barên kaxezan di enbaran de kevz û kifîk digirtin. Pereyên min dihatin xwarin. Deyndarên min nema li min vedigeriyan. Dostên min nema li min dipirsîn. Lanetek li min bariya bû Hans. Ez bi lanetan ji hundir û ji derve de dorpêç bûbûm. Toqa lanetê li stûyê min geriyabû.

Ez li çareyekê geriyan ku hema bi kêmanî ticareta min vegere wek berê. Û ji nişkêve di tariya wê xaçîrêk û gerînekê de çira çareyekê çirisî. Di hişê min de wê çareyê şewq da û min nema karibû pêkanîna wê bi derengî bixim.

Di şeveke meha gulana çûyî de ku xwêdan bi erd û ezmanan ketibû ez çûme koşka waliyê Helebê a ku bi hezaran laleyên sor û zer û spî dorpêçkirî bû. Ew laleyên rengîn di ronahiya spî ya ji pencerêyên dîwanê difiriya derve de weke parçeyek ji bihiştê xuya dikirin<sup>1</sup>.

Dergevanên arawut nexwestin min derbas bikin, lê min çend aqçe berdan berîka mezinê wan ku rê ji min re veke. Li Helebê, di wan çend salan de ez fêrî wê yekê bûbûm ku dirav deriyan vedikin. Deriyên asê li ber diravan nînin, ew mîna peyva *Simsim veke* ya di efsaneyên Elf Leyle we Leyle de ye kevirên giran ên şikefta Elî Baba jî didin aliyekî.û girîzê bi devê Sadriazaman jî dixin.

Dergevanê arawut çû û bêhnê ma. Paşê hat û got: derbas be xoce Martîn, cenabê walî efendî yê qedirbilind li hêviya te ye.

Min nafeyekî temam ji miska welatê Xutena Çînê ku min ji bazirganekî tebrîzî kiribû, di laşê xwe dabû. Ez ditirsiyam ku wê kêlîka ez li seraya walî bim bîna genî ji min bifûre û ez bihetikim. Berê kosetiya min bi gelek kesan nexweş bû îca ew bîn jî bi ser de.

Walîyê ku bûbû saleke wî nû hatibû Helebê û min ew di diyariyan de hiştibû û çî gava ku ez didîtîm ji ber min radibû û ez li rex xwe didame rûnişkandin, wê şevê guh li hatina min nekir û rû jî neda min. Lê bi destê xwe îşaretî cihekî vala di civata xwe de kir ku rûne. Civat geriyabû. Bixûrdançî darikên bixûra bînxweş di menqelê de vêdixistin û yek bi yek datanîn ser bixûrdankan. Şamadanbaşî mûmên veketî li kenar û quncikan nû dikirin. Macûnaxasî ava cemidî, gulav û zûbad û mawer di qedehên cam de digelandin. Bezmeke ku bi rastî jî rojhilata osmanî di xwe de kurt kiribû bû bû. Min bi dengê nîzm silav da civatê û pîs pîs, milxwar û tirsîyayî di bin tabloyeke nêçîrê de, ku tijî xezalên tirsîyayî yên di nav lalezaran de ji ber siwarên bi tîr û kevan bazdidan bû, rûniştin. Mûmên stûr ên geşkirî, qendîla mezin a di nivê hêwana mezin de, ronahiyeke şahanî bi ser rû û dîwar û tuhafiyên hêwanê de herikandibûn.

Min bîdengiya civatê ya ku bi derbasbûna min re konê xwe bi ser kesên rûniştî de vegirt, wek keys û fersendekê dît û hemû cegermendîya xwe kom kir û ez rabûm ser xwe min bi dengê bilind, ku nêzîktirî qêrînekê bû, got:

- Eşhedû ulla ilahe illellah, we eşhedû enne Muhemmden resûlullah<sup>2</sup>.

Ev cumle bû şûrê ku serê bîdengiya civatê di wê şeva bîdeng de pê hate birrîn. Dengên ullahû ekberan ji devê her kesî bilind bû. Rehwanaxasî û dewatdarê walî rabûn mîna dînan li dora xwe zîvirîn. Civat tevde rabû ser piyan û hemiyan bi kêf li min û li hev nihêrîn. Walîyê ku bi derbasbûna min re wek ku min nas nake ji xizmetkarekî xwe re gotibû qedehek av bide vî koseyê li koseyê han, mat mabû. Ew jî bêhemdê xwe rabûbû ser piyan û bi miftî û şêxulislam û qadî û axund û giregiran re ullahû ekber digotin.

\*\*\*

<sup>1</sup> Ew laleyên çeleng ku ji Tebrîz û Şîraz û Esfehân û bajarên din ên Ecemistanê û heta sînorên Hindistanê dihatin welatê osmaniyan, ji wir bi baran diçûne Ewropayê û hawîrdora serayên padşah û mîr û kont û mezinên wir rengîn dikirin. Laleyan ku ressamên osmanî êdî ew kiribûn mijarên xwe ên bijarte ji bo tabloyên ku ji paşayên jixwehez re dikişandin, li vî welatî li her deverê pêrgî mirov tî.

<sup>2</sup> Bi vî hevokê re yek derbasî dîne îslamê dibe Hans. Ev kilîta misilmantiyê ya zêrîn e ku min wê şevê xwest pê deriyên di rûyê min de hatibûn girtin vekim. Wateya wê ev e: ez şahid im ku çu xweda ji bilî Ellah nînin, û Muhemmed pêximberê wî ye.

Wê şeva ku ez tede mîna yekî ku beng û heşîş cûtibe û ji hiş cûbe, walî emir kir ku min bibin hemama Yelbuxayê û tedarika şuştina min bikin. Şêxul-islamê Helebê bi xwe bi min re hat. Em derbasî hundirê hemamê bûn û çûn li ber cirnekî kevirî ku tijî ava germ bû û kelexa wê ew der germ û xumamokî kiribû, rûniştin. Wî bi destê xwe ava germ û sar tev li hev dikir û bi ser min dadikir. Her bi tasekê re bismillahirrehmanirrehîm digot û ayetî ji quranê dixwendin<sup>1</sup>. Piştî nîv saetê, êdî ez ji gemar û qilêra berê hatibûm şuştin û cilin spî li min kirin û şaleke sor ji mûyê deveyan girtin ser milên min û şaşıkeke keşmîrî renghingivîn li serê min gerandin. Dîsa em vegeriyan koşka walî. Nizanim çawa wisa zû xeber gerandin! Dengê minareyan bi sedaya ullah û ekberan mîna şingeşinga şûran perdeyên reş yên wê şeva Helebê diçirandin. Walî ferman li muezinan kiribû ku hilkişin serê minareyan û ullahû ekberan bibêjin û qendîlan vêxin. Her weha dewrêşên tekiyeyan jî derketibûn serê kolanan û li defan didan û sirûdên dînî dixwendin. Daweta civaka islamî bû wê şevê lê haya civaka mesîhî ji tu tiştî nebû. Ez mîna kesekî bengî û serxweşekî teles bûm û gêj bûbûm. Wek ku ez di xewneke dirêj de bim tev digeriyam. Nizanim ne kêfa min dihat ne jî ez diêşiyam. Giriye min dihat û min dixwest herim li ber îkonostasa dêra ortodoksan rûnim û bi hêsrên xwe qurbangehê bişom. Ez ketibûm halekî kambax de. Mîna yekî ku kêrekê li nîvê dilê xwe bide û di nîvê rê de jî poşman bibe. Kêr kûr derbas bûbû û êdî derxistina wê yan jî hiştina wê yeksan bû. Li koşkê, walî û qadî û şêxulislamê Helebê, kaxeza misilmanbûna min amade kirin. Navê min guhertin û min mora xwe li binê wê kaxezê danî. Civata mezin a ku geriyabû bi fermana Qadî fatiheyek ku yekemîn sûret e di Quranê de ji bo misilmantiya min xwendin. Destek cilên misilmanan dane min û ji nav wan maqûlên bajêr Miftî rabû û got:

- Muradeddîn, ev navê te yê nûye, yanî xwesteka olê. Tu dizanî xwesteka ola me çiye Muradeddîn efendî? Hedefa misilmantiyê bexteweriya mirov e. Mirov bi misilmantiyê bextewer dibe. Ji bilî Misilmanitiyê rê ji bexteweriyê re nînin. Li vê cîhanê jî, li wê cîhanê jî. Li vir jiyaneke paqij, zelal, û bextewer. Û li wir jî jiyana ebedî bi pêximberan re, bi qencên Xwedê û welîyan re û di nav xêr û bêra bihişteke bêdawî de. Horî û xulam û çemên hingiv û şîr û meyê. Eger niyeta te safî be, te ji îşev pêde bextewerî bi dest xistiye. Koşka te niha li cennetê amade dîkin. Te êdî dîn û dunya bi hev re bi dest xistine

Li dû miftî Qadî jî rabû û peyvek avêt:

- Misilmantî rastî ye. Ji bilî vî dînê me yê pak, li rastiyeke din negere. Xwedê teala bi xwe di kitêba xwe ya ezîmuşşan de dibêje ku li ba xwedê tenê islam ol e. Her weha Qurana me ya pîroz dibêje ku, eger kesek ji bilî islamê dînekî hîlbijêre ez napejirînim.

Xewa min dihat Hans. Mijara Rastî û bexteweriya ku êdî wan qal dikir û ez jî bi salan bû bi dû de bûm nema bala min dikişand. Min naskiribû ku bextewerî xewnek e. Rewrewkek e.

Min bi xwe di riya bidestxistina bexteweriyê de ruhê xwe biderda. Min pakiya hundirê xwe ji dest da. Ez ketim kunçala kiryarên qirêj û giyanê min kifikî bû. Bîna genî bi min ket û çu derman nema li min hatin. Ez ji şaberûya xwe ya ji dara xwe dûrketî kifikîtir bûm. Min dabû ser riya bexteweriyeke sexte. Ya qencîr ew e ku ez bibêjim sextekariyeke bextewer!

Ez bi wê misilmantiya xwe jî bextewer nebûm. Berovajî wê, êşa min a hundir, herifîna giyanê min û heyirîna min zêde bû. Mebesta min ticaret bû ew jî serrast nebû. Fitûyê cihê xwe girtibû. Divabû ez kaxezan jî, ku li gor derewên wan reqîbên min bi donê berazan sîqalkirî ne, biguherim ne tenê ola xwe.

\*\*\*

Xebera misilmanbûna min civaka Helebê li bin guhê hev xist, hejand û serûbinî hev kir. Misilmanan ew mîna delîlekî rasteqîniya dînê xwe dîtin. Mesîhiyan jî ew mîna finaseke şêxul-islam û hevalbendên wî dihesibandin. Misyoneran, rahiban, keşişan û her bawermendekî

mesîhî berê xwe ji min guherîn. Konsulosan û tercumanên wan, tacirên ku ji Palermoyê, Napolîyê, Venedîkê, Amsterdamê, Lionê, Marsîlyayê û heta Kirît û Qibrisê jî hemûyan xwe dûrî min kirin. Heta Metropolîtê rûnêrî jî, ê ku çî gava ez didîtîm kêfa xwe dianî û ez mîna xwediyê xêreke mezin dihesibandim ji ber ku min çavên wan li makîneya capê vekiribûn, nema dixwest min bibîne.

Êvarekê, ez li mal bûm û diramiyam ka gelo çawa bikim, berê xwe bidim ku û ev çî bû min kir? Rêya vegeerê bi birrîna serê min e, rêya berdewamkirinê jî ne baweriya dilê min e! Ev çî bû yarebî? Ev çî ezmûneke sext û dijwar bû! Ez di wan ramanan de, dengê derî hat. Gava min vekir, min dît Ebdullah û Henanya El- Musewwir li ber derî ne.

Herdu jî bi hêdfîka derbas bûn û rûniştin. Henanya sebir nekir û berê xwe da min û got:

- Te çî kir Martîn? Ji bo piçek malê cîhanê te Mesîh firot? Tu bûyî Yehûda yê Isxeryûtî te bi maçekê kurê xwedayê xwe firot? Tu ji ber ronahiya Mesîh çûyî û ketî ber siya gunehkariyê!<sup>1</sup>

Ebdullahyê Zaxir jî, ê ku gelekî hurmeta min digirt, got:

- Çawa be Yehûda poşman bûbû û sî diravên zîv li xwediyên vegeerandibû, ka tu poşman nebûyî Martîn efendî? Tu dizanî te civaka mesîhî li Helebê bi vê kiryarda xwe ya nedursut û narewa gelekî êşand! Tu dizanî Martîn eger her kesekî ku rastî tengayiyeke bazirganiyê bibe rabe dîne xwe biguhere, kesek li ser dîne xwe namîne! Te bigota me, te bigota metropolîtê me, te bigota qunsulusê ingilîzan ku dostê te ye, bêguman çare hebûn! Te hewara xwe bigihanda hevalê xwe yê li Ecemistanê Albero de Silva ewê wî alîkariya te bikira. Karê te kiriye yekî şet jî nake. Tu dizanî ku rêya vegeerê jî li ber te hate girtin? Ger tu ji misilmantiyê vegeerî wê te mîna Dawûdê Romî<sup>2</sup> li ber dergehê

---

<sup>2</sup> Berî çil û heft salan bû, dawîya meha temûzê, mirovekî mesîhî ji Helebê navê wî Dawûdê Romî bû bi şûr serê wî hatibû birrîn. Kalên mesîhî serpêhatiya wî weha vedigotin: zemanê waliyê Helebê yê kurd Mihemed Paşayê Xasigî bû. Dewletê carê baca tiştêkî derdixis. Her ku xizneyên paşa û waliyên Helebê vala dibûn, baceke nû dihat meydane. Îcar wan salan paşayê kurmançê sitemkar, ku paşê bûbû paşayê Bexdê, baca şaşikê derxistibû. Divabû her mesîhiyek baca şaşikê bide. Dawud mîna her kesekî baca xwe çareneçar dabû. Lê piştî demekê peyayên Tehsîldar dîsa hatibûn û bac jê xwestibûn. Dawud gotibû: min berê daye, ez nema didim. Rabûbûn li nivê sûkê ew danîbûne erdê û bi pehînan li her devera bedena wî dabûn û sixêfên ku mirov ji lêvandina wan şerm dike kiribûn wî û dîn û milletê wî. Ew jî hêrs bûbû û xwe ji nav lepê wan derxistibû û rabûbû ser piyan şaşika xwe ji serê xwe avêtibû û gotibû: ha ji we re şaşik! Ez mesîhî me loma hûn vê yekê tînin serê min. Dema ku wî şaşika xwe wisa bi kerb ji serê xwe avêtibû, wan tehsîldaran wisa fam kiribûn ku wî bi şaşikavêtinê dev ji dîne xwe berdaye û êdî bûye misilman. Rabûbûn lêborîna xwe bi nermî jê xwestibûn û di cih de berê xwe dabbûne qadîyê Helebê û gotibûnê: Dawûdê Romî dîne xwe berdaye û hidayetî misilmantiyê bûye! Qadî şandibû pey wî ku kaxeza misilmantiya wî mohr bike û wî wek misilman di tomarên dîwana Helebê de qeyd bike. Lê wî gotibû ku ew ji dîne xwe derneketiye, tenê wî ji kerban re şaşika xwe avêtiye erdê. Erê şaşik nişana mesîhiyeta wî ye, lê gelek caran ew şaşikê ji serê xwe datîne. Ma wisa kesek dibe misilman? Ne misilmantî him bi dev e û him dil e? Wî pirsî bû. Leşkeran ew bi zorê ji mal derxistibûn û biribûn dîwane. Berdevkê walî çend pîrs jê kiribûn û tavilê ew hinartibû nik qadî. Wan rojan waliyê kurmançê ne li Helebê bû. Qadî hukmê murtedên ji dîne îslamê derketî lê birrîbû û gotibû: ev misilman bûye, û dîsa dev ji misilmantiya xwe berdaye. Wî bibin destê wî û piyên wî bixin qeydan û bidin tobekirin. Dawud şêst û yek rojî di zindana kela Helebê de mabû. Her carê şêxek hatibû ba wî û gotibûyê: tobe bike û serê xwe xelas bike, lê wî bi ya wan nekiribû. Heta rahibê qedirbilind Brunoyê Kermilî çûbû ziyareta wî û îmana wî qewîn kiribû û îtîrafa wî qebûl kiribû û nanê Efxaristayê ê pîroz dabûyê. Dema walî ji sefera xwe vegeeribû, kêfa jina Dawud gelekî hatibû. Bi destê her çar zarokên xwe girtibû û erzihalek biribû ber deriyê koşka Mihemed Paşa, lê erzihala wê rebenê, berdabûne tasek av û bi ser jînekê de rijandibûn. Jinik bêhêvî nebûbû, careke din li cem feqîyekî henefî erzihaleke gelekî bi şewat nivîsibû û rakiribû meqamê wilayetê. Lê dîsa jî walî guh nedabûyê û gotibû dergevanan: erzihala wê bişewitînin û bikin arî û di rûyê wê bidin. Wê rebenê çî zêrê ku li ba xwe hilanîbû xistibû tûrikekî û li vir û wir belav kiribû ku xwe bigihîne kesên berz û payedar. Çûbû cem misyoneran, tercumanên konsolusên ewropayî ku piraniya wan yûnanî û ermenî û cihû bûn, û axayan û giregiran jî. Lê hemû hewldanên wê badihewa çûbûn. Konsulosan guh nedabûn çîroka wê û gotibûnê: ev meseleye hundir a dewleta osmaniyan e, karê me pê neketiye. Zêr li ba wê nemabûn, ji ber ku ruşwet dabû her kesî ku xwe bigihîne waliyê Helebê ê kurdê zalim, heta fikirîbû ku berê xwe bide Babi Alî li Asitanê jî. Dawîya dawî berê xwe dabû dizdarê kelê, bi ruşwetek mezin û behaneya ku ew dixwaze mêrê xwe qanih bike da ku li dîne îslamê vegere, derbasî zindanê bûbû. Wê di hevdişîna xwe û mêrê xwe de jê tika kiribû ku hema bi derewan bibêje ez misilman im. Kiribû û nekiribû, mêrê wê Dawud ji ser ya xwe daneketibû. Roja

kela Helebê serçok bikin û serê te bi şûrê islamê bifirînin. Ma guhertina dîn jî mîna firotina çend rizme kaxez e qey? Ma dîn kumeke tu bibêjî li serê min nayê? Ma dîn xwarineke tu neecibînî Martîn!

Henanya El- musewwir, cihê xwe xweş kir û mîna ku têr xebardan bûbe got:

- Kesê ku bi Mesîh bawer be divê netirse. Tu niha dikarî ji misilmantiyê vegeerî û bibî misala rastiya Mesîh. Mesîh jî li ser xaçê danîn û dest û lingên wî mîx kirin. Taca stiriyayî li serê wî danîn. Wî bi cesedê xwe emên gunehkar hemû xelas kirin. Tu jî dikarî, ji bo aramiya civaka mesîhî xwe li ber êşa stûberrînê bigrî. Tuyê bibî şehîd û cihê te ê li rex Mesîh û şehîdên ola me ya pîroz were nasîn.

Ebdullah xwest agirê poşmaniyê di hundirê min de geş bike, wî dizanîbû çendî ez ji kitêban û herf û kaxezan hez dikim, bi kenekî dilovan re got:

- Na Martîn na. Netirse ew te nakujin. Tu ji reîyeyên Ewropayêyî. Tu di bin ala inglîzîyan de li vir î. Kes nikare destê xwe jî bi te bike. Pir pir dê te sirgûnî welatekî dût bikin yan jî te ji erdê welatê osmaniyan derînin û te vegeerînin Ewropayê. Were niha emê Zebûrê çap bikin. Me nîvê wê qedandiye. Me ayetên wê kitêbê herf bi herf rêz kirine. Were dêrê alîkariya me bike. Were hemêza Mesîh ji her gunehkarî re ye û deriyê poşmaniyê çu caran nayê girtin. Were şivan ji berxa winda hez dike dema ku vedigere nav kerîyê xwe. Were li hemêza rastiye vegeerî û bikeve bin konê bexteweriyê. Were bibe ew kurê bazdayî ku li bavê xwe vegeerîya.

Janeke mîna jana niha ku di koka zimanê min de asê bûye, xwe li zimanê min girt. Min dizanîbû ku ji bo komeleya mesîhiyan tiştekî xirab e ew kiriyara min, lê min ya çê ji bo xwe dît ku ez misilman bibim. Ticareta min a li ber têkçûnê, ji min re ji baweriyên min pêwisttir bû. Ez ji civaka mesîhî girîngtir bûm.

Wê şevê me gelekî da ber hev. Heta ku herdu ji min bêhêvî bûn û rabûn çûn. Li ber derî, Ebdullah bi destê min girt û bi niyaz got:

- Tu bi qedrê wan kêlikên ku min têde tu fêrî zimanê erebî dikirî, bike. Tu van bêbavên osmanî ji vê ziyareta me agahdar nekî.

Min dilê wan xiste cih û bi gotina helebiyan got:

- Netirsîn. *Hon heferna, hon temerna*<sup>1</sup>.

Nameya min dirêj hat. Çi bikim Hans! Dibe ku riya vegera min dût û dirêj bibe loma jî ezê van nameyan û defterên ku tê de dinivîsim ji te re rê bikim. Ji xwe ku ez zû vegeerim dê wan bi xwe re bînim û çap bikim. Yan jî bidim te, tu jî sebra xwe bi xwendina wan bîne û ne hewceye ku tu pirsan ji min bikî. Ez ditirsim ku bêziman li te vegeerim. Niha ez dixwazim her tiştî binivîsim. Hin bûyer hene hema ezê di ser re herim, lê hin hene divê wan berfireh bikim. Mesela ev misilamnîna min. Ma ew qurtek av bû ku wisa bi lez û bez di ser re biçim?

Martîn

Bayezîd, seet sisîyê piştî nîvro. Pêncşem. 13ê meha çîleya paşîn. 1708

\*\*\*

---

Carşemê seet sisîyê nîvro, 28ê temûza 1660 î bû, Dawudê ku di zindanê de bûbû kesekî din, riya wê dirêj bûbû û rûyê wî ji solên wî zertir bûbû û parsûyên wî ji kêmxwariniyê xuya bûbûn, derxistibûn ber deriyê kelê. Destên wî ji pişt ve girêdabûn û ew li ser kabokan kiribûn. Serê wî ber jêr bûbû û di ber xwe de ayetin ji incîlê xwendibûn. Celladê ku ew ji Iskenderûnê anîbûn û bûbû serbîrrê zindana kelê, serê şûrê xwe yê ku li ber tava wê nîvroya germ dibiriqî li newqa wî dabû. Dawud ji êşan re, lê bêtî ku axînek jî jê derkeve, serê xwe bilind kiribû. Cellad bi lez şûrê ku gaz û nîvekê dirêj bû vewêşandibû stûyê wî û serê wî gindirandibû. Dibêjin ku xwîna ji rehên qirîkê pijiqîbû, xaçeke sor li ser erdê resim kiribû. Serê ku li erdê deh gazan dûtî gewde gindirîbû jî, li ser bextê wan kalan be, bi qasî bejna mirovekî bilind bûbû û ev deng jê derketibû: ey Mesîhê xelasker, ez giyanê xwe teslîmî te dikim. Kesên misilman ên ku hatibûn temaşê bikin, bi dengê ullah û ekberan dîwarên kelê hejandibûn. Mesîhiyan jî berê xwe guherîbûn û çavên xwe ên mişt hêsir ber bi ezmanê sayî û bédeng de bilind kiribûn.

<sup>1</sup> Me li vir kola û me li vir veşart. Yanî ev raz ê tucarî derneyê.

Hansê hêja,

di nameya berê de min him behsa nexweşiya xwe ya xedar û him jî behsa misilmanbûna xwe kir. Lê çîroka misilmanbûna min li wir neqediya ye. Ezê di vê nameyê de temamiya wê binîsim.

Heftiya pêşî ji misilmantiyê, dojehek bû ez di nav de dibirijîm. Çolek ji stiriyana bû ez pêxwas li ser wan dimeşiyam. Min ne dixwar ne vedixwar û ne jî dizanîbû mirov çawa dikare serê xwe deyne ser balîfê û bikeve xew. Deqa ku têde diketim xew jî min di xewnê de Mesîh di nav mijeke di rengê ronîyeke sor de didît. Her ew xewn bû. Min destê xwe dirêjî wî dikir û nedigihamê. Wî tim berê xwe ji min diguherî. Ez di nîvê şevan de ji xew çeng dibûm û min didît ku di nav xwêdana xwe de mame. Weke dînan li min hatibû. Bêgav dibûm ku biçim mizgeftê pênc wext nimêj bikim. Min dev ji vexwarina meyê jî berda û serê min dihat ku biteqe. Navê min ê nû Muradeddîn wek qeydekî hesinî bû bi min. Togê koletîyeke nû bû di stûyê min de. Tawilê bîna wî şeytanê di hinavê min de, ew bîna genî, bîna kevz û kifika ruhê min bi rengekî tûjtir li min vegeriya. Ji berê bêtir ez noqî binê gola tirsê bûm. Ez misilman bûm jî ticareta min venegeriya. Heftiya pêşî, ku bi şev min xewn bi Mesîh didît, ez ji mizgeftê dervediketim. Melayekî ez fêrî desnimêj û fatihe û çend sûretên Quranê yên kinik dikirim. Li ber min bi bizavên nimêjê radibû. Wisa bike wisa bêje, wisa rabe wisa dakeve heta ku ez fêr bûm. Ji min re nû bû ew nimêj. Bi rastî ji te re bibêjim! Xweş bû jî. Ez êdî pêre dihatim. Lê wek ku min got, bîna min a genî neçûbû û zêdetir bûbû. Meleyê kurmanç bêvila xwe ji fedîyan re nedigirt lê digote min: xwe ji cenabetê bişo. Dest û rû û nigê xwe qenc bifirkîne. Berî tu werî mizgeftê miskê di xwe bide. Ji wî bû ku bîn ji çermê min tê. Hayê wî ji genîbûna giyanê min nebû. Enbarên kaxezan ên min, di gel ku havîn bû û qîçeqica rokê bû jî, ji ber rewayê rizîyan. Nizanim kê av bi ser wan de reşandibû. Muşteriyên min ên misilman jî berê xwe dane wan werraqên ku bûbûn reqîbên min. Ji xwe mesîhiyên Helebê jî nema yek kaxez ji min kirîn. Bextewerî bû kulmek av di mista min de û ji nav tiliyên min niqutî.

Dîsa kela kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* li min rabû. Nûredînê kor hate bîra min. Ez rabûm û koşê bi koşê, tax bi tax, mizgeft bi migeft lê geriyam min ew nedît. Hevalên wî yên kor gotin ku ew ji zû de nema xuyaye û windaye<sup>1</sup>. Rabû min bi dizî xwe gihande Ebdullahê Zaxir û gotê ku ka em li wê kitêbê bigerin. Wî carekê ji min re qala kitêbaxaneyên marûniyên katolîk kiribû û gotibû ku wî min di haşiyeya kitêbeke tîbbê de xwendîye ku kitêb berê li Helebê hebû. Dema ku Teymûrleng ji Entabê berê xwe dabû Helebê û ew zêft kiribû, çend nusxe jê hebûn lê wî hemî bi xwe re birine Semerqend û Buxara û Teşqend û Nîşapûra eceman.

Ebdullah xwe ji min nexeyidandibû, lê sedana min mîna fersendeke xwe dît ku min ji xelesa misilmantiyê derîne. Wî dixwest ku ez li dînê xwe yê rast vegerim û dev ji rîya xwar berdim. Bi dîtina wî, ku dîtina civaka mesîhî tevî bû vegera min serkeftina rastiya Mesîh bi xwe ye. Wî gelekî hewl da ku ez vegerim. Min jî piştî ku dît Ebdullah dixwaze dîsa min bikişkişîne alî dêrê, min xwe dûrî wî kir û di rêyekê de fikirîm ku bi çî buhayî be xwe bigihînim wê kitêbê. Lê hemî hewldanên min vala çûn.

Ji nişkêve min xwe tenê dît. Dostên ku heta demeke kin bi misilmantiya min şabûn, nema guh dane min. Berê min li iflasê bû. Kesê miflis jî, misilman be cihû be çî be, bê dost e. Xelk dostên peran in ne dostên meran in. Lanet li min bariya bû Hans. Lanetek reş. Diravên min hindik mabûn. Min hespê xwe yê seglawîyê çê Raad û herweha cêriya xwe Ganîmaya zincî, ku walî mîna hediye ya misilmanbûna min xelatî min kiribû, firotin û bi buhayê wan hinek deynên xwe dan û idareya xwe kir. Carekê du caran ez çûm min bi dizî bi endamên civaka venedîkî û ingilîzan re qumar lîst û têkçûm. Min digot belkî ez hinek pere qezenc bikim hema pê li ser lingên xwe bisekinim û careke din li ticareta xwe vegerim. Tu bawer dikî ku ez nemêr

<sup>1</sup> Dema ku min roj û meha windabûna Nûredînê kor ji hin koran bihîst, min da berroj û meha berdana wî ya ji ber deriyê xwe. Min dît ku ew dem bi xwe ye.



jî bûbûm? Hewwa û Xedîce û Rahêla jina Yaqûbê serraf jî ji dora min çûn. Min nema pêjna wan kir. Di destê min de cariyeya min Ganîmayê mabû. Min kir û nekir ku karibim bi wê cariyeya reş re razim min nikarîbû. Ewê cariyeya ku çîroka wê jî ecêb e, nema zanîbû çî ji min bike! Ew di heremên mîr û waliyan de fêrî hunerên kutanê û kêfxweşkirina mêran bûbû. Wê dikaribû miriyan jî har bike lê hemî hunerên wê jî bi kêrî min nehatin<sup>1</sup>. Min ew bi bîst û pênc floriyên zêr firote bazirganekî rûs ku bi karwanê Hindistanê re hatibû Helebê û barek hevrişimê welatê Ceylanê anîbû<sup>2</sup>. Lê ma wê bîst û pênc floriyên zêr têra min û çî bikirana! Min hemî dane wekîlekî xwe ku ji min re biçe Şamê û çend bar qehweya yemenî bîne. Ma ne ku bela tî bi qeflan tî! Karwanê ku diçû Şamê û min hêviyên xwe li ser kiribûn rastî şevxûneke rêbirr û talankeran bûbû û wekîlê min hatibû kuştin û ew dirav jî tuyê bi xwe bizanibû ka çî bi wan hatibû! Min ji Yaqûbê Serraf hinek dirav bi selefê deyn kiribûn. Gelek fayiz hatibû ser û min nema dikaribû xwe ji bin deynê wî û fayiza wan deynan derînim.

Mal û milk û qedr û qîmet jî çû û ew misilamntiya ku zerreyekê fayde li min nekir hat û bû bela serê min. Ez gelekî poşman bûbûm lê ka ewê cegermend ku li dînê xwe vegere! Dixwestin min sinnet jî bikin Hans! Ji xwe ez ji wê yekê gelekî ditirsyam û min hesabê wê qet nekiribû. Ji heftiya pêşî de wan dixwest min sunnet bikin lê her carekê min xwe dida alî. Lê dawîya dawî, ji bo ku dînê min temam bibe û ez bibim misilmanekî rast diva bû ez serî li ber biryara şêxul islam radim.

Êdî min hêviyên xwe hemî birrîbûn û ez li hêviya mûcizyekê bûm. Mûcizyekê ku min ji wê gola genî derîne.

Û ew mûcize di kirasê kevokeke şîn de hat û xwe li deriyê min qeliband.

Kevokeke namebir, kevokeke şîn ji wan kevokên ku ezmanên welatên germ yên şerqê bi firefira baskên xwe hênîk dikin û hêviyên ku bi pencên wan ve hatine girêdan belav dikin. Kevokek ji dwazde kevokên ku Alberto cara dawî di rêwîtiya Esfehanê de bi xwe re biribûn û dema ku xatir li ber deriyê Xan Elbenadiqe ji min xwest, gote min:

- Ezê mehê kevokekê bifirînim û ji te re nameyekê bi lingê wê ve girê bidim. Çavê te li hatina wan be. Ku tişteki pir girîng nebe jî, ez kevokan nafirînim û nameyan naşînim.

Min kevokên Alberto de Silva û nameyên wî di xirecira jiyana xwe ya tevlihev de ji bîr kiribûn. Destpêka payîza buhurî bû. Seet çarê piştî nîvro bû. Ez li nivê hewşa xaniyê Alberto rûniştî bûm û min xemgîn li bergên gulên muhemedî û yasemînên ku bi ser ava hewzê di nivê hewşê de ketibûn dinerî. Bûbû kêlîkek ku ji nimêja esrê mîna dizekî vegeyabûm. Geh jî min li laleyên sor û zer ên ku hawîrdora hewşê dixemilandin temaşe dikir. Laleyên ji wanên ku bazirganên holendiyan pîvazokên wan bi tûran li gemiyan bar dikirin û dişandin Amsterdamê, û ji wê jî li tevaya Ewropayê digerandin. Min pelên kulîlkên yasemînê ên spî li ser rûyê ava aram ya di hewdik de dicivandin û bêdeng diponijîm dema firefira baskên kevokekê hat û gola ponijandina min çelqand. Min serê xwe bilind kir ku waye kevokek li ser bircê kevokan yê li ser deriyê xaniyê li qatê jor venişt. Nikilên wê ji westabûnan ji hev bûbûn. Xuyabû ku ew ji devereke dûr dihat. Ez bi şûn de çûm û min xwe di hêwanê de veşart. Kevok daket, li ser kenarê hewdik venişt û serê xwe xwarî avê kir û vexwar. Paşê dîsa firiya û çû kete qulikekê ji qulikên di bircê kevokan de. Min dikaribû ji veşergeha xwe bi hêsanî nameya bi nigê wê ve girêdayî bidîta.

Ez bi heyecana dizekî ku davêje ser mala yekî maldar, hilkişiyam jor û min destê xwe xiste qulikê û ew kevok girt. Nameyeke biçûk ku hevrişimekî sor lê gerandîbû mîna lûleyekê bi

<sup>1</sup> Ganîma ji rojavayê welatê ku Ereba navê wî dikin Bilad Elsûdan, hatibû. Ewropiyên ku çûbûn li wan deveran nêçîra koleyan dikirin ew ji ber çemekî ku navê wî li gor ku wê ji min re digot, Tano bû, dîl girtibûn û xwestibûn wê bişînin Emerîkayê. Lê qorsanên misilman ên barbarên welatê Fas dest danîbûn ser gemiyê, hemî koleyên wê daxistibûn gemiyeke din û rêya xwe zivîrandibûn û di ber Tancayê re berê xwe dabûn Smîrnayê û li wir qeflek kole, Ganîma di nav wan de, bi buhayekî mezin firotibûn bazirganekî misilman î tirk. Di wê jiyana xwe ya li Helebê de, tenê min ew kole kiribû. Hinan ji xwe re salê çend yek dikirîn û difirotin.

<sup>2</sup> Bazirganên rûs û ermenan ew hevrişimê spî yê bi ser zere ve ji Ceyalana farisan dianîn û li Helebê bi cuxê qerzî re diguherîn. Venedîkiyan ew cuxê buha û firotina wî di dest xwe tenê de hiştibûn.

nigê wê ve bû. Dilê min ji yê wê kevoka di nav lepê min de bêtir kire kutekut. Min bi lez ew kaxeza pêçayî vekir. Nameya Alberto bû, tenê ev hevok têde nivîsandî bûn:

*Martîn ez li Bayezîdê me, were û her tiştî li dû xwe bihêle. Bi yekemîn Karwanê ku dê berê xwe bide welatê Diyarbekirê re karê xwe bike û xwe bigihîne min. Yavuzê Eleşgiri jî li vir e. Me şopa kitêba te dît.*

*Alberto de Silva.*

Ev hevoka ku bi pencê kevoka Alberto ve bû bes bû ku min bide ser rêya Diyarbekirê. Êvara ku min têde xebera Yaqûbê serraf bihîst, min karê xwe û derketina ji Helebê kir û bi rohilat min da rê<sup>1</sup>.

Martîn

Bayezîd, seet sisiyê piştî nîvro. Yekşem. 16ê meha çileyê paşîn. 1708

---

<sup>1</sup> Yaqûbê cihû, ku bav û kalên wî ji Endelusê reviyabûn û hatibûn li Helebê bi cih bûbûn, rehm li kesî nedikir. Wî dikaribû jina xwe Rahêl jî bi fayizê bida. Ez heta niha jî deyndarê wî me. Berî ku ez ji Helebê derkevim bi rojekê, hate nasîn ku Yaqûbê serraf li bajarokê Tadiîfê di mala xwe de kuştî hatibû dîtin. Îroj ez ji Bazîdê derdikevim. Ezê xatir ji vê malbata kurmanc a mêvanperwer bixwazim û bidim ser riya Wanê.

## Seet çar

*Bi ringîniya dawî a jama dêrê re, ku seet çar radigihand, hewa hinekî sartir bû. Melodiya ringîniyan hatibû guhertin û sist bûbû. Xuyabû ku tenê zengilê nêvî ê ku qaşilekî ji zingara kesk ew rapêça bû diheje. Bêhna pirsan ji wan ringîniyên sist diha<sup>1</sup>t. Êdî li derve, ji bilî wê mija ku dunya tarî dikir, reşayî jî diket erdê. Xwendevanê ilahiyatê ê ku benikê bersikura xwe hinekî sist kiribû, xwest ku Martîn, piştî wan rûpelên ku têde behsa misilmantiya xwe kiribû, nas bike. Rûpela ku bi perawêza li ser kuştina Yaqubê serraf diqediya, serê wê yê jor ji aliyê çepê de şikand û nîşan kir. Defter li ser iskemleyê danî û dakete jêr. Wî dixwest vî Martînê hertûqî yê ku ji bo malê dunyayê dev ji baweriya xwe ya rast berdaye nas bike û pêre bikeve kişmekişê. Û eger ew hîn di we herqa genî de ku navê wê misilmantiye mabe, wî vegehe rêya durust û kaniya zela! Rêya Mesîhê xelasker. Ku ev jî nebe, wî radestî dêrê bike ka bê li wir kîjan cezayî heq dike! Wî bala xwe dayê ku li jêr hîn jî dîmen nehatiye guhertin. Tenê Fernandoyê ispanî û Gustavê rîsor ne li ser maseya xwe bûn. Li şûna wan xortikekî derdora panzdesalî rûniştibû û du kêr di destên wî de bûn ku yek bi ya din tûj dikir. Xwendevanê ilahiyatê bi dengê bilind bang kir:*

*- Navê kê li vir Martîn e?*

*Kesî dengê xwe nekir. Ew xortik derket ber derîyê rêwîxaneyê û ji xwe re li aliyê dêrê nihêrî û hey kêra xwe tûj dikir. Pîrê goreya di destê xwe de danî<sup>2</sup>, serê xwe hinekî bilind kir û bi awirîn*

---

<sup>1</sup> Karlê jamkut, ewê ku navê wî berî bibe luterî Borislav bû, seetekê piştî engirîn û derketina Karl a ji dêrê li der û doran lê geriyabû lê ew nedîtibû. Pêşiyê daketibû zêzemînê û qulik bi qulik geriyabû. Li enbara mûman, li nav cêrên meyê, li cihên ku firaxên dêrê yên kevnare têde hiltanîn geriyê lê ew nedît. Her carê jî bi dengê bi poşmaniyê pêçayî bang dikir: Georg! Georg ka were ez te haşt bikim. Ka were tu çiqasî bixwazî ezê bidim te. Lê kesekî lê venedigerand. Karl derek di dêrê de nehişt û lê negeriya. Lê ew nedît. Di dilê xwe de got, ewê niha vegere, ma wê bi kû de bireve ev kitik! Heta seet bû çar jî ew kitik venegeriyabû. Pirsên ku di serê Karl de dikirin ringînî, di awazên zengilê dêrê de jî deng vedan.

<sup>2</sup> Dema ku xebera mirina birayê wê Hans hat, Hedwig dev ji dêrê berdabû û êdî li rêwîxaneyê Amsterdame nêzîkî keviyê deryayê bakur dihêwirî. Ji dêrê, wê tenê wek yadigar, ew goreyên nîvcomayî bi xwe re anîbûn. Mejiyê wê li hev ketibû. Her ew gore dirist û dawî bi behaneya ku xerzê wê sist çûne dîsa vedirist û ji nû ve dest

bêwate li wî nihêrî û taviîlê pîj û goreyên xwe rakirin û ristina xwe berdewam kir. Xwendevanê ilahiyatê texmîn kir ku yek ji wan herdu kesên berî seetekê li ser wê maseya vala rûniştî bûn Martîn e, îcar berê xwe da xortê kemanjen, îşaretî maseya vala kir û gotê:

- Ji kerema xwe tu dikarî ji min re bibêjî, ew herdu xortên li vir bûn, bi ku de çûn??
- Çûn.

Kemanjenê ku bi awazeke nû biliyabû, bêyî ku çena xwe ji ser çendanka kemanê rake hema peyva (çûn) tenê got û kevirê kolofanê hêdî di têlan da û dîsa kevan li ser jîhên şidiyayî bir û anî.

Ji ba wî kemanjenî berê xwe da ressamê ku awirek li naqosa dêrê û yek li cawê li ber xwe dixist û ew pirsar ku ji kemanjen kirî ji wî jî kir. Lê ressamê ciwan serê awirên xwe ji dêrê û cawê li ber xwe nebirrîn û diranên xwe bi ser hev de şidandin û di ber xwe de got:

- Lanet lê bibare. Lanet. Ev jehra kesk.

Xwendevanê ilahiyatê ji ba wî jî dageriya û çû qeheweyek ji xwe re rûkire fincaneke ferfûrê spî ku bi neqşên çînî xemilandî bû û dîsa berê xwe da jor. Dema di ber wê odeya ku dengîn jê dihatin re derbas bû, di dilê xwe de got ka hela ez bi navê Martîn li vir jî bang bikim, dibe ku kesê li vir ew be. Û bi du sê dangan navê Martîn hilda.

Ji odeyê bêdengiyê bersiva wî da. Xwest di qulika derî re binêre, lê mifteya ku ji hundir de derî kilit kiribû rê nedida dîtina çu kes û çu tiştî. Hinekî guhê xwe da ser qelşikeke ziravik di derî de lê pêjna çu henasan jî nekir.

Dîsa çû odeya xwe. Rahişt defterê û ji ser iskemleyê daxist û fincana qehweyê li şûnê danî û piştî ku dîsa bûyera kuştina Yaqûbê serraf di perawêzê de xwend, xwendina xwe berdewam kir:

\*\*\*

---

pê fikir. Karê wê mabû ew. Pir kêma diaxivî. Wê gelek xalxalok xistibûn qutûkin mezin û ew xwedî dikirin. Ku hewa hinekî germ dibû derdiket nav zeviyan û nêçîra xalxalokan fikir. Ew mabû mîratgîra tekane a birayê xwe. Dema berê xwe dabû Herne jî, çend xalxalok û ew gore bi xwe re anîbûn û sebra xwe li ber tifika rêwîxaneyê bi ristin û veristina wan dianî.

Ji Martîne zimanpûç ji bo Hansê hêja,  
silav

Ez niha li bajarekî li ser deryaçeyeke şîn û kûr im. Di rêya hatina vî welatî de, berî nêzîka du mehan, ez li vî bajarî nesekinîm. Karwanê me wê demê dageriya Adilcewazê ku ew jî bajarekî serê xwe daye kaboka çiyakî û lingên xwe berdane vê deryaçeya şîn û kûr. Lê vê carê, em li Adilcewazê nesekinîn û yekser me berê xwe da vî bajarê ku li ser keviyên avê paldaye û bîna sêvan ji erd û ezman û hewayê wî tê.

Dema ku ez berî deh rojan ji Bayezîdê derketim, korekî ji Bedlîsê jî tev li karwanê me bû, Selaheddînê kitêbfiroş hin dirav xistin destê karwansalarê me û temîna korê bedlîsî li wî kir<sup>1</sup>. Di dirêjîya rê de wî korî stranên bi kurdî bi dengê xemgîn digotin. Lê kêfa xwe jî di nav re xuya dikir. Digot ku ez li Bedlîsê vegerim wek ku çavên min li min vedigerin. Xuyabû ku ji zû de ji welatê xwe derketiye û pir bêriya bajarê xwe kiriye. Îroj me pêjna wî hinekî winda kir, lê tavilê me dît vaye selikek sêv aniyê û xwe gihandiye me.

Niha ez jî di rêya vegeerê de me, kêfa min jî tê. Her ku ez dûrî wê xana seyr dikevim, bîna min bêtir tê ber min. Kê bawer dikir ez derkevim! Ez piştî xwe didim wî kabûsî û wê xewna reş û dirêj. Lê zimanê min girantir dibe. Ez hinekî bi wî korî re bi erebî axivîm, got ez ji te fêhm nakim. Min got de qey kal e guhên wî giran bûne yan jî ew bi erebî nizane. Lê dema ku çend kesên din jî ku hinek ji wan ereb bûn, ji min re wisa gotin min pê derxist ku êdî peyv û hevokên min nema zelal in. Ez jî wisa pê dihesim ku zimanê min bi zincîrên nedîtî ve hatiye girêdan. Nizanim ji tîrsa wê xanê û bûyerên wê ye yan jî êşeke û li min peyda bûye!

Ev pelên nû jî ku ez niha li ser wan dinivîsînim semerqendî ne. Wisa Selaheddînê kitêbfiroş got dema ku rizmeyer firote min. Lê ez bala xwe didimê ku hema çawa ez pozikê teraşkirî ê perîka nivîsandîne li ser wan datînim, hibra di perîkê de hemî dadiwerive ser rûpelê! Eger wisa be ezê wan biguherim. Yan na hibra min ê têra min neke. Ezê ji devera ku gîhabûmê dest pê bikim. Ezê behsa reva xwe ya ji helebê bikim.

\*\*\*

Ez roja îne sibeha nehê êlûnê, roja ku dê berber tede ez sinnet bikirama, ji bajarê Helebê bi karwanê Diyarbekirê re derketim<sup>2</sup>. Roj hîn nehilatibû lê asoyê rojhilat di agirê hilatîna wê de dîlan dikir. Dema ku em hinekî dûr ketin, roj mîna mîrekî hilat. Ez li ser piştî deveyekî bûm û min mêzerekî ji kitanê misrî avêtibû ser serê xwe û hinekî berdabû nav çavên xwe jî ku roj nede wan. Ez li pişt xwe zivîrîm, kela Helebê ya ku xwe di ronahiyê de dişûşt kela dilê min rakir. Salên min ên li wî bajarî jî dawerivîn bîra tarî a bîranînên ku min ew di rûpelên berê de bi ronahiya hibrê anîbûn jiyane. Min piştî xwe da qederekê ku naskirî bû û berê xwe da yeke din a nenas. Min piştî xwe da evîne, nîfrîne, gunehkariyên di kirasê bexteweriyê de, milk û malê pîr û windabûna giyan û laş, min piştî xwe da Martîne kose ê firincî û Muradeddînê misilman jî.

Navê min di karwan de êdî Murad bû, di dirêjahiya seferê de navê min bûbû Kose Murad! Her tiştê min dihate guhertin; dîn û nav û rewş. Tenê kosetîya min û herdu çavên min î şîn ku nîşana bêyomiyê ne nedihatî guhertin. Di wê seferê de yek kesî jî nizanibû ez kî me û berê çî

<sup>1</sup> Selaheddîn yek ji kitêbfiroşên Bazîdê bû ku kitêb durust dikirin û bi qab dikirin. Pel diqusandin, rast dikirin û bi ava zêr jî navê kitêban li ser qabên çermîni bi xeta xwe ya xweşik datanîn. Wî camêrî, piştî ku li ziman û elîfbêya latînî ku nivîsên min pê hatibûn nivîsîn ecêb mabû, soz dabû min ku qabkirinê zû biqedîne û bi rastî jî sozdarê wê soza xwe bû. Pelên min ên pêşî û ev deftera ez niha li ser dinivîsînim û yeke din î biçûk wî ji min re durust kirine. Min kir û nekir jî heqdestê xwe nexwest.

<sup>2</sup> Ew karwanê sabûnê bû. Ji Helebê, salê carekê karwanekî sabûnê despêka payîzê berê xwe dide Diyarbekirê. yek caran ew karwan mezin dibe ku ne serî ne binî heye. Qal dîkin ku berî çend salekî karwanekî ji sed û bîst deveyên bi sabûnê barkirî bi rê ketibû. Li hêla Bîreyê ku li ser ava Firatê ye raserî rêbirrên kurd hatibû, lê wan rêbirran dema ku dîtibûn barê sabûnê ye, dev jê berdabûn û tenê hin cil û pere ji xelkê stendibûn.

bûm yan ji kû tîm û diçime kû. Min xwe mîna kesekî ku berê xwe daye ticareta xaliyên Ecemistanê dida xuyakirin û gelekî nêzîkî kesan nedibûm û pir caran min mêzerê xwe dida ber rûyê xwe yê kose ku kesek min nas neke. Dema ku em li xanekê peya dibûn, ez dûr diçûm û hema bi ser xwe de diponijîm.

Bi wî awayî nêzîka du meh û nîvên seferê çûn. Em gihan bajarê ku Alberto navê wî di nameya xwe ya bi kevokê re şandibû; Bayezîda ku di dawîya memleketa osmaniyan de weke nuqtaya li dawîya nivîsekê be, bû.

Li xaneke nêzîkî bajêr, di dawîya payîza çûyî û serê vê zivistanê de, Alberto hate pêgrîna min û bi kêf ez hembêz kirim. Ne min û ne wî, me ji çavên xwe bawer nedikir.

Êvareke sar bû. Em li ber agirê darên berrûyan di odeya Alberto de rûniştibûn me dît vaye Yavuzê çortanxur bi wî rûyê xwe ê ku şopa birînan ew mîna deşteke kelûkortî û dagirtî ji xaçerêyan kiribû, derbas bû. Bi derbasbûna wî re mûma li ser refikeke di dîwêr de vemirî. Pirsê pêşî ya ku min ji Yavuz kir: çi halê Kewserê ye? bû.

Yavuz kirtikek çortan avête devê xwe, destên xwe dane ber agirê vêtekî û di hev dan û bêyî ku li min binêre got:

- Paşê ezê behsa wê bikim, niha karê min heye. Ez dê îşev biçim bajêr. Tu jî xwe vehesîne. Hûn sibehê dikarin werin, Alberto cih nas dike.

piştê berê xwe da Alberto û gotê:

- ew dara çinarê ya li nêzîkî mizgefta Muradiyye ye civangeha me ye. Emê li wir hev bibînin û ji wir emê dakevin bajêr.

Û bi lez derket. Dîsa ew mûma ku Alberto careke din geş kiribû û dîsa vemirî bû, vemirî. Sê caran wê şevê mûm vemirî. Alberto kenîya û got:

- tu dizanî ku ev vemirandina mûmê li vî welatî nîşana bêyomîyê ye?
- Ez jî nîşana bêyomîyê me.

Alberto kenîya. Bi dilovanî destê xwe li kaboka min de û got:

- Dibêjin ku eger stêrikek birije, yan jî mûm bitefe, kesekî naskirî dimire.
- Hema ne ez bim yan tu bî, kî dibe ne xema min e.

Dîsa Alberto kenîya. Ez jî vê carê pê re kenîyam. Ew cara yekê bû ku piştî çend mehên dirêj ken rîya lîvên min nas dike. Lê dîsa jî e wkenê min, kenê yekî xemgîr û derdmend bû. Ne ji dîl bû. Û ji alberto ve xuyabû ku derdekî min î giran heye.

Min li ber wî agirê ku hûrik hûrik vedimirî û dibû arî serpêhatiyên xwe yên vê dawiyê ji Alberto re gotin. Ewî mîna zarokekî ku li çîrokên pîrka xwe guhdarî bike, xwe kerr kiribû û li devê min dinêrî. Dema ku min qedand ez pê hisiyam ku min barekî giran ji ser piştê xwe danî. Êdî nema deng ji min derket. Alberto ecêb mabû lê neaxivî. Min dixwest hema tiştêkî bibêje, ber dilê min bide, kiryarên min û bi taybetî misilmanbûna min rewa û durust bibîne û ji min re li behaneyan bigere. Lê wî tenê got:

- Tu xelas bûyî.

Ez wê şevê tîr razam. Bêyî ku tu xewnan bibînim. Sibehê em rabûn, me taştêya xwe xwar û em derketin. Alberto cilin ji min re amade kiribûn. Cilin ku minasibî welatê kurmancan bûn; kurkekî sivoreyan û şerwelekî qehweyî, piştaneke rîs û cotek solên çermê gamêşan. Ji xwe re jî qutikekî qedîfeyê reş, kumekî lûleyî ji hiriya berxên celaliyan ku êleke mezin e li wê herêma û kurkekî renghingivînî ji mûyê bizinan. Bi wan cilan em herdu ji xanê derketin û meşîyan. Bi rê de Alberto gote min:

- em ê îro herin serdana kitêbfiroşekî kurmanç li nava bajêr. Yavuz dibêje ku, kitêba *El Ifade fî Iksîr El Se`ade* li ba wî peyda dibe!

Dîsa kêfa rojên berê hate min. Kêfa wan demên ku min tîde xeberek li ser vê kitêbê dibihîst li min vegeriya. Bi dehê caran wisa li min dihat û di dawiyê de kitêb peyda nedibû. Bi rastî ez him jê bêhêvî bûbûm him jî nema ji bo min girîng bû. Eger ne ew rewşa min a kambax li Helebê bûya ez heta van deveran jî nedihatim. Erê min êdî kêf dikir û di dilê xwe de digot ku, dawîya dawî ez digihim wê kitêba ku yek ji sebebên derketina min a ji welatê min bû û bi xêra gera li wê ez pêrgî qedereke din bûm. Min bi saya gera li wê kitêba bexteweriyê bextewerî bi

xwe dît. Lê dawiyê jî min jiyana bextewer li Helebê derda. Niha vaye ez êdî digihêmin kitêba ku dê iksîra bextewriyê bi min bide nasîn.

Wê katê ez di te de fikirîm Hans! Min kêfa te texmîn kir. Min ji xwe re got ku ez bi wê kitêbê re vegerim û te bibînim tuyê bibêjî min: te dît Martîn! Av di cihê xwe de genî dibe. Tu neçûbayî wan welatan, ma te yê ji ku bextewerî bi dest bixista?

Bi rê de baraneke hûrik dibariya. Ewrin ji qedîfeyê qutikê Alberto reştir ezman nuxumandibûn. Min hîn ewrên wisa reş di jiyana xwe de nedîtibûn. Tirsek dawerivî dilê min mîna ku dilopek hibr dawerive tasek av. Alberto jî li wan ewran ecêb mabû. Me hinekî lezand û em gihane bin wê dara çinarê a ku sê ribê pelên wê ên zer weriyabûn. Ji dûr xewxayek xuya bû. Min gote Alberto ka em berê xwe bidin wir. Lê wî got ku na, emê wisa Yavuz winda bikin. Dibe ku ew qerebalix a şerekî kurdan be. Ew her roj bi hev dikevin<sup>1</sup>. Ku em bidin nava wî şerî, serê me jî dikare bifirre! Serê mêrekî li ba wan wek serê pîovazekê ye. Em li cihê xwe bin qencir e.

Min bala xwe dayê ku çipikên baranê reş in. Her çilkek li ser kefa destê min diket te digot nuqtetek ji hibrê ye. Dema ku min kefa destê xwe bîn kir, ez behetîm. Bîna hibrê difûriya û min bi tirs got:

- Alberto! Tu jî bala xwe nadê!
- Bala xwe nadim çi Martîn?
- Baranê!
- Çi bûye?
- Bîna hibrê jê tê.

Alberto keniya. Wî jî li jor nihêrî û çipikên ku bi ser kefa destên wî de diketin bîn kirin. Bêyî ku awirên xwe ji ezmanê tarî bibire got:

- Tu serxweş î Martîn? ma hibr dikare bibare!

Ji nav qerebalixê reşek bi alî me de bi lez hat û her carê berê xwe bi jor ve dikir. Alberto got ku ew Yavuz e. Bi rastî jî ew bû. Dema gihîşte me, tirseke bêsînor rûyê wî nuxumandibû. Cilên wî gemarî bûbûn û axeke şil bi porê wî ve bû. Yekser gote me:

- Ka em vegerin xanê.
- Çi bûye Yavuz?

Alberto bi tirs pîrsa xwe weke wê baranê barand. Yavuz bêyî ku raweste, berê xwe da xanê û got.

- Niha nikarim tiştêkî bibêjim. Bilezînin em vegerin. Em îro nikarin herin civana xwe li ba wî kitêbfiroşî. Ka em bilezînin berî ku ev barana nebxêr bêtir lê bike.

Me jî di bin wan çipikên reş de bédeng da pey wî.

Martîn

Bajarokê Xelatê, seet çarê piştî nîvro. Roja îne. 27ê Çileyê paşîn. 1708

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Kurd gelekî bêtehmûl in. Eger du sê kes ji wan ji xwe re xeber bidin, te dît demek dirêj nebuhurî germ bûn û beziyane hev. Dibe ku seba gwîzekê be, yan jî seba teyrekî yan hema du kes ne wek hev bifikirin bi hev dikevin. Dibêjin li gundekî welatê Hekariyan sê mêr ji bo hejîrekê hatin kuştin. Yekî hejîrek anîbû ku teyrikekî ew nikil kiribû. Vî got ev nikilandina çûkan e, wî got na ew ya şalûlan e. Ji vî yek û ji wî yek, rabûne hev bi xenceran û termê sê mêran li erdê rêz bû.

Ew xana lanetlêbarî ne mîna xanên Helebê mezin bû. Xaniyên xewê li jor û li binî jî axurên mehînan, dewar û hesp û deveyan û cihên mezin ji bo parastina pirtal û mal û barên bazirganan hebûn. Xaneke biçûk û du qatî bû. Li bilindiyekê mîna keleşeke biçûk xuya dikir. Hewşa wê gelekî biçûk bû. Ew qonaxa fersengekê yan jî derdora seetekê bi meşê dûrî bajarokê Bayezîdê bû. Li wir jî, di guldankên qafikî de laleyên rengareng pencereyên odeyan dixemilandin. Ez fikirîm ku ev lale qey guleke pîroz e li van welatan. Ji Ekkayê, heta vî welatê kurmancan lale li her mal û qesr û xan û sûk û heta mizgeft û dêran jî hebûn.

Çend rojên pêşî ez û Alberto di odeyekê de bûn, her êvar mandola xwe radikir û lêdida û straneke xemgîn digot. Paşê xwediyê xanê ê rîspî û zêrperes Seferşahê Anadolî, ji halê me agahdar bû û got ku, divê hûn her yek di odeyekê de bin û her yek kirêya xwe cihê bide. Em rojekê dûrî hev man, lê dawî me gote Seferşahê temadar ku emê kirêya du kesan bidinê lê di odeyekê de bin. Û wisa jî bû.

Seferşah kalekî ku temenê wî heftê sal تمام bû. Wî digot ku ew di sala aştiyê de hatiye rûyê dinê. Havîna ku têde şah Sefî ê sefewî û sultan Murad ê osamnî peymana Qesra Şîrîn mohr kirin û agirê şerê dehan sal vemirandin, ew ji bavê xwe ê ku bi eslê xwe ji Anadolê û diya xwe ya ermen a ji Rewanê re bûye. Loma jî bavê wî ê tirk navê wî kiribû Seferşah. Wê salê sultan Muradê çaremîn hatibû wan welatan û di wê sefera xwe de heta Bexdayê fetih kiribû.

Te digot rûyê wî Seferşahî hema devek e hingî devê wî mezin bû. Riya wî ya spî mîna geyayekî şeytanî di wî rûyê ziravik de bê fesal şîn hatibû. Dengê wî qebe û bejna wî dirêj û navmil pehn bû. Mîna hespekî fal bû, lê kal bû.

Bavê wî ê ku di artêşa osmanî de de onbaşiyek bû, berî ku sultan Murad berê xwe bide wê seferê, li wir ew xan ava kiribû. Piştî wê peymana aştiyê, aramî li herêmê peyda bûbû û êdî karwan diçûn û dihatin û pêdiviya xelkê bi xanan hebû. Bazirgan ji Rewanê, Tbilîsîyê, Esfehanê, Tebrîzê û heta bajarên Ozbekan jî dihatin li wê xanê dihewirîn û ji wir berê xwe didane Şam û Diyarbekir û Urfa û Wanê û Helebê û Antakiya û Smîrnayê û heta welatên rojavayê jî. Ji rojava jî hin dihatin û berê xwe didane şerqa dûr heta bi Buxara û Semerqendê û Çîn û Hindistanê diçûn.

Xana Seferşah a seyr jî bûbû civangeha millet û peyrewên her olê li wê herêma sar û bi sirr.

Li wê xanê hemî ode tijî bûn. Ji ermenan, tirkan, ereban, îtaliyan, firensîyan, ingilîzan, azerîyan, eceman, gurcan, rûsan, hindî û çiniyan û neteweyên ku ez wan nas nakim jî nêzîka sed kesî li wê xanê li bin guhên hev diketin. Dunyayeke biçûk bû xana Seferşah. Lê berfa ku bi dînbûn bariyabû ew kiribû zindanek û em hemî di odeyên me de girêdabûn.

Heftiya pêşî, hîn ew berfa qidoş nebariyabû, min gelek kes nas kirin. Alberto jî di şevbuhêrkên me de hin kes bi min didane nasîn û me demên xwe bi suhbetên pîralî bi gelek zimanan dibuhurandin.

Hansê hêja,

Tiliyên min ditevizin û ez nikarim zêde wan li xameyê bipêçim. Tu dibêjî qey tevizîna zimanê min gihaye tiliyan jî. Yan jî dibe tevizîna tiliyan e xwe li zimanê min alandiye!

Çîrok û serpêhatiyên wê xanê, ez ê di nameyên bê de binivîsim. Şev dereng bûye û xewa min tê. Em vê nîvroyê gihane Bedlîsê û sibehê ez û Emerê kal, korê bedlîsî û hevalê min î rê, emê herin li nava bajêr bigerin. Bedlîs ji wî bajarê ku min xeyal dikir ciwantir e. Di hatinê de karwanê me lê nesekinîbû. Emer jî hingî bêriya wê kiribû pir pesnê wê dida. Wî qala wê dikir mîna ku qala jineke ciwan bike. Gava din gote min:

- eger tu Bedlîsê nebînî, hema xwe jî mîna min kor hesêb bike.

Martînê zimansist.

Bedlîs, seet çarê piştî nîvro. Sêşem. 31ê Çileyê paşîn. 1708



**Danê êvarê**

## Se`et pênc

*Bi ringînya pêncan a naqosê re ku tûj bû, qêrîneke tûj ji gewriyeke xeniqî ji jêr hate guhê xwendevanê ilahiyatê:*

- *Fernando mir. Fernando tev li tûtina xwe di avê werbû.*

*Xwendevanê ilahiyatê yê westiyayî, perîka qazê ya ku li ser iskemleya ber serê wî ramidiyayî bû bi lez rakir û xiste nava defterê cihê ku di xwendinê de gihabûyê. Defter ji destê xwe danî û ber bi jêr de çû. Berî bigihê bi pênc pêpelûkan, rawestiya û li axaftina Gustav guhdarî kir ku bi heyecan digot:*

*Hûn Fernandoyê ispanî nas dikin? Hevalê min î çend seetan bû. Hatibû tûtînê bifroşe. Min soz dabûyê ku wî bibim koşka di nav avê de. Koşka Strünkede. Em çûn û li keviyê avê hinekî rûniştin. Werdekek di avê de li pêşiya çêlikên xwe dimeşiya. Fernando bi henekî got ka ez hinek tûtîn biavêjim vê werdekê. Madem ku xwediyê koşkê ewqasî qelûnkêş e, dê werdekên wî jî mîna wî bin. Û rabû ji pê sekinî û mistek tûtûn derxist û hat ku bavêje ber werdekê. Keviyê şil şemîtonkî bûbû û Fernando çerixî. Dîtina min dît ew mîna marekî di nava mîja tîr de dişemite avê. Hinekî bû çelpeçelpe wî lê tavilê bêdeng dawerivî binî. Noqî binê avê bû û werdek bi dûr ket. Ew jî nema xuya bû. Ez dikarim sond bixum ku ruhê şeytanekî di wê werdekê de bû. Ez tirsîyam ku pasvanê koşkê min bibînin. Hema di nigê nig de ez reviyam û hatim. Xwedê kir ku mijê nedihîşt kes tiştêkî bibîne. Min xwe li bîna qehweyê girt û hatim vir. Ne ew bîn bûya, ji tîrbûna mijê minê rê jî nas nekira.*

*Mîja li derve, keçela serê Gustav şil kiribû. Awirên çavên xwe ên hûrik û kortikî bi çar aliyan de şandin. Kesî bal nedayê. Ressamê şalsor friçeya dawî li kevalê di nav destê xwe de xist û dest avête qehweya li ber xwe û qurtek vewar û got:*

- *Rengê zengarê renekî jehrîn e.*

*Tu kesî guh neda birebira wî jî.*

*Kemanjenê xort e ku gihiştibû dawîya ahnega xwe, mailka kemanê vekir, bi dilovanî ew têde bi cih kir, serpoş kir û li rex xwe li ser kursiyeye vala ramedand. Ew xortikê ku berî seetekê du kêr di hev didan hatibû ber agirdankê bi pisîka pîrê re dilîst. Ji kincên wî xuyabû ku ew ministrant e<sup>1</sup>. Sermilekî sor î kenar bi qesebê zêrîn, mêzerekî ji kitanê spî û navbendeke hevrişimê zer li ser kirasekî sorî heta gwîzekên nigan dirêj. Kêrên ku berî seetekê di destên wî de bûn û tûj dikirin niha xistibûn ber piştana xwe ya ji hevrişimê zer. Ji xwe pîrê di xew re çûbû û pixepix pê ketibû û goreyên wê nîvco jî hîn li ber wê bûn.*

<sup>1</sup> Kesî bala xwe nedabû Georgê ministrant gava derbas bûbû. Ew gelekî engirî bû û peşkên agir ji awirên wî difiriyan. Piştî ku ji dêrê derketibû berê xwe yekser dabû rêwîxaneyê û derbasî metbexê bûbû û dîtibû ku kes li wê nîne. Hema destê xwe avêtibû du kêran û hatibû li ser maseyê vala rûniştibû û ew herdu kêr di hev dabûn bêyî ku kesek jê bipirse ew kiye û çî divê! Nêzîkî seetekê bi wan kêran listibû. Geh derdikete derve û berê kêrê dida dêrê û dihejand û geh jî li hundir kêr tûj dikirin. Karl jî ku hîn hevî ji vegera wî nebiribû xwestibû dema xwe ji seet çar heta pênc bi xewê derbas bike. Lê kiribû nekiribû xewa wî nehatibû. Hema ketibû ser zikê incîlê û xwendibû heta seet bûbû pênc. Îcar çûbû werisê zengil çar caran kişandibû û cara pêncan jî heta jê hatibû weris bi kerb kişandibû û dengêkî bêhawe tûj ji zengil deranibû. Heta bi çûkên ku li ser şaxên şaberûyê veniştibûn firandin.

*Rîspiye ku roman dixwend jî, xuyabû ku gihiştiye rûpela dawî. Kitêb dada û bi aramî danî ser maseyê. Wî qurtek li qehweyê xist û rabû ser xwe û bi gavin giran ber bi Gustav de meşiya. Dema gihişte ber, destê xwe avête zendekî wî, hişk pê girt û got:*

*- Te ew kuştiye.*

*Û ji berîkên Gustavê behetî tûtûn derxist. Ne mistek, ne du û ne jî sê mist. Dawiya tûtûnê nema dihat. Li ber lingê Gustav girekî ji tûtûnê bilind bû. Hemîyan çavbeloq li wî dîmenî dinêrîn. Wan xeyal kir ku ew kalê berî kêlîkekê kitêbek dixwend sihirbazeke loma jî di cihên xwe de sar û tirsîyayî û bêdeng man û bi kursiyên xwe ve hatin mîxkirin. Tenê xwendevanê ilahiyatê piştî xwe bê baldarî da wî girê tûtûnê yê li ber lingên Gustav bilindbûyî û dîsa hilikşiya jor. Bi girtina deriyê odeyê li pey xwe re, dengê ku li jêr bilind dibû, nema hate guhên wî. Di pencereyê re jî nema tişteke xuyabû. Hîn dem hebû ku roj here ava lê dîsa jî tarî ketibû erdê. Mûma stûr ya li ber serê xwe geş kir, xaçek li ser sînga xwe resim kir û dîsa deftera Martîn vekir û xwend:*

\*\*\*

Hansê hêja,

Bedlîs zaf xweş e. Bihişteke e ku çiyane wê di dawa xwe de dilorînin. Bajarê sêvên bînxweş û bax û bistanan e, erdê koprî û kaniyan e. Cihê medrese û mizgeft û xanqah û dêrên kevn e. Bajarekî kevnare ye ew. Îroj Emerê kor bi destê min girt û di nav berfa li caddeyan re ez birim mizgeftekê<sup>1</sup>. De bala xwe bide vê girêka kor; yekî kor î misilman dibe rêberê kesekî fille û biçav, wî dibe mizgeftekê ku berê dêreke ermenan bû û navê wê bi tirkî ye lê li bajarekî kurmancan e!

Ev korê misilman, yanî Emer, xwediyê hişekî xurt e. Hemî rê û rêçik jiberkirine. Ew dibêje: Murad tu bes bibêje min em li kû ne û ezê te bibim deverên din. Ji min re behsa mîrên berê ên vî bajarî dike, behsa gola Nazik û Bulaniqê dike, behsa çiyayê Nemrûd û Şerefdînê dike û dibêje ku bihiştê Adem û Hewwayê jî ev welat bû. Ma kî welatê xwe nahesibîne bihişteke!

Ez ji karwanê xwe qut bûme Hans. Min got ka ez xwe li vir rihet bikim mîna çawa ku Iskenderê Makedonî xwe li vê herêmê rihet kiribû. Dibe ku çareyekê ji êşa zimanê xwe re bibînim, her wekî Iskender ku çare ji wî quloçê serê xwe re dîtibû.

Li vî bajarî efsaneyek heye dibêje ku navê vî şarî ji navê xulamêkî Iskenderê Makedonî hatiye. Di sefera Iskender ya ber bi welatê Hindistanê de, tişteke mîna quloçê gayekî di pêşiya serê wî de şîn hatibû<sup>2</sup>. Hekîmên yûnanan kiribûn û nekiribûn derman nas nekiribûn. Iskender koça xwe li derdora vir danîbû û xwestibû hinekî xwe vehesîne. Civateke şahanî li dar xistibû û çend rojan di kêf û şahiyê de mabû. Dibêjin ew herdu quloçên ku di serê wî de şîn hatibûn, roj bi roj kintir bûbûn heta şopa wan nema bû. Hekîman gotibûn ku hewayê vî bajarî derman e. Îcar kêfa Iskenderê mezin ji herêmê re hatibû û ji xulamê xwe Bedlîs xwestibû ku keleheke asê ava bike ku tu kes nikaribe wê fetih bike. Bedlîs dest pêkiribû û keleh ava kiribû. Dema Iskender hatibû ku derbasî kelê bibe, Bedlîs dergeh hemî girtibûn û nehiştibû ew derbas bibe. Hingî sûrên kelê bilind û asê û dergehên wê xurt bûn Iskender kiribû nekiribû nikaribû derbas bibe. Rabûbû ferman kiribû ku dorpêçê vekin û ji wir herin. Lê xulamê wî sûrê xwe li ser kefenekî danîbû, kilîten dergehên jî li ser, û berê xwe dabû Iskender û gotibûyê: şahê min, li gor fermana te min ev kela ava kir. Niha jî ez stûyê xwe radestî dadmendîya te dikim. Ha ev sûrê min e û ev kefenê min e û ev jî kilîten kelê ne. Tu û vî sûrî, tu min dikujî, min dihêlî ferman fermana te ye. Kêfa Iskender ji bersiva wî re gelekî hatibû. Ew xelat kiribû û navê wî li kelê danîbû û ji wê rojê de navê bajêr Bedlîs e.

\*\*\*

Piştî wê barana reş, berfeke weke xezebeke spî bariya. Bi şev pê de, min û Alberto û Yavuzê çortanxur me li berfê dinêrî. Kesek wê şevê li xanê nekete xew. Şeva rojiyê bû. Niştevanên xanê ên misilman karê xwe û paşîvan dikirin. Berf jî hêdî hêdî bilind dibû. Hespên di axur û tewîleyan de di nav re hîrehîr dikirin. Yavuz bi tirs got: ev şev şeva remezanê ye jî lê xuyaye ne şeva xêrê ye. Hesp ne ji vala dikin hîrehîr. Ji xwe vê berfê û wê baranê!

Ji min û Alberto re behsa wî kesê ku miribû kir. Şêxekî kurmancan bû. Yavuz çîroka xwe û wî hemû ji me re got. Wî got ku ew bi daxwaza hin naskiriyên xwe hatibû wî şêxî bikuje û çend hewldan kiribûn lê pêk nehatibûn. Geh xwestibû jêre jehrê bixe nav zeyta çiraya ber serê wî. Geh jî xwestibû destxeteke ku wî bi hibreke jehrîn nivîsibû bigihîne wî. Lê yek hewldan jî neçûbû serî.

Alberto ji min bêtir vecinîqî bû, loma bi devekî jihevûyî û çavin beloq pirsî:

- Ji ber wê yekê bû te ew destan bi dizî û lez û bezê dinivîsand? Tu dikarî mirovekî bikujî?

<sup>1</sup> Nav li wê mizgeftê dikin Qizilmescid. Ew li gor agahiyên imamê wê berê dêreke ermenan bû û tirkan ji ber soraya kevirên wê ew nav lê danîbûn.

<sup>2</sup> Loma jî li nav misilmanan dibêjinê Iskender Zulqerneyn yanî iskenderê duquloçî. Di quranê de jî navê Zulqerneyn heye. Lê şêxê helebî şêx Mustefa Eltermanîni ê ku ez fêrî zimanê erebî dikirim digot: zulqerneyn yanî ew kesê ku dused salî jiyaye.

- Erê Alberto. Min dixwest zêran qezenc bikim. Li himber kuştina wî merivê Xwedê dê zêr biketa berîka min. Lê ew mirovekî Xwedê bû. Roja ku min ew dît hezkirina wî niqutîbû dilê min lê zêrên zer zora hezkirinê biribûn. Min naskiribû ku ew ne mîna kesên ku min ew berê kuştine. Axa, mêrên maqûl, dizdar û heta karwansalar jî bi tedbîrên min dihatin kuştin. Bi destên min dihatin xeniqandin bêyî ku xweziya min di ber min de bimîne. Kuştin li ba min wek firrek av bû. Hema bi vî camêrî re poşmaniyê ez dame ber gezan. Lê elhemdulillah ne min ew kuştîye. Îro jî min nas kir ku ew bi rastî weliyekî muqeddes e. Merivekî Xwedê ye ew. Ev barana ku bariya jî delîlê welîbûna wî ye. Hûn bawer dikin ku ewqase baran hat û kefenê wî şil nekir! Yek dilop jî bi ser kefenê wî de nebariya!

Li ber şewq û çirisîna pêtiyên agirdanka di dîwêr de, me dikarîbû em gulokên hêsirên Yavuz bibînin ku çawa li ser wî rûyê kirêt û hişk hilol dibin. Di xêzên kûr yên wî rûyê tirsnaq û kelûkortî de diherikin û tîn li koşeyên devê wî ê mîna dasekê xwar, kom dibin. Min û Alberto me matmayî li çavên hev dinihêrî û bi tirs li serpêhatiya wî guhdarî dikir:

- Ez qatil im qatil. Qatilekî ku serê mêrekî dikim buhayê zêrekî. Çima dibêjim mêr? Ez qatilê jinan im jî! Qatilê jinên....avis....û....zarokên di malzarokan de me jî.

Di nav wê axaftina xwe ya ecêb re, ku bi fişefîşa bêvilê re qetoqeto dibû, berê xwe da min û got:

- Martîn. Min Kewsera bi heml jî kuşt.

Û bû iske-îska wî û da girî. Piştî ku têra xwe giriya çîroka kuştina Kewserê got<sup>1</sup>. Min nema zanîbû ka gelo divê dilê min pê bişewite yan ez nefretê jê bikim? Hestekî xerîb li ba min peyda bû. Giriye wî ji dil bû. Lê dîsa jî ez tirsiyam. Di dirêjahiya axaftina wî de, destê min li ser qevdika xencerê bû. Min digot ku hindik maye bibeze me jî û me herduyan yan yekî ji me bikuje. Lê ew her digiriya heta ji nişkêve rabû ser piyan û berê xwe bêdeng da odeya xwe.

Çend roj derbas bûn êdî me pêjna wî zêde nedikir. Sibehean ji odeya xwe derdiket bi rûyekî tehl silav dida, dadiket jêr, demekê nebedî dibû û êvarê vedigeriya û dikete odeya xwe bêyî ku bi me re biaxive. Ew pir lihevketî bûbû û ne ditebitî. Erdê ew nedigirt. Ava dîzeke ku agirekî gurr di bin de veketî be bû ew.

Kewserê dihate bîra min. Min ji guhê xwe bawer nekir ku Yavuz ew kuştibe. Rûyê wê, desmala wê ya ku ji ser porê wê tim dişemitî, xwêdana paxilên wê ku bîna kemûnê jê difûriya û ew bejna xwedayî û çavên sihirbaz ji ber çavên min nema diçûn. Xemgîniyeke giran weke girekî girte ser dilê min. Ez her diponijîm û Alberto bi wî dengê xwe yê nerm û diloan ber dilê min dida. Ruhê min mîna şûşeyeke li nêzikî agirê êtûneke gurr be derizî. Çipiskekê dikaribû ew hûrhûrî bikira. Sibehean ez berî hemûyan ji xew radibûm û hildikişiyam ser banê xanê û heta ku çavên min dibirrîn min li der û dorên bi berfê nuxumandî temaşe dikir.

Sibehekê ez dereng ji xew rabûm. Çi bibînim! Berfê hewşika xanê ya biçûk dagirtiye. Gava ez ji odeya xwe derketim û min xwe siparte derabzîne ku li wê berfê temaşe bikim, min dît waye Sefêşah jî xwe sipartiye derabzîna pêşberî deriyê odeya xwe û ew û Mele Zahirê Gulbaxî<sup>2</sup>

<sup>1</sup> Şeva ku wî Kewserê ji mala min derxistibû, berê xwe bi wê re dabû mala wê. Li wir çi şikarte û zêrê wê hebûn xistibû hemyanekî û bi destê wê girtibû û gotibû de ka em berê xwe bidin welatê me. Kewsera reben, Kewsera ku bawerî pê anîbû jê pirsî bû: tê çawa berê min bidî welatê kurmancan di vî halî de? Wî gotibûyê ku ew ê ji wê re texterewanekî amade bike û ewê lê siwar be û hîç bi rê nehise. Kesê bêhêvî çi xeber be zû bawer dike. Wê jî ji Yavuz bawer kiribû. Û herdu derketibûn çûbûn keviyê çemê Quwêq li aliyê dergehê Antakyayê. Li ber aşekî avî herdu kurmanc rawestiyabûn. Wê pirsî bû ku çima te ez anî me vir? Wî gotibû: dermanê te li vir e. Kesên mîna te ku li xwe heyirî bin, ev pêlên giran in û ev ava kûr e. Û ew ji nişkêve dehfandibû nivê avê û ji wir bi lez dûr ketibû. Kes wê nivê şevê li wir nebû ku şelpeşelpa wê keçika avis di nav pêlên xedar de bibihîze. Min jî hîç nizanîbû ku bi kuştina du giyanan re, ew kevirê giran ji ser sînga min daketibû.

<sup>2</sup> Oldarekî kurmanc î li ser mezhebê şafiî bû. Bi çavê dijminan li filleyan dinêrî. Ku destekî wî bi şaşî li kesekî fille biketa, diçû dişûşt û nod û neh carî, bi qasî daneyên tizbiya xwe ya reş û dirêj a ku ji destê wî nediket, Estexfirullah rêz dikirin.

bangî hev dikan. Xirtepirta Melê bû ku heta nava xwe ketibû nava wê berfa seyr. Mele Zahirê ku bi destên xwe, mîna yekî ku sobayê dike, berf ji pêşiya xwe dida alî, bang dikir: yareb yareb! Ev nîşanên qiyametê ne. Duh barana reş îro jî ev berf! Rabin û li vê ecêba giran û vê xezeba Xwedê teala seh bikin. Seferşah jî behetî bû, hinekî bêdeng ma lê tavilê got: Xwedê ji te razî ma tu vê sibeha hanê di nava wê berfê de çî dikî! Madam ew xezeb e tu di nava xezebê de çî dikî seyda? Mele Zahirê jidesthılanînketî gotê: paşîvan, ku ez daketim biçim destavê, min dît berf tê. Tu dizanî duh destê min bi wî segê firinciye heram Agapito<sup>1</sup> bûbû û ez lewitîbûm. Ez jî daketim ku xwe ji gemara wî bişom. Hema min dît ez bi berfê hatim dorpêçkirin. Bawer nabe ha! Tu dibêjî qey hinekan tertên berfê bi ser min de anîne xwarê û dewisandine. Berf li dora min hatiye repisandin. Ev ne berf e heyran. Ev xezeb e xezeb. Bûye qeşa jî bi ser halan de. Ez nikarim tev bilivim.

Derenceya kevirî a ku dadiket jêr jî di bin berfê de winda bûbû. Imkana ku yek dakeve xwarê nebû. Ez di çareyekê de fikirîm ku wî rebenî ji nav lepên wî dêwê spî rizgar bikim. Hîn ez wisa difikirim min dît vaye Alberto jî derket û hat li rex min rawestiya û li wî dîmenê seyr, seyr kir.

Berfê dabûyê, hêdî hêdî bilind dibû û mele Zahir li ber xwe dida û hey dadiwerivî jêr. Ji pirtik û guliyên berfê êdî ew bi zorê dixewinî.

Silêmanê kurê Seferşah jî xwe gihande rex bavê xwe û kenekî bêhûde da ser. Bavê wî kir ku wî biqewirîne, lê wî xwe da ber derabzînê, daqûl kir, kef bi devê wî ket û got: Gun, gun. Gun.<sup>2</sup> Alberto bi destê min girt û got: Martîn ka em herin odeya Yavuz, min carekê hin kokelên werîsan li cem wî dîtibûn. Emê werîsekî ji ba wî bînin û bavêjin ber wî ehmeqê han bila li newqa xwe bigerîne û emê wî bikişînin. Dibe ku tew çareyek li ba Yavuz bi xwe jî hebe.

Deriyê odeya Yavuz nîvgirtî bû. Me bi dengê du deng bang kirê. Li me nevegerand. Alberto bi hêdîka derî dehf da û derbas bû. Bi derbasbûnê re mîna ku marek pê vede bi şûnde vegeriya. Rûyê wî zer bûbû û tirs jê diniquî. Tirs niqû dilê min jî û bêtî ku ez jê bipirsim çî bûye, min bi herdu kêlekên derî girt û serê xwe dirêjî alî hundir kir.

Yavuz di nîvê odeya xwe de daliqiyayî bû! Werîsekî ku bi beştê qalind ê di nîvê banê odeyê de girêdayî bû, li stûyê wî gerandîbû. Zimanê wî heta kokê derketibû û dikira di nav diranên wî de perçe bibaya. Rûyê wî şîrkîyê tarî bûbû û dest û lingê wî pê ve dawerivîbûn. Iskemleya ku berê li ber serê wî bû hatibû nîvê odeyê û qulipî bû û gazekê ji ber lingên wî ên daliqiyayî pengizî bû. Xwe kuştibû yan kesekî ew bidarve kiribû! Kî dizane? Ez jî bi şûnde hatim. Min û Alberto me li hev nihêrî. Ji nişkêve wî xwe dada hundur û iskemle rast kir û hilkişîya ser û bang kir:

- Martîn were, dibe ku hîn ruh tê hebe.
- Ruhê çî malava! Ma tu zimanê wî ê kişiyayî nabînî!

---

<sup>1</sup> Bazirganekî ji Florensayê bû. Ji zû de li wê xanê bû û li hêviya bersivekê ji bajarê Azofê (osmanî dibêjinê Azaq) bû ku bibêje malê te gihiştîye. Wekilê wî ê rûs dê xebera gihiştina mal jêre baniya. Ew jî her li hêviya wê xeberê bû û guhên wî li bayê ku ji deryayê reş, hêla Trabzunê dihat bû. Ebaya wî ya sor ku ji çuxê navdar û nixrdar ê florensî bû, tim li ser milê wî bû û bi erdê re dixuşiya. Te digot qey serleşkereki Romayê ye.

<sup>2</sup> Silêman, kurê Seferşah ê tekane bû. Di temenê min de bû. Di bîst saliya xwe de dil ketibû keçeke kurmancan. Kiribû û nekiribû bavê keçikê ew nedabûyê. Silêman anîbû ew revandibû. Lê xwediyên keçikê bi dû wan ketibûn, ew zeft kiribûn û li ber çavên wî keça xwe dabûne ber xenceran. Hûr hûr kiribûn û avêtibûn ber segên şivanên xwe. Wî bi niyaz gotibû wan koçeran: min jî bikujin. Lê wan gotibû ku, ji kuştinê sezatir cezayek li ba me heye. Ê ew xesandibûn. Du kevirên çeqmaq anîbûn û di nav barebara wî de herdu gunên wî xistibûn navbera herdu beran û teqandibûn û ew wisa jihişçuyî berdabûn beriyê. Şivanekî ew dîtibû û gunehê wî bi halê Silêmanê reben hatibû. Ew mehekê li ba xwe di nav keriyê pez de veşartibû û dermankiribû. Paşê ew berda bû. Silêman, him lal û bêhal him jî aqil çelqiyayî li mal vegeriya bû. Tenê gotina gun gun di nav kenekî şeytanî û şêtane de pê re derdiket ku xelk bi xwe dikenandin.

Min wisa got lê dîsa jî min da pey banga hevalê xwe û ez derbasî hundur bûm. Laşê wî sar, hişk û qefilî û rûyê wî xeniqî û şîrkî bûbû. Miribû Yavuzê çortanxur<sup>1</sup>. Alberto xwest stûyê wî ê xeliyayî ji xelesa werîs derxe lê min gotê:

- Alberto! Ev ne karê me ye. Ka em herin xwediyê xanê agahdar bikin.

Wek ku nû hişê wî hatibe serê wî, çavên Alberto beloq bûn û ziq li min nihêrî, û got:

- Ev çawa ji bala min çû!

Me laşê Yavuzê daliqiyayî di cih de hêla û em bi alî Seferşahê xwediyê xanê de beziyan. Alberto bi farisî gotê ku çi li odeya Yavuz qewimîye. Lê Seferşah qet guh neda me. Te digot tu behsa mirina kêçekê yan kurmîkekê dikî!

\*\*\*

Li derve qiralkeke reş daketibû nava berfê û li ber serê Mele Zahirê Gulbaxî venîştibû û paş stûyê wî dinikiland. Geh jî libên savarê ên ku di nav riha melê ya dirêj de mabûn dinikilandin. Qajewaja melê bû, fikir û nedikir qiralkê bela xwe jê venedikir. Bi wê qajewajê re ku tev li qijeqiya qijika reş dibû, kesên di odeyan de yeko yeko derketin û her yekî sînga xwe da derbazînê û li dîmen temaşe kir. Egelî Murad<sup>2</sup> kumê xwe ji serê xwe kir û avête qiralkê ku wê bifirîne. Lê qiralka bi rû nefiriya. Wê baskên xwe hinekî ji hev vekirin û qevzek ber bi jor de da xwe, lê dîsa daket û vê carê cira xwe livenîştina li ser şaşika mele Zahir xweş kir û zelq kir. Mele qutifi bû. Berf ne bes bû ev mîrata reş jî bi ser de hat! Wî wisa digot. Egelî Muradê ku ji girava Chiosê<sup>3</sup> bû û tim benîştê Mezdekî dicût, loqa benîşt ji devê xwe derxist û bi derabzînê ve zeliqand û bangî mele Zahir kir:

- Mele efendî! Ma ne xebera min e qey? Eger niha Xwedê û şeytan li hev bana, ma tu diketî vî halî? Bi ya min bike were em herin cem rahibê Mûşê Sanosê qedirbilind, tu û wî peymaneke aştiyê di navbera Xwedê û şeytên de li dar bixin û.....

Mele Zahir stûyê xwe hinekî bi kerb zîvirand û li alî me nihêrî. Bi wê zîvirandina bi kerb re qiralka reş dîsa xwe bi jor de çeng kir û dîsa li ser şaşika berfînî danî û zelqek din kir. Mele qêriya:

- Seferşah tu bi qedrê Xwedê û pêxember kî vî dînî dîr bixe. Fasiqê heram! qîçeqiça wî ye benîşt dicû û bi ser de jî gotinên beradayî dike! Halê ku ez tê de besî min e.

Seferşah awirek di Egelî Murad veda û bi çavan jê xwest ku dîr here.

Egelî Murad yekser berê xwe da odeyekê û ji ber çavan wînda bû. Min Yavuzê reben ji bîr nekiribû, loma jî dîsa min xwe da tengala Seferşah û bûyer dubare jêre got. Vê carê ji devê wî

---

<sup>1</sup> Nizanim ka ji ber çi wî xwe kuşt! Lê di destekî wî de kaxezek hebû beytek bi farisî tê de bi xeta destê wî nivîsandibû, ji ber ku ew kaxez hîn bi min re ye, ez dikarim wê beytê li vir jî binivîsim:

*Darem gunahan zi qetre baran bîş*

*Ez şermî gunah figende em ser der pîş.*

Alberto wateya wê weha gotibû min:

*Gunehên min ji dilopên baranê bêtir in*

*Ez jî ji şerma wan gunehan, sernexûn im.*

<sup>2</sup> Serbazekî yenîçeriyên î bîst û pênc salî bû. Ji wan Yenîçeriyên ku welatên ewropayê didewixandin bû. Mirovekî qutik, rîgirover û dengê wî stûr û pozê wî mezin bû. Bi naskirina rahibekî mûşî re jiyanî wî serobinî hev bûbû û cilên serbazan ji xwe kiribûn, li şûnê qerpalên dewrêşan li xwe kiribûn. Diçû û dihat digot: ka werin em Xwedê û şeytên li hev bînin! Bi gotina wî ku hevrikî û dubendiya di navbera dîn û mezheb û milletan de sûcê dijmintiya Xwedê û şeytên e! Îcar ku ew herdu zatên mezin li hev werin dê dijmintiya mirovan jî ji holê rabe.

<sup>3</sup> Giravek di behra Ege de ye, tirk dibêjinê Saqiz. Bazirganên Smîrnayê ji wê giravê benîştekan dianîn û difirotin bazirganên ewropî. Min bi xwe ew cûtiye, bêhna wî zaf xweş e. Destpêkê mîna kevîrê zerik e lê di devê mirov de nerm û qajikî dibe. Ew girav bi xwe jî bûbû benîştekan di devê bîzansî û cenovayî û venedîkî û osamniyan de. Yekî ji devê yê din direvand. Piştî şikestina osmaniya li wê giravê di dema sultan Ehmedê duyemîn de, ku xettat bû û bi destê xwe hin nusxeyên Quranê nivîsibûn, Egelî Murad û bavê xwe, ku mezinekî yenîçeriyên bû, ji tîrsa xazoqan reviyên van welatan û li bajarê Mûşê, xwe di dêreke ermenan de veşartin.

yê mezin û di nav wê rih û simêlên bêfesal re gotineke ji zelqa qiralkekî pîstir pekiya rûyê min:

- Hela tu siktir bibe niha!

Di pey re, mîna ku li wê peyva xwe poşman bûbe, bi nermî got:

- Murad efendî! Niha bisekine em berê vî rebenî ji nav wê xezebê derînin.

Dîtina me dît ku waye Egelî Murad keşîşê ermenî Qerebêt<sup>1</sup> daye pey xwe û devliken ji odê derdikevin û tên. Du sê qiralkên din li jora me hêlan dikirin. Keşîş bi dengê bilind bangî mele Zahir kir û bi tinazî gotê:

- Mele efendî! Şaşika te çi xweşik bûye! Tu dibêjî qey te bi miskê deqdeqî kiriye.

Gotina keşîş di devê wî de, loqek zelq bi ser milê wî de jî ket û herikî ser xaça şikestî. Mele Zahir, tevî ku bi xwe biliyabû û dikir û nedikir nedikarîbû destên xwe ji bin berfa qeşagirtî derîne jî, ew dîmen dît û bi kêfa zarokekî ku zora hevalê xwe di lîstikê de dibe, bang kir:

- Keşe Qerebêt li xaça xwe ya şikestî mêze bike! Waye qiralkê ew cebirand.

Ehmo<sup>2</sup> jî ji odayê derket. Ehmoyê ku navê wî kiribûn Ehmoyê gawir, derket û hat li rex Egelî Murad rawestiya û bi qerf bang kir:

- Ha apê mele! Îro werîs ji duayan bi kêrtir in ha!

Bere bere, xelkên di xanê de ji odayên xwe derketin, berê xwe dane berfa li derve û hatin xwe sipartin derabzînê ku temaşe bikin.

Bedlîs, seet pêncê piştî nîvro. Pêncşem. 2ê sibatê. 1708

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Ji keşîşên dêra Aşmiyazîna Ermenistanê bû. Li ser kincên xwe ên reş ku heta ber gwîzekên wî dihatin, xaçeke mezin ji hestîyên filan ku kenarekî wî şikestî bû li ser sînga wî bi zincîreke zêr ve bestî bû û diçû û dihat. Berê wî li bajarê Bayezîdê bû da ku hekîm Zuhrabê ermenî ê ku li wî bajarî dermandarî dikir, bi xwe re bibe dêrê. Êşeke nenas, li gor gotina wî, di nav rahibên jin de belav bûbû û metropolîtê dêrê ew hinartibû ku hekîmê navdar Zuhrab bi xwe re bibe. Qerebêt û mele Zahir her roj diketin qirika hev û dihatin ku hev bixun.

<sup>2</sup> Yekî ku baweriya xwe bi tu xwedayî nedianî bû loma jî naznavê gawir lê danî bûn. Ji Qersê bû. Piştî wî ji şûn û şopa qamçiyên bûbû mîna tejiyeke xetxetî ji wan tejkên ku li van deran davêjin ser piştî keran. Ew li Qersê bi vexwarîna meyê navdar bûbû, lê navdariyeke ku wî digot: xwezî qûna min derketiba û ne navê min. Nîvê temenê xwe di zindanan de derbas kiribû. Hatibû xanê da ku bi karwanê hecê re berê xwe bide welatê Hicazê yê pîroz û, li gor gotina wî, binêre ka ew çi kevir e ku bi deh hezaran xelk rojê pênc wextan berê xwe didinê. Dema bihevçûna mele Zahir û keşe Qerebêt daweta Ehmoyê gawir bû. Çi kar di destê wî de hebûya diterikand û dihat li wan temaşe dikir.



Hêja Hans:

Ez hê jî li bajarê Bedlîsê me. Ezê demekê li vî bajarî bimînîm. Em derbasî meha sibatê bûne. Ji duh êvarî de heta niha berfê etlahî nedaye xwe. Her dibare!

Êvarî ji kesên li xanqahê re, şorbenîsk anîn. Keleboxê mijekê spî bi ser zerikan xistibû. Min û dewrêşên li vir me zikê xwe da ber û hinavê xwe pê germ kir. Emerê kor nema xuya dike. Wek zarokêkî winda ku li diya xwe vegeriya be, xuyaye destê wî nema ji kolanên vî bajarî dibe. Ji xwe di vê seqemê de ez jî ne bi hewceyî wî me. Ma emê bi ku de herin! Erd û ezman bûne yek reng. Jana ku di zimanê min de bû îro kêmbûye. Peyvên min sivik sivik derdikevin. Min duh êvarî ji dewrêşekî re behsa êşa zimanê xwe kir. Hema min dît destê xwe dirêjî devê min kir û ayeteke Quranê xwend: *wehlul `udeten min lisanî. Yefqehû qewlî*<sup>1</sup>. Ezê niha berdewamiya bûyera ku di nameya berê de nivîsî bû binivîsînim.

\*\*\*

Bêhnedemeke kurt buhurî, Agapîto jî di gel xizmetkarê xwe derket û pala xwe da derabzînê. Min û Alberto me Yavuz û mirina wî ya ecêb ji bîr nekiribû, lê bi rastî em bêçare mabûn. Ji xwe Sefêşah ketibû gola axaftineke bédawî bi Mele Zahir re û çend carê ku me bûyer li ber guhê wî dubare kir, badîhewa çûn. Cara dawî ku Alberto çû seriyek li Yavuz xist û vegeriya û dîsa ji Silêman re got ku Yavuz hatiye kuştin, qeherî û got:

- Em yekî li ber mirinê xelas bikin, ferztir e ku herin yekî mirî defin bikin.

Paşê berê xwe bi kerb da ezmanê spî ku bi dehhezaran pirtikên berfê jê dihatin xwarê û bi niyaz got:

- Xwedêyo!

Deng nema ji mele Zahir dihat. Nema diliviya. Hema me dît Topal Feqe Nûrî<sup>2</sup> şaşika xwe ya biçûk li serê xwe şidand û weke xîxanekî xwe di ser derabzînê re avête ser berfê ku here alîkariya melê bike. Bi qasî bostekê berfê qeşa girtibû lê dîsa jî berfa har a ku nû dibariya bostekê bi ser wî qatê qeşayê ketibû. Topal Feqe Nûrî xwe da nav û bi alî mele Zahir de çû heta xwe gihandê. Destê xwe da serê wî, zelqa ku li ser şaşika wî ketibû bi zendika xwe ya rastê paqij kir û li dorê çû û hat, tiliyeke xwe da cênîka wî û li nebza wî guhdarî kir. Li çavên wî ên vekirî meyzand û ji nişkê ve qîrîya:

- Temam bûye! Ruh ji mele efendî kişiyaye. Inna lillah we inna ileyhî raci`ûn.

Di vegerê de, piştî ku kir û nekir û nikaribû gewdeyê melê ji nav berfê derîne, lingên wî di berfê de çûn xwarê. Rabû kire hawar û gazî. Kes newêrîbû bi alî wî de here. Berfê dabûyê û bilind dibû. Hema Agapîto ebaya xwe ya erxewanî ji ser milê xwe kir û di guhê Îvanê dîl<sup>3</sup> de

<sup>1</sup> Yanî: *Girêka di zimanê min de veke da ku ew axaftina min fêhm bikin*. Ev ayeteke di sûretê Taha de ku yek ji sed û çarde sûretên di Quranê de ye. Dibêjin rojekê Mûsâyê pêximber hîn zarok bû, di hemêza Fir`ewn de bû û ji nişkê ve bi riya wî girt û kişand. Fir`ewn got ezê wî bikujim ji ber ku ewê bibe sebeba herifîna desthilatdariya min! Lê dilê jina wî Asya bi Mûsa şewitî û got ku ew zarok e tiştêkî fêhm nake. Rabû Fir`ewn bizotek agir û qetek zêr anî li ber Mûsa danî û got ka em binêrin bê fêhm dike yan na? Mûsa destê xwe dirêjî qeta zêr kir ku rahêjê, lê Cibraîl hat û destê wî dagerand ser bizota êgir. Mûsa ew rakir û xiste devê xwe û zimanê xwe şewitand. Jina Fir`ewn gotê: ma min negote te ku ew zarok e fêhm nake! Ji wê rojê de devê Mûsa peltekî bûbû û peyvên wî ne zelal û diyar bûn. Ê min bizota bexteweriyê zimanê min şewitandiye.

<sup>2</sup> Nozdesalî bû. Yekî çermspî û terlan bû û bi lingê xwe ê rastê dikuliya loma jî sifetê Topal yanî seqet û kulek her jê re bûbû navê yekem. Di gel topaliya xwe jî gelekî degel û çalak bû. Dengê wî zirav, ku bi axiviya û te ew nedîtiba, teyê bigota keçikek nûhatî diaxive. Ji Erzerûmê dihat û berê wî li derê wî şairê kurmanc bû bi armanca ku bibe suxteyê wî. Ew şairê ku di wê roja barana reş de miribû û hişê Yavuzê çortanxur li hev xistibû. Ji kesên ku şerîet û ola îslamê dixwînin re dibêjin feqe.

<sup>3</sup> Îvan di şerekî bi osmanîyan re êsîr bûbû. Xwediyê xanê ew kirî bû û kiribû evdê xwe. Lê vê dawiyê ew firotibû Agapîto. Ew xortekî ku xemgîn û bédeng li wan deran diçû û dihat. Bi hêviya ku pêşbîniya rahibekî gundê wan pêk were, dijî. Rahibê gund berî panzde salan gotibû: ku sê heşt di salekê de kom bibin, osmanî li ser rûyê erdê namînin. Hinan digot mebesta rahib ji sê heştan, heştê meha tebaxê sala hezar û heftsed û heştan e ku tenê heşt meh jêre mabûn. Lê hin stêrnasan jî digot ku mebest ji sê heştan reqema bîst û çar e, angosultanê osmanî yê bîst

hinekî kire pistepist. Îvan reviya odeya Agapîto û bi lez vegeriya û xencereke serxwar di destê wî de bû! Me bi çavên mîna du tasan ji behitîna ferehbûyî dît ku Agapîto xencer ji dest girt û ew ebaya nirxdar ku hêjaye giraniya xwe floriyên zêr, tîş tîşî kir û bi hev ve girê da. Terîşek dirêj jê saz kir û serê wê avête ber lingê seqet ê Topal Feqe Nûrî.

Devê me hemûyan ji hev ma û hema tenê himehim ji me dihat! Ew çi kiryar bû! Ew çi biryar bû! Ê xencerên tirsê xeyalên me qet qetî kirin. Qetên pirsan ji çavên hemûyan hatin xwarê, bûne terîşek û li ber lingên Agapîto kom bûn<sup>1</sup>.

Topal Feqe Nûrî dem wînda nekir, serê sor ê terîşê girte destê xwe û li newqa xwe ya ziravik zîvirand. Agapîto ew kişand, ên li dorê jî bêhemdî xwe dest avêtinê û Topal Feqe Nûrîyê gewde sivik ku mîna beytîkekî di bin baranê de mayî dilerizî, kişandin heta ew gihandin jor.

---

û çaremîn. Em niha di zemanê sultan Ehmed de ne, ku ew yê bîst û sêyemîn e. Gelek rûs bi wê hêviyê dijîn ku dewleta osmaniyan dê nêzîk biherife û şopê jî li pê xwe nahêle. Hîn ez li Helebê bûm, di nav tacirên venîdikiyan de qewlek belav bûbû ku ava Ferat li cihekî zuha bûbû û nihîtekî mermer î spî derketibû, li serê bi erebî hatibû nivîsîn ku, dewleta osmaniyan gihaye dawîya xwe! Bi gumana min ev tenê hêviyên kesên ku dijmintiya osmaniyan dikirin bûn. Her weha xwesteka kesên ku piştî wan di bin barê bac û xûkiyan de xûz bûbû bû.

<sup>1</sup> Di wê kêlîkê de çîroka Sankt Martînê ku ebaya xwe qusand û nêvî da rebenkî da ku xwe pê germ bike hate bîra min. Di zarotiya min de, diya min her bi vê çîrokê şevên zivistanên me dixemilandin û xewa şêrîn û zêrîn mîna hingivekî diniquand çavên me.

## Se`et şeş

*Bi se`et şeş re, her çar naqosên dêra nêzîk dest bi destana ringîniyê kirin<sup>1</sup>. Dengê naqosên dêreke din jî tev li wan ringîniyan bû. Naqosan êdî bangî bawermendan dikir ku herin nimêja êvarê. Qerebalixa li jêr êdî zêde bûbû û kesekî guh li zengilên dêran nedidêra. Gustav û ew kalê rîspî rabûbûn hev. Destên xwe avêtibûn yaxeyên hev û hev dikişkişandin. Hemû rawestiyabûn û li wan û wê qewxeya wan temaşe dikirin. Tenê pîrê ji cihê xwe neleqiyabû û gore dirêsa. Pisîkê wê jî rabûbû û teriya xwe li dû xwe rep kiribû û bi çavên tijî tirs ziq li pevçûna wan dinêrî.*

*Xwendevanê ilahiyatê ku dît deng bilind bû, deftera di dest xwe de girt û berê xwe da jêr. Dîsa li ser pêpelûkekê rawestiya û bi baldarî li wê hayûhoyê temaşe kir.*

- *Te Fernando kuştiye!*
- *Na ne min!*
- *Erê te!*
- *Ku ez bim jî ma tu bavê wî yî qey? Çiyê te li ba min heye! Ha! Tu wekîlê wî yî? Tu ji ku wî nas dikî?*

*Tu kesî hewl nedida ku xwe biavêje nava wan û wan ji hev veke! Xwendevanê ilahiyatê jî ku wisa dît, lêvên xwe qermiçandin û bi tilîka xwe ya nîşanê îşaretî cênîka xwe û kesên rûniştî kir ku hişê we nîne. Kesî bala xwe nedayê, tenê pîrê hinekî çavên xwe rakirin û awireke sist û bêwate tê veda lê dîsa bi ser gore û pîjên xwe û guloka rîs de xwar bû. Xwendevanê ilahiyatê yê ku di xwe re nedît berê xwe bide nimêja êvarê, berê xwe da jor. Derî li pey xwe nîvvekirî hêla û pê hisiya ku êdî deng li jêr kêmtir dibe. Xuyabû ku kesên li jêr derdiketin nimêjê. Wî jî defter rakir û ji devera ku gihabûyê dest pê kir û xwend:*

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Dema seet bûbû pênc, Georg herdu kêrên xwe yên tûjkirî di ber piştana xwe ya hevrîşim de veşartibûn û derketibû. Wî yekser berê xwe dabû dêrê. Dema çavên Karl pê ketibûn kêf kiribû û di dilê xew de gotibû: ez dizanim tu jî bêtî min debar nakî. Mesele ne pere tenê ne berxiko. Hayê wî ji raza dilê Georgê ciwan nebû loma jî bi dilovanî gotibûyê: berxikê xwedê! Dûrî dêrê nere. Dêr bêtî te kavl e. Pere jî sibe di berîka te de ne. Û jêre dîsa meteloka kurê winda ya ku bi hezarê caran bihistiye û di incîla Lûqa de hatiye, got. Mîna ku çawa di incîlê de bav ji xizmetkaran re gotibû: dê bilezînin! Qencîrîn cil ji kurê min re bînin. Gustîlekê bixin tiliya wî. Golîkê qelew bînin serjê bikin da ku em bixwin û şahiyê li dar bixin. Karl jî gotibû: emê şahiyêke gewre li dar bixin. Emê mûman hemûyan vêxin û zeyta pîroz û nanê bi bereketa Mesîh strayî li ber xwe deynin û kêf bikin. Georg serê xwe berda bû ber xwe. Û wê seetê gişî ji xwe re incîla Lûqa xwendibû heta bûbû seet şeş. Êdî rabûbû bi Karl re werîsê her çar zengilan kişandibû. Karl jî da ku bide xuyakirin ku hinekî poşman bûye, bi destekî werîsê jamê dikişand û destê din jî di ser serê Georg û heta nav milên wî re bi nermî dibir û dianî. Dema ku destê wî hinekî berjêr hatibû li kêrekê ji wan herdu kêran rast hatibû. Karl hîn dikira jê bipirsiya ev ç kêr e? Nimêjker derbasî hêwana dêrê bûn.

Sê roj bi wî awayî derbas bûn, ne mele Zahir ji nav berfê derket û ne jî kesî guh da Yavuzê xeniqandî! Berf her dibariya û nema mele Zahir di bin de xuyabû. Êdî tirs ku erzaqên di xanê de nemînin girte ser me. Yek caran ez û Alberto diçûne serdana ewropiyên din û me suhbet dikir. Alberto car caran mandola xwe radikir û ji zengeloka xwe awazên gelekî nazik derdianîn. Di nava wê berf û seqemê de, stranên Alberto mîna agirê daran ruhên me yên tirsîyayî germ dikirin. Lê hin koşeyên giyanên me hebûn ku germî nedigihî wan. Tirs qeşayek bû xwe li giyanên me girtibû û agirê stranê nikarîbû wê bihelîne. Tirsê mîna marekî xwe di quncikên giyan û hişê me de kokel kiribû. Tirs marekî ku ji êgir neditirsîya bû. Em ditirsîyan û ecêb diman ku mirina Yavuz bala tu kesî nakişîne. Yavuzê ku êdî Alberto deriyê wî girtibû û qelşên derî şima kiribûn ku bîna termê wî ê genî neyê me. Em di rîya derketinê de difikirîn û nedigihan tu encaman. Dengê guran ji derûdorê dihat ku bêrawestan dizûriyan. Ên li wir, ku ji wan welatan bûn, behsa keftar û gurên birçî dikirin. Digotin ku ew didine nav malan û mirov û sewalan dixun. Ûsibê Kildiz bi dehan çîrokên guran digotin. Seferşah navê wî kiribû Tekgöz Ûsib. Hinên kurmanç jî digotinê Ûsibê wirr. Di talanekê de derbek di çavê xwe yê çepê de xwaribû ku weke hejîrekê hatibû perçiqandin. Çi li xanê hatibûya dizîn, li ba wî dihate dîtin. Serpêhatî û çîrokên ecêb digotin. Gelek caran ew bi xwe mijara wan çîrokên xwe bû ku têde tim gur û keftar dikuştin. Me gelek ji wan çîrokan bawer nedikirin lê sebra me bi wan dihat. Sar bû, êdî kelexa ji devê me sibehan derdiket jî li ser simêl û rûyên me dibû qeşa. Tacîrekî ji Hindistanê hebû xwe bi barê topên hevrişimê ku bi xwe re anîbû germ dikir, ew top li bedena xwe digerandin û her bêdeng dima. Fîlîpê Firencî<sup>1</sup> pê dikeniya, berê xwe dida me û digot:

- Ev reben nîzane ku bi du aqçeyan hinek êzing ji Seferşah bikirre û di tifika odeya xwe de vêxe da ku xwe pê germ bike. Barê hevrişimê wî wê jêre bibe kefen jî!

Ku Evdîlmesîhê Helebî hinera tacîrê hindî dît, wî jî wekî wî hevrişim li xwe gerand û ew jî bû pêkenoka me. Ew bazirganekî ku dirhem bi ruhê wî bû û tirsonekê ecêb bû. Mirovekî gewez, spîçerm, çavşîn û zendbadayî bû. Berek hevrişim bi xwe re ji Esfehanê anîbû. Li ser bextê Alberto be, wî ew carekê li ser Yavuz dîtibû!

Di wan rojan de, min hemû kesên di xanê de nas kirin û serpêhatiyên wan bihîstin. Me tiştên ku nayên bawerkirin dibihîstin. Her du sê heb kom dibûn behsa ên mayî dikirin. Ehmoyê gawir carekê qala Topal Feqe Nûrî û Agapîto kir û sond xwar ku, Agapîto bazdide ser wî feqiyê kurmanç. Wî digot ku cotek goreyên rîs yan kulmek mewîj bide Seferşah, ewê Enîseyê bixe hemêza te<sup>2</sup>. Destê xwe li nan dida û digot:

- Bi vê nî`metê û bi vî te`amî min şevêk razana bi Enîseyê re himber tîzbiyekê bidest xist.

<sup>1</sup> Xortekî ji Parîsa Firansayê û berê wî li Hindistanê bû. Li gor gotina wî, wî dixwest ji bo qiralê mezin ê Firansayê Ludvîgê çaredmîn rêyên bazirganiyê ên nû nas bike û encama gera xwe wek kitêbekê bigihîne wî qiralê katolîk. Li ser kaxezên stûr nexşeyên qiralaçe, wilayet, mîrnuşîn, beglerbegî, sinceqbegî û derya û deryaçe, çem û cobar û gund û bajar dikişandin. Sindoqeke wî hebû tijî nexşe bûn. Wî digot ku, beriya ew ji Parîsê berê xwe bide şerqê, nexşeyê gerrokê firensî Sir John Chardin bi dest xistibû û têra xwe agahî anîne. Bi rastî jî ji yekî niştecihe wan waran bêtir der û dor û rê û rêçik û sînor nas dikirin. Min kitêba Sir John a bi navê **Voyages en Perse et aux Indes orientales** ku berî bîst û pênc salan li Leibzîgê bi wergera wê ya almanî bi navê: **Des Ritters Chardin Curieuse Persian und Ost-Indische Reise Beschreibung** derketibû, xwendibû. Tê bîra te Hans! carekê, dema te ew kitêb di destê min de dît, te gote min: here welatan bi çav û hestên xwe bibîne, ne li ser wan di kitêban de agahîyan bixwîne. Di kitêban de welat bê ruh in.

<sup>2</sup> Enîse di mala axayekî kal î çexan de cariyê bû. Axayê çexan carekê ew bi xulamê xwe re dîtibû û hatibû ku wê bikuje lê wê xwe filitandibû û reviya bû dêrekê. Ji wir jî bazda bû û xwe li xana Serferşah girtibû. Wî jî ew li xwe mehr kiribû, lê ji malheziya xwe ya zêde ew bi pereyan dixebitand. Beranber razaneke bi Enîseyê re, tîzbî, şal, cotek solên mûşî, yan hema kulmek tûtîn ba jî, distend. Min bi xwe sê qalib sabûnên helebî dane Serferşah û bi hêviya ku bi Enîseyê re razim. Ha îro wê dibînim, ha sibe wê dibînim, ez li ser agirê hêviyan dikizirandim wî berazê Seferşah. Ez ji xanê derketim ji min ew nedît.

Destê xwe davête berîka qutikê xwe û tizbiyeke reş î qetranî derdixist, dibû şeqşeqa wî û bi ken digot:

- Şeva din min tizbiya xwe jê dizî.

Lêvên xwe digeztin, çavên xwe nîvgirtinê digirtin û dinaliya:

- Aaax ax. Bes hûn çêja Enîseyê binasin, ne tizbiyekê tenê, hûnê salên temenê xwe hemûyî ji bo şevêkê bi wê horiyê re bikin tizbiyek û bidin Seferşah.

Çavê me bi Enîseyê nediketîn, lê Ehmo digot ku ew di hucreyeke biçûk de li pişt ya Seferşah dinive. Yanî ku yekî bixwesta wê bîbine divabû berê derbasî hucreya xwediyê xanê biba û ji wir derbasî koşka Enîseyê biba. Cihê wê wisa mîna kelayekê asê kiribû ku ne her kes bikaribe wê bibîne.

Mîna keriyê pez dema ku çav li gurekî dikeve û xwe dide ber hev, mirov jî di tengasiyan de nêzikî hev dibin. Bela, mirovan digihînin hev lê wî Seferşahî ew belaya berfê mîna fersendeke zêrîn dît ku êzingan bifroşe me. Di her xanekê de ocax û bixêrîk û êzing belaş bûn. Ew di nav kirêya her şeveke razanê de dihesibandin. Lê Seferşah her gurzek êzing bi du aqçeyan difirost û em jî mecbûrê wî û êzingên wî bûn. Ûsibê Kildiz teksîr nedikir, derengî şevê êzing dianîn li ber me rû dikirin, dikeniya û digot:

- Ma ne naznavê min Kildiz e! Hûn bixwazin ezê kilê li ser mijangên Enîseyê jî bidizim. Me fikir nedikir Ûsib cihê êzingan nedigote me, lê her digot:

- Niha êzingê we rihet têne ber we yan na? Hela we çî ji cihê wan e wey!

Rojekê ber êvarê, Seferşah em hemû vexwendin odeya xwe ya mezin. Fitar jî amade kiribû. Li ber dîwarên hundir kulavên ji hiriya mîhan û di nîvê odeyê de xaliyên esfehanî ku bi gulên rengîn ên laleyan neqîşandî bûn, raxistî bûn. Çend palgehên bi hiriye heşandî û rûyên wan ji etlesên kesk sipartibûn dîwaran û perdeyên ji dîbayê sor ê tarî bi ser pencereyan de hatibûn berdan û çend çirayên bi dîwaran ve li ser serê me ronîyeke xav û zerik diherikandin ser rûyên me. Li dîwarê bakur jî hin xencer û şûr hatibûn hilawêstin. Min dizanîbû ku li pişt vê odeya wî koşka Enîseyê ye. Min di xeyalê xwe de perde da alî û derbasî cem wê bûm û ketim ser zikê wê. Lê hebûna wê civatê û ewqase mêran rê li ber herikîna çemê xeyalê min î har girt. Çavên hemûyan li Seferşah bû û fena ku em li nêçîra kewan bin hemî bêdeng mabûn. Min bi xwe di dilê xwe de digot ku ewê niha behsa Yavuz û mele Zahir û bûyera mirina wan bike. Alberto jî wisa fikirî bû.

Dengê bapêça ku li derve dikire guvegûv gola bêdengiyê ku em noqî wê bûbûn û dawerivîbûn binê wê, şêlû dikir. Wî bayî mîna tiliyên mirîşoyekî tecrubedar kefenê tirseke spî li me hemûyan dipêça. Seferşah serê tayê axaftinê girte destê xwe û guloka xav veresand û bi ahengeke xemgîn û tirsîyayî got:

- Ev pêncî sal in min berfeke weha nedîtiye! Ev ne berf e wey! Xezebeke rebbanî ye ev ha.

Kêlîkekê bêhna xwe berda û di çavên me de li bersivan geriya, dema ku dît deng ji me derneket berdewam kir:

- Em asê bûne li vir. Min jî hûn civandine ku em çareyekê bibînin. Xan bi berfê hatiye dorpêçkirin. Heta ku çavê min dibirre girên berfê ne. Gur jî li dorê ne. Derketina nema dibe. Kes nikare bi hewara me jî were. Erd û ezman bûne berf. Niha divê em....

Gotina wî di devê wî de, yekî ser bi şaşıkeke mezin bi sê kesan re derbas bû<sup>1</sup>. Bêhneke tûj ku ez bawer im miskeke giran bû, berî wan derbasî odeyê bûbû. Bi derbasbûna xwe re bi dengekî bilind wî mêrê ser bi şaşık got:

- Qul ca-el heqqû we zeheq-el batil<sup>2</sup>.

Bi wê gotina xwe re şûrê xwe kişand û dewam kir:

<sup>1</sup> Navê wî Mucahid El-Ezdî bû. Ereba bû lê kesî nizanîbû çawa û kengî ew û wan hevalên xwe derbasî xanê bûne û ji ku hatine! Çavên wî kilkirî bûn û li her aliyekî serê wî yê bi şaşıkeke kitanê misrî pêçayî du guliyan reş xwe berdabûn ser milên wî yên pehn. Riya wî dirêj, çermê wî qemirî û dengê wî qebe bû.

<sup>2</sup> Bibêje ku, Rastî hat û nerastî têkçû! Ev ayeteke Quranê ye ku, li gor tefsîran, Xwedê têde fermana pêxember Muhemmed dike ku wisa bibêje.

- Kesên ne misilman, li rojavayî odeyê, û yên misilman li rojhilat bi cih bibin!  
Ew û her sê kesên bi wî re ketibûn devê derî, riya revê ji kesî re nemabû. Her kesek di cihê xwe de hate mîxkirin û çavên teva beloq bûn û li Seferşah nihêrîn. Ehmoyê Gawir xwe avête nêviyê berrekê û di binê qendîlekê de ku bi binbanê odeyê ve hilawestî bû sekinî û bi qerf, bi zimanekî erebî yê şikestî got:

- Ê min ne ez misilman im, ne jî ne misilman im.

Û wek dînan kenîya.

Yekî ji wan hersêyên bi Mucahidê ereb re, ku li aliyê wî yê rastê bû, qamçiyek ji ber newqa xwe kişand û veweşande nav rûyê Ehmo û gotê:

- Dema tu bi Imamê me re biaxivî, bêedebîyan neke.

Yê li aliyê çepê jî cinihekî sertopikî rakir û li nav milên Ehmo da. Ehmo tavi lê ji hiş çû û weke meytekî li erdê ramediya! Kesê sêyem bi destekî wî girt û ew bi dû xwe de circirand û derxiste derve û vegeriya hundir.

Em behetîn û tirsîyan. Me li rûyê hev nihêrî û nema zanîbû çî bibêjin. Mirina Yavuz, ew berfa sosret û mirina mele Zahir û niha jî ev belaya han! Gelo xewn e em dibînin! Ew ji ku hatine, û doza wan çiye? Van pirsan mîna çivîkên ji ber baranê bazdayî xwe li pencereyên xeyalên me xistin. Wa diyar bû ku dengê firefira baskên çivîkên xeyalê me çû guhê Seferşahê ku ew jî wek me veciniqî bû. Ew ji cihê xwe rabû û ber bi wan ve çû û got:

- Hûn kî ne û çî dixwazin?

Mucahid bi zirzî bersiv da û got:

- Niha fermanê pêk bînin, paşê eger min destûr da we pirsan bikin.

Tûjbûna awirên wî û hevalên wî hundirê wan dida xuyakirin. Diyar bû ku ew ne rêbirr û diz in, ne jî qorsan in û ne doza zêr û pereyan dikin. Ew doza îmanê li me dikin. Dixwazin bizanibin ka kî bi kê û bi çî bawer e. Ez tirsîyam, em hemû tirsîyan. Ma kî ji şûrên kişiyayî natirse? Ji bêgavî me fermanên wî bi cih anîn û civat li gor ola her kesekî, bû du beş: şerq û xerb, misilman û nemisilman, çê û neçê, bawermend û gawir!! Û di ser serê me hemûyan re şûrên tazî yên Rastiya tazî hatibûn kişandin û di nav me de xwarina fîtarê li ser sifreya sor!

Ez dudilî bûm! Gelo tev li kîjan refî bibim? Ez jî mîna Ehmo bibêjim, dê cinihekî li nav serê min jî bidin. Ez herim alî nemisilmanan, ku راستiya min e, dibe ku belayekî mezin li pêşiya me kesên nemisilman be! Xwe bidim aliyê misilmanan, dê hevalên min çî navî li min bikin? Dê nebêjin tirsê hişt ku Martîn ji dîn derkeve! Ew bi halê min û misilmanbûna min a li Helebê nizanin. Ew nizanin ku kaxezeke mohrkirî di berîka min de heye ez li gor wê misilman im û navê min tede Muradeddîn e. Walî û qadî û şêxul-islamê Helebê û dwazde şahidan imzeyên xwe li bin wê kaxezê danîbûn. Ew ji bo min ê rêya xelasê be. Dikare rêya mirinê be jî. Ku xwe bidim aliyê hevalên xwe ên ewropî ji xwe dibe ku hukmê murtedan li min bibirrin! Murted ew kesê ku ji islamê derdikeve. Cezayê wî jî serbirrîna bi şûr e. Sê rojan firsetê didinê, navê vê firsetê dikin Istitabe yanî tobexwestin. Ku li dîn vegeriya ji xwe difilite, yan na serê wî dibirrin!

Ji avjeniya di gola dudiliyê de divabû ez zuha derkevim. Min hew dît ku min xwe daye alî misilmanan û di navbera Ûsibê Kildiz û Sultanî yê şair<sup>1</sup> de cihê xwe girtiye! Çavên hevalên min ên fille bûne tas û devê wan bûne das.

Fexriyê Şengalî <sup>1</sup> jî mîna min heyirî xuya dikir. Bêhnekê xwe da aliyê misilmanan û li rex Topal Feqe Nûrî rawestiya, lê paşê xwe da tengala Eframê suryanî<sup>2</sup> û bi hêdîka destê xwe ê rastê di ser simêlên xwe ên reş re bir û anî.

<sup>1</sup> Kurdekî nîvkor î ji Makuyê bû. Kumeî reş î mûyê bizinan tim li serî bû. Qesîdeyên bi zimanê farisî û kurdî dinivîsandin. Agahiyên wî ên li ser kitêbên kêmpeyda gelek bûn. Ji Makuyê hatibû ku berê xwe bide Qostantinopelê û qesîdeya xwe bixwîne ku li ser sultanê osmanî bi farisî nivîsîbû û di beyta dawî de gotibû:

Qewl û eş`arhayî Sultan xakî ne`lî padişah

Malikî iqlîmiha û sahibî zerrînkulah.

Ew zêde ji xwe razî bû û edebfiroş bû. Digot kî zêde diravan bide ez qesîdeyaqn di pesnê wî de dinivîsim.

Mîna ku ew civat were werbêj kirin, çend deqe derbas nebûn heta du beş hatin saz kirin. Erê! Wan her sê şûrên hildayî civat werbêj kirin. Mîna ku pîrejinek genim werbêj bike û zîwanê ji nav daneyên genim cuda bike li me hat. Kî zîwan e kî genim? Helbet kes ji baweriyên xwe re nabêje zîwan. Her kesek xwe û ola xwe, nijada xwe û pêxember û rêberê xwe û xwe bi xwe jî genimê pak dibîne û ol û nijadên din zîwana reş dibîne.

Hevalên min ên fille ên ku çavên wan tasikî bûbûn, hemûyan li min nihêrîn û devên wan ji hev man! Tenê Williamê ingilîz<sup>3</sup> awirên xwe berdabûn şûr û xencerên bi dîwêr ve hilawêstî. Mucahidê çav bi kil, stûnên konê bêdengiya ku li ser me hemûyan hatibû vegirtin kişandin û bi zirzî gote koma kesên nemisilman:

- Hûn ên gawir du rê li ber we hene, yan misilmanbûn û yan jî serbirrîn!

Fexriyê Şengalî xwe da pêş û got:

- Navê gawiran li me neke, em xwedan ol in!
- Ola te çi ye?
- Ez êzdî me.
- Êzdiyên şeytanperest û....

Topal Feqe Nûrî rê neda Mucahidê ku hevalê wî digotinê imam, û got:

- Riya sisiyan Cizye ye!<sup>4</sup> Ew jî .....

Yekî ji wan herdu hevalên Mucahid, rimê xwe ê dwazde movikî dirêjî Topal Feqe Nûrî kir û serê tûj hinekî di newqa wî rakir û gotê:

- Imam diaxive, ew ji min û te qenctir dizane. Bêedebîyan neke.

Di nav wê qîl û qalê re, Ehmoyê gawir û yekî din<sup>5</sup> pê re bû, ji nişkêve xwe mîna du gurên birçî dan derî.

\*\*\*

Seet heftê êvarê ye. Taqeta min û nivîsandinê nema. Ezê zû herim nav nivînên xwe. Wê sibehê careke din min ji xew rakin û bihêlin ku ez bi zorê nîmêja fecrê bikim. Nîmêja fecrê jî yanî a sibehê berî ku roj hilê, ku ew jî nîmêja yekem e ji pênc nîmêjen di rojekê de! Êdî dê li ser defterek din binivîsim. Ka binêrim kîjan şêwe dê minasibî deftera dawî be! Ezê du sê rojê din ji Bedlîsê bidim rê. Bi karwanê hevrişimê ku îro ji Erzerûmê gihişt re ezê berê xwe bidim Diyarbekirê.

Bedlîs. Dawiya adarê. 1708

.

<sup>1</sup> Fexrî celeb bû. Ji bo begekî êzdiyan hatibû keriyk pez ji koçerên Serhedê bikire. Simêlên wî reş û dirêj ku devê wî vedişartin bûn. Bejna wî dirêj, cilên wî spî û dev li ken bû. Ehmoyê gawir ew gelekî dilteng dikir. Bi kevirekî xeleekek li dora wî dikêşa û ew di wir de hêsîr dikir. Heta ku ew xelek nehatiba xerakirin, ew her têde dima!

<sup>2</sup> Xortekî ji Mêrdînê bû. Ew tercumanê Williamê ingilîz bû. Bi navê Eframê drogman jî dihate nasîn. Karê wergêriyê, li Levantê, di destê suryan û marûniyan û hin cihûyan de ye. Wan gelek sûd ji qanûnên osmaniyan ên derbarî biyaniyên li welatê osmaniyan dijîn, didîtin. Hema hema ew jî mîna hemwelatîyên rojavayê tene hijmartin.

<sup>3</sup> Ew di sala ku London têde ketibû ber xezeba agirekî bêîman de jidayik bûbû. Yanî derdora çil yan çil û yeksalî bû. Roja ku Brîtanîyaya mezin berî heşt mehan hatibû damezrandin û qiralejin Annayê taca Ingiltere û Skotlandayê dabû serê xwe, wî ji kenarê başûr ên Brîtanîya berê xwe dabû şerqê. Di rêya gerrok û bazirganan re me agahiyên wisa mezin nas dikirin. Dunya biçûk e Hans, di çend mehan de yan jî eger pir dirêj bike di nava salekê de bûyerên ku li welatên dûr dicirin li her derê belav dibin.

<sup>4</sup> Cizye: pereyên ku hemwelatîyên nemisilman didin dewletê! Ji zengînan re salê 48 dirhem, yanî mehê 4 dirhem, ji kesên navîn re salê 24 dirhem û ji xizanan re 12 dirhem. Ji jin û zarok û pîr û kal û rahib û nexweşan nayê stendin.

<sup>5</sup> Yekî cihû bû. Navê wî Danyalê Terzîzade bû.

Ruha, roja şemiyê. Pêncê gulanê. 1708

Dora mehekê riya me ji Bedlîsê heta vî bajarê ku navê wî Ruhaye dirêj kir. Em di gelek xan û bajaran re derbas bûn ku min navê piraniya wan nizanibû û nebihîstibû jî. Şopa buharê li her derê bû; kaniyên teqiyayî, çemên herikî, xaliyên rengîn ji gul û kulîlkan, darên guhîjan bi kulîlkên xwe ên spî, dawa kesk a çîyan, xuşexuşa rûbarên li ser riyan û ezmanê sayî û şîn î mişt teyrik. Dîmenekî ji cennetê bûn. Ez di dirêjiya rê de, mîna dema ku ji Helebê reviyam, bi tenê bûm û min ji xwe re bêdeng li wan dîmenan temaşe dikir. Êvaran jî min hema li ezmanê bi hezaran stêrik xemilî bû dinêrî. Min xwe ji her kesî vedigirt û bi tenê dimam û ji xwe re defetrên xwe ên berê rast dikirin û jêrenotên nû lê zêde dikirin. Ku ez mecbûrî axaftinê nebama nediaxivîm. Zimanê min di axaftinê de diêşiya, giran dibû û peyv di devê min de bêwate dibûn û min ji ber xwe şerm dikir. Min di xwe re nedidît binivîsim. Hîn jî ji nivîsandinê bêzar im lê divê van bûyer û bîranînan biqedînim ku rihet bibim. Sibehê zû ji vir emê berê xwe bidin bendera Iskenderûnê. Min dixwest behsa her bajar û gundekî ku têre derbas dibim bikim, lê him ew karekî zor e û him jî min di destpêkê de gotibû ku ezê behsa der û doran nekim bi qasî ku dê behsa hundirê xwe bikim, behsa êşa giyanê xwe û jana xwe ya hundirîn bikim. Vaye ez li Ruhayê me jî. Ez li vî bajarê ku dibêjin ew cih û warê bavê pêximberan Ibrahîm e me jî lê ez naxwazim bibêjim yan bizanibim ka kî lê dihêwire, çî lê tê kirîn û firotin, çî cûre dar û meywe lê hene, navê çem û çiya û çolên wê çî ne, mizgeftên wê çend in û dêrên wê ên kîjan mezheban in, çî millet lê dimînin û kîjan ziman lê tên bikaranîn. Ez du rojan li karqabserayekê li Diyarbekirê me. Li rex çemê Dicle bi seetan bi tenê meşiyam lê nehate bîra min ku behsa wî bajarî bikim.

Ezê rabim karê xwe bikim, alavên xwe bidim hev ku sibe bi derketinê re tiştêkî li dû xwe nehêlim.

\*\*\*



## Seet heft

*Şeş ringînîyên bi lez û li pey hev ji jama dêrê hatin û bêhnvedanek derbas bû heta ku ringîniya heftan jî hat<sup>1</sup>. Bi ringîniya heftan re, xwendevanê ilahiyatê deftera duyem ku nameyên dirêj ji kesekî bi navê Hans re bûn û ji deftera berî xwe biçûktir bû bi dawî anî û li kêleka xwe danî. Mijê jî her tevna xwe ya xav û xunavî dihûna û tîrtir dibû. Xewê bi perîka xwe ya sihirbaz tîpên hevrişimîn li ser çavên wî nivîsîn. Wî balîfa xwe rast kir û çû perde hinekî da alî û li derve nihêrî. Di pencereyê re hew tişteke xuyabû. Perdeya mexmer î sorê tarî berda, û dîsa vegeriya cihê xwe û ji tûrikê xwe qetek nan derxist, hinek penîr û sêvek li ber xwe danî û dest bi xwarinê kir. Xewa wî bi wê xwarinê re firiya. Kêlîkek derbas bû dakete jêr. Bar vala û bêdeng bû. Tevan berê xwe dabû dêrê ji bo nimêja êvarê. Tenê pîrê û pisîka xwe li ser kursiyê li ber agirdankê di xew re çûbûn û mîna ku agir jî di xew re çûbe nema xuyabû. Ariyeke ku di nav de hin pêtên veketî car caran xuyadibûn di agirdankê de bû. Wî ji surahiyeke li ser maseyekê hinek av vexwar û çavek li tabloya ku wî ressamî îro pê de dikişand xist. Wî ressamî bircê dêrê gelekî ciwan, lê bê naqos, çekiribû. Xwendevanê ilahiyatê peyalek meya sor ji xwe re dagirt û xwest hinekî li jêr bêhna xwe vede lê pêjna xelkê kir ku ji dêrê vedigerin. Peyala xwe rakir û hilkişîya jor. Derbasî odeya xwe bû û tavilê mûmekedîn li ber serê xwe vexist û deftera sêyem, ku rûpelên wê hindik bûn, rakir û dest bi xwendinê kir:*

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Nimêjkerên ku berî seetekê derbasî dêrê bûbûn hemî ji rêwîxaneyê hatibûn. Kemanjenek, ressamek û hin kesên din bûn. Keşîş waaza xwe ya ku bûbû hezar car dubare dîke, dîsa dubare kiribû û ava pîroz li beşdaran reşandibû û hatibû li hal û demên wan pirsibû û derdora seetekê li gel wan suhbet kiribû. Karl û Georg jî li kursiyekî dawîya hêwanê rûniştibûn. Êdî ew li hev hatibûn û Georg hinekî aram bûbû. Lê dilê Karl neketibû cih û ji wê kêrê tirsibû. Her carê di nav waaza keşîşê li newqa Georg dinerî. Ku nimêjker belavbûbûn, keşîş hatibû û li ba Karl û Georg rawestibû. Wek ku heft kes jêre bibêjin ev herdu kes ne li hev in, gotibû wan: hûn dibînin bê çawa mij û tarî alîkariya hevdû dîkin û nahêlin ku yek pêşîya xwe yan derûdora xwe bibîne! Hûn dibînin çawa tarîti li dijî ronahiyê her û her di şer de ye? Şeytan jî wisa ye. Dikeve navbera te û xwedê, dikeve navbera te û birayê te yê bawermend, dikeve navbera te û rêya rast û nahêle tu keviyê din ê rûbarê rastiya xwedê bibîn. Mirov bi birayê xwe yê bawermend re li hev be, bi xwedayê xwe re jî li hev e û nahêle ku ew Iblîsê lanetlêbarî bikeve navê. Nehêlin şeytan bikeve navbera we. Ji hev hez bikin daku xwedayê we jî ji we hez bike. Û piştî vê kurtewaza xwe, keşîşê rûnêrm piştî xwe dabû wan û çûbû mala xwe. Karl ji xwe re li laşê Georg î nerm nerî bû û jê pirsî bû: tu wê seetê bi kû de çûbûyî? Dilê Georg tijî kîn bû lê newêrek bû. Nikaribû bi karl re rû bi rû bibe û li ber wî rabe. Jê ditirsiya. Du kêrên tûj di ber piştana wî ya hevrişim de bûn lê dilê wî ko bû. Rûyê wî zer bûbû û deng jê nedihat. Karl ew bêdengî mîna xeyd û engirînê fêm kiribû loma jî li ber geriyabû û gotibûyê ku ewê perê wî bidîyê. Hinek pere dabûnê jî û pê Georg bi yekcarî sist kiribû. Karl xwestibû mêzerê wî ji wî bike û hema li hêwana dêrê ku vala bûbû destê xwe dirêjî navbenda wî a hevrişim kiribû û li ber şewqeke xav a mûman girêka wê vekiribû. Dema ku navbenda yekgirêkî vebûbû du kêr ji ber şemitîbûn û ketibûn erdê. Dengê herdu kêran Karl vecinîqandibû. Tavilê ew kêr rakiribûn û pirsibû ku ew çima pê re ne? Devê Georg ketibû hev û nizanîbû çî bersivê bide. Deqeyek bêdengî derbas bûbû û paşê bi lez xwarî wan bûbû û mîna ku derewa xwe berê hazir kiribe gotibû: Min li ber rêwîxaneyê Zur Kurve li erdê dîtine. Û ji bo ku Karl zêde nekeve pey wî û pey raza wan herdu kêran, Georg rabûbû bi xwe mêzerê xwe ji ser xwe şeqitandibû û destê xwe avêtibû navşeqên Karlê jamkut û herduyan hevdû ber bi zêrêmînê ve biribûn. Bi seet heft re dîsa herduyan cilên xwe li xwe kiribûn û derketibûn jor û bi hev re werîsê jamê heft caran kişandibûn.

Ez lal bûme! Erê lal! Ne lalekî mecazî lê yekî rastîn. Ji lalbûnê wêdetir ev zimanpûçbûn e. Yanî zimanê min nema tev digere, nema dilebite. Nema dikarim peyvan ji devê xwe derînim. Tenê deng ji min tên. Ji zengeloka min derdikevin ev deng. Dengin ku bawer dikim nayên fêmkirin. Ev bûbûn çend meh ku ji wê xana seyr reviyabûm û êdî zimanê min roj bi roj giran dibû. Rêya min heta ku ez gihame vê benderê gelekî dirêj bû. Min ê behsa wê rêyê bikira lê derdê vî zimanê min daye ser her derdî. Destpêkê min ev yek nekire kulek ji bo xwe, lê hêdî hêdî ez pê hisiyam ku êdî berê min li labûnê ye. Niha jî lal im. Loma jî ez xwe dûrî hevalan dikim, xwe dûrî wan kesên ku xwe amade dikin du rojên din ji vê bendera ez duh gihamê bidin rê, dikim. Ez naxwazim lalbûna xwe ji tu kesî re diyar bikim. Ezê binivîsim da ku bûyerên jiyana xwe ya li wê xana seyr winda nebin. Ez dizanim ku dê nikaribim bi devkî wan bûyeran vebêjim. Wê ev defter devê min bin. Wê ev xame zimanê min be.

Ez duh ghiştîm. Riya ku ez tere hatim gelekî nexweş bû. Min nexwest ez di Helebê re werim. Ez niha nêzîkî Helebê me. Qonaxa du rojan nêzîk im. Xwezî min karibaya biçûma xatir ji wan kolanên ziravik bixwesta. Min ji kevirên wê, ji xaniyê Alberto, ji taxa Kewserê, ji mala Hewaayê, ji sûka sergirtî û ji siya meşrebiyên ku diherikî erda kolanên teng û tarî û ji çemê Quwêq ê ku ruh û cendekê Kewserê di nav pêlên wî de ye jî xatir bixwesta û bihatima. Aax xwezî! Lê êdî ez ji Helebê ditirsim. Giyanê Kewserê li wir niha mîna kevokeke spî hêlan dike. Eger ku ez di wir re derbas bûbama, ew giyanê pak ê bûbaya bazekî penctûj û kezeba min qul bikira. Min newêribû xwe bidim alî wî şarê ku bûbû şahidê evîneke têkçûyî û giyanekî gunehkar û jiyanekê bê hedar. Dê gunehên min ên ku min li wî şarî kiribûn bihatana pêrgîna min û mîna dêwan bi dawa min bigirtana. Ez ji bêgavî di ser Helebê re di riya Entabê re hatim vê benderê. Bi ghiştina min a Iskenderûnê re ez bi yekcarî lal bûm. Êdî ez piştî xwe didim vî welatî, vê şerqê û wê jiyana xwe ya tevlihev. Ez lal piştî xwe didim welatê misilmanan û berê xwe didim cih û warê xwe. Ruh derizî, dilşikestî, serlêgeriyayî û berîkvala ez berê xwe didim welatê xwe ê berê. Neh sal ji temenê min bûne qurbana lêgerîna leylana bextewerîyê. Neh sal ji leylanê, ji biriqandineke sexte re ku dawiyê min nas kir. Lê çi heyf! Tu dereng fêm bikî mîna ku te fêm nekiribe.

Ez bawer im ku wê xanê, wê xana di berfê de windabûyî û bûyerên ku tê de hatin serê min û kesên lê bicih bûbûn, tirseke nasayî berdabûn hinavê min, tirseke ku bû kabûsek û xewa şevan li min herimand. Tirseke di dirûvê şerekî bîrsî de ye ku çavên xifşa xezalekê li wî dikevin. Şêr li ber wê tîrsa min heywanekî kedî, pisîkekî malan û qeşmerekî rû bi mask e.

Di rojê yekşemê de ji meha hezîranê çêbûbûm. Rojê ku zengilên dêrê ji bo ku ez rihet ji diya xwe re bibim û bi hêsanî werim ser rûyê vê cîhanê, berdewam dikirin ringînî. Rojê ne mîna îroj germ bû. Ew roj bi ba û baran bû, şilî û şepelî bû. Lê îroj! Bayekî hênîk î bi ser germ ve ji hêla deryayê tê û qîjeqîja qaqlîbazan e. Bîna pêlên şor difûre. Ewrin spî jî sînga ezmanê şîn mîna qazên gewre dixemilînin. Bûye pênc meh ku ez ji wê xanê reviyame, ji nav pencên mirina reş filitîme û careke din ji dayik bûme. Lê hêjî pê dihesim ku garanek gur li pê min digerin û nigên min di berfê de asê bûne. Hêjî di xewnên xwe de xwîne dibînim, serên firiyayî li ser daran mîna meyweyan dibînim û nema bawer dikim ku careke din bayê Herne bikeve pişikên min.

Ezê binivîsim. Ezê wan bûyerên seyr û awayê reva xwe ya ji xanê binivîsim. Berî ku bigihêim welatê xwe divê min deftera sisiyan jî dagirtibe. Ku vegotina nivîskî a bûyernê tamam nebe jî, ezê ên mayî bi devkî ji Hans û kesên gundê xwe re vebêjim. Heta ku ez lal bimim jî, ezê bi

---

<sup>1</sup> Ev bendera ku ev bûne du roj ez gihamê, qet bi min xweş nehat. Ji ber bilindiya çiyayên ku wê dorpêç dikin tava rojê nadiyê. Niha jî, di gel ku havîn e seqemekê xwe li hestiyên min girtiye ku berfa wê xanê tîne bîra min. Berê min êdî li rojava ye. Hindik maye hêsir ji çavên min biherikin. Dibêjî qey hinek vî dilê min di kulma destê xwe de diguvêşin.

îmayê vebêjim. Divê vebêjim. Divê wî kevirî ji ser sînga xwe deynim. Perîk nema di ber min re qîm dikin! Min deh perîkên serteraşkirî li gel xwe anîne<sup>1</sup>. Berê, min bi qelemên zilê dinivîsî. Lê vê dawiyê min dît ku perîk qencir in. Him sivik in him jî xetên ku bi wan tînin nivîsîn ciwantir in. Ew ne mîna qelemên zilê ne û hibrê pîr venaxun. Hibra wan diherike ser van rûpelên spî û dibe gotin, dibe hevok û serpêhatiyên kesnedîtî.

\*\*\*

Kêlîka ku Ehmoyê gawir û Danyalê Terzîzade ê cihû xwe dane derî, gotin ku gur li derveyî xanê ne û ne dût e werin hundirê xanê. Tirseke bêpayan konên dehstûnî li ser rûyê Mucahid û hevalên wî ên qutifî û bizdiyayî vegirtin. Em jî di cihên xwe de sar bûn. Li derve gur û li hundir jî ev guremirov! Em berê xwe bi kû ve bikin? William hatina Ehmo û Danyal a ji nişkêve fersendeke baş dît û xwe bi lez zer kire şûrekî kalanzer î bi dîwêr ve hilawêstî û bi leza birûskeke tavên buharê li himberî Mucahid rawestiya û doza daberizînê lê kir.

Kurtedemeke kin em hemî bêdeng man. Nola ku em di huzûra mirinekê de bin deng nema ji kesî hat. Me bi hev re li devê Mucahid nihêrî ka dê çi bibêje! Wî em gelekî bi hêviya xwe ve nehiştin. Berê xwe da William û bi dengekî berz bi erebî jêre got:

- Felnetebarez bissuyû<sup>2</sup>.

Ehmo hê jî di devê derî de bû gava ku Mucahid ew dehfand û derkete derve û hevalên wî dane pey wî.

Derketina Mucahid û hevalên wî ji hundur bû fersendek ku her kesek xwe amade bike. Hinan xencer, hinekan şûr û qame, hinekan jî tevr û balte û hindekan jî rim rakirin û me yek li pey yekî da pey wan. Gava ku em ji derî derçûn çavên me bi kesekî neketin. Me nizanîbû ew bi kîjan awayî beta bûbûn û ji ber çavên me nebedî bûbûn! Ji nişkêve Ehmo şûr ji destê William revand, li ba kir û çû ode bi ode li Mucahid û hevalên wî geriya. Mucahid doza daberizînê li william kiribû û xwe dabû alî! Me ew yeka han fêr nekiribû.

Em hemû li derve bûn. Di nav wê seqemê û barîna tund ya berfê de bûn û me dengê zûrîna û xirtepirta gurên li derûdora xanê dikir. Me carekê dît Ehmo kete odeyekê û derneket. Şingeşinga şûran hate guhê me û dawî orîniyek û qêrîna mirovekî ku tê gurandin hat. Kurtebêhnek derbas bû em hemî bêdeng bûn û me bi çavên yekûdu de nihêrî. Me dizanîbû ku yek di hundir de serjêbû lê kîye me nizanîbû. Dîtin me dît deriyê odeyê vebû û seriyek jê pekiya û bi alî me de gindirî heta ku hat û li nêzîkî me rawestiya. Hîn xwîn ji rehan dibeliqî û kelexekeke spî bi ser wê xwîna sor î erxewanî ya rijiyayî de ketibû. Xwînê kef dida! Serê Ehmo bû ew ku xwîn ji rehên stûyê wî diherikî. Ehmoyê ku berî kêlîkekê mîna pilingekî dehlan xwe zer kiribû William û şûr ji destê wî derxistibû û êrîşî Mucahid û hevalên wî kiribû. Wê katê, wê kata ku min ew serê Ehmo yê ku gindirîbû ber piyên me dît, ez pê hisiyam ku rehek di koka zimanê min de qetiya. Bi rastî jî heta seetekê nema deng ji min hat. Min digot qey êdî zimanê min bi ezmanê devê min ve hatiye dirûtin. Giran bûbû û nema diliviya.

Pîreboka pîrs û tîrsê konekî xav û xeniqî bi ser rûyê William ê westiyayî de wergirt. Lê wî tavilê xwe ji nava wî konê mîna kefenekî nedîtî kişand û mîna keşeyekî qurre qêriya. Qirika xwe dirêj kir û got:

<sup>1</sup> Min ku dît qelema min î ji zilê tiliyên min diêşîne, min ew avêt û ji xwe re deh perîk peyda kirin. Du perîk ji wan ên qazên wanî ên spî ne. Qazên derdora gola Wanê bi perîkên xwe ên xurt navdar in. Yek jî ya qijikekê ye. Du perîk ên bazê mîrekî kurdên Bedlîsê ne, perîkek a tawusan e, perîkek a elokekî ye û yek a kundekî ye, du perîkên mayî jî ên balindeyekî nenas in ku werraqekî di karwanê vegeerê de berî em bigihin Entabê bi rojekê ew diyarî min kirin û got ku wî herdu ji tacîrekî Smîrnayê kirîbûn. Hemû perîk jî ên baskê çepê ne. Eger xettat bi xwe çep be, perîkên baskê rastê bikartîne. Divê perîkên nivîsandinê jî di dema buharê de ji baskan werin hilkirin. Piştî ku serê perîkê tê birrîn, qelşekê di nêvî de saz dikin da ku murekkeb neherike û di serê perîkê de bimîne ku bêtir pê bê nivîsandin. Misilman dibêjin ku dema Xwedê yekem qelem afirand, awirek tê veda, îcar qelem di serê xwe de ji heybeta Xwedê qelişî!! Di Qurana wan de sûreyek bi navê El Qelem heye Xwedê tê de bi qelemê sond dixwe!

<sup>2</sup> De ka em bi şûran daberizin hev.

- Binêrin! Ev ezmûna ezmên e. Rebbê me rabûye karîna me raberî me dike û baweriya me imtihan dike. Kî bi Mesîh bawer e, ba were xwe bide aliyê min.

Dîsa werbêjkin! Dîs veqetandina mirovan ji hev! Dîsa dubendî û nakokî! Dîsa şerê rastiyan li himber rastiyan! Îvanê dîl û Agapîto li cihê xwe man lê filleyên mayî; Fîlîpê firencî û Evdîlmesîhê helebî û ên din tevde tev li William bûn. Tavilê Îvan û Agapîto jî dane pey wan. Hinekan jî berê xwe dane cihê Mucahid! Ew ên misilman bûn. Topal Feqe Nûrî û Egelî Murad, Seferşah û kurê xwe û misilmanên mayî. Dîsa ez dudilî bûm. Dîsa ez li wê navê û di nava wê bahoza rastiyan a bêdeng de û di nav qûma baweriyên de mam. Berî niha ji tîrsa mirinê min xwe dabû rex misilmanan. Niha ez çi bikim? Ez kî me? Çima wisa heyirî me? Çima tîrsonek im? Çima newêrim û nikarim biryarekê bistînim? Rastî li kîjan aliyê min dikeve? Berê xwe bidim rastê yan çepê! Pîrsan di mejiyê min de dikirin pingînî. Lê min got na! Ez ez im û ne aliyê tu rexî me. Ez alîgirê aqilê xwe me. Hevalbendê bîr û boçûnên xwe me. Ney ji van im ney ji wan im! Ez peyrewê rastiya xwe me.

Eframê suryanî û Fexriyê êzîdî jî hinekî heyirî bûn. Gavekê ber bi William de diçûn û yekê jî bi şûnde. Danyalê Terzîzade guliyên xwe ên ziravik mis dan û hinekî bêdeng li erdê nihêrî. Alberto jî di serî de got ka emê xwe bidin alî William lê min qebûl nekir û got:

- tu dikarî tev lê bibî lê ez na!

Gava ku wî dît ez xwe nadim ser herdu aliyan jî, ew jî sist bû. Em bûne sê beş. Sê komên ku her yek li ser hêka rastiye kurk rûniştîye. Her yek xwe maka ku rastî zaye dibîne. Her yek di dilê xwe de rênasê riya bexteweriyê ye ku mirovan digihîne ber destên Xwedê û keviyên jiyaneke bextewer û ebedî!

Koma me, koma ku em ne ji van û ne ji wan bûn, berê xwe da odeya ku ez û Alberto lê dihêwirîn. Komeke tevlihev û hevnegirtî weke ewrên sibatê û xirqeya li ser milê evdalekî xwedê bû. Fille, cihû, misilman, êzdî û gawirekî Hindistanê jî di nav de bûn. Em bûne şahidê rastiya şet û dîn li wê xanê. Me dît bê çawa termê Ehmo ji guran re avêtin. Li ber çavên me Topal Feqe Nûrî û Êsibê kildiz laşê bê serî ê Ehmo gawir ji ser banê xanê avêtin derve. Qeflek gurên birçî li wê derdorê bûn bîna terman dikirin. Me di pencereyan re dinihêrî. Me dît bê çawa wan guran xwe avêtin termê Ehmo û ew zîvarzîvarî kirin. Me dil û gurçik û kezeba wî di devê wan dirindeyan de dît. Gurên devbixwîn yên ku Ehmo xwarin û hinekî têr bûn, bela xwe ji xanê vekirin û dûrketin.

Du rojan deng ji kesî nema dihat. Her yek bi rastiya xwe mijûl bûbû mîna ku gurek bi nêçîra xwe mijûl bibe. Her yekî yan her komekê ji me kêra rastiya xwe tûj dikir da ku serê nerastiyan bigurîne. Em yekcaran li derve di bin barîna berfê de rastî hev dihatin û her yekî hewl dida ku hevalê xwe bi riya xwe ya rast bide bawerkirin. Tenê Mucahid û hevalên xwe ji odeya xwe dervediketin. Lê Seferşah xwarina wan, ava wan, êzingên wan jî dibirin ber deriyê wan. Berf jî her dibariya. Êdî bilind bûbû û heta derabzînan hatibû. Bayê kurr î ku êvaran radibû rûyekî ji qeşayê digirte ser berfê û ew dikir mîna tehtekî yeker î spî. Nema mele Zahir xuyadibû û nema tu kesî jî lê dipirsî. Min û Alberto jî me nema qala Yavuzê çortanxur kir. Me nema li aliyê deriyê odeya wî jî dinihêrî. Me ne ku ew ji bîrkiribû, lê bûyerên seyr ên ku li pey hev bi ser me de mîna kabûsan peya dibûn, her tişt ji bîra me biribû. Me encereyên biçûk ên di odeya xwe de ku ji bilî berfê tişteki din şanî me nedikirin, bi balîfan girtin ku gur têre neyên me.

Ew çi berf û serma bû! Kuxtekuxta gelean ji me bû. Bi hev re dikuxuyan! Weke dengbêjên kurmancan li hev vedigerandin wan kuxukên ku dikira zengelok biqetandana. Erê baweriyên me ji hev cuda bûbûn, lê berfê û wê sermaya nedîtî em di kuxukeke şeytanî de gihandibûn hev. Kuxuka me yek, tîrsa me ya ji berfê û mirinê yek, lê baweriyên me cuda!

Qîreqîra William bû, xwe tehl û tirş dikir, nav di xwe dida, xaçên ji paçên spî bi cilên xwe û hevalên xwe ve didirûtin û mîna ku xwe ji cengeke giran re amade bikin, mîna ku mîrekî dema berê ye û berê wî li Qudsê be himehima wî bû û ew dihêvotin. Geh qêrîn û geh himehimeke watenenas û yekcaran jî şingeşinga şûrên kişandî hevrişimê bêdengiya berfa wê xana naletlêbarî diçirand.

Em jî, em koma ku ne ji van û ne ji wan bûn li dora hev dizîvirîn û me nizanîbû emê bi ku de herin. Hin ji me ditirsiyan û dixwestin bikevin bin siya aliyekî ji wan herdu aliyan. Em dudilî bûn û dudilî man heta ku bû seet heftê sibehê ji roja sisêyan piştî kuştina Ehmo. Wê sibehê Eframê suryanî bi helkehelk bang li me hemûyan kir. Em di rex hev de mîna tîrên di tîrdanka siwarekî de yan beştên sipartî dîwarekî razayîbûn. Bi dengê Eframê lerizî re, bi wê qêrîna mişt tirs re em ji cihên xwe çeng bûn û ji pê sekinîn. Eframê suryanî bi dengê quto quto û bêhnçikiyayî got:

- Mêrikê ereb û hevalên xwe dikin destê Ûsibê Kildiz bibirrin!

\*\*\*

Bendera Iskenderûnê, Sêşem 29 ê hezîranê. 1708

Seet bûye heftê sibehê. Ez li ser pişta gemiyeke holendiyan im û li roniya rojê ya ku mîna hûrikên zêrî bi ser desmaleke etlesê şîn de birijîn dibiriqê dinêrim. Gemî hîn li bendera Iskenderûnê ye û bi werîsan bi qurmên daran ve li benderê girêdayî ye. Waye deryavan gemiyê ji bejayê rizgar dikin û werîsan vedikin. Hêdî hêdî perdegemiyên bilind dikin. Çar qat perdegemî hene. Ew perdeyên vê gemiya mezin ên mîna baskên Enqayê bi rabûna bayekî nerm re dinepixin<sup>1</sup>. Bi dehan gemî hene dikin bidin rê û hin jî nû digihîjin benderê. Hin jî ji dûr ve di kêrhiya deryayê de mîna teyrikên masîxur li ser rûyê pêlên ku ronî têde dişikê xuya dikin. Hindik maye gemîya me ya ku bi her cûre mal barkirî ye bide rê û ez ji vê şerqê, ji vê herqê, ji vê janê, ji vê gerra li valahiyê û bexteweriyeke sexte û ji vê xewna dirêj û kabûsê giran xelas bibim. Berê min li welatê min e. Lê gelo êdî cihek dikare ji vî giyanê min î aware re bibe welat! Xakek dikare hestên min ên tevlihev û dînbûna min bihewîne! Kîjan bajar dê lalbûna min fêr bike? Kîjan dost dê bêdengiya min mîna axaftina têrwate nas bike! Pişta min li janekê ye û di pêşwaziya min de jî janek e. Ez im rêwiyê ku di nav kelûkortên janan de tême jenandin. Ez jan im. Ez janeke li ser du ligan im. Ez janeke bê ziman im.

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Ne tenê perdegemî dinepixin, zik jî ji ber janeke ecêb li vî bajarî dinepixin heta ku yekî didin erdê û dikujin. Min gava din ji du tacîrên venedîkî bihîst ku behsa Iskenderûnê û nexweşiyên wê dikirin. Wan digot ku li vê benderê jana Zaferan Paşa heye ku ew jî rengê ji zerikê ye biyanî pê dikevin û rengê wan ji ber wê êşê zer dibe û zikê wan dinepixin û tavilê dimrin. Cîgirê konsulusê Fransayê pê ketibû û miribû. Piraniya bazirganan ji tîrsa êş û webayan li bajêr şevder namînin lê tîrên di gemiyên xwe de xew dikin. Eger çûn û hatina wan bazirganan pirr be, diçin bajarokê ku navê wî Bîlan e ku du fersengan dîrî Iskenderûnê ye şevder dimînin. Wan herdu venedîkiyan wisa suhbeta xwe dikirin û hayê wan jê nebû ku yekî lal û kose û qepalên cilan lê, li wan guhdarî dikir û di ber xwe de dimizicî û li pêlên ku li zikê gemiyê didan dinêrî. Erê haya wan ji min nebû û nedipirsîn ka ev evdalê han kiye û berê wî li ku ye!

## Seet heşt

*Seet bû heştê êvarî lê hringînî ji naqosa dêrê nehat<sup>1</sup>. Xwendevanê ilahiyatê, ê ku xemgîniya paragrafa dawî a ku Martîn ew li ser piştta gemiyê nivîsîbû ew noqî deryayeke ji janan kiribû, serê xwe bilind kir û di nav mija li derve re li aliyê dêrê nihêrî. Mij û şevê xwe li hev pêçabûn. Wê mijê, wê şeva reş û hinek qerebalixa li jêr hayê wî jê kir ku hîn jiyan li derdorê heye. Ku hîn giyan di bedena wî û vî gundî de digere û ew ne li ser piştta gemiyekê li kenarê bendereke Levantê ye, lê ew di odeyekê de ye li rêwîxaneyekê keleha baweriyên xwedayî ên rast. Ew li Ewropayê ye û tenê bîranînên kesekî nenas li ser jiyanekê ku êdî nas e, dixwîne. Berî ku seet bibe heşt wî ew defter ji dest xwe danîbû û diramiya. Tiştê ku dilê wî xweş dikir û deyaxa wî bêtir dikir ew bû ku pel hindik mabûn. Niyeta wî jî ew bû ku wan pelan berî seet bibe neh biqedîne û binive û sibehê zû berê xwe bide riya xwe. Tarî ketibû erdê û tîr bûbû. Mijê jî rengê wê tariyê şilekî kiribû yan jî tariyê renekî reş dabû wê mijê. Ew reşahiyeke şil û şilahiyeke reş bû. Dengê kemanê nema dihat. Li şûna awazên tîlên kemana darîn, êdî nalîna telên kevanî ên daran bû ku bi jenandina tiliyên bayekî aram û lawaz re dihejiyan. Awazeke lawaz e ev ba. Wî weha di dilê xwe de got û peyala meyê rakir ku firekê jê binoşe, lê dît ku vala bûye. Xwest dakeve jêr û yeke din bo xwe dagire û dîsa dagere jor, lê wê defterê û wan çend pelên spî yên mayî ku bîna binçengên keçeke çardesalî jê dihat ew dîsa ber bi xwe ve kişandin. Ji jêr nûzenûza pisîka pîrê bû, xuyabû ku ji nêzan bû ew nûzenûz. Birçî bûbû pisîka pîrê. Dengê qerebalixa ku ji jêr dihat tavlê da ser nûzenûza pisîkê. Bala xwe dayê ku hîn ew kalê han ji yekî rîsor re dibêje:*

*- te ew kuştîye.*

*Rûyê xwe tirş kir, berê xwe guherî û di ber xwe de kire birebir:*

*- Her ew in û her ew doz û dawe ne!*

*Xura wî ya xwendinê xurttir bû û dîsa xwe xwarî rûpelan kir û xwend:*

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Piştî ku Karlê jamkut û Georgê ministrant ringînî ji zengilê şehwetê anîbûn û ji zêrzmînê hilkişiyabûn jor û heft ringînî ji zengilê dêrê jî anîbûn, çûbûn li keviyê pencereyekê rûniştibûn û heta nêzikî seet heşt ji xwe re bêdeng temaşeya mijê kiribûn. Mijeke wisa tîr herduyan jî nedîtibû. Karl sibehên Karlofçayê anîbûn bîra xwe gava ku payîzan û destpêka zivistanan mijeke tenik bi ser çemê Tunayê diket. Georg jî herdu kêrên xwe yên ku ji erdê rakiribûn, ji xwe re di berîkeke xwe de bi wan listibû û di serê wî de mijeke ji renekî din geriyabû. Dema ku Karl dengê xîstexîstê bihîstibû, bi awirin tijî pîrs û tîrs li Georg nihêrîbû. Di awirên Georg de kêrên hêrs û tolhildanê li ber roniya mûman diçirîsîn. Awirên Karl li awirên Georg rast hatibûn. Û ji nişkêve Georg xwe avêtibû jamkutê dêrê Karlê qut î qalind î girover û kêrek ji wan herdu kêrên tûj lê kişandibû.

Qibris, yekşem. 11ê temûzê. 1708

Li gor plana rê, her gemiya ku ji benderên levantê derdikeve divê ji du heta sê heftiyan li girava Qibrisê bimîne. Ev bûye bêtirî heftiyekê gemiya me li li Qibrisê rawestiyaye. Ez kêman ji gemiyê peya dibim û diçim bejayê. Ez naxwazim tev li xelkê bibim. Ez dixwazim li xwe guhdarî bikim, bîranînan bidim ser hev û bînim cem hev. Ez dixwazim çîrokê vebêjim ku hinekî giyanê xwe ji zincîrên jana negotinê rizgar bikim. Lê ziman! Ezê çawa vî zimanê ku hêdî hêdî dibe qetek risas derman bikim <sup>1</sup>!

Ezê dîsa vegerim serpêhatiya Êsibê kildiz. Ziman ji dest min diçe lê hîn hişê min li serê min e. Hîn destên min dikarin qelemê hilgirin û bûyerên wê xana seyr binivîsin.

\*\*\*

Êsibê desgirêdayî wê sibeha sar li ser sekoyekî sekinandibûn<sup>2</sup>. Li jor banê xanê, li her koşeyekî yekî bi şûr û mertal danîbûn. Xuyabû ku êdî xan bûbû zindan û riya revê li ber me hatibû girtin. Du kesên ku bi milê Êsib girtibûn, qeyda destan vekirin û destê wî ê rastê li ser dîlmeyê textekî stûr û dirêj î ku heta ber sînga wî hatibû rast kirin. Di gel ku Êsib kildiz yekî pîrbêj bû jî lê tu deng wê sibeha lal jê nedihat. Tirsê ew jî lal kiribû. Lêva wî a jêr mîna bijiya elokekî meliqîbû û daliqiyabû. Tevrek di destê yekî ji wan herdu kesan de bû û zîq li qevdika destê Êsibê hejar dinêrî. Destên me jî di wê sibeha ku sermayê tede hestî diseridandin de li ser dilên me bûn. Mirov dikaribû çeqçeqa diranê hevalê li rex xwe jî bibihîsta. Ew çeqçeqa diranan ne ji ber sîxên qeşaya ku di laşên mirov re diçûn bû. Ew dîmenê Êsib ê ku tevrek li ser qevdika destê wî hildayî bû û çavê wî ê tekî tenha ê ku bi qasî artêşeke têkçûyî dabû hawarê û rûyê wî ê ku tirsê xwîn jê kişandibû û ew di gola bêdengîyê werkiribû, vî dîmenî seqemeke nepenî û pûk û berfeke giran bi ser giyanên me de werandibû. Koma mîrên bi Mucahid re jî bêdeng bûn û keriyên tirsê li ser rûyên wan jî mexel bûbûn lê ew ne bi qasî me herdu komên din ditirsyan.

Li rex wî textê ku Êsib mîna berxekî li ber rawestandibûn, agirek hatibû dadan. Agirekî ku Êsib bi xwe êzing jêre dizîbûn. Tîna êgir xweş digiha me û me xweziya xwe bi kesên li dorê dianî. Kêlîkek kurt derbas bû nebû, Mucahid berê xwe da valahiyekê, çavên xwe girtin û qêriya:

- Vî neyarê xwedê dizîya xwediyê xanê kiriye. Ev jî gunehê ku xwedê teala beyana hukmê wî di kitêba xwe ya pîroz û rast de gotiye: Destên dizan, jin bin yan mîr, qut

<sup>1</sup> Min li ser piştê gemiyê li Qibrisê bi rasthatinî hekîmekî inglîz nas kir. Navê wî Robert bû û xelkên gemiyê jê re digotin Sir Robert. Ew ji Hindistanê dihat û berê wî li welatê wî bû. Min bi îşaretan pê da zanîn ku zimanê min giran bûye, pûç bûye û nema digere. Kêlîka ku sir Robert devê min vekir û bi du tiliyan zimanê min ecîqand û peland, tê derxist ku ziman pûç e. Ne ez êşiyam û ne jî bi ecîqandina tiliyên wî hisiyam. Wî hinekî serê xwe hejand û bêdeng dakete enbara gemiyê cihê ku lê dihêwirî. Teqnekî ma, dawiyê hilkişiya jor û hat li ber min rawestiya. Dîsa devê min vekir û du sê caran zimanê min di nav tiliyên xwe de guvaşt. Di ber xwe de kire himesî û paşê jî tûrikekî ku bi xwe re ji enbarê anîbû, macûnek derxist û di zimanê min da. Bi min xweş hat tehma wê macûnê. Lê hîç bi kêrî pûçbûna zimên nehat.

<sup>2</sup> Êsibê kildiz, ku ew û Sultanîyê şair bûbûn alîgirê Mucahid û koma wî, û êdî bi koşeyê çavan li me dinêrîn, di tariya şevê de ketibû odeya Seferşah û kîsîkekî wî ê diravan dizî bû. Çavên Enîseyê pêketibûn û xwestibû diravan bi wî re par vebike lê Êsib gotibûyê: ka pêşî destûra min û ganekê ji xwe bide. Enîseyê bişkokên sînga xwe vekiribûn û ew bi dû xwe de kişandibû cihêkî xewle û agirê wî tefandibû. Dema ku xwestibû Êsib soza xwe bi cih bîne, Êsib kenîya bû û gotibû: bila ev gan bi deyn be. Berf bihele ezê herim Trabzûnê bi wan diravan ji te re zêr bikirim. Enîseyê tecrubedar fêhm kiribû ku ew derewan dike û heqê wê ganê nadiyê. Bûbû sibe xeber dabû Seferşah ku Êsib kîsekî diravan ji wî diziye. Wî jî ji aliyê xwe de Mucahid agahdar kiribû. Û lê geriyabûn û kîsik di bin balîfa wî de dîtibûn. Ev waqî'e Eframê Suryanî ji me re got.

bikin. Em jî li vir gotina xwedê tînin cih. Em bi navê xwedê û herfên wî ên muqeddes destê vî gunehkarî ê rastê dibirrin. Bismillah. Ellahû ekber.

Rûyê sultanîyê şair bûbû zaferan. Kumê xwe yê ji mûyê bizinan dibir û dianî û li qevdika destê Êsib dinêrî. Newêrîbû tişteki bibêje. Topal Feqe Nûrî jî xwe xwarî êgir dikir û hinekî ew gurtir dikir, êzingek du êzing diavêtin ser û carê pif dikirê.

Kesê ku tevra tûj di destê wî de bû, bi lez ew bilind kir û heta ku hêza wî hebû şilfa wê tevrê di qevdika Êsibê reben de lêxist. Destê wî pekiya dera hanê û barînî pê ket. Topal Feqe Nûriyê ku xwe bi dadan û gurrkirina êgir mijûl kiribû bi zendê wî girt û cihê qutkirinê di qevdikê de xiste nava êgir<sup>1</sup>. Dengê çizîniya qevdika bi xwîn ku bi pêtiyên êgir bû wê sibehê giha me hemûyan. Lê dengê Sultaniyê şair dabû ser her dengî.

Nizanim çawa wî xwe gihande sekoya ku Êsibê Kildiz li ser rawestandibûn û dest pê kir qêriya. Qesîdeyeke dirêj bi germî xwend. Nayê bîra min wî çî digot, lê pelika wî ya dawî bi dest min ket ev sê beyt tê de nivîsî bûn<sup>2</sup>:

Hakimêd Hind û Xurasan bibne axa dergehê  
Qulzem û behra kerîman qetreyek gola te bin  
Ey Mucahid *fî sebîlillah* tu mîrê gewreyî  
Sed hezar dîwan û şair goriyêd sola te bin  
Bendê pêlava te ey mîr melhema çavên min e  
Xaç û pût û lat û esnam kuştîyêd ola te bin

Paşê xwe li ber lingê Mucahid xwar kir û sola wî ramûsa û bi dengekî tijî heyecan, lerizîn, tirs û kêf qêriya:

Qeytanê pêlava te me  
Pêlek ji wê ava te me  
Toza li ber gava te me  
Ey serwerê alîcenab

Êsib ji hiş çûbû û weke termê kuştîyekî li dera hanê ramediyabû. Yekî ji wanên bi Mucahid re lepa destê jêkirî rakir û xwe tehl û tirş kir û ew di ser banê xanê re virvirande derve. Topal Feqe Nûrî û Sultanîyê şair piştî destûrxwestinê Êsibê lepqut bi dû xwe de kişandin odeyeke li rex ya Mucahid û hevalên wî. Em jî, ez bibêjim ez jî zimantevizî, bizdiyayî, ziravqetiyayî û zer û zerhimî bûbûm û lavlavên tirsê dîwarên mêraniya min hemû nuxumandibûn.

Ev çî bela bû bi ser me de hatibû? Ji kû werivîn ev kesên ku dibêjin Rastî pêtek agir e di destê wan de? Çima dixwazin me bi wê rastîyê bisojin? Heta kengî emê wisa li hêviya hev bin û ji hev bi tirs bin? Em di xew de êdî ditirsiyan ku bigrin ser me û me bidin ber devê şûran. Riya revê nebû. Li jor ew kesên bi şûr û mertal, li derve gur û keftar û li hundir ev kesên ku nefesa me çikandine! William jî bi me re li wî dîmenî dinêrî. Ew jî bêdeng, ew jî tirsîyayî û ew jî matmayî bû. Wî berîya wê bûyerê gelekî nav di xwe dida û hin kes bi dora xwe xistibûn, lê wa xuya kir ku tenê zirt û gef bûn gotinên wî. Ez wisa difikirîm û min kevokên xeyalê xwe serbest berdabûn ezmanê gumanan dema min dît William hate ber me û xwe da bin çengê min

<sup>1</sup> Min pêşî fêm nekir ew çî huner e? Paşê me nas kir ku ew wa dikin da ku herikîna xwînê raweste. Agir devê rehan dişewitîne û wan bi hev ve dizeliqîne û dixitimîne.

<sup>2</sup> Wî her ku pelikek dixwend ew ji destê xwe diavêt û bi ber bê dixist. Pela wî a dawî jî nermik nermik mîna pirpirîkekê hat û li ber lingê min ket. Ew bi xwe dîmenekî ecêb bû! Şairên ku min ew dîtibûn hemûyan ji ezber dixwendin lê Sultanî tenê ji pelan. Wê gavê Mucahid sê tugralîyên zêr ku hêjayî hezar aqçeyî bûn xistin devê Sultanî. Ev huner jî li bal giregiran heye, ku şairek pesnê yekî dide, mîna geşt û padaşê gewher û zêran radidin devê wî. Carekê li dîwana waliyê Helebê devê şairekî hate çirandin hingî ku zêr û gewher û mirarî hepişandibûnê.



û Alberto û em birin odeya xwe. Xizmetçiyê wî<sup>1</sup> taştîyeke şahane ji me re amade kiribû. Rûnê hîzan û hingivê şikeftan, penêrê koçeran û qeymaxê li ber dimsa tirî. Lê kî wî dîmenê destê jêkirî ji bîr bike? Dilê kê wê sibehê biçe xwarinê? Me xurîniya xwe bi dîtina lepa destê ku ji zenda xwediyê xwe firiya kiribû û êdî dilê me nedibijîya tu xwarinê. Em ji desthilanîn ketibûn û bêqudûm bûbûn<sup>2</sup>.

Williamê ku xizmetçiyê wî qelûna tijî tûtin da destê wî û pêxist, berê xwe da min û Alberto û bi nermî got:

- Hûn dibînin ev kes çî tûnin serê xelkên xwe! Derketina ji xanê jî êdî bi tu rengî nema mumkin e. Berf gihaye banê xanê û nema devereke xuya dike. Min bihîst ku dixwazin me yan qir bikin yan jî bînin ser dînê xwe. Îcar yan divê em hemî serî ji van kesên serserî re deynin yan jî divê em bi kêrî xwe werin û li ber wan rabin. Eger em ranebin ewê me jî dawî bidin ber xenceran. A rast em bi şev bigrin ser wan û vî Mucahidê dil tijî kîn û nevîn bikujin. Ew serê mar e û ku neyê birrîn dê bi me hemiyan vede.

Alberto yê dîlzîz û ruhnazik guhdariya wî dikir û kûr difikirî. Ez ditirsiyam. Ez jî kûr diramiyam û min di dilê xwe de ji xwedê tika dikir ku rîyekê li ber min, li ber me hemûyan veke û me jî vî kabûsî riha bike. Alberto û William gelekî axivîn. Ez pê hisiyam ku zimanê min hatiye zincîrkirin. Çend caran min da xwe ku bipeyivim lê ji min nedihat. Min xweziya xwe dadiqurtand û li agirê ku di koşeyekî de vexistibû dinêrî. Ji nişkê ve Alberto rabû ji pê û got:

- Ezê doza daberizînê li Mucahid bikim. Ez û wî emê bêne hev û binêrin ka kî kê dike. Rûyê William geş bû û dûyekî dirêj ji ber şivqelûna di devê xwe de berda û di ber de jî li çepikan da. Min nizanîbû çî ji wan re bibêjim! Min zanîba jî min ê nikariba. Ji wê kêlîkê de êdî ez ji xwe re li çareyekê geriyam. Ez li rîyekê geriyam ku ruhê xwe ji wê gerînekê derînim. Li rîyekê geriyam ku dûrî wan hov û dînen ku tune kirina hevdû dixwazin bikevim. Ez fikirîm ku bi çî buhayî be divê ez xwe ji nava wê pirrikê bikişînim. Hema ku min dît zimanê min hinekî sivik bû û vebû min gote Alberto:

- Tu çî dibêjî lo! Ji hemû aqilî tu wa dibêjî! Le tu bêyî kuştin?
- Bila bême kuştin. Ev rewş tehmûl nabe Martîn. Yan emê bi ya wan bikin û yan jî divê em li himber hev şer bikin. Ez jî dibêjim emê mîna siwarên cengên giran bikin; doza daberizînê li hev bikin. Yan em yan ew û hew. Dibe jî ku ez serê vî dînî difirînim û çîrok safî bibe.

Destê xwe avête zengeloka xwe, a ku min ji awazên xemgîn û nazik pêve jê nebihîstibû û got:

- Heta ku ba di vê zengelokê de here û were, heta ku nefes hebe û heta ku deng ji min derê ezê nehêlim ku ev gurên di dirûvê mirovan de serdestiya me bikin û baweriyên xwe ji bo me jî bikin bawerî.

Li derve berf hîn dibariya. Mîna wê axaftina Alberto, ew jî bi xişm û xezeb û hêrs dibariya. Te digot erd û ezman jî ji hevdû re dibêjin: hodrî meydan û doza daberizînê li yekûdu dîkin. Ji dûr dengê zûrîna hinek gur dihat. Ji nêzîk jî orîniyek dihat. Xuyabû ku Êsibê kildiz biribûn odeyekê û derî lê dadabûn. Ji ber jana destberrînê û şewatê barebara wî bû û bi pehînan ji hundir de li derî dida û nizanim çî digot. William şûrekî qevdik zîv da destê Albertoyê ku bi lez hemaylokên şûr avêtin stûyê xwe û bi ken berê xwe da min û bi payebûn got:

- Tu bi xwedê kî Martîn ez ne mîna siwarê navdar Lancelot du Lac im!

Ku Alberto dît ez besrivê nadim û ponijîme, xwest hinekî ber dilê min bide. Rabû got:

- Ewê kêlîkeke kurt dirêj bike. Yan serbilind vedigerim ba we, yan jî ev wê deqeyên min ên dawî bin bi we re. Martîn me gelek tehliyên jiyanê bi hev re dîtin. Şîrîniyên ku

<sup>1</sup> Yekî gurgî bû, navê wî nema tê bîra min. Lê xwarina ku wî amade dikir zehf bitam bû.

<sup>2</sup> Heta demeke dirêj min di xewnên xwe de seriyên jêkirî û dest û payên firiya dîdîtin. Min didît ku ez di şikeftên tarî de me û destên bi bask di ser serê min re mîna barçemokan difirin û tîrî li rûyên min dixin. Min serî didîtin ku weke gulleyên hesinî ên top û mencenîqan li hewa dîkin vizîna û tîrî li ber lingê min disekin. Yekcaran jî min dar didîtin ku serî lêketine! Serî bûn berê daran! Kabûs bûn şevên min êdî! Bêxewî bûn û her ku çû pûçbûna zimanê min zêdetir bû.

me bi hev re dîtîn jî ne hindik bûn. Emanet be ku ez mirim tu xeberekê ji vê rojê bigihîni destgirtiya mina li Venedîkê. Navnîşana wê di gel nameyekê di kodika mandola min de ye<sup>1</sup>.

Dengê wî hinekî lerizî. Destê xwe da qirika xwe, zengeloka xwe hinekî mis da û bi xemgînî berdewam kir:

- ez li ber tiştê nakevim bi qasî ku li ber stranekê dikevim ku min nikaribû ji destgirtiya xwe re bistira. Min ew amade kiriye, peyv û awaz. Lê ka gelo ezê careke din karibim wê bibînim û pêre li gondolekê siwar bim û em di nav kolanên avî yên Venedîkê de bigerin û jêre bistirê!

Ne min ne William me deng ji xwe ne anî. Alberto destê xwe ji ser zengeloka xwe rakir, du caran qevdika şûr hejand û em hersê derketin; William di pêşî de û ez û rebenê Alberto jî bi dû wî de.

Li derve her yekî berê xwe dabû odeya xwe. Tenê Sultaniyê şair ê ku kurkek li xwe gerandibû li derve mabû û pelên xwe ji erdê didane hev. Hin pelên wî firiyabûn hewşa xanê û hin jî li jor bi bayekî sar re mêl dibûn. Gava ku çavên wî bi me ketin bi xar kurkê xwe avête ser serê xwe û çû.

Dilê min bi ser Alberto ve bû û min nedixwest ew xwe bavêje wî agirê hanê. Min hewl da ku wî ji wê yekê viz bikim. Hîn hêviya min hebû ku kela hinavê wî sar bibe rabû min gotê:

- Alberto neke! Bawer bike daberizîna bi wî mêrî re xwekujî bi xwe ye.

William awirin tûj di min vedan ku herdu kabokên min sist kirin. Awirin ku min texmîn kir ew ji xenceran jî tûjtir in di min vedan û ez kût kirim. Nema ji min hat ez gavekê bavêjim. Bi rastî jî ez di cihê xwe de mîna mîxekî di deriyekê de hatim kutan û min xwest tenê ji xwe re demekê li dîmenê ku dê li ber min biqewime binêrim. Xencereke serxwar î mîna şaxê pezkoviyekî di ber Alberto de bû û şûrê lahorî di destê wî de dihejiya. Hêdî hêdî xwîna germ di rehên wî de dikeliya û diherikî rûyê wî û herdu zend û herdu çavên wî. Hêrsa wî êdî bi çavan dihate dîtîn. Bîna hêrsê jê difûriya. Min ew yek ji çavên xwe bawer nekir! Çawa Albertoyê nazik, xwediyê mandolê û awazên xemgîn, peyvên hingivîn, zengeloka zêrîn û ruhê weke sira bayê beyanê dikare berê xwe bide kuştinê! Gelo Albertoyê ku ew çend sal in em heval bûn maskek danîbû ser rûyê xwe! Yan niha maskekî datîne ser rûyê xwe! Rastiya wî kîjan e gelo! Albertoyê nazik û stranvan yan Albertoyê şervan û pêlewan! Ez hîn di wan xeyalan de bûm min dît ku ew qêrîya û bi latînî bang kir:

- werin meydanê.

Hinekî ma û seha bersivê kir. Lê tenê dengê wî lê vegeriya û kes derneket. Rabû bi dengê hîn bihêztir û tûjtir û bi erebî qêriya:

- Heyya uxruc ya Mucahid. Uxruc in kunte reculen<sup>2</sup>.

Min di wê kêlîkê de dikaribû zîpikên xwêdanê yên ku li ser ferşê eniya Alberto dixewinîn bijimartana. Ez nizanim di wê qir û qeşayê de ew çi xwêdan bû pêketibû! Rûyê wî zer, lêvên wî zuha û çavên wî zîq li berfê dinêrîn û diçirîsîn. Bendewariya me dirêj nekir. Ji deriyê ku serê Ehmoyê gawir jê pekiyabû ber lingên me zîqîniyek hat. Dengê zîqîniya çilmêre<sup>3</sup> bû ku ji ser qulpika xwe rabû û derî vebû. Mucahid bi wî gewdeyê xwe ê mîna kerkedanekî bi zorê di derî re derket. Bi derketina wî ya di derî re tirs derbasî dilê min bû. Mucahid, ew giremêre çavkildayî û rûtirş ku şaşıkeke ji etlesê sorê hindî li serê xwe pêçabû û şûrekî caferî ê tazî di dest de bi pêş de hat û got:

- Kiyê vê sibê gora xwe dikole?

<sup>1</sup> Li Iskenderûnê min ew nameya wî da bazirganekî venedîkî ku bigihîne Abelina Donna destgirtiya Alberto de Silva. Nayê bîra min ku wî behsa wê destgirtiya xwe ji min re kiribû. Tenê hayê min ji yarika wî Rûnaza esfehanî hebû.

<sup>2</sup> Wateya vê hevokê ev e: de haydê derkeve Mucahid, derkeve eger tu mêr î.

<sup>3</sup> Çilmêre: textekî stûr î qerase ye li pişt deriyên datînin ku asê bibin. Kurmancên wan welatan hemû çilmêreyan bikartînin. Bi texmîna min ew ji gotina kurdî çil ku hejmara çilî ye û mêr yanî zilam tê, ango çil mêr nikarin wî darî rakin.

- Ez gora te dikolim.
- Tu kiyî? Navê xwe hilde.
- Ez Alberto de Silva me ji Venedîkê. Doza daberizînê li te dikim.

Alberto besriv da û herdu ber bi hev de kişyan. Dilê min bi ser Alberto ve bû. Min dizanîbû ku hêrs dikare kêra kînê tûjtir bike lê min nizanîbû ku hêz zora gir û hêrs û kînê jî dibe. Mucahid girsemirovekî hêzdar bû. Ku dimeşiya gurmegurm ji bin lingê wî dihat. Alberto jî yekî zirav î tenik î nazik, lê bixwebawer bû. Girr û kîn û bixwebawerî li aliyekî û hêz û hêrs ji aliyekî din ve bi hev re rû bi rû bûn wê demê. Ew herdu beziyane hev bi şûran. Şingeşinga şûrên wan hişt ku her kesek dîsa derkeve temaşeyê. Her yek li ber deriyekî rawestiya û ji xwe re li wê daberizînê nihêrî. Ên ku xaç li ser sîngên xwe resim kirin û ên ku tekbîrên bilind gotin. Bû dubendî û fersenda bêlayanîyê nemabû êdî. Tu ne bi Alberto re bayî, divabû tu alîgirê Mucahid bayî. Tu ne piştgirê Mucahid bayî divabû te destek bida Alberto. Wê katê, fikra ku ez ne ji vî û ne ji wî me dê tu pere nekiraya. Çiqasî zor e jî gava ku tu bêgav bibî da ku bibî alîgirê aliyekî ku tu pê ne bawer bî! Çiqasî zor e ku tu nikaribî di nêvî de rawesî. Di nav şingeşinga şûran û ullah û ekber û hêlehêlan re zûrîna guran jî di hate bihîstin. Gur û keftar her li der û dora xanê digeriyan mîna ku bîna xwîna mirovan kiribin û bendewarê encama wê daberizînê bin.

Daberizîna li ber derabzînê qederekî ajot. Berfê lêdikir. Gur dizûriyan. Dil jî dihatin ku ji sîngên me werin xwarê. Alberto wekî pezkoviyekî xwe da ser Mucahid û piştî wî siparte derabzînê. Bêhemdî me dengên aferînan ji me, ên mesîhî, derketin û xan hejandin. Me got ha Alberto dê aniha şûr bide ser zengeloka vî hirçê han û me jê xelas bike. Lê dîtina me dît Mucahid dehfek bi kulma destê xwe da sînga Alberto û ew avête erdê û mîna deveyekî hêçbûyî bi ser de çû. Vê carê dengê ullahû ekberan bilind bû. Çavên me li wî dîmenî bûn. Wî dîmenê ku têde qaşo xêr û şer, tarî û ronahî, xwedê û şeytan, reş û spî hatibûn himberî hev. Destên me hemûyan bi sîngên me ve hatin dirûtin û nefesa me qut bû. Ji hemûyan bêtir ez ditirsyam. Alberto hevalekî min î salan bû. Dostekî qenc û sozdar û alîgir bû. Hemrazê min bû ew û di wan neh salan de min kesekî mîna wî comerd û dilrast nas nekiribû. Tîrsa min bi her qêrînekê re, bi her aferînekê re û bi her ullahû ekberê re mezintir dibû ku ew di nav lepê wî gurî de were kuştin. Ew çî dîmenekî tîrsnak û xemgîr bû xwedayê min! Yek li erdê li ber xwe dide û yek li ser sînga wî peya bûye û dike wî bikuje. Ji bo çî? Ji ber ku yekî rastiya ê din nedipejirand. Her yekî ji wan digot ez rast im. Her yekî ji wan xwe nêzîktirî xwedê didît. Xwe paktir didît û yê li pêşberî xwe netîstek didît û loma jî dixwest wî tune bike. Eger yek yekî tune bike, rastiya wî jî tune dike! Em, em kesên li dora herduyan jî li hêviya biserkeftina baweriyên xwe, rastiya xwe û pakî û pîroziya xwedayê xwe bûn. Te digot dîrok bi hemû nakokiyên xwe, cengên xwe ên giran û bûyerên xwe ên dilgûvêş û cegerqelêş li wir rawestiyaye. Te digot Xwedê û Iblîs her karekî xwe şemirandine û hatine temaşeya wî dîmenî da ku ew bi xwe jî rastiya xwe nas bikin. Te digot hêzên dunyayê ên mezin, şerq û xerb, dêr û mizgeft di wî dîmenî de hatine himberî hev.

Û Alberto hate kuştin.....

Çawa? Ne girîng e. Hate kuştin û hew.

Hêsirên min diherikin. Roj diçe ava. Aso sor bûne eynî mîna xwîna Alberto ku ji zengeloka wî ya qutkirî herikî. Bayê hênîk ji ser rûyê pêlan hildikişe jora gemiyê û rûyê min dimale. Min bi sarbûna hêsirên dihisîne ev ba. Peşkên şor ên pêlan tev li hêsirên min dibin. Ez digirîm. Ez nikarim şeweyê kuştina hevalê xwe vebêjim. Nikarim. Ez naxwazim ew careke din were kuştin. Naxwazim.

Himberî girava Krîtayê, çarşem. 1ê tebaxê. 1708

\*\*\*

Ev bûye nêzîkî du heftiyan ku nema bejayî ji me ve xuyaye, me Krîta li pê xwe hişt û Sîsilya jî buhurandiye êdî. Heta niha em rastî tu bager û bahozan nehatine. Lê dilê min şikestiyê û ez nema dikarim binivîsim. Zimanê min jî wek xwe ye. Giran e û ji dengên zengelokê pêve ji min dernakevin. Ez nikarim tîpan bilêvînim. Ziman nagere û peyvên min bê tîp in. Tenê deng in. Sir Robertê ingilîz li min û vê rewşê mat maye. Dibêje ku wî di jiyana xwe hemûyî de tiştekî bi vî awayî nedîtiye. Çiqas derman hene bikatîne lê hîç e.

Raserî girava Sardînyayê, Sêşem. 13ê tebaxê. 1708

# Seeta Dawî

*Xwendevanê ilahiyatê êdî westiyabû. Dibawîşkiya û dixwest zû çavên xwe bide ser hev û rakeve. Sibehê zû divabû rabe û berê xwe bide bajarê Kölnê cihê ku dê xwendina xwe lê dewam bike. Lê bûyera kuştina Alberto çivîkên xewê ên ku li ser çavên wî veniştibûn, firandin. Li wan pelên di defterê de mayî nihêrî, dît ku hindik in. Mîna ku xewê ji ser rûyê xwe bide alî, bi destekî xwe ew mis da, çivîkên xewê yek bi yek firandin û awireke tijî spasdarî di mûma vêketî veda. Deng ji dunyayê hemî bilyabû. Heta bayê ku li derve dar dihejandin jî bêdeng, melûl û westiyayî bûbû. Bayekî xilmaş û berxew bû ew. Bêdengîyê hinekî ew xwendevanê westiyayî tirsand. Mîna Martînê di wan defteran de xweza jî lal bûbû. Seet ji nehê bi şev derbas bûbû. Ji nişkêve bala xwe dayê ku ringînîyeke ne asayî ji hêla dêrê hat. Dengekî ne mîna lêdana naqosê ye. Dengekî xeniqî û ecêb e mîna ku naqos tê serjêkirin<sup>1</sup>. Tirsê bêdengîyê tev li tirsê ji wî dengî bû. Mîna yekî ku di tariyê de bifîkîne ji bo ku tirsê xwe birevîne, xwendevanê ilahiyatê yê münsterî jî ji bo ku zora wê tirsê bibe û derdorê bi ziman bike, biryar da ku êdî hinekî bi dengê bilind bixwîne. Û xwend:*

\*\*\*

---

<sup>1</sup> Dema Karlê jamkut dîtibû ku Georg kêrê di rûyê wî de dikişînê bi lez ji ber keviyê pencereyê dûrketibû. Bi çavên Georgê sêzdesalî de nihêrîbû û dîtibû ku di wan de bi sedan zengilên girr û kînê û hêrseke nasayî dikin ringînî. Karl fêma nekiribû çima ewqase girr û kîn û hêrs di wan awiran de ye û çima ew kêra tûj di rûyê wî de bilindkirîye! Ji bo çend taleran e gelo! Wî wisa texmîn kiribû. Rabûbû destê xwe avêtibû berîkeke xwe û xwestibû hinek pere derxe û wî lawikê ku hatiye şerê xwe difiroşê aram bike, aşt bike û rawestîne. Lê lêwik, ministrantê sêzdesalî, xwe zer kiribûyê û kêrek veweşandibû rûyê wî. Karl têgihiştibû ku mesele ne henek in û bi lez xwe ji ber wê derbê dabûbû alî û xwestibû di pencereyê re bireve. Di wê kêlikê de Georg kêra din jî derxistibû û îcar bi herdu kêran êrîşî Karl kiribû. Êdî xwîn di rehên Karl jî de keliyabû û hema destê xwe avêtibû mûmdankeke û li himber Georg rawestiyabû. Dema ku Georg ew mûmdanka sifir î şaxikşaxikî di destê Karl de dîtibû, kabokên wî fisiyabûn û ew hinekî sistbûbû. Kesekî ku bihata û biketa navbera wan jî nebû. Seetê neh derbas kiribû. Pêlên mijê, di gel ku der û pencere girtibûn jî, ji nişkêve derbasî hundirê dêrê bûbûn û dîtina derûdorê zor bûbû. Mij ketibû navbera wan û êdî hema hema nema hevdû didîtin. Karlê tirsonek ew mij mîna diyariyeke xwedê dîtibû, jêre bûbû fersendek ku xwe ji ber veşêre. Wî qulik û derên dêrê ên asê û quncikên veşartî mîna kefa destê xwe nas dikirin. Loma jî bi lez bi şûn de vekîşiyabû û berê xwe dabû bircê naqosê û hêdî hêdî bi derenceyan ve hilkişiyabû heta gihişibû naqosa mezin û lê qelibî bû.

Ev bûne du roj gemiya me ji dertenga Cebeltariq derketiye û berê me li Amsterdamê ye<sup>1</sup>. Di dirêjiya riya ji kenarên girava Sardînyayê heta vê dertengê ku mehekê temam dirêj kir min destê xwe jî bi qelemê nekir. Dilê min ji nivîsê sar bûbû êdî. Min bûyera kuştina Alberto nivîsî nenivîsî û ez ji van pelên spî bêzar bûm. Ji vê xameya perîkî dilteng bûm. Ez nizanim çi bi min hat! Min digot qey ezê bi vegotin û nivîsandina wê bûyerê rihet bibim lê jana hundirê min zêde bû. Ez pê hisiyam ku min careke din ew anî jiyanê û kuşt. Wek çawa wî gurê han hevalê min li ber çavê min kuşt û min newêrîbû deng bikim, min jî rabû hevalê xwe li ser van rûpelan kuşt. Di dirêjiya rê de, yan ez di xew de bûm yan jî li ser piştê gemiyê bûm û min bayê şor berdida pişikên xwe û ji xwe re li pêlan temaşe dikir. Min li asoyên dûr, li gemiyên ku zikê deryayê diqelaştin, li qaqlîbazan û li hewrên spî û yekcaran jî li bahozên deryayê û barana xurt dinêrî û li dengê ba û pêlan guhdarî dikir.

Êdî rojhilat li pê min maye. Êdî ew sihr û ew ronahî û ew êş û jan û ew salên tijî bûyer û xirecir li pê min mane. Ew bûne xewn û bûne tarîx. Bûne serpêhatî ku min ew hemî di van pelan de parastine. Êdî dîsa berê min li welatê min e lê gelo ez bi kîjan kirasî vedigerim wî welatî! Gelo ezê ne mîna biyaniyekî vegerim warê xwe! Li wê biyanistanê ez nebûm hemwelatîyek ji wê axê re, ez û wan keviran û wê rojê li hev nebaniyan û her mame biyanî. Bi ruhê xwe, bi ziman û rû û rabûn û rûniştina xwe ez biyanî mam. Lê gelo ezê li bajarê xwe jî ne mîna biyaniyekî vegerim! Gelo ew ax wê êdî şopa piyên min nas bike? gelo ewê nebêje ku, ev çi terpetrepeke xerîb e ji guhên min re! Ezê bi kîjan zimanî bi axa xwe re, bi xelkên xwe re, bi ezman û der û dor û gora diya xwe re bipeyivim? Ji xwe ev zimanê di devê min de! Nîvê wî pûç bûye. Îro min tiliya xwe da koka wî, him zuwa him bê ruh bû. Mîna ku pizikeke di kokê de be.

Hîn berî ku ez ji Îskenderûnê derkevim ez lal bûbûm, lê ziman digeriya di devê min de. Hin tîp bi min re derdiketin û min dikarîbû kesê li himberî xwe bi xwestekên xwe, bi zorê ba jî, bida fêmkirin. Lê niha êdî lebata wî baş giran bûye. Ez dibêjim qey loqek qîr di devê min de ye ne ziman. Ez êdî bûme mîna maran pariyên xwe dadiqurtînim. Nikarim pariyekî jî bicûm. Robertê çavbirçî nikarîbû çareyekê ji min re bibîne. Çi pereyên bi min re hebûn heqdestê xwe ji min stendin û ez rihet nebûm. Heta bîst rojan jî wî hekîmî geyayên çînî û hinek macûn di koka zimanê min û serê wî û kêlikên wî dida û her roj digot: binêre va baştir bûye. Lê min dizanîbû ku ew derewan dike û zimanê min her ku diçe kambaxtir dibe. Ma min ê ji zimanê xwe bawer bikira yan ji gotinên wî hekîmê hîlevan! Ewî hekîmîçav berdabûn pereyên bi min re. Hema ku derman derdixist digot: ev derman gelek mesref lê çûye! Ez şelandim wî hekîmî, talan û rût kirim. Xwedê kirî hin pûlên zîv di berîkeke min de veşartî mane. Ne wisa bûya wê ew jî ji min stendibana. Ew dizê di kirasê hekîman de pêr li Cebeltariqê ji gemiyê peya bû û xwe gihande gemiyeke inglîzî ku berî li Londonê bû.

\*\*\*

<sup>1</sup> Di çûna şerqê de berî nêzîkî deh salan gemiya me di Tancayê re buhurî û ez li wê rawestiyam. Min wê çaxê ev çiyayê bi heybet î mîna pasvanekî pêlan nedît. Lê vê carê gemî di ber re çû. Mij û moranê xwe li serê wî girtibû. Ji min ve mîna kesekî keribî û bi hêrs xuya dikir. Wisa awirên kevirî di her gemiyeke vedidan te digot qey bacê dixwaze yan jî qorsanekî barbar e. Vê carê min Tanca nedît. Lê mîna ku çirayên wê ji min ve xuya bibin, ronahiyeke dûr li aliyê çepê dixewinî.

Deryayê bakur, کنارên Holandayê, roja şemiyê. 24ê êlûnê.

Li dû kuştina Alberto bi çend seetan min bîrara revê da. Lê min nexwest ji çu kesekî re bibêjim. Alberto tenê hevalê min ê rast bû. Min dikaribû bi wî re hesp jî bidiziyana. Lê ji wî pêve na. Êdî ez ditirsiyam ku kesê ez jêre bibêjim destbirakê Mucahid be û xeberê bigihîne û nehêlin ez birevim. Di wê xanê de êdî bawerîya me nema bi hev hebû. Kes li kesî ewle nedibû. Em êdî ji siyên xwe jî bi guman bûbûn. Me nema dizanîbû kî dost e kî dijmin e. Xan li bin guhê hev ketibû û dost û dijmin nema ji hev dihatin nasîn. Nizanim çima em zûtir di revê de neramiyan! Dibû ku Alberto jî bifilitiya. Erê, êdî ez ji ber mirinê direviyam. Li wê xana dût, di nava wê berfê de û di nava wan komên mirovan de ku tunekirina hevdû dixwestin, jiyan êdî bûbû fincanek jehr, pariyek agir û hilmek ji bayê dojahê.

Min newêrekî kir. Li xwe mukur tîm ez. Ez tirsonek bûm. Tirsonekekî herî bêkêr û herî çavşikestî bûm ez. Ez bi hawara hevalê xwe ve neçûm û min newêrîbû xwe bida ser Mucahidê ku êdî ji zengeloka Alberto ya di destê wî de xwîn diherikî. Ew zengeloka ku min bi xwe gelek caran stranên bêrîkirina welêt jê bihîstibûn, Stranên evînê û axaftina nerm û xweş jî gelek caran. Niha ew êdî di nav lepê wî gurî de ye! Bêdeng, kerr û lal mîna goristanekê. Wê zengelokê berî ku were hilqetandin qîreke mezin di rûyê Mucahid da. Weke ku Alberto dizanîbû êdî ew dê qêrîna wî a dawî be, qîriya û got:

- divê tu ji vê xanê derkevî. Zû derê ev der ne warê kesekî mîna te ye û rastî ne tenê li aliyê te heye.

Mucahid ew zeft kiribû. Porê wî xistibû mista destekî xwe û pê li sînga wî kiribû. Çavên Alberto li min bûn. Di wan awirên dilêrane de, ne tirs mirinê hebû ne jî daxwaza alîkariyê. Tenê min di wan awiran de xwestina ku ez birevim dixwend. Di wî halî de wî berê xwe da min û bi hêrs qêriya:

- Martîn ji vir bazde, ev ne.....

Lê hevoka wî nîvco ma. Serê peyvînan di wê zengelokê de, mîna berxên ketî ber êrîşa guran hatin gurandin.

Min negot ka ez herim wî xelas bikim lê min lezand û berê xwe da odeyekê û derî li xwe girt. Deng û halan bi xanê ketibû. Xuyabû ku êdî hemî bi nav hev ketibûn. Şerekî giran li dar ketibû. Ez ditirsiyam. Tirseke kerr û kor û lal konê xwe bi ser min de vegirt. Min hema çî dît û da ber derî ku kesek nikaribe ji derve ve veke. Di odeyê de ez çûm û hatim lê tirs min a ku hatibû nema çû. Her ku çû tirs zêdetir bû û êdî ji tirseke kerr û kor û lal bû yeke çavsor û bi pence û dev û diran û ez dame ber nehperûşk û gezan. Tirsê ez dixwarim: dilê min, cegera min, mejiyê min û hinavê min û berî hemûyî zimanê min dixwar wî dêwê tirsê. Zimanê min wê demê şikest. Ez pê hisiyam ku rehek di bin de qetiya. Di koka wî de rehekî xwînê pûç bû. Devê min zuwa bû. Bû qeracekî di havînê de. Tirsê ez lal kiribûm. Min hinek meya sor di binê kûpîkekî de dît. Hema bi lez min ew rûkire hinavê xwe û hinekî devê xwe pê şil kir.

Mîna ku yek reşêşek av bavêje ser sêleke sincirî, ew mey di devê min î hişkbûyî de bû kelex. Ez ecêb mam! Gelo zimanê min nebûbe perengê di devê min de! Li derve hay û hoy hey hebû. Di dilê min de jî hezar hespên kihêl didan cirîdan. Êdî ziravê min qetiyabû. Ez bizdiyabûm û di rîyeke revê de diramiyam. Ji nişkêve çavên min bi kesekî ketin. Mîna pûtekî di cihê xwe de sar bûm ez. Di devê min de xwezî jî nemabû ku daqurtînim. Çavên min beloq bûn û min li wî kesê paldayî nihêrî. Termê Yavuzê çortanxur bû ew. Yavuzê ku çend hefte bûn miribû û me ew ji bîr kiribû. Ew hîn li erdê di quncîkekî de, mîna ku di xewa şêrîn de be, ramedandî bû. Kê stûyê wî ji werîs deranîbû? kê ew li wî quncîkê hanê danî bû? Min nizanîbû. Êdî tirs min duqatî bû. Li derve bêhna mirinê ji şûrê Mucahid û hevalên wî difûriya, û li hundur jî mirin bi xwe, termek û şopa mirineke nenas. Ezê berê xwe bidim kîjan alî? Kîjan mirinê? Gelo li cem wî termî bimînim û bi mirinê re rû bi rû bibim yan jî stûyê xwe li ber şûrê rastiyan Mucahid û cemaeta wî ramedînim!

Demek çû, bêhna min hinekî hate ber min. Tirsan min mîna qetek berfa ku aveke keliyayî bi ser de birije hiliya. Ez li ser tiliyên nigê xwe hêdî ber bi deriyê girtî ve çûm û min di qelşikekê re li şemateya derve temaşe kir.

Bi nav hev ketibûn. Hev dabûne ber kêr û xencer û şûran. Sultanîyê şair kurkê xwe li xwe pêçabû û ew jî li dûr li ber deriyekî bû ji xwe re temaşe dikir. Îvanê dîl û Topal Feqe Nûrî daberizîbûn hev. Agapîto jî ketibû şerekî giran bi Egelî Murad re. Meydana şerê wan teng bû mîna ramanên wan. Agapîto siwarekî dilêr û pisporê şûrbazîyê bû. Min dît çawa xwe da ser Egelî Murad û hat ku wî bikuje, lê mîna qirdikekî Topal Feqe Nûrî dev ji Îvanê dîl berda û hat ji pişt ve xencerek di piştê Agapîto de çikand. Agapîto li pişt xwe jî nezîvirî. Destên wî berjêr bûn, xwarî erdê bû û hema wî mîna stûnekî hate xwarê. Topal Feqe Nûrî rabû ser wî û pê li cihê birînê kir. Min dikarîbû xwîna ku ji ber milê wî ê çepê diherikî û kef dida bidîta. Coyên kêfa ku li ser rûyê Topal Feqe Nûrî diherikî jî dihatin dîtin. Ez dilerizîm. Ji tirsan, ji hêrsan, ji kerb û qehran lê min newêrîbû ku ez derkevim û bi hewara hevalên xwe ve herim. Çavên min bi wê qelşikê ve qemitî man. Min nema dizanîbû kîjan kiryar dê rast be, bimînim yan derkevim! Ku derkevim ihtimala kuştina min pirtir e. Pir dudilî bûm ez, derêm derneyê, derêm derneyê? Dawiya dawî min biryara xwe da: dê heta ku reş bikeve erdê li vê odeyê û li ba vî termî bimînim. Paşê bi çi awayî be divê çareyekê bibînim û ji vê gerînekê, ji vê firtoneyê, ji vê gêjenê û ji vê tor û pirrikê derêm.

Destê min ji bûyerên ku li derve diqewimîn nedibû. Min bi wî çavekî xwe yê ku min ew bi wê qelşikê ve zeliqandibû ziq dinêrî. Kê kî dikuşt? Ew êdî nema pêwist bû. Ya pêwist kuştina mirovan li ber çavên min û bêçarebûn û bêkêriya min bû. Min dît çawa Evdîlmesîhê helebî gurandin, min dît çawa keşe Qerebêt avêtin erdê û ew mîna berxekî serjêkirin. Min dît çawa Egelî Murad bi destê Fîlîpê firencî hate xeniqandin. Min Eframê suryanî, yê ku qutikê xweyê cêloyî jixwe nedikir, dît bê çawa serê Silêmanê lal kurê Seferşahê xwediyê xanê xistiye hemêza xwe û xencerê li ser stûyê wî dibe û tîne. Min xwîna Silêman ya sor dît bê çawa nola çavîyekê pijîqî ser çav û rîya wî ya gij û qutikê wî yê kej. Min Williamê inglîz jî dît bê çawa sînga hevalekî Mucahid diqelêşe. Min dît bê çawa dilê wî weke dobelanekê ji sebeta wî deranî û gezek lê da. Min ji çavê xwe bawer nedikir. Min ji guhê xwe bawer nedikir, lê min nikaribû ji dilê xwe bawer nekira. Dilê min digot ku ewa hanê li derve dicire kurtasiya xwerastbînîyê ye. Cenga rastiyan li himber rastiyan e ew.

Wê xwînrêjiya hovane heta ku tarî kete erdê dom kir. Ez ditirsîyam ku kesek bi min bihese lê wa xuyabû ku ew bi hev û gurandina hev biliyabûn û nema diaznîbûn ka ez hatime kuştin yan jî hîn dijîm. Bi hatina şevê û bêdengiya demê re ew jî bêdeng bûn. Tenê bayê kurr dikire guregur û li derve dizûriyan gur. Her yek ji wanên mayî vekîşiya odeyekê û nema pêjna kesî hat. Min nema zanibû kî hatiye kuştin û kî birîndar bûye! Termên kuştîyan li derve man. Min fersenda bêdengiye bo xwe weke şens û deriyekê xêrê dît û şeva tarî mîna sitareyekê dît û bi lez ji wî hundurî derketim û min berê xwe di nav pêlên şeva reş û nalîna hinekên birîndar re da odeya xwe. Odeya xwe û Albertoyê venedîkî.

\*\*\*

Amsterdam, Sêşem. 25ê êlûnê. 1708

Piştî heştê û heşt rojan gemiya me ya ku ji bendera Iskenderûnê dabû rê gihişte bendera Amsterdamê. Niha ez li Amsterdamê me. Ji pencereya rêwîxaneyê ku ez lê dimînim, bircê naqosa dêra Waalse Kerk dibînim. Qaqlîbaz difirin û qîjeqîja wan di felekan re derketiye. Ez li xuşîna pêlên deryayê bakur jî guhdarî dikim. Dengê xweş ji naqosa wê dêra nêzîk tê. Di ber vî dengê dilovan re jî hewayeke sar û ewravî, tarî û rûkirêt. Hewayeke ku êdî, mîna ku ez ne kurê van welatan bim, ji min ve biyanî dixewine. Hewayeke tevlihev û nahez e. Zimanê min bi yekcarî pûç bûye. Pizika ku di binê wî de hatiye mestir bûye. Êdî jan dide ew pizik.



Deftera ku ez li ser dinivîsînîm çend pel jê mane. Çîroka min jî hindik maye biqede. Ezê behsa şeweyê reva xwe ya ji xanê, ji mirinê û ji nav lepên wan keftaran bikim. Ew rev û derketina ji xanê bi serê xwe destanek e. Ku negihim hemûyî binivîsînîm jî ezê bi dev ji Hans û gundiye xwe re vebêjim. Bêguman ku li gundê xwe vegerim û bayê wî di pozê min re here û were, ava wî vexum û wan der û doran careke din bibînim wê zimanê min jî vebe û li min vegere, wê ew mîna kulîlkekê bibişkeve û êdî ezê nema karibim vî zimanê rawestînim<sup>1</sup>.

\*\*\*

Bi derbasbûna xwe ya hundir re min çira pêxist û ji kodika mandola Alberto ew nameya ku wî gotî û navnîşana destgirtiya wî derxist.

Tirsa min kêr nebûbû lê êdî vîna ku ez zindî bimînim bi tevgera min û çûn û hatin û rabûn û rûniştina min radibû. Min derî asê kir heta ku ji min hat. Çi tiştekî giran hebû min da ber û di şeweyê revê de fikirîm.

Bêdengiya di xanê de sawa min bêtir dikir. Tenê dengê bayê kur dihat ku hewran dadimale. Şev êdî qert bûbû û min texmîn dikir ku piştî wî şerî tev di xew de ne. Lê ka ezê çawa ji xanê baz bidim û di kû re derkevim? Xan ne tenê di binê berfê de mabû, lê bi gur û hirçên çiyê yên birçî jî dorpêçkirî bû. Dê min wê şeva reş berê xwe bida kîjan semtî! Derketin zor bû. Û man zortir bû. Ez ditirsiyam ku yekî ji alîgirên Mucahid bi qirika min bigire û min jî serjêbikw û termê min biavêje ser termê Alberto yan jî min di ser banê xanê re biavêje ber guran. Ku li hundir bimînim jî dibe ku werin û êrîşî min bikin û min di nav nivînan de bikujin. Ez di van ramanan de heta destê sibê payî mam. Palikên çavên min giranbûbûn lê xewa min nedihat. Sar û serma bû, rikrikandina kabokên min û lerizandina gewdeyê min rê li ber planeke dursut digirtin. Lê ji nişkêve nola ilhamê fikreyek hate min û min ji xwe re got: ka çima ez erda odeyê qul nakim û tere danakevim jêr? Dibe ku riyek li jêr hebe yan jî bi kêmanî xwe ji ber van keftaran veşêrim. Ez dudilî nebûm û hema min yekser berê xwe da quncikekî, palas hilanî, çirayek pêxist û li ber xwe danî û erda xênî bi xencerê kola. Ez buhustekê neçûm min dît ez li dîregekî rast hatim. Hesîreyên qamîşan û tûr û qirşik û şivên ku li ser dîregan bûn jî ne hindik bûn. Bi sebr û aramî, hêdî hêdî û bêyî ku tu dengan derxînim yan xirtepiştê ji kolana xwe bînim, min kunek bi qasî ku mirov tere derbas be di erda odeyê de vekir. Min tiştên ku ji min re pêwîst bûn, nameya Alberto û defterên xwe hemî xistin buxçeyekê û ew di qulikê re avête jêr. Paşê min fitîla çirayê hinekî bilind kir û anî ew li ber devê kunê li kevîkekê danî ku rîya min li jêr ronî bibe.

Tirsa min berî min reviya bû. Şopek jî li pê xwe nehiştibû. Êdî ez bi tenê di xelasiya ruhê xwe de difikirîm. Min hîç nizanîbû berê min li kû ye, lê min wisa texmîn dikir ku ezê karibim bi gemya wêrekiyê xwe bigihînim kenarê din yê deryaya jîyanê.

Dema ku ez peya bûm û min mîna dewlekê xwe berda jêr, çavên min bi hespekî ketin. Hespekî zînkirî, bijî şehkirî û dêlhûnayî ku Raadê minê seglawî anî bîra min. Ronahiya çiraya li keviyê qulikê li jor ku bi ser kulêmek û piştê hesp de diherikî dida xuyakirin ku ew kihêlekî bi nijad e. Min bi dilovanî destê xwe di ser stûyê wî re xuşand. Wî dengê xwe nekir û di ronahiya melûl a ku ji jor de mîna sûlaveke xunavî diherikî çavên wî biriqîn.

Ez xwarî buxçeya xwe bûm, min ew hilgirt û hinekî jipê di cihê xwe de mam. Tirs dîsa dawerivî dilê min. Şeva reş, ev hespê biyanî, ew bûyerên ku li jor qewimîn û serencama min a nenas bi hev re teşîya tirsê di serê min î xewixê de zîzikandin û badan. Ji nişkêve pêjnek hate guhên min. Ji tirsan min xwe bêhemdî xwe avête quncikekî tarî û guhên xwe miç kirin û nefesa xwe qut kir. Pêjn pêjna mirovan bû û hêdî hêdî nêzîk dibû. Gavin giran dihatin avêtin.

---

<sup>1</sup> Ezê hewl bidim ku serpêhatiya reva xwe hemûyî îşev biqedînim. Sibehê komek bazirgan û hinek xwendekarên felamanî ku dê berê xwe bidin zankoya Kölnê, bi alî bajarê Kölnê de herin. Ezê jî tebayî wan bidim rê. Pereyên min î ku bi min re mane û min ji wî hekîmê ingilîz veşartibûn, ê min bigihînin Herne.

Gavên kesekî jixwebawer bûn ew. Ê min jî êdî ruhê min hatibû ber devê min. Di ronahiya melûl ya çiraya li jor vêketî de mirovekî saldar, bi teylesanekî spî û kirasekî etles î xetxetî û şalikeke ku rengê wê ji min ve nexuyabû, xuyabû. Ew mirovê aram hat û li ber hespê rawestiya. Ronahiyê bala wî kişandibû. Jîrbûn û zîrekiyeke zêde jêre nediva ku jêdera ronahiyê nas bike. Serê xwe berjor bilind kir û li wê çiraya li ser kevîyê wê qulikê temaşe kir. Bi bilindkirina serê wî re, riya wî ya gij û spî jî xuya bû. Serê xwe daxist û destê xwe bi dilovanî di ser piştê hespê re bir û dawî bi kurmancî got:

- tu çima vê çendê ditirsî! Bide pey min.

Û derket.

Min nizanîbû ka gelo wî ez dîtime yan na! Ka gelo ew çê li min dike yan bi hespê re diaxive! Yan jî tew kesekî din li wan deran heye! Lê min bêhemdî xwe, wek ku ji min re gotibe bide pey min, da pey wî. Hêzeke nasayî di axaftina wî de hebû. Dengê wî, mîna ku çawa mexnatîsek qetek hesin bikişîne, ez bi dû xwe de kişandim. Buxçeya min di destê min de ez li pey wî derketime hêwaneke fereh û ronî. Qendîleke mezin î bi binbanê odeyê ve hilawestî ew der mişt ronî kiribû. dîwarên hêwanê bi gecê spîkirî bûn û hin kulik têde hebûn tijî kitêb bûn. Her ber dîwarekî kulavek û çend palgeh hebûn. Agirekî vêketî jî ew hêwan germ û ronî kiribû. Tîrsa di dilê min de bi germiya hundir re daket. Dengê wî mirovî yê germ û dilovan jî tîrsa min revand. Postê berxekî li rex êgir hebû. Ew li ser wî postî rûnişt û destê xwe yê rastê dirêjî cihekî nêzîkî xwe kir û got:

- rûne kurê min.

Min bi erebî lê veğerand:

- şukren ya şeyx. Barekellahû fîke.

Dema ku dît ez bi erebî diaxivim, mizicî. Bi wê mizicandinê re rûyê wî bêtir geş û dilovan bû û pirseke sar nola gulokek berf avête ber min:

- tu ji ku tê yî?

- Ji....

Û min berê xwe da jor banê hêwanê.

Ez nizamim ka ewî mebesta min fêm kir nekir û nizamim ka gelo hayê wî jê hebû bê çi rewşeke kambax li jor heye, lê wî bi nermî got:

- Baş e. Te baş kir.

Dilê min li wî rûnişt. Piştî kabûsê wan rojan, wan bûyerên buhurîn ku nayên bawer kirin ev kesê ku wisa aram û milayim rastî min tê!

- Navê min Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî ye. Ewê han jî birayê min Şêrbar e.

Û destê xwe dirêjî koseyekî li koşeyekî wê hêwanê kir.

Koseyekî mîna min bû ew, xwarî çend pelan bûbû tiştek dinivîsî.

- Ew xettat e. Kitêban nesix dike.

Şêrbar serê xwe ranekir û iltifat jî bi me nekir<sup>1</sup>.

Min bi kurtî çîroka xwe ji Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî re vegot. Ez kî me ji kû me çima ji welatê xwe derketime û bi çi armancê di vê xanê re derketime û çi hatiye serê min, min jêre ta bi derziyê ve kir. Agirê vêketî, zimanokên êgir ku dîwarê agirdankê dialastin rûyê wî yê aram nîşanî min dida. Rûyê Hans hate bîra min.

Di nav serpêhatiyên xwe de min behsa wê bîna genî jî kir, ew bîna ku li min peyda bûbû û sabûnên Helebê tevî nikarîbûn ji min bibin. Mîna ku ez dixwazim li ber destên wî li xwe û kiryarên xwe mukur werim, rabû min gotê:

- Ew bîna gunehan bû bê guman.

Ku min wisa got, wî nefeseke kûr kişand û bersiva min bi giranî weha da:

- eger ji ber gunehkariyan bîna genî ji mirovan bifûriya, du kes li ba hev rûnediniştin

<sup>1</sup> Dema em ji xanê derketin û gihiştin Bazîdê, pêşî em çûn mala Şêrbarê Mamzêdî. Bi gihiştina me re xwedê kurek da jina wî. Ji adetên kurmancan e ku zarokê wan dibe, navekî bi lez jêre dibînin, navê roj yan meha ku têde bûye, wek Remezan, Cuma. Yan jî navê weliyekî yan jî minasebetekê. Ji ber ku wan digot ez mêvanekî ezîz im, navê kurê xwe Ezîz danîn.

Û Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî gote min: eger kitêb û ol rast dibêjin û Xwedê yekî ewqase qenc û diloan e, şeytan jî yekî şerxwaz e, nexwe hîn Xwedê li erdê hukumdarî nekiriye.

Û gote min: hingî zêr bi hêz e dikare şerîetan jî betal bike.

Û gote min: di her mirovekî de canîwerên ji her cûreyî hene. Rovî, baz, şêr, piling, keftar, gur, pisîk, mar û heta bi kêzikên nav xezaman û qelşên daran û qulên dîwaran û derdora kewaran jî di mirovan de veşartî ne. Şer di hindurê mirov de her li dar e, ne şerê Xweda û şeytên e ew, belê ew şerê heywanên kedî û yên kovî ye. Di hin mirovan de gur serdest e di hinan de berx. Di hinan de mar e di hinan de beytik. Hin nêçîr in hinek jî dirrinde ne. Hirçek dikare kedî bibe, filekî daristanan dikare kedî bibe, piling jî kedî dibin, lê mirov! Bi sedan pêxember hatin, bi sedan fîlosof û hekîmên mezin hatin ku mirovan hinekî kedî bikin û ji xelesa kovî û hovîtiyê derxin lê nikarîbûn. Pilingek kedî dibe ji ber ku ew tenê piling e. Rûpêç yan rûpoşeke wî tenê nîne. Hema mirov! Di binê rûpoşan de nema rûyê wî tê nasîn.

Û gote min: yek ji delîlên ku ol ne ji ba Xwedê ne, pirrbûna wan e.

Û gote min: baz bi tena xwe difire, lê qijikên ku karê wan tenê qijeqij û kurmxwarin û zelqkirin e, bi hezaran bi hev re di refekî de difirin.

Û gote min: tu li pirrbûna peyrewên olekê nenêre, wê neke delîlê rastiya wê olê. Keriye ji hezaran pez dikare bide pey bilûra şivanekî tirale jî. Karwanek ji hezar deveyî dide pey zengilê deveyekî gurî jî.

Û gote min: piranî tu carî ne delîlê Rastiyê ye.

Û gote min: Rastî berxek e bi kêra kesên ku dibêjin: Em rast in, tê serjêkirin.

Û gote min: tuyê çawa nas bikî ku yek dûrî Rastiyê ye? Dema ku bibêje Rastî li ba min tenê ye.

Û gote min: bi qasî ku hêza te heye, Rastî li aliyê te ye.

Û gote min: yê ku ji xwedê hez bike jê natirse.

Û gote min: yê ku xwedê nas bike jê natirse.

Û gote min: tu ji yekî bitirsî tu nikarî jê hez bikî.

Û gote min: her yek dibêje Rastî li ba min e lê ne wisa ye. Rastîya mutleq ne li ba kesekî ye. Rastîya îro, nerastîya sibe ye. Û rastîya li welatekî, çewtiya li welatekî din e. Ramanên ku tu îro şerê wan bikî, dibe ku sibe bibin rastiyên te û tu ji bo wan xwe bidî kuştin jî.

Û gote min: her mirovek bi xoyê xwe sitemkar e. Yê ku sitemê nake, nikare.

Û gote min: hengek ku bi gulekê tenê razî bibe, nikare hingiv peyda bike.

Û gote min: gul yan kulîlka ku bibêje ji min bi tenê hingiv peyda dibe nas nekiriye hingiv çiyê.

Û gote min: her kulîlkek dibêje ku ew bi tena xwe buharê diafirîne.

Û gote min: azadî asta herî bilind e ji her mirovî re, lê kanîn ew kesên azad?

Û gote min: azadî azadiya hiş e ne ya leş e. Dibe ku tu destgirêdayî di zindanekê de bî lê ji kesekî li derveyî zindanê azadtir bî.

Û gote min: eger kevir fikirîba wê gotiba: ez bi iradeya xwe ya azad tême xwarê.

Û gote min: bextewerîya ku tu ji bo naskirina wê ji welatê xwe derketî û dûrketî, leylan û rewrewk e. Her ku tu bidî pey wê, tu yê tîtir bibî, ewê dûrtir bibe.

Û gote min: eger bextewerî di nan û gan û razanê de bûya, wê gayê di axurekê de bextewerê herî mezin bûya.

Û gote min: rêyên ku meriv digihînin bexteweriyê nînin, bextewerî bi xwe rêye.

Û gote min: hemû dîn û felsefe û mezheb û rê û rêçikên ku hene, dibêjin em tenê rast in û em tenê ji bo bextewerîya mirovan in. Bi behaneyê pêkanîna bexteweriyê pêlên artêşan dikevin nava hev: olek û peyrewên wê olê li vî alî meydanê, û li aliyê din oleke din û peyrewin din ku peyvîna pîroz kêra kîne di dilê wan de tûj kiriye. Hev bi navê bexteweriyê dikujin, tune dikin,

dayikan kezebşewitî dihêlin, jinan bî dîkin, zarokan sêwî dîkin û hevdû talan dîkin. Ji bo ku bexteweriyê pêkbînî, bêzarî û êşên mezin di dirêjiya dîrokê de peyda bûne. Misilman heta ber deriyê Viyannayê çûn û mirin bi xwe re birin. Ewropî heta Qudsê hatin û reben û belengazên wan welatan bi xwe re anîn û li van welatên dûr dane kuştin. Pêlên bexteweriya sexte bi sed hezaran xelkên reben dane ber xwe. Her yek jî dibêje: ez ê bexteweriyê pêkbînim. Dixwazin mirovan bi zorê bextewer bikin. Tu misilman bî, keşe dibêje ku na, bextewerîya te sexteye. Were bide pey xelaskerê mirovan û afrînerê bexteweriya rasteqîn Îsayê Mesîh. Tu nesranî bî, şêx dibêje te ka were bextewer bibe, were bide pey kelmê Xwedê û riya Muhemmed û deriyên bexteweriyê bi stûxwariya li ber fermanên xwedayê mezin veke. Henefî li bexteweriya şafîyan heyirîne, şafî li ya henbelîyan, ortodoks li ya katolîkan û katolîk li ya lûteranî û kalvenîyan. Di quranê de, ayetek heye dibêje: *kullû hizbin bima ledeyhim ferihûn.*

﴿كُلُّ حِزْبٍ بِمَا لَدَيْهِمْ فَرِحُونَ﴾ Yanî: Her komelek bi `eqîde û baweriya li ba xwe, kêfxweş e. Her kesek rastiye li ba xwe dibîne û xwe pasdarê pîroziya rastiye dibîne. Her komek bi rastiya xwe kêfxweş û bextewer e. Her olek xwe ji ba Xwedê dibîne û olên mayî jî wek qewlên şeytanî bi nav dike. Her mezhebek û her neteweyek, dibêjin em gelê Xwedê yên bijarte ne. Di Quranê de jî ayetek wisa heye ku misilmanan ummeta herî çê û rast bi nav dike. Hemû xwe bijarte dibînin.

Û gote min: Her kesek bi baweriyên xwe bextewer e weke çawa ku kêzika gûgerînk bi guloka rîxê bextewer e û wê gulokê diparêze.

Û gote min: hemî mirov pîvazên mişarekê û berûyên darekê ne.

Û gote min: bextewerî gelek caran tê li deriyê mirovekî dide, bêtî ku derî jêre vebe.

Û gote min: dikare di serpêhatiyên herî diltezîn de, bextewerî hebe.

Û gote min: eger bi bextwerbûna te kesekî din janê bikêşe bizanibe a te ne bexteweriye.

Û gote min: hin kes dizanin bextewerî çiyê, lê ne bextewer in.

Û gote min: Dunya tev de dîzeke mezin e ku agir di bin de vemirîye û ava di dîzê de genî bûye.

Û gote min: ev welat ne cihê ku mirov lê bijî. Vegere welatê xwe. Li vir çi heye? Nakokiyên mezheban? Bi sedan mîrnuşîniyên ku êdî ji qijîkan xerabtir xwîna xelkê dimijîn û di pehnavan de rebenan kom dîkin û dihêlin ku ew bi şûran hev qir bikin? Welatê dînan e ev welat. Çi li vir heye? Zêrperes! Bazirganên mirovan ji beg û axa û mîr û mîrmîran û beglerbeg û paşa û serdar û serleşkeran! Here ji van deveran. Here. Ku dilê te nebe warê hikmeteke mezin ruhê te xelas nabe. Tu bikaribî heta dawîya dunyayê jî biçe. Her ku tu ji van deran dûr bikevî dê Rastiya mîna horîyeke spehî û tazî, were pêşberî te û xwe di hemêza te de bimelisîne. Tuyê Rastiye hembêz bikî.

\*\*\*

Wê êvarê, heta danê sibê ew diaxivî û min guhdarî dikir û hin gotinên wî dinivîsîn. Gelek caran rûyê wî li ber çavê min eynî mîna rûyê Hans dibû. Deng jî dibû ew deng. Gotin jî mîna ku dûbare dibûn, her ew gotin bûn, ên Hans bi xwe bûn. Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî gotinî pirr watedar digotin ku nema tene bîra min. Diyarbû ku Şêrbare Mamzêdî dest pêkiribû û peyvên wî li ser kaxezên xwe dinivîsandin. Ez niha dibêjim xwezî min jî wisa bikira. Xwezî min jî ew gewherên giranbuha li cihekî taybet nivîsîbana. Wan peyvên wî wisa aramiyeke wînda ku ez ji zû de lê digeriyam dane giyanê min. Wê axaftina wî ya bi tîn û germ giyanê min î ku di berfa gumanan de û di nav qeşaya zozanên windabûnê de mabû û qefilî bû, germ kir. Qet behsa bûyerên ku li jor diqewimîn nekir, lê mîna ku hayê wî jê hebe tev digeriya û diaxivî.

Bi destê sibê re ji birayê xwe Şêrbare kose re got ku wan kaxezan bipêçe. Paşê keşkûlekî çermîn da destê min û got:

- Alavên xwe bixe vî keşkûlî.

Û çû aliyê wî hespê tewilandî. Ez û Şêrbar, em herdu kose bêyî ku em biaxivin, rabûn û me da pey wî.

Li cihê ku hesp lê tewilandî bû, kulîkek biçûk roniyeke ku bûbû nizamî çend roj min nedîtibû herikandibû ber simên hespê kihêl. Ew ronahiya roja sibê bû ku nû hilatibû. Êdî min hespekî din î zînkirî jî dît. Min serê xwe bilind kir ku wê kuna têre daketim jêr bibînim, min tiştek nedît. Ez behetîm û min nema wêrîbû bipirsim. Nema min ji hev derxist ka gelo ya ku şeva çûyî qewimîbû xewn bû yan rastî bû! Ew bûyerên sosret ên wê xanê xewn û xeyal bûn yan rojên dijwar bûn ji temenê min î ku mîna libên nokan li zinarê vê xurbetê ketîye! Rûyê Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî geş bû. Min îcar bi rihetî şopa salan, newal û gelî û xaçirêkên ku dem têre derbasbûbû di wî rûyê aram û ronîdar de dîtin. Min di wî rûyê kurmanç û bextewer de bersivên gelek pirsên xwe xwendin. Wî îşartî hespa din î zînkirî kir ku, rişma wê bigre û bi dû xwe de bîne. Wî bi xwe jî hefsarê wî kihêlê dêlhûnayî girt û bi dû xwe de ajot û em ber bi derîyekî ve meşîyan. Bi gihiştina wî deriyê mezin ku li berîyeke bi berfê xemilandî vekirî bû re, Dawud berê xwe da wê valahiya spî û got:

- Hemû rê diçin valahiyê. Ji valahiyê tên û diçin valahiyê. Temenê mirovan jî, rawestgeheke vala ye di navbera du valahyan de ye.

Û em derketin.

\*\*\*

Xwendevanê ilahiyatê piştî ku gihişt dawiya defterê, ew bêdilî xwe dada. Ew ne li hêviya wê dawiya hanê bû. Wî texmîn dikir ku dê awayê derketina ji wê xanê bi gir û hûrê xwe hatibe nivîsandin. Wê Martîn, bi kurtî be jî, behsa şeweyê reva xwe ji xanê û rêya ku ew gihandibe heta Bazîdê kiribe. Wî her dipa ku Martîn bi dirêjayî li ser derketina xwe ji xanê rawest e. Nema sebir dikir ku bigihê dawiya deftera sêyem û nas bike bê Martîn xwe çawa ji nava wê gerîneka kûr deraniye. Lê wî piştî hevoka dawî ku têde nivîsî bû: hemû rê diçin valahiyê, yek tîp jî nedanîbû. Ji valahiyê pêve di dawiya deftera Martîn a sêyem de nemabû. Çend kaxezên spî mîna beriyeke bi berfê nuxumandî li pê hev hatin lê wî tîpeke tenê jî di wan de nenivîsîbû. Şopa hibrê nema hate dîtin. Pêjna pênuşê nema peyda bû. Wî xwendevanî hêvî dikir ku hema tenê peyvekê mîna qijikeke reş li ser wê berfa kaxezan ya spî bibîne, lê nedît. Gîrrê naskirina berdewamiya serpêhatiyê lê gurrûbû. Rabû ji odeya xwe derket. Berê xwe da odeya li rex xwe ku ev bûbûn çend seet geh himesim jê dihat geh jî bêdeng dima. Wî êdî texmîn dikir ku kesê li rex wî di odeyê de Martîn bi xwe ye. Ji texmînê bêtir jêre bûbû bawerî ew yek. Dîtina Martînê xwediyê wan serpêhatiyên di her sê defteran de tomarkirî, xwediyê wê çîroka dûr û kûr û dirêj, wan şikestinan, rabûn û daketinan, tehlî û şîrîniyan, û wê pêketina leylana bexteweriyê, êdî bûbû kuleke herî mezin di dilê wî de.

Xwendevanê ilahiyatê dixwest rastiyê zindî ji devê Martîn bibihîze, wî dixwest rastiyê tazî bibîne û nas bike kanî dawiya çîrokê çawabû, loma jî biryara xwe da ku biçe li deriyê cîranê xwe bide, di xew de be jî ew wî ji xewê rake. Divê bi çi buhayî be rastiyê nas bike. Û rabû berê xwe da odeya hemsayê xwe û li deriyê wî da.

Martîn ji xew rabû. Berî ku çavên xwe mis bide, destê xwe li kitêba bin serê xwe peland û dilê xwe xist cih ku ew di cihê xwe de ye. Kitêbeke ku Dawudê Yezdanyarê Mamzêdî ew diyarî wî kiribû di rîya Bazîdê de. Wî jî ne destê xwe dabûyê ne jî xwestibû lê binêre. Ew di qewlikê wê de hiştibû heta ku gihiştibû nêzîkî Herne. Dema ku li rêwîxaneyê Zur Kurve hilkîşiyabû jor defterên xwe li dû xwe hiştibûn lê ew kitêb bi xwe re biribû ku bixwîne. Xewê zora wî biribû û di xwe re nêdîtibû ku kitêbê hema ji qewlikê wê derîne bê çi kitêb e û rabûbû radabû bin balîfa xwe û razabû.

Ode tarî bû. Martîn rabû mûmek ji wan mûmên ku ji bo gora diya xwe anîbûn geş kir û berê xwe da deriyê odeyê û vekir. Ronahiya mûmê ya melûl rûyê westiyayî ê xwendevanê ilahiyatê bi kelûkortên xwe resim kir. Çavên xwendevanê ilahiyatê ketin çavên Martîn, li cilûbergên wî yên ecêb temaşe kir û hinekî bêdeng ma lê dirêj nekir wê bêdengiyê. Xwendevanê ilahiyatê pirsar xwe mîna ku Martîn ji zû de nas kiribe nola şaberûyeke di êgir de teqand:

- De ka bibêje tu çawa ji wê xanê derketî?

Martînê ku wê pirsê ew vecinîqand, dizanîbû ku gotin ji wî nayên, peyva xanê zimanê wî anî bîra wî. Ji bo ku ji xwendevanê ilahiyatê re bide xuyakirin ku ew lal e, hema zimanê xwe dirêj kir û destê xwe avêtê. Zimanê xwe bi du tiliyan girt û hinekî hejand mîna ku bibêje ev ziman bi kêrî axaftinê nayê. Zimanê ku hinekî dinav tiliyên wî de çû û hat ji nişkêve mîna şaxikekî riziyaqî qurîfî. Zimanê Martîn jêbû û di nav herdu tiliyên wî de ma. Ew bi jana qurîfandinê jî nehisiya. Zimanê xwe di kefa destekî xwe de ramedand û hema ziq li xwendevanê ilahiyatê nerî. Ewî xwendevanî gava ku zimanê Martîn di kefa destê wî de dît behetî, qutîfî, tirsîya û mîna yekî ku çav li ejdehayekî ketibe çeng bû û qêrînek bilind pê ket û hema berê xwe bi lez da odeya xwe û derî li pey xwe girt.

Martîn kenîya, tirsar wî fêr kir lê guh nedayê. Derî bi hêdîka girt û li zimanê xwe yê di kefa destê xwe de ramediyaqî nihêrî. Mîna pelege payîzê weşiyabû ew ziman. Bêyî ku bijene, bêyî ku deverê di devê wî de biazîre ziman qurîfî. Martîn bêyî ku guhdaneke mezin bide wî zimanê xwe ew avête bin iskemleya ber nigê xwe û berê xwe da palgeha bin serê xwe. Destê xwe dirêjî kitêbê kir û ew kişand. Piştî heşt mehan ji jibîrkirin û guhnadanê xwest nas bike Dawudê yezdanyar çi diyarî wî kiriye. Rabû kitêb ji qewlikê qedîfe derxit û lê nihêrî. Nav bi

hibreke zêrîn li ser bergê bû. Martîn ji çavên xwe bawer nekir. Ew nêzîkî roniya mûmê kir û ew nav li ser bergê xwend:

**El Ifade fî Iksîr El Se`ade!** Kitêba ku bîna ariyê jê dihat da ber sînga xwe û bêdeng ma.

Xwendevanê ilahiyatê ê ku bizdoyî bûbû û kurpekurpa dilê wî bû, hinekî xwe xurt kir. Kula naskirina agahiyên li ser reva Martîn û wê kitêba ku di dirêjiya çîrokên wan her sê defteran de hebû ji dilê wî neçûbû. Rabû careke din hate ber deriyê odeyê û bi dengê nizm ji Martîn pirsî:

- Û ew kitêb! Te ew kitêb anî?

Martînê ku zimanê wî berî kêlîkekê mîna xezamekê weşiyabû got:

- erê, min aniye.

Bê ziman ew peyv ji devê wî derketin. Wisa nerm û hêsan, bêyî wî goştê sor î di devê wî de Martîn axivî û li ber xwendevanê ilahiyatê rawestiya. Kitêba di destê xwe da şanî wî kir û got:

- ev e.

Çermê kitêbê ji postê gayekî qert bû, postekî wisa req û stûr û xurt bû ku mirov digot ev sindoq e ne kitêb e. Martîn kitêb rakir û vekir. Bi vekirinê re arî weşiya. Di navbera herdu qaban de tenê arî hebû. Ji qabê heta qabê arîyeke germ bû mîna ku yekî ji hundur de pelên wê şewitandibin. Mîna ku ew hundurê tenûrekê be, nava tîfîkekê û naveroka sêkuçîkekê be arî weşiya. Ariyeke hûr, sivik û reş weşiya heta ku naveroka kitêbê nema û tenê herdu qabên hişk û req di destê Martîn de man. Xwendevanê ilahiyatê ku ev yek dît, tîrsa wî duqatî bû, di dilê xwe de got ku ev kes sihirbazek e. Û bi lez xaçek li hewayê resim kir û bêyî ku li pişt xwe bizîvire bazda. Martîn keniya, kenekî bi hêl kir û bi dû wî de bang kir:

- Tu bi kû de diçî! Hemî rê diçin valahiyê. Ji valahiyê tên û diçin valahiyê. Arîye, arî. Her der arî ye.

Û berê xwe da jêr. Li jêr tarî serdest bû. Tişteke ji reşayê pêve nebû. Yek kes jî li dora maseyan nebû. Arî ji dûkêşa dêrê pêl bi pêl derdiket. Ringînîya naqosê bû <sup>1</sup>. Ringînîyeke ne asayî û ne di wexta xwe de bû ew. Mîja li derve jî reng û tehma ariyê stendibû. Ji bilî wê ringînîyê dengê tu tiştî nedihat. Martîn di nav kursî û maseyan re hêdî hêdî meşiya. Dengê piyên wî jî nedihate wî. Arî li erdê mîna xaliyeke stûr û têr pirç raxistibû. Li dora xwe nihêrî ji mij û tariyê pêve tişteke din nedît. Guhên xwe miç kirin ji ringînîyeke dirrinde û bê harmonî pêve tu dengê din nebihîst. Mij û arîyê, ringînî û tariyê ew dorpêç kiribûn. Martîn ew bergê çermînî avête pişt xwe û derkete derve û di nav pêlên mij û arî û tariyê de winda bû.

---

<sup>1</sup> Dema ku Karlê qut î qalind, li jora bircê bilind li naqosê qelibûbû, dengê xeniqî ji naqosa sifir a mezin derketibû. Georgê sêzdesalî, ministrantê ku Karl pereyên wî yên gana çend caran nedabûnê, ku li jêr li wî digeriya, ji wê ringînîyê fêmkiribû ku Karl berê xwe daye kulika naqosê. Rabûbû ew jî bi derenceyê ve hilkişiyabû heta ku gihîştibû jor. Û li wir, di nava wê mîja sar û di wê tariyê de, li ber naqosa mezin ew û Karl bi hev re careke din rû bi rû bûbûn. Li wê jora hanê bi hev ketibûn herdu yarên neyar. Herduyan jî naqos ji xwe re dikirin çeper û sitare û her yekî xwe ji ber derba ê din di pişt naqosê de vedîşt. Naqosa ku bi her liveke wan re dihejiya û dikire ringînî, bûbû mortal ji herduyan re. Çend derbên kêrê û çendekên wê mûmdanka ku hê jî di destê Karl de bû li kevîkên naqosê ketibûn û dengîna naşêrîn jê peyda bûbûn. Hêdî hêdî xelkên ku ewan ringînîyên ne di çaxa xwe de ew tirsandibûn, ber bi dêrê ve kişiyabûn. Ji rêwîxaneyê Zur Kurveyê ku nêzîkî dêrê bû, neh deh kes bi lez dabûne nav riyên ariyê û di nava mijê de xwe gihandibûn biniya dêrê raserî bircê naqosê û ji xwe re li jor li du kesên ku diyar bû şer dikin temaşe kiribûn heta ku dîtibûn yek ji wan herdu kesan ji jor hatibû xwarê û li ber lingê wan li ser wê ariya ku tiliyekê bilind bûbû ketibû û bûbû gurmîniya wî.

## Naverok

|                          |  |
|--------------------------|--|
| <b>Danê sibehê</b> ..... |  |
| Se`et neh .....          |  |
| Se`et deh .....          |  |
| Se`et yazde .....        |  |
| Se`et dwazde .....       |  |
| <b>Danê nîvro</b> .....  |  |
| Se`et yek .....          |  |
| Se`et du .....           |  |
| Se`et sê .....           |  |
| Se`et çar .....          |  |
| <b>Danê êvarî</b> .....  |  |
| Se`et pênc .....         |  |
| Se`et şeş .....          |  |
| Se`et heft .....         |  |
| Se`et heşt .....         |  |
| <b>Se`eta dawî</b> ..... |  |